roman

LALEŞ QASO



# Sê şev û sê roj

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Sê şev û sê roj

# Sê şev û sê roj

**LALEŞ QASO**

NEFEL
Stockholm
2002

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)
[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

**Laleş Qaso:** Sê şev û sê roj

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Laleş Qaso û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-10-8

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Sala 1969an

Qereqola hidûd di sala 1958an de, di berpala başûrê girê Qesra de hatibû ava kirin. Di serê gir de ji dema ku qereqol hatibû ava kirin pênc dîrekên dirêj çikandîbûn. Bi van dîrekan ve daliqandî gelek mirovan can dabû. Li hawêrdorên gir bi kevirên bestan, boyax û kilsê wiha hatibû nivîsîn:

»Tirkek bedelî cîhanê hemî ye! Her tirk esker çêdibe! Ev welatê me ye! Welat yekperçe ye!«

Di rohilat û roavayî gir de dîsa ji kevirên bestan bi qasî deriyên sûr û dêrên kufarî mezin rengareng du wêneyên eskerên tirk hebûn. Wêne bi haweyekî pir balkêş hatibûn çêkirin. Mirov ji wan heybet digirt! Serê eskeran bi mîxfer, newqên wan yekser bi rext û fîşek û bomban rapêçayîbûn. Potînên wan ên bi niçik, bi qasî tabûtên zarokan dirêj û mezin bûn. Mîxên kubikî ku seranser di qiraxên potînan de çikandîbûn; mîna qesnaxên cenceran xwe dabûn der. Destên xwe ên çepê kiribûn kulm û danîbûn ser sênga xwe. Tivingên wan ên bi qezetore di destên wan ên rastê de bûn û berê tivingan jî bi bakur ve bû. Qezetore heta ku digiha lûla tivingê bi carekê ve ji boyaxê sor bûn. Ji serikên qezetoran mîna ku xwîn binisile bi lez dilopên boyaxê xwe berdidan. Di nav şeqên wan de kelaxekî bêserî, ji kelax hinekî dûr di bin lingê çepê de seriyekî devjihev û zimankişiyayî hebû. Li jêra gewdê serjêkirî ji boyaxa sor bi tîpên mezin jî wilo nivîsîbû:

»Xwezî bi dilê wî ê ku dibêje ez tirk im! Tirk mezin e!«

Gava mirov bi terempêlê ji Qosarê ber bi Nisêbînê û ji Nisêbînê ber bi Qosarê de diçû û nêzîkayî li gir dikir, gir ji esker û termê insên di çavên mirov de bi qasî çiyayekî bêper bilind dibû. Ji sawa ku vî girî dida, Reşo her ku diçû Nisêbînê xwe berdida ser rêya Menderê û li vegerê dîsa di rêya vî gundî re dihat malê. Gir, ji gundiyên derdor bêtir tesîra xwe li ser qesiriyan dikir. Remoyê qesirî di rojên ku wê ber bi derekê de biçuya, ji gund heta ku dihat ser rêya Îpekê, da ku gir nebîne, şifqa xwe dixist nav çavên xwe, ziq li erdê dinerî û dimeşiya. Dûv re jî ji ber gir mala xwe bar

kir û li Zorava bi cih bû.

Li vê qereqolê sih û şeş esker diman. Ev hejmar carina bilind jî dibû. Li hewşa qereqolê seraqet cîb û cemsek û panzêrek sekinîbûn. Eskeran bi van terempêlan hidûd saxtî dikirin û didan pey qaçaxçiyan. Îcar di şevên ku teqîn dibû û bi qaçaxçiyan re remî dikirin, ji qereqola Kewke û Nisêbînê jî hewar bi qereqolê ve dihat, hejmara terempêl û eskeran bilind dibû. Li vê qereqolê wekî din jî di hindurê heftê de bi kêmanî sê, çar caran terempêlên ku ji hêla Nisêbînê ber bi Mêrdînê û Qosarê de diçûn, saxtî dibûn.

Qereqolê keriyek pez xwedî dikir. Li vir her roj du pez ser jê dibûn. Qesabiya qereqolê jî Cimoyê zoravî dikir.

Besta Zorava ji aliyê rohilat ve di ber gir re dirêjî nav mayinan dibû; binya hesin derbas dikir û xwe bi nav erdê binxetiyan de berdida. Best heta bi çend sal berê jî seraqet diherikî; lê di dûv re hêdî hêdî av ji ser qut bû û best ku lehî raneba, di zivistanan de jî nema herikî. Di jêra gir re rêya Îpekê derbas dibû. Deriyê qereqolê li rê dinerî. Di qiraxa rê de pêşberî hev du kulûbên eskerî hebûn. Bi tîpên mezin li ser hêtên kulûbê hatibû nivîsîn ku Tirk bahoz e! Tirk birûsk e! Li jêr hema bi rê ve dîrekên têlên erda mayînkirî ji hindama qereqola Kewke heta ku diçû Nisêbînê, yek di ber yekî de çikandîbûn. Gundê Qesra li jêra Îpekê dima. Navbera gund û qereqolê latek erd ne digirt. Dêrûdorên gund bi têlên ristîn rapêçayîbûn. Ji vî gundî bi tenê rêyek derdiket. Rêya gund di ber deriyê qereqolê re derbasî ser Îpekê dibû. Li jêra têlan mayin û li jêra mayinan jî rêya trênê bû. Trên di hidûdê Binxetê re derbas dibû. Li binya hidûd gelek gund hebûn. Eskerên Sûriyê têkilî hidûd ne dibûn. Eskerên tirk hidûd diparastin. Di vî warî de selahiyeta wan bêsînor bû. Heta carina xwe berdane gundên binya hesin, di van gundan de bi mebesta qaçaxê hin mirov girtine û di nava mayinan de kuştine. Eskerên Sûriyê şelû ne dibûn. Di sala 1967an de gava eskerên tirkan êrîşî ser qereqola Doda dikin, Hemîdê hezexî digirin û di qereqolê de dikujin, ne eskerên Sûriyê desthiltînin û ne jî dewleta wan bi xwe bersivekê dide dewleta Tirkiyê. Gelek bûyerên wiha çêbûne. Û eskerên Sûriyê jî tu carî li xwe ne qewimandine.

Zorava û Sirêçkê diketin bakurê qereqolê. Besta ku ji Herbê destpê dikir, di binya Cinata re xwe berdida Hebîsê, Kurikê, Sitilîlê û di ber Atxê re dihat, di navbera van herdu gundan re derbas dibû. Gund di nêzîkî hev de hatibûn ava kirin. Di roavayî Sirêçkê de tibabê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kîlometroyekê dûr, oda axayê sarinciyan xuya dikir; hema bi Sarincê ve Pîrebokê an jî Gundik û Kuçûka dihat. Şêxderbik, Gundikê Evdirehman, Gundikê Semho, Domiza û Darê jî li roavayî Pîrebokê û Kuçûka dima. Gund hemû bi ser hev ve bûn. Menderê li jêra Zorava ji aliyê rohilat hinekî ber bi başûr de dima û bi qasî beza yextiyarekî nêzîkî hev bûn. Çûva tam di rohilatî Menderê de ava bûbû. Herdu gund jî hema hema bi hev ve bûn. Şivanekî temam, bi kevirê koçanîkê xwe ji Menderê dikarîbû çûvayiyek birîn bikira. Dêrê, Dala, Cibiltînê, Bamidê, Xirbê Hinarê, Xirbê Zil û Eferê diketin rohilatî Zorava. Di nav van gundan de gundên ji hidûd herî dûr Xirbê Hinarê, Şahbanê, Xirbê Zil û Eferê bû. Pênc, şeş kîlometroyan ji hidûd dûr bûn. Zivingê, Atxê, Qûzo û Gurik li rajorî Zorava di çiyê de diman. Gundê ku ji hidûd hinekî dûr diket Gurik bû. Ew jî qey hemû heft, heyşt kîlometro digirtin. Bi tevayî xelkê van gundan hemû jî xal û xwarzê, ap û birazî, dotmam û pismamên hev bûn. Ên mayîn jî pisêpismaman bûn. Bi giştî ji hev dizewicîn. Dotmam a pismêm bû. Bira dimir, jinbir bi birayê din dima. Zilamekî dikarîbû bi deh, duwanzdeh pîrekan re bizewiciya. Lêbelê herçi pîrek bû, tu carî nikarîbû bi du zilaman re bizewiciya. Zilamê ku zewaca xwe nuh dikir, cotek qundere û bedlek jê re dihat kirîn. Û pîreka ku li ser zewaca bi du zilaman re hema piçikekî bifikiriya, demaçe di serî de vala dibû. Çimkî li gor wan a ku zilêm dikir exlaqî û a pîrekê jî bêexlaqî dibû. Di civatê de navê zilamê ku li dor pîrekê digeriya bi tolazî û ê pîreka ku li dor zilêm digeriya jî bi qûnekî derdiket. Herdu jî sûc bû. Lêbelê zilam bi çend qurûş pere cirm dibû û pîrek jî dihat kuştin. Zilêm di civatê de dikarîbû bi haweyekî serbest behsa çûna xwe a kerxanê bikira, lê pîreka ku di ber deriyê kerxanê re derbas bûba, di devê wê de demaçe vala dibû. Dema lawik çêdibû dawet li dar diket; ku keçik çêdibû şîn û girîbû. Li vê herêmê mirovên xwedî du, sê û çar jin gelek û ên xwedî yanzdeh û duwanzdeh jin jî kêm kêm hebûn. Civatê ji ber ku li dinyayê nêr temaşe dikir, diruvê pîrekê bi hertiştî dixist û bi lebatekî wê bi nav dikir. Civak nêr û dînê civakê nêr bû. Heta li ba wan navê Xwedê jî nêr bû. Lêbelê ev jî hebû:

Di nav xelkê omeriyan û bi giştî jî di nav bûblaniyan de pîreka ku bi ser pêncî diket, wek her zilamî dikarîbû di civatê de rûnişta. Li gor terbiya islamê, pîrekê tu carî nikarîbû di nav koma zilaman de cih bigirta û wek zilaman bipeyiviya. Mihemed û xelîfên wî ev yeka ha li ser navê Xwedê lê qedexe kiribû. Lêbelê sitilîlî û bûblaniyan jî ev zilma islamê tu carî qebûl

ne kirin û bi pîrekê re rûniştin. Heta li Zivingê di sala 1955an de Fesla Enter kiribûn muxtarê gund û li gundê Gurik jî Emîna Ehmê bûbû mela gund. Ji %90ê stilîlî û bûblaniyan tu carî tam misilman ne bûne. Ya jî mirov bibêje ku wan li gor xwe misilmaniyek saz kiribû, belkî bêtir di cih de be. Mizgeft çêdikirin mele ne dianîn gund. Mele bianîna, mizgeft çênedikirin. Merş û alavên di mizgeftan de didizîn. Diçûn hecê nîv-sofî, ji hecê vedigeriyan limêj ne dikirin. Bi Xwedê û pêxember re li ser sicadê dikufirîn. Û dûv re jî limêja xwe dikirin. Şêx dianîn gund, tobe ne dikirin. Rojî digirtin, limêja eydê ne dikirin. Hinan jî rojî ne digirtin û limêja eydê dikirin. Hinan di meha rojiyê de bi sibehkî re perde didan ber pacan, hindur reş dikirin, têr dixwarin û niyeta xwe li rojiyê dianîn. Sofiyên wan ên herî dîndar jî di hindurê mizgeftê de bi jinên xwe re radizan. Li ba wan sofitî remza minafiqiyê bû. Hin ji wan gava ku bi cenabet dibûn, xwe di hewşa mizgeftê de li ser nahşê miriyan helal dikirin. Pirên wan gava diçûn omeriyan destlimêj ne digirtin û limêj dikirin. Dema ku limêj dikirin jî »Bismillahirrahmanirrehîm« digotin û »Eûzûbîllahîmînelşeytanirrecîm« ne digotin. Sûnda wan ji Quranê bêtir bi Mishefa Reş bû. Agir pir miqedes didîtin. Di rojên înan de li hin gundên omeriyan hêk û mirîşk ji gundiyan distendin û beşdarî xutbên wan dibûn. Sibehan pere diavêtin kozika ziyaretê û êvaran jî perê xwe dianîn. Henekên xwe bi ziyaretê dikirin. Ji aliyekî de miriyên xwe gor dikirin û ji aliyekî de jî bi wan re him dikeniyan û him jî sohbet dikirin. Di civatê de devjenga li ser islamê serbest bû. Islam li ba wan pir bêqîmet bû. Herkes bi melan re dikarîbû li ser qencî û xerabiya islamê û xwedayê wê bi rehetî bipeyiviya. Li gor islamê zekat li mitirbên kurd ne diçû, ew jî ji bo ku muzîk, govend û dîlana kurdî li ser ligan dihiştin. Lêbelê xelkê herêmê jî ji feqe û melan bêtir zekata xwe dida mitirban. Bûblanî ji êzîdiyên derdora Wêranşahirê û Dêrika çiyayê Mazî bûn. Pêşiyên wan, li gor ihtîmala herî mezin, çûvî bûn. Çûvî eşîreke mezin bû. Eşîrê ji Qerejdaxê heta ku digiha wêranşehirê, Dêrikê û hidûdê Sêwregê cih girtibû. Eşîr bi carekê ve êzîdî bû. Dûv re çend bavik jê dibin fileh û bi dû filehtiyê de jî hema hema hemû dibin misilman.

Li dor sê sed salî çêbûbû ku bûblanî hatibûn derdora Nisêbînê. Li vir dibin du beş, beşek di bin pozê omeriyan de bi darê zorê cih digire û beşê din jî ber bi çiyayê Şingalê de diçe. Li gor tefsîra axê bûblaniyan omerî û eşîrên herêmê ji wan re « Bûn-bela« dibêjin û ev nav di herka zemên de dibe Bûblanî. Heta pêncî sal berê jî têkiliyên axê bûblaniyan û êzîdiyên

Şingalê bi hev re hebûn. Ji hev re digotin, »Pismam.« Pisê pismamên Sarê jî di nav wan êzîdiyên Şingalê de hebûn. Lêbelê têkiliyên wan û êzîdî, fileh û misilmanên çûvî ji hev qut bûbûn. Taybetmendiyek din a sitilî û bûnlaniyan pir henekçî û ewqasî jî xeberokî bûn. Û xeberên wan jî wek şekir şêrîn bûn. Di vî warî de hin ji wan pir li pêş bûn. Ewqasî xweş digotin, pîrekên pîr û zilaman ew bertîl dikirin ku bi wan re hema siqêfek kiribana.

Wek li temamê gundên herêmê, li Zorava jî berberî hebû. Ji gundên din bi tenê belkî ferqa zoraviyan ew bû ku berberî bi haweyê du bendan digeriya. Çimkî bi giştî di her gundî de sêbendî, çarbendî û pêncbendî hebû. Û hemiyan jî bi hev re xirecir û şer dikirin.

Pizûrî hemû li taxa jorê diman. Gund sê tax bû. Rêyên kolanan ji ser hev qut kiribûn. Ne ji jorê kesek dikarîbû daketa jêr û ne jî ji jêrê kesek hilkişiya jor. Mercên ku Circîs û Heso danîbûn pirole dijwar bûn. Li vî gundî têkilî û hevkarî qedexe bû. Pîrekên terefan nikarîbûn digel hev biaxiviyana; qedexe bû ku zarokan pev re bilîstana. Her hêlekê çend tenûrên xwe hebûn. Du gavan û sê şivan di gund de hebûn. Heta bi ava ku ji Sitilîlê diherikî birka gund, li hev hatibû parkirin. Birka avê ji danê sibehê heta ku seet dibû duduyê rojê di mista benda pizûran û seet ji duduyan heta sibehê jî di mista benda hûran de bû. Gol û sarinca gund ew jî bi dorê dihate bikaranîn. Pez bi dor dianîn ser avê. Bi dor diçûn cilşo yê. Tahta birxulan havînan herhefte wê dest biguherta bûba malê bendekê. Her hêlekê du cot destarên xwe hebûn. Berî ku terempêl têkeve gund, heta bi aş û darteraşên Sitilîlê li hev pişk kiribûn. Yanî benda ku dan û sitendina wê bi kîjan aşî û darteraşî re bûbûya, benda din têkiliyên xwe ji wan dibirî. Elba gund bi tevayî bi kar ne dianîn. Herdu bendan jî elbek xwe hebû. Di vî gundî de yekaheng, tu tişt tune bû. Dema elba genim li taxa jor bi bîst û heft wereqeyan bihata firotin, taxa jêr wê ev sêr têk bibira, elba genim daxista bîst û şeş wereqeyan. Çiyayiyan ji vê qayişê fêde dikir û qerfên xwe bi berîvaniyan dikirin. Lêbelê berîvaniyan jî ji qayişa nav wan fêda xwe didît û henek û laqirdiyên xwe bi wan dikirin. Mewîj, dims, bastêq û êzing erzan dikirîn. Heso CHPî û Circîs jî APî bû. Li ser van herdu partiyan jî di rojên hilbijartinan de çend carekî şer kiribûn. Heso paşnavê xwe û malbatê kiribû »Kaplan«, Circîs jî ê xwe û malbatê kiribû »Aslan.« Tiştekî wan ne dişibiya hev.

Bacanfiroşên Newalê ji ber ku bi rewşa gund dizanîbûn, bi çar cembiyan ve zozo dihatin gund: Yekî barê xwe li taxa pizûran, yekî jî li taxa

hûran datanî. Bacan û tirîfiroşên Newalê mîna kose û berkosan li xelkê gund dikirin. Dema koseyekî ji taxa jorîn bang dikir û digot, »Ha werin bacana ser bi ser!« Kosê din li taxa jêr bang dikir, »Ha werin bacana, du ser genim bi serek bacan!« Îcar kosê ku li taxa jor bû wê dev biguherta, sêra berê betal bikira û wî jî dikir du ser genim. Kose û berkosan carina bayê sêrê pir radikirin. Li vî gundê serpiçûk, gelek caran serek bacan bi çar ser genim firotine. Terbiya Circîs û Heso rê dida hemû babetên şelihandinê. Xwe mecbûr didîtin. Gava li gor sêra kosan bi kosan re nemeşiyana, bêguman kose wê li taxekê biciviyana. Lêbelê kêmanî dihat ser taxa din. Nemaze ev kiryara ha jî, wê di nav benda din de, destûra peyrewî çikûs û qelsok bihata dîtin. Bi kurtî, li vî gundî hertişt di rengê belayê û xerabiyê de ava bûbû.

Heso û Circîs bûrayên hev bûn. Pêşdestiya malbata pizûran di destê Heso û a hûran jî di destê Circîs de bû. Gotinên van herdu mirovan di nav malbatê de wek ên pêxemberan bûn. Malbat ji gotinên wan dernediketin. Tarîxa dijminatiya malbatan ji kevin de dihat. Kalikkalikên Circîs û Heso pisên pismaman bûn. Li gor ku digotin, ev mirov rojekê bi siwarî digel hev diçin nêçîra xezalan. Li hindama Amûdê di nav qendirxan de xezalekê dikujin. Laş tînin malê û li hev pişk dikin. Hûr û pizûr li aliyekî goşt û serûpê li aliyekî goşt datînin. Hûr û pizûr pişka Xido dikeve. Kido li gotina xwe diqulipe vê yekê qebûl nake û dibêje, »Hûr ji min re pizûr ji te re« Xido bi xwe ne xweş tîne. Gotin gotinê dikişîne, radibin hev. Xido Kido dikuje û dijminayî dest pê dike. Xelkê herêmê ji bavikê Xido re »Pizûran« û ji bavikê Kido re jî »Hûran« dibêjin.

Li herêmê gelek navên wilo hebûn. Navên wek »Mala Kezebo, Mala Serûpêyan, Mala Çermo, Mala Simo, Mala Teneko, Mala Qerase, Mala Zirzopan, Mala Şotiran, Mala Hotiran, Mala Dimso, Mala Mewîjo, Mala Meyiro, Mala Masto, Mala Terîşo« bi giştî li nav omerî û toriyan civiyabûn.

Bi kuştina Kido re, kuştin ji kuştinê vedikeve heta ku digihê bavê Heso Rûto û bavê Circîs Şûto.

Rûto û Şûto bi armanca ku neyariyê ji nav xwe rakin, qîzên xwe berdêlî dabûn hev. Xweha Heso Perîxanê jina Circîs û xweha Circîs Sarê jî jina Heso bû. Lê mixabin wê ev dostaniya wan dom neke û li ser çima ku mirîşk û elok ketine ziyanan, Şûto Rûto bikuje. Bi kuştina Rûto re sereketî derbasî Heso û Circîs dibe. Van herdu malbatan ji dewra kalikkalikan heta dewra Heso û Circîs bêwestan bi hev re berberî kirine. Di


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vê berberiyê de bîst û heft mêr birîndar dibin û nozdeh mêr jî tên kuştin. Ji bîst û heft kesên ku birîndar bûbûn, sêzdeh jê ji ling, zend û piştê seqet dibin û neh jê jî, ji derba ku ji serî xwaribûn tirodînî dibin.

* * *

Şeveke reş û pir tarî ye! Ji reşaya şevê, çav tiliyên destan ji hev nafesilînin. Hawêrdor ba û bahoz dixurbile. Rewşa şevê ji êvar de xuya kiribû. Bi êvarkî re teyr û tilûr li şêniyan vehewiyabûn; di kulek, derî û taqan re xwe avêtibûn hinduran. Çilapekên baranê rû çipîsk dikin. Dar û devî dihejhijin. Tayik tewiyane, şaxên tayikan taht û latan dimalin. Ewrên weke qîrê reş di ser hev re dikelin, perên ewran xwe berdane ser kavilên gundê Zorava û her der di nava reşayê de xerq kiriye. Ji qir û seqemê, guve guva bayê reş û bapêşkên ku li borangehan dixînin, kevokan xwe bi ser hev de qurnisandine. Gur paşpûk bûne û di ber pêlên bagerê de disûrikin. Hirç, keftar û çeqelan di qorzîbirên kunan de xwe qoçandine. Kûçikan gasîn û kolanên gund ji guran re berdane û xwe avêtine taldên tenûr, tifik, pang û hefşoyan; serê xwe xistine nav lingên xwe, dinya biqîre jî ew taqet nakin ku ji cihê xwe rabin. Dizên herî bi nav û deng di vê şeva reş û tarî de nikarin sewêl ji hewş û axuran bidizin. Di bejayê de, ne çirûskek xuya dike û ne jî pêjina rihberekî tê. Ezman bêwestan pêdikeve û vedimire. Li jêr mîna ku hertişt sekiniye û li jor jî hertişt heralî di hereketê de ye. Ezman erdê dilerizîne. Tu dibêjî qey du ordî bi balafiran li hev didin, gire gir bi ezmên ketiye û agir bi ser dinyayê de dirije. Dinya bi temamî teslîmî ezmên bûye.

Heso hîn ji êvar de dilerizî, ketibû tayê. Bûka wî Meyro li ber sobê doşeka herî qalind jê re raxistibû û du lihêfên hirî bi ser dakiribûn. Meyro pir hej xesû û xezûrê xwe dikir. Qedir û qîmet dida wan.

»Lawê min Temo, ma te pez êm kir ku tu xwe wilo di nav livînan de vediparimînî?«

»Erê yabo.«

Heso destê xwe yê rastê ji ser nava xwe hilanî xist bin serê xwe û bi destê xwe yê din jî, bi guhikekî lihêfê girt. Bi herdu lingan hêdî hêdî lihêf ji ser ruyê xwe avêt û kabok ber bi xwe de kişandin. Pêşî çav kutkutandin û serê bêvila xwe xwirand. Dûv re dest bi hev firkandin, tilî hemû sipartin hev; kirin wek aqida qesiran û herdu tiliyên girdikê heta bi movikan ajotin qulên bêvilê.

»Lawê min Temo, ma te dewar jî êm kirin?«

Temo bi tena serê xwe dîwarê êxur lêkiribû. Pir westiyabû. Baranê ji hêla bakur de li ser du maxan dîwar hilweşandibû. Ne dixwest kesek pê re bipeyive, da ku deqîqeyekê berî deqîqeyekê rakeve. Temo xwe ji ser kêlekê qulipand ser piştê, ziq li bin zikê xênî nerî, xwêziya xwe daqurtand û piştî ku bi dengekî hêdî got:

»Erê yabo, min dewar jî êm kirin«, bi hêrs serê xwe xist bin lihêfê.

Heso li qûn rûnişt, pelxemek di tifika ber sobê de werkir û berê xwe dayê:

»Lawê min, ma te çawa kir ji wê bergîlê?«

»Yabo ez xulamê te bim, de bihêle ez hinekî ji xwe re rakevim, hê! Min alifê bergîlê jî tije ceh û ka kir. Min pez yek bi yek hejmart; tam çil bizin û pêncî û neh mîh, du nêrî û sê beran niha li êxur di ser êm de ne. Fehmîko kerî tebût gihandiye malê. Guran tu pez ne kuştiye. Min dewar bi êm kirin. Min pênc rêsî ji hev feşkilandin û danîn ber keran. Min xwarina kûçik jî dayê. Ma ne bi Quran ez ji te re çi bibêjim tu ê hey dîsa here yek bi yek wan heywanan saxtî bikî. De îcar ez qurban bihêle ez ji xwe re rakevim.«

Heso gebirê ku li serê xwe gerandibû bi hêrs avêt nav şekalan, kulmek dawişand doşekê, rimekê çeng bû û qêriya:

»Lawê kûçik gotinên min bi xwe ne xweş tîne, hi!« û li ser çarlepikan ber bi derî de meşiya.

Bêî ku fitîla lempa hûrkirî hilde, li reşayê destê xwe li şekalan pelikand. Çep û rast du şekal bi serê lingan ve danîn, bi herdu destan qeweta kelaxê xwe hemû berda ser kabokan, »Ya xwedayê ezîm« got û hilda xwe. Şerwal jê herikî. Heso mîna ku qebheteke mezin kiribe di cih de çong berdan erdê, xwe wek teyrikekî melisand û xwe bi ser hev de guvaşt. Serê xwe wek ê dizan bi dizî bilind kir, li hindama ristila genim ku kuflet lê radiket, kûr nerî û hûr xurbiland. Wek jojiyê ku carina wî digirt û dixist nav teşta avê û jojî bi ketina nav vê avê re wilo yekser xwe ji nişkê ve vedikir, şerwal heta ku li ser çiçikan sekinî kişand xwe û doxîn hişk zeft kir. Piştî ku doxîn bi sê girêkên kwîr girêda, hîn nuh bêhna wî hat ber wî. Lingên xwe radan, şeqên xwe ji hev vekirin û bi serê lêvan got, »Ya rebî tu xefûr û rehman î, kufletê min ez di vê rewşa xerab de ne dîtim...«

Heso selewat ne qedandibûn Meyro ji dera ha bang kir:

»Apo deng ji te nayê, ma çi bi te hat?«

»Weh, keçê Meyro, tu hîn ranezayî qey!«

»Na apo.»


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heso piştî ku ji Meyro re bi dengekî hêdî got, »Razê qîza min razê, êz ê niha herim êxur û bêm«, rabû ser xwe meşiya û xûz li ber derî sekinî.

Hindur ji xwe reş bû; reşaya hindur û derve jî bi carekê ve xwe berdabû ser hindama derî. Mîna ku şîfika derî didît, devdevkî pala xwe da derî şîfik kişand û bêmefer xwe avêt derve. Pala xwe da dîwêr û li hindama qereqola hidûd temaşe kir.

Di ezmên de guhertineke ber bi çav çênebûbû. Her der mîna teniyê reş bû. Bahozê ji ser sêncan hej diqulipandin hewşan; reqe reqa camên şibakan bû. Heso ji şevê xof girt û bi lez hat hindur.

»Meyro Meyro qîza min, ma ne îro sept bû, Reşo ji mektebê hatiye gelo?»

»Na, Seydo hatiye.«

»Wey mala Xwedê ava ku ne hatiye! Lêbelê Seydo çima birayê xwe bi tenê dihêle û tê malê? Sed beleyên dinyayê hene. Bitenêbûn ne baş e.«

»Apo hewce nake ku ez ji te re bibêjim, tu dizanî bê exlaqê Reşo çawa yî. Emirqesifiyo dîsa çûye sînemê.«

»Bila Seydo jî biçuya sînemê« got û menqela êgir ber bi doşeka xwe de kişand.

Çarmêrkî rûnişt. Destê xwe dirêjî bin qiraxa doşekê kir. Li qutiya tûtinê digeriya. Xofê dilê wî diguvaşt. Ricfê ew bi carekê ve zeft kiribû, mîna bajenê dilerizî. »Belkî bi kişandina çixarekê ez hinekî bi ser xwe ve bêm û bikaribim aqilane bifikirim«, di nav lêvan re wişe dipengizîn. Qutiya çixaran bi herdu destan hişk zeft kir û herdu kêlekên qutiyê ber bi hev de dewisandin. Qutî venebû. Bi serê nenûkan hilqerast, qutî vebû û bi lez destê xwe li çixara herî qalind gerand. Rahişt çixarekê û xwe bi ser menqelê de tewand. Lihêf bi ser pişta xwe dakir, bi guhikekî lihêfê girt, hilmek dirêj li çixarê da û bi dengekî kelûgirî got:

»Pir baş ket, pir pir baş e ku ev lawik îro ne hatiye malê!..«

Meyro:

»Apo Xwedê xêr bike, îşev çi hewala te ye? Mirov ji gotinên te ditirse.«

»Ez îşev tiştekî ecêb ditirsim! Dinya reş xeriqiye Meyro! Kûçik dizûrin! Bêhna mirinê ji Zorava tê. Di şevên wilo tarî û bahozî de, her tim ya guran xwe dadane hewşan pez kuştine û ya jî qaçaxçiyan li hidûd xistine. Dibe ku îşev zelzele jî rabe. Lêbelê tirsa min ne ji guran, ne jî ji zelzela ku wê Xwedê rake; ez ji qaçaxçiyan ditirsim. Îşev tam şeva ku mirov li hidûd xîne. Hîn birînên me ji lêdana eskeran qalik ne girtine, ava serê Hemoyê bamidî zuha ne bûye û wê ev teres dîsa bigirin ser gund. Mala Xwedê ava

ku ev lawik ne hatiye malê. Reşo ji eskeran danaxwe; dikare li himber wan bê û ew jî mîna ku Hemo ji qomandarê hidûd re gotibû, 'we em bi lêdanê kuştin bes e!' tivingê di serê ê me de vala bikin!«

Meyro piştî ku keserek veda, axivî:

»Bêhna xwe fireh bike apo, xwe ewqasî netirsîne. Erê Hemo bi jin û zarok û zilam bû, lê Reşo jî hîn naşiyekî hivdeh salî ye. Ma wê çawa wî bikujin!«

»Êh aqilê wê. Ma lawê Ûsivê qesirî Ekrem ne zarok bû ku demaçe li ser kirin! Lawik çardeh, panzndeh salî bû û bêsûc û sebeb kuştin. Çima ku qomandarê qereqolê li ser rêya Çûva li hespê xwe ê hesinî siwar ne kiriye. Li Gundikê Evdirehman çar, pênc sal berê, bi bafîka ku kûçikê Biro esker didire, esker jî heyfa xwe bi kuştina Tajdînê lawê wî hiltînin. Lawik panzndeh salî bû. Niha ku ê esker har bûbaya, kuştina lêwik dîsa jî xem ne dikir. Kûçik devê xwe avêtibû şerwalê wî ewqas. Segbavan qismê nêr, piçûk - mezin hemiyan ketûber didin ber hev!«

»Tişt nabe apo tişt nabe. Înşelleh wê tu qaçaxçî îşev li hidûd nexînin. Xwe pal bide tiştê Xwedê kiriye betal nabe.«

»Rast e, tiştê ku xwedayê mezin bibêje wê bibe. Lêbelê wilehilezîm destê min di nava min de ye. Hewalek dikare biqewime. Di her şevên wilo de her tim beleyek li me qewimiye. Min dîtiye, bi serê min hatiye ez dizanim. Wilo li vî kalî menere ez ji serî heta binî tecrûbe me. Qaçaxçî çawa mêr in, ez wan xweş nas dikim. Bi giştî di şevên zivistanê de bêî ku bertîlê bidin qomandar û eskeran, bi qeweta devê tivingê li hidûd xistine xelas bûne û dûv re jî qûncilikan êrîş anîne ser me belengazan. Keçê ma ne tu jî van tiştên ku ez dibêjim, dizanî? Her roj li ber çavên te dibin. Subhanelah qey bira ez xurifî me bavo. Min xew li te herimand Meyro. Tu kebaniya malê yî, karê te pir e û tu ê sibehê zû rabî. Razê qîza min razê, li min guhdar meke.«

Meyro piştî ku got »Apo taswasê ji xwe re çeneke, înşeleh wê qaçaxçî li hidûd nexînîn. De Xwedê rehetiyê bide te«, xwe li Temo pêça.

Heso lihêf bi carekê ve ji ser xwe avêt. Berê xwe da başûr û herdu destên xwe ber bi hidûd de dirêj kirin:

»Ji wê roja ku van bêbavên romiyan ev mayîn danîne û heta roja îro, bi bafîka qaçaxçitiyê ezabên giran dane me, temamê gundên ser keviya mayinan û xelkê mentîqê. Gava ku Dawidê Osmên hat kuştin tu wî çaxî di pêçekê de bû, qîza min. Û ez jî xortekî di benga xwe de lihevhatî, pir bi difr û paye bûm. Şeveke havînê bû. Em li ser bên radiketin. Xweş tê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bîra min. Tê bîra Sarê jî. Xanim wî çaxî bûk bû. Malikviritiyê hîn ji wan deman de wilo bi ecêb radizê. Di bûkaniya wê de min ev xewa wê ne dikir tiştek. Bi ketina ku em diketin nav livînan, ecêb nedîno ev jinik hema pê re di xew re diçû. Min digot qey aşiqî min bûye, dilê wê xwe li ber eşqa min nagire, dil bêhiş dikeve ji ber vê yekê zû di xew re diçe. Lêbelê di dûv re min fêm kir ku jinik xerabe ye. Tu têkiliya xewa wê û eşqê bi hev re tune ye. Ji maka xwe de ev mal e. Niha mirov top û tematêkan jî li ber serê wê biteqîne, bi Xaliq wê dîsa jî şiyar nebe! Qîza min Meyro, ez li ku derê mabûm, min çi digot? Ma tu li min guhdar dikî?«

Heso di vê navê re çixare ji çixarê pêdixist. Ji kûraya dil û kezebê keser vedidan. Bêwestan hilm li ser hilmê dikişand û di nav gotinên xwe re yekliban ditewirand. Mîna ku nava rojê ye hertişt jê diyar e, dîsa eskeran girtine ser gund, piçûk û mezin hemû derxistine ser bênderan, zilam şilfîtazî kirine û bi dar, qûndaxê çapiliyan û qezetoran belişîne ser wan, bi haweyekî wilo behetî di kulekê re ziq li jêra gund temaşe dikir.

Derdorên hindur mîna ku şemedankirî be û xanî yekser bi qîrê hatibe seyandin, hîç hewê nastîne ku wilo genî bûbû. Ji dixana çixara wî wexmeke agirê serkulan dida pozê mirov. Zarokan lihêf ji ser xwe avêtibûn. Temo di nav xwêhdanê de mabû. Sarê di nav livînan de herwiha xwe bi ser kêlekan de diqulipand û bêvila xwe dixurand. Nêrgiz di himbêza Meyro de digiriya. Meyro şîr didayê, lê dîsa jî her ji kêlîkekê qîr didan.

»Apo, te çêlî kuştina Dawidê Osmên dikir.«

»Hey rehmet li dê û bavê te be, erê qîzê min çêlî wî dikir. Heyvreş bû. Seet li dor yekê şevê bû; û hema me dît ji nişkê ve li texma hidûd bû qîr û qiyamet! Mîna ku tu çewalek xwê biavêje tenûrê, wilo fîşek teqiyan û dormedor ji hewa de gule bi ser me de bariyan.

Xelkê zarokên xwe ji ser xaniyan revandin hinduran. Lêbelê ez ji ser xênî ne hatim xwar. Qaçaxçiyan nav di xwe didan. Dengê navtêdanên wan mûyê laşê min bi carekê ve kiribûn mîna perên sîxuran. Dengê yekî ji wan mîna kewê ribat li ên hemiyan ferq dikir û digot, ‘îşev şeva me kurmancan û eskerê tirko ye, lêxin! Lê lawo, heta ji we bê tivingên xwe ber bi hewa de berdin. Wan nekujin ku ew jî van gundên dor xetê neşewitînin...’ Di wan kêlîkan de wilo diket serê min ku hema ez jî rahijim tivingê û xwe berdim nav hofka şer, da çend eskerên qûncilik bikujim. Hingî ku dabû dilê min. Hîn jî wilo me. Ez wê şevê heta sibehê ranezam. Min dizanîbû bê wê di sibehê de çi bi ser me bînin. Min dikarîbû xwe ji

ber lêdanê bida alî; lê mîna îro hîn ji wan deman de navê temamê gundiyan li ba teresan qeydkirîbû. Ew ê bihatana gund yek bi yek navê me hemiyan bixwendana û ez ê jî ne li gund bama. Wilo ne dibû. Wê hertişt di situyê min de bima. Dawiya vê yekê jî kuştineke pir pîs bû!

Şeva ku dîsa qaçaxçiyan bi teqîn li hidûd xistin, di wê şevê de Dawidê Osmên li Nisêbînê mêvanê xezûrê xwe bû. Hîn ne zewicî bû, bi dergîstî bû, bêmirado. Ê ne te ne dît bê çi xortekî delal bû! Di temenê Temo de bû. Temo bi sê mehan jê mezintir bû. Dawid miroveki pir bi edeb û kemlan bû. Di salên ku me û Circîs berberiyeke dijwar bi hev re dikir û me hev dikuşt, vî lawikî tu carî xwe ne da terefekî û dijminayî bi terefê din re ne kir. Lêbelê kuştin. Kuştin lê çawa kuştin! Li Nisêbînê cemseke tije esker digire ser mala xezûrê wî û hay û bayê Dawid jî ji tiştekî tune ye. Xwedê mala Osmên bivirîtîne, xwe li ber lêdanê ne girt, di lêwik hilda û lawik da dest.«

»Ma we nikarîbû qasidek bişanda Nisêbînê ku Dawid xwe ji wir bida alî?«

»Na qîza min na. Ma qey îro jî em dikarin gelo? Wê demê jî mîna îro bi sariya sibehê re derdorên gund zeft dikirin û ne dihiştin ku çîçikek ji gund derkeve. Îro di gundê Sitilîlê de du, sê terempêl hene. Di wan deman de terempêl jî tune bûn. Him terempêl hebana wê bûba çi, wey li vî aqilê min be! Ez jî bi xwe nizanim çima carina ez wilo xeşîm dipeyivim. Hîn ji berê de, bi şev çûn û hatina terempêlê bêî emirê qomandarê qereqola hidûd qedexe ye. Ma ne tu jî dizanî keçê. Qey nayê bîra te şeva ku Celîlo ji eskeriyê hatibû gund, eskerên hidûd dabûn pey wî û ew û şifêrê texsiya ku ji Mêrdînê kirê kiribû, di hindurê malê de bi lêdanan tirek kiribûn?«

»Erê erê apo, wilo bû.«

Nêrgiz di himbêza dayika xwe de di xew re çûbû. Meyro bi hêdî memika xwe ji devê lorîkê kişand û lorîk xiste dergûşê. Bêî ku bi qerpalekî an bi kincekî lorîkê binixumîne, xwe ji ser dergûşê da alî. Hêsirên xwe bi qutikê Temo paqij kirin. Destê xwe ê çepê da ber ruyê xwe û got:

»Apo ma bi rastî Xanê li ser Dawid xwe avêtibû bin trênê?«

Heso ji bilî Sarê hej tu pîrekê ne dikir. Kêfa wî ji wensa wan re hîç ne dihat. Lêbelê gava ku tirs jî lê peyde dibû, bi zarokan re jî dikarîbû biwenisiya.

»Wilehî nizanim. Lêbelê dihat gotin ku Dawid û Xanê pir ji hev hez dikirin. Ser bextê xelkê be. Îcar qîza min eskerên tabûra Nisêbînê Dawid


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di hindurê malê de qepaçe digirin û wî rast dibin tabûrê. Li tabûrê tam şev û rojekê lê dixin. Piştî ku Dawid dikujin, îcar termê wî tînin li texma gundê me diavêjin nav mayinan. Of qîza min of! Ev ne misilman in, kafir in kafir!! Bawer nakim ku kafir bikaribin zilmeke wilo ecêb di serê mêrê misilman de bikin! Ronîvro û qiçe qiça germa havînê bû. Wawîk li ser cendekê Dawid kom bûbûn û cendekê wî ji hev vediçirandin. Gundiyan bi dûrbînê lê temaşe dikirin. Ez bi xwe wê rojê tam sê caran bi ereba heywanan çûm Nisêbînê û hatim; da ku ez ji nêzîk de cendekê Dêwid bibînim û çend fatîhan li ser rihê wî bixwînim. Hey mala min! Gava di cara pêşî de ez di ber term re derbas bûm, wawîkan hinavên wî bi carekê ve xwaribûn û milekî wî revandibûn. Di cara duduyan de, li vegerê serî ji gewde kiribûn û kelax dikevaştin. Di cara siseyan de min nema dikarîbû taqet bikira ku min berê xwe bida mextela bêmirado. Îcar bi ser vê ecêbê de tew bêbavan him ezabekî mezin dan me hemiyan û him jî Osman li dor sê salan hepis kirin.

»Ma qey apê Osman an Dawid qaçaxî dikirin?«

»Na qîza min na! Li vî gundî kesî tu carî qaçaxî ne kiriye. Heta çend kes ne tê de, ji gundên dor me bi xwe jî kesî pîş bi qaçaxiyê ne kiriye. Ên ku vî tiştî dikin, bi giştî licî, qubalî, meşkînî, xursî û çend kesên omerî ne. Ax ji destê van bêbavên liciyan! Ê ne tu nizanî bê ev licî çi pêxwas in! Ji bo wereqeyekê dikarin mala mirov bi a xwe re biviritînin! Diyarbekirê li terefê dinyayê ye, Licê jî ji Diyarbekirê bi wirtir de ye û segbavan tên heta vê derê qaçaxê, kuro! Esker û polîs wan yek bi yek nas dikin, bi wan re deng nakin, lê tên me! Gelek caran hin serekên qaçaxçiyan girtine û dîsa jî berdane. Me jî nas dikin. Yanî bi me dizanin ku em qaçaxiyê nakin. Û dîsa jî tên malên me talan dikin, li me didin û me dikujin!«

»Baş e, ev esker û polîs gava bi rastî van qaçaxçiyan nas dikin, wî çaxî jî gerek êrîşa xwe neanîna ser me. Bila herin wan bigirin û wan bikujin. Ma gunehê me çi ye?«

»Rast e, eyn wek te ye. Lêbelê ez jî tam esasê vê yekê nizanim. Qey ji ber ku em kurmanc in û dilxwazê Berzanî ne.«

»Ma ne licî jî bi kurmancî dipeyivîn apo. Min çend kes ji wan dîtin.«

Gotina wê li hesabê wî ne çû. Destê xwe hejand û dengê xwe hilda:

»Îcar çi yanî! Circîs jî bi kurmancî dizane, diya minê...«

Meyro mîna ku bêusûliyek kiribe, di cihê xwe de sar bû. Xwe bi ser hev de guvaşt û bêdeng sekinî.

Giraniya zilma salan û reşaya şevê xwe li hev badabû, mîna çiyayekî

xwe berdabû ser dilê Heso. Dixwest rakeve; lêbelê zilmê xew lê herimandibû, nikarîbû raketa. Çavên xwe digirtin, lihêf li serê xwe dipêça dixwest xwe ji temamê kayinatê bêrî bike da tiştek neyê bîra wî û bikaribe razê. Dîsa jî xilmaş ne dibû. Şev qar bûbû û her der bêpêjin bû. Xofa zilmê canê wî yekser zeft kiribû, te dest dabayê ew ê biketa.

Kabokên xwe xistin zikê xwe, destê xwe ê rastê da ber ruyê xwe û di dilê xwe de got:

»Dengê kûçikekî hema bihata min, belkî hinek cesaret bida min; belkî ji min re bûba wens bêhna min pê derketiba. Çêleka ku îro çar roj golika wê mirî çêbûbû û her kêlî dioriya çima naore? Bergîl naşîhe. Ya herdu kewên Temo çima yekliban naxutxutînin?«

Kelax teviziye, lê mejî ketiye newala guman û xumanan bûye çipik; kelax mîna hejekî bi dû xwe vekiriye, diyar bi diyar digerîne û di bîr û çal û koncalan de werdike. Zemên xwe jê re şilfîtazî kiribû û xwîn dinisiland. Kelaxê Restem bi dîrekê telefona qereqola hidûd ve didît. Dengê kekê wî Cibran ji guh ne diket. Gava ku eskeran bi êvarkî re Cibran ji gund biribû û Cibran di nav lepên wan de melûl melûl digot, »Heso, Edlê li xwe mahr bike ku zarokên min di nav destan de şerpeze nebin« û jina wî bi qîr û hewar xwe diavêt lingên komutanê tabûra Nisêbîne ling maçî dikirin, ew rewş bi carekê ve hatibû ber çavên wî.

»Ez ê çawa bi jina te re bizewiciyama kekê min?« digot, dev lihêfê dikir û digiriya. Li termê Cibran digeriya, dixwest devê xwe têxe qirikê bêhn bike û darîçavê herkesî ji xwe re têr bikira hewar û bigiriya. Lêbelê Cibran winda bû. Bi tenê qerpalekî tev bi xwîn jê mabû. Eskeran ew qerpal jî nedabûyê. Qerpalê ku bi gulan mîna bêjingê qulqulkî bûbû, bi ser têlên mayinan de wek hêsîrekî birçî dihejiya û roj bi roj piçûk dibû. »Kekê min, dilê min, rihê min ji bo wî çakêtê te ê xakî ku te pir jê hez dikir û di civatê de her tim li ser te bû, ma tu dizanî bê ez çend caran çûm wê Nisêbîna malikwêran! Ji bo ku hema terîşekê bi dest bixim, her roj, tam sed û sih du rojan çûme Nisêbînê û vegeriyame gund. Erê ey Xwedayê xefûr û rehman ma qey bi rastî te nikarîbû bayekî xurt rakira û ew qerpal ber bi gund de biavêta! Ên me dikujin zalim in. Ma qey tu jî zalim î? Tobe estexfîrulah. Min efû bike, li min negire...«

Meyro raza bû. Nêrgiz ne digiriya. Xew li Sarê giran bûbû. Sarê mîna ku di newaleke kûr de raketî be, pixe pixa wê bû. Temo ji xwe hîn ji êvar de bêhal ketibû. Xelîl di xew de pir diaxivî û gazî kalikê xwe dikir. Devê Xelîl hatibû girêdan. Fehmîkê şivan her tim li ser dika nêzîkî tewla bergîlê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

radiket. »Fehmîko kêm şevan diçû malê ba diya xwe. Ev lawik çima îşev ne li vir e?«

Heso ji ser cihê xwe rabû. Kurkê xwe ê erebî li xwe kir, rahişt gopêl û ber bi derî de meşiya. Li şekalan terpilî serê wî li hêt ket. Di ber xwe de, »îşev fiqiriyek ji ber min tê«, got, bi hêsanî derî vekir û xwe berda hewşê.

Di ewran de guhertin ne bûbû. Her der mîna berê tarî, ba û bahoz bû. Bahozê, pûka berfê û peşkên baranê bi ser kurkê wî de dixurbiland, pişta sitû şil dikir. Heso di talda sêncê de li dor nîv seetekê guhên xwe bi ser besta Zorava de ker kiribû û li bestê guhdar dikir. Gava qaçaxçiyan li hidûd bixista, wê qaçaxçî di vê bestê re ber bi Atxê de biçûna û bi çiyayên omeriyan ve hilkişiyana.

Qurpîniyek ji dilê wî hat; xwîn lê vemirî. Dil weke pêlên deryayan rabû, xwe da qesefê û sêng nepixand. Ji taqet ket. Devdevkî bi nav pirikê de kumişî û mîna gayekî serjêkirî li wê navê perpitî. Di vê rewşê de li dor du, sê deqîqeyan li erdê gevizî. Dûv re bi ser hişê xwe ve hat, pîjaq ber bi hinavan de kişand û lêv cûtin. Xwe bi ser hev de kire gilok, ser pêyan çeng bû û bi bazdan çû hindur:

»Rabin rabin! rabin ser xwe, rabin ser xwe dîsa mala hinekan ji me viritî! Qaçaxçiyan li hidûd xistin, li hidûd xistin!..«

Heso her çendî bi qêrîn bang dikir, dîsa jî kes bi qêrînên wî şiyar ne dibû. Te digot qey efrîtê cinan morîka xewê xistiye guhê hemiyan ku ewqasî xew li wan giran bûbû. Heso gopalê xwe hişk zeft kir û gopal li ser gopêl li sobê û menqelê da. Toz û arî ji sobê û menqelê bi ser ruyê wî de bilind bû û li hindur belav bû. Lempa ku hûrkirî bû, vemirî. Destê xwe avêt bêrîkê rahişt çeqmêq da ku lempê pêxîne. Lêbelê ji nişkê ve, »Wey gidî ez dikim çi bikim, ma ne şewq qedexe ye!« hat bîra wî û dîsa bi gopêl dabelişî ser sobê û menqelê.

»Keçê Meyro Meyro, rabe ser xwe!«

Meyro herdu destên xwe xistibûn situyê Temo. Şeqên xwe di nav ên wî re derbas kiribûn û heta bi navikê xwe xistibû bin.

»Temo ev îşev çi bi we hatiye! Zû rabe ser xwe û derkeve derve, qaçaxçiyan li hidûd xistin, hidûd..!«

Mîna ku tu cereke ava qerisî bi ser Temo de dakî, veciniqî. Ji nav livînan çeng bû. Meyro qulipî ser piştê. Lempe vemirî bû, laşê wê ji Heso xuya ne kir. »Te got çi yabo te got çi?« Temo got û ber bi hewşê de bazda.

Bi neqebên xênî ve hilperikî, çong berdan erdê û li besta newalê guhdar kir.

Gava ku Temo li ser xênî xwe vezilandibû û li bestê dihishisî, sê qaçaxçî bi hespên xwe ve ji karwên veqetiyabûn, gihabûn qûntara çiyê û karwan jî hîn li hindama gund bi kûçikan re pevdiçinî. Kûçikên gund rê ne didan karwên. Karwan giran diçû. Qaçaxçî li ser baran siwar bûbûn, kesek peya ne dimeşiya. Yekî ji wan li bayê lezê bi dengekî sivik digot:

»Hiso gidî ez di bextê te de, ji bestê dernekeve; herdu aliyên bestê heta ku em negihên qûna çiyê weke binya xetê deşt e. Her der herî û teqan e. Binere, eger vê carê jî tu nikaribî hespê xwe ragire, ji bestê dagere nav teqanê, em ê dev ji te berdin û bi rêya xwe de herin...«

Dengên axavtinên wan yek bi yek dihat guhên Temo. Yanzdeh hesp di hindurê bestê de garankî dabûn pey hev û dimeşiyan. Best teng bû. Qey deh, duwanzdeh metroyan fireh dihat. Ji nav simên hespan çirûsk diçûn. Mîna kevirê koçanîkan bi şeg kevir dipengizîn, dengekî bi hêl û mêl dida derdor. Xurîna bestê û ewte ewta kûçikan kîlometroyekê deng vedida. Temo jî herwiha di cihê xwe de çirisî bû, guhdar dikir û li texma qereqola hidûd dinerî. Lêbelê pêjin ji qereqolê ne dihat. »Wilo çênabe, çawa hûn bi wan nahisin!« di ber xwe de ditewirand û digot.

Heso bi dengekî melûl:

»Ma te çi fêm kir Temo?«

»Ma min çi fêm ne kir yabo, qaçaxçiyan bi hespan li hidûd xistine, mala me şewitî dîsa!..«

»Ma pir bûn?«

»Oho oho, zir garanek bû! Gava ez hilkişiyabûm ser xênî min li wan guhdar dikir, serê garanê gihabû çiyê û dawiya wê jî hîn li hindama qereqolê bû.«

»Te got çi, te got çi?«

»Ez dibêjim, temamê xelkê vî welatî îşev bûne qaçaxçî û li hidûd xistine, yabo!..«

»Bi telaq romî wê sibehê fermana me hemiyan rakin!..«

Heso deyl li kuflet kiribû, kuflet hemû şiyar bûbû. Mîna ku wê esker di sibehê de agir berdin gund û îşev dawiya jiyana wan e tevxircilîn, heryekî ji xwe re tiştek got.

Heso:

»Penceran qenc asê bikin û merşan bi ser perdan dakin. Pîrê, fitîla lempê girs bike ku hindur baş ronî bibe..«

Temo ji bo ku tirsa xwe nede der, li ser doşekê palda û sêrê xwe xist bin lihêfê. Eskeran bi dijwarî li wan dixist. Wî baş dizanîbû ku bi sibehê re wê

çi afatê bi serê wan de bînin. Meyro li êxur pez êm dikir. Pîra Sarê jî mîna keçeke şanzdeh salî xwe di kirês û xeftên de çikçikandibû û li wê navê diçû û dihat. Pêşmalk dabû ber xwe, libade li xwe kiribû, kofiya reş girêdabû û kofî bi ser eniyê de xwar kiribû. Bi tenê wê livînên xwe dabûn ser hev, kerş û gemara wê navê paqij dikir û navtêdan di Heso de difirandin. Jineke mêranî bû. Carina ji Heso re digot »Xwelî li sero tu jî zilam î. Gerek ê min bi te û te jî bi min ve ba. Lêbelê ez çi bikim ji vî xwedayê ku tu nêr û ez jî mê çêkirime«

Sarê ji eskeran ne ditirsiya. Heta sala ku eskeran jina Farisê qesirî ne kuştibû, wê herwiha bi wan re pevçinîbû û ji wan danexwaribû.

»Heso kuro bes bibilîne, te kuflet ji desthilanîn xist bavo, te em hemû cinoyî kirin, çi dibe bila bibe, wey bimir!..«

»Keçê Sarê ma ez ê çawa nebilînim, romî sibehê wê me bi saxî bibirêjin! Tu pîrekî ji xwe tiştek ji te re tune, ma tu ê çima van zirtan nekî diya minê. A te mêraniyeke belaş e pîrê.«

»A min mêraniyeke belaş e ha, hema aniha rabe ser xwe em bigirin ser qereqolê. Heçê ji min û te de îşev negire ser qereqolê, bila ne ji pişta bavê xwe be!..«

»Ev ne mêranî ye xanim. Dûv re wê çawa bibe tu dizanî? Êh, ew ji kû dizanî«

Heso hîn gotina xwe ne qedandibû Sarê bi dengekî nerm:

»Heso ev hezar car çêbûn ku ez bi te re vê gotinê dikim û tu jî dipirsî bê, 'dûv re wê çawa bibe?' Wê çi çawa bibe? Tu tişt nabe. Em ê romiyekî duduyan bikujin, dûv re ew ê jî me bikujin û weselam, ewqas. Ji roja ku tê bîra min û heta roja îro romî vê zilmê di serê me de dikin û kesekî ji me jî deng ne kiriye. Bi me dizanin ku em qaçaxê nakin. Îcar çi! Ka carekê jî em ê çendekan ji wan bi cehnemê şa bikin belkî di cihê xwe de rûnin; nema zilmê bi me re bikin. Tu di fesadiyê de mesix bûyî, romiyekî bikuje bi Xaliq wê destê te kesk bibe û tu ê rast herî bihuştê. Ew serê te ê cimcimî û bêmix, roja ku birayê te kuştin wî çaxî te bi a min kiribûya, me ê çend romî bikuştina û em ê ji xwe re ji vê heyata bi merez, xelas bûbana. Lêbelê te bi a min ne kir. Ez di wê demê de çîrçîreke jinan bûm, li ser xwe bûm. Bi Xaliq di qereqolê de min ê ew qûncilik hemû bi ser hev de ser jê kiribana.«

»Keçê nihîta neqeban, Eliyê Betê, Hemê Gozê rê bide min ku ez jî çend gotinan bibêjim, weh!«

»Bibêje bibêje bê tu ê çi bibêjî, hey min xweliya heft gundan bi serê te

dakiro. Bibêje ka bibêje!..«

Heso û Sarê bi giştî gava ku dabaş li ser esker û qaçaxçiyan vedibû, bi devjengê qirik li hev dinepixandin. Îcar a herî balkêş, di kêlîka ku herduyan bi devjengê radihiştin hev, mîna ku ne jin û mêrê hev bin, tiştekî zêde serbest digel hev diaxivîn û rê didan axavtinên hev. Dida û distend. Ev yeka ha li gor normê civaka wan, tiştekî kilêt bû. Sarê pîrek û Heso jî zilam bû. Ne dînê civakê û ne jî civakê bi xwe, ew heq dabû pîrekê ku bi mêrê xwe re devjeng bigirta. Dema ku ji gotinê gotin pêdiket û gotinan hev disût, hema wilo pê re yekalî ya Heso, ya jî Sarê dê gotin daqurtanda û herdu hêl jî mîna gulekê vebana. Herduyan jî bi dilekî paqij ji hev hez dikir. Bêî hev xwarin ne dixwarin. Di esasê xwe de ne Sarê, Heso aşiqî Sarê bû. Heso heyranê mêraniya Sarê bû. Lêbelê ev aliyê xwe, mîna ku wê jê re bûba kêmaniyek, vekirî ne dida der. Dikir qerf û digot. Reşo ev aliyê wan kefş kiribû. Ji kalik û pîrika xwe fêm kiribû ku çendî mirovin, hêja nin. Li gor wî pir tiştên ku wê mirov ji wan hîn bûba, hebûn.

»Keçê romîkujê, mesele ne di kuştina çend eskerên vê qereqola pîsik de ye. Enqerê heye, Enqerê!«

»Ez, gû di devê sed bavê Enqerê jî kim, te fêm kir ne wilo! Tirsoneko ew jî ji min re zilam e, hi!«

Heso mîna ku ne ji wir be xwe xaşomaşî kir, li Temo nerî keniya û got:

»Lawo Temo serê xwe ji bin lihêfê derxe, diya te dîsa hêç bûye. Jinikê qereqol safî kir, îcar berê xwe da Enqerê jî...«

Temo li qûn rûnişt. Xwest ku biaxive, lê Sarê berî wî dest bi gotina xwe kir:

»Erê kuro ma niha hûn bi qedirê xwedê kin, ev jî hal e ku em tê de ne. Bi şev û carina jî bi ro em ê nikaribin ji gundê xwe derkevin biçin gundê din, qedexe ye. Heywaneke me wê li çiyê bimîne em ê nikaribin herin bînîn; heywanê ji guran re berdin, ji ber qedexa wan. Dîsa bi şev ne em ê bikaribin bi çirayê herin êxur, heywanên xwe êm bikin û ne jî em ê bikaribin bi elatirîkê li nav malan bigerin. Lîstika hingulîskê ji navbera gund û gundan rakirin. Şevbihêrk rabûn. Pêketina çirûskekê bê çi ye, li me qedexe kirin, weh! Qalûnkêşên me ji tirsa wan çixare terikandin. Bi şev kesek newêre çixarekê bikişîne. Em bi hesreta dîtina hespekî ne. Xwedîkirina hespan li me qedexe ye. Biharan bi terempêlên xwe didin nav çandiniya me û çandiniyê hemî dikin gêre. Ji xwe re li vê ecêbê binerin, dibê qey em ne insan in kuro! Mastê me dixwin, heywanên me digurînin. Ji mentîqê bi bermîlan vikî belaş şîr didin hev. Em ji wan re penêr

çêdikin û dibin heta devê deriyê wan. Wey bimir, bê çi bênamûs in! Namûsa kûçikekî jî bi van romiyan re tune ye. Gava te nan û av da kûçik, wê kûçik te nedire û heta bi te re bibe dost jî. Ev teres bi qasî kûçikekî jî nayên, kuro! Teban e, çi ne ev!«

»Keçê eskerkujê, hîn jî heye hîn jî. Te behsa berx, kavir, elok, dîk, mirîşk û hêkên ku em ji çawîşê qereqola Sitilîlê re dibin, ne kir. Wan jî bibêje.«

»Ma ji xwe a ku ew lawê nizam kîjan dolê di me de dike, qe wek a vanên din e! Kula wî di dilê min de şax berdaye. Lêbelê çi fêde. Min sed carî ji vî bênamûsê Temo û birayên Temo re got ku binerin bê hûn derbekê li vî berazî naxînin; lê bi a min ne bû. Ji xwe re li vê ecêbê binerin, min heyşt zik zarok anîn, ji xeynî ên mê, yekî nêr ne şibiya min, kuro! Qîzên min hemû li min hatin, lê qismê lawan mû ji wî qahfûrê serê te bernadane. Di rojên ku ez dizam, xwezîka tu li êş baya. Belkî wî çaxî ew jî li min bihatana. Di vanên nêr de bi tenê hewara min Reşo maye. Ev lawik tam li pîrika xwe hatiye...«

Heso gotinên wê bi xwe ne xweş anîn. Xwe bi ser hev de guvaşt. Serê xwe rakir, sênga xwe hilda û danî û lê nerî:

»Tu çi dibêjî yanî? Ma qey ez ne mêrekî temam bûm? Însaf, li ser hidûd gava teqîn çêdibû, min gelek caran dixwest ku ez jî xwe berdim meydana şer. Ma ne te jî ew keft û lepta min didît keçê. Çima îcar tu bêbextiyan li min dikî?«

Heso hîn wilo li ser mêraniya xwe diaxivî, dixwest hinekî Sarê nerm bike, dengê teneka melê hat. Ji cihê xwe rimekê qevizî:

»Ev niha kê nîhaye jina vî melî ku li tenekê dixe! Ma niha wextê sihorê ye! Tobe estexfîrulah me xwe dîsa kufir kir!«

Sarê bi ser de hilbû:

»Hey Xwedê topek li rih xisto, tu çima xeberan ji melê re didî! Te aqilê xwe xwariye, sihora çi! Ji meha remezanê re hîn çar, pênc meh mane...«

Dema ku qaçaxçiyan li hidûd dixist û melê gund pê dihisiya, derdiket nav malan û li tenekê dixist. Teneke işareta xwehaziriyê bû:

»Ey gundîno, qaçaxçiyan li hidûd xistiye; esker sibehê tên gund, xwe ji niha ve ji kuştin û lêdanê re hazir bikin!«

Heso bi vê siqêfê ne baş kiribû. Cihê melê li ba Sarê bilind bû. Qîmeteke mezin didayê. Jê re digot »Birayê min ê axretî.« Heyecanê ew girtibû. Vekirî xuya dikir ku ji tirsa eskeran hinavên wî diricifîn. Ricifa hinavan di destan de dida der. Lê çi fêde Sarê ev aliyê Heso ne didît. Kone

fikirîbû. Ji bo ku kuflet û bi giştî jî Sarê wê ricifê nebîne, herdu destên xwe xistibûn bin lihêfê. Bêhemdî xwe gotineke bêisûl kiribû xem ne dikir, wê çi bûba qey. Wê jî di bêhnikên wiha de gelek caran gotinên çort bi hin dost û hogirên wî re kiribûn.

Sarê bi bêhntengî û bi zirt da ser Heso.

»Mele ji temamê vê birekê bi şereftir û namûstir e. Tu çawa dikarî siqêfan bi mele re bikî!..«

»Erê keçê gotinek bû û ji devê min derket, dinya xerab ne bû, weh! Ziman bêhestî ye. Mîrato carina ji ser sing dikeve. Tuxtikên te dîsa li binguhê hev ketin, hinekî bêhna xwe fireh bike jina min...«

Heso piştî ku Sarê bi qerf û henekan haş kir, li Temo nerî û di ber xwe de got:

»Keçê fêrisa min, de ka bibêje lê, ma bi rastî wextê sihorê ye?«

»Heso, wileh nizanim bê ez ê çi bibêjim. Bi xwe mîza min nayê. Ka li seeta xwe binere?«

Temo xwe li xeşîmiyê danî, mîna ku hayê wî ji tiştekî tune be.

»Min ji te û diya xwe û meseleya vê seetê tiştek fêm ne kir, yabo?«

»Erê lawê min, seet di nav şeqê diya te de ye. Yanî gava mîza wê dihat me dizanîbû ku bûye wextê sihorê. Em bi mîza wê re radibûn sihorê, ma nayê bîra te lawê kerê?«

Seet yek kêm çarîkek bû.

»Aha wileh qewimî, romiyan li me teqand! Temo xwe neke wek Sarê dernekeve hewşê, binere wê gulenin li binguhê te bikevin. Lawo dîn nebe dernekeve! Keçê Sarê Sarê, keçê were hindur! Howeh tu li vê ecêbê, agirê ku di vê jinikê de ye kuro! Erê keçê esker in û ji xwe re êretî diteqînin we çi ji wan e. Tenûr di vê jinikê de ye tenûr! Ez fêm nakim bê zewqa vê hishisandinê çi ye haho!..«

Di pey lêxistina mele a tenekê de hîn nîv seet derbas ne bûbû, teqîn bi hidûd ket û weke baranê gule bi ser Zorava û gundên derdor de bariyan. Eskeran mîna ku qaçaxçî hemû ji Sirêçkê û Zorava bin, berê tivingên xwe ber bi gund de vekiribûn û bêyefş fîşek diteqandin. Bi teqînê re her tim terempêlên wan xwe ji ser rêya Îpekê berdidan gundan û di pey tibabekî re, li deriyê hin gundiyan dixistin. Bi terempêlên xwe çarhawêr şintaq digerandin. Nav mayinan bi şintaqê wek royê ronî dikirin. Lêbelê vê carê ne terempêlên wan dageriyan gundan û ne jî şintaqa wan xuya kir. Ji şewqa fîşekên hewayî pê ve tu şewqê xuya ne dikir.

Qûna Heso erd ne digirt. Mirov digot qey kelefên wî xwe ji ser

kulîmekan dane aliyekî; kulîmek bêgoşt tazî mane, kabên kulîmekan di çerm de radibin, çerm diêşe. Diqeliqî, nikarîbû li qûn rûnişta. Bi dizî balîf ber bi pişta xwe de kişand, xwe palda û ling kirin pîj. Destê çepê xist bin serê xwe. Bi destê rastê, mîna ku dilê wî pir sivik lêxe û vê lêxistinê hinekî ragire sênga xwe dewisand. Lêvên wî ên tije herx ziwa û çilmisî bûn. Ronahiya lempê xwe dabû ser rû, herxên lêvan dibiriqandin. Çav ne dikutkutîn, çûbûn xwarê û beloq dinerî. Guh ji qiyasê der, rep rawestiyabûn. Bêvila şerbikî piçûk û zirav bûbû. Firnikên bêvilê xuya ne dikirin. Ji çenê berjor ve, serê wî qoqekî miriyan di bîra mirov de dianî. Te digot qey li ser hidûd mayin bi wî û hevalê wî de teqiya ye, ew birîndar e û hevalê wî jî hatiye kuştin, wawîk term dixwin û ew jî ji desthilanîn ketiye, nikare tiştekî bike. Di diruvekî wilo xof de bû! Temo û Seydo li wê navê diçûn û dihatin sobe dadidan û bi hev re diaxivîn. Lêbelê wî ew ne didîtin. Dilop ji bin zikê xênî wek ku mirov kevirekî di nav gola avê de wer bike li hindurê teştê diketin; peşk bi ser sêngê de dipengizîn, bi xwe şiyar ne dibû. Nêrgiz ji girî zîz bûbû. Xweha wê a nehsalî Seyrê bi ser Nêrgizê de dikir qelebalix. Meyro jî bi Seyrê re dixeyidî. Lê dîsa jî dengê kesekî ji van ne diçû Heso. Xelîl kîsikê kabên tîlkirî vala kiribû erdê wî û Demo û Şewqedîn bi guhkişînkê dilîstin. Bi vê reqepolkê jî agahdar ne dibû. Sarê ketûber esker dabûn ber xwe. Derdorên gund ji cendekan raxistibû; li bestê xwîn rabûbû, xwînê gewde ber bi qereqolê de digindirand. Bi vî şerê Sarê jî hayî ne dibû!

»Heso Heso, de ka rabe ser xwe kuro, çi bi te hatiye? Xwarin hazir e rabe gepeke nan bixwe.«

Gerek şiyar bûba. Ji ber ku Sarê bi dengekî bilind sê, çar caran gazî wî kiribû. Sarê ji Temo re got:

»Lawê min, ew bavê te mir çi pê hat? Ka binere bê tu wî ji xew ranakî. Çend niqurçkan jê bide...«

Şewqedîn bêî ku bavê wî dapîra wî bibersivîne, ji cihê xwe pengizî û bi lez çû ber serê bapîrê xwe li ser pêyan sekinî. Xwe heta bi newqê tewand, milên bapîrê xwe hejand û hinekî bi deng:

»Kalo kalo!..«

Xwînê xwe dada mejî. Çavan di kortikan de wek du xarên zindoqî lîstin. Mîna pezê bin kêrê, xirînî bi qirikê ket. Reş û sipî bû. Dûv re bi carekê ve lerizî çeng bû û li qûn rûnişt. Eger di vê bêhnikê de Şewqedîn jê bêtir pêhlewan derneketiba û xwe ji ser nedaba alî, miheqeq wê serê wî li çena Şewqedîn keta û çend diranên lêwik bihatana şikestin.

Hêdî hêdî bi ser hişê xwe ve hat. Xwe pal da. Xwest ku istîxfara xwe bîne û bibêje »Eşhedûenlaîlahe îllellah. Ya reb me bisitirîne!« lê nikarîbû bigota. Ji taqet ketibû.

Sarê:

»Heso, Heso kuro zû xwe bide ser hev! Te êvarê jî ne xwaribû, were bixwe!..«

»Hi te got çi, Sarê?«

»Min got dest û ruyê xwe bişo. Ferecê lê xistiye, berî ku teres bigirin ser me, em xwarinê bixwin. De zû were, zarok hemû li ser sifrê li bendî te ne. Bilezîne, zû were...«

Xwe tev xirciland. Pêşî herdu destên xwe bi hev firkandin, dûv re çavên xwe û dûv re jî rîha xwe firkand. Mîna ku hîç tirs pê re çênebûbû, hay û bayê wî ji tiştekî tune be, xwe veparimand û got:

»Sarê, ez hinekî ji xwe re xilmaş bûbûm. Ji êvara xwedê de xew ne ketibû çavên min. Malxerabnebê, hema te ez şiyar ne kiribama hê. Bi zorê çavên min çûbûn ser hev. Wey hezar carî mala vî xwedayê mezin ava ku hûn pîrek ne kirine tiştek. Eger hûn jî tiştek û miştek bûbana, ma qey bazarî bi we re dibû! Wilehilezîm we ê em zilam bi saxî çandibana, lê!«

»Çorto mortkî nepeyive, dirêj neke zû were!«

Heso ji rastiyê direviya, xilmaş ne bûbû. Di kêlîka ku xwe palda bû ketibû xeyalan. Li xwe kiribû sibeh. Esker anîbûn gund. Reşo şibandibû lawê Farisê qesirî Mirad û bi dû cemsê ve girêdabû; cemse li dor gund digerand. Reşo dikire hewar. Sarê bûbû Rewşêya diya Mirad. Esker wê Reşo bi dû terempêlê vekin, Reşo bi haweyekî barbar bikujin û Sarê jî wê deng ne kiriba ha! Ev dikete serê kê? Dilê Sarê wê çawa bikarîba li himber vê wehşetê debar kiribaya! Reşo bi dîn û îmana xwe ne dida. Di dinyaya xwe de ew bi qasî pêxemberekî mezin kiribû. Dinya li aliyekî mêzênê, Reşo li aliyekî mêzênê danîbû û bi dinyayê re diwezinand. Jê re digot »Sitûna mala min. Tu hêviya min î. Mekteba teyaran bixwîne, bibe şifêr. Teyarê tije top, metilyoz, fîşek, bombe û deremêt bike û were van qereqolên romiyan hemiyan xirîxopan bike!..« Îcar Sarê wê çawa bikarîba xwe li ber qîr û hewarên Reşo bigirta û mala xwe û eskeran li topekê nexistiba! Ji xwe dê Sarê rahişta çekê herî mezin û êrîşî ser komutanê qereqola hidûd Mehmet Bîçer bikira. Çifta dulûle di zikê Bîçer de biteqanda û hinavên wî berdana erdê.

Heso li xwe danetanî ku tirsa xwe bide der. Gava qîq mabû, çav çûbûn xwar, çavan ne dikutkutand û wilo beloq li binê beştan dinerî, Sarê di nav



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

lepên eskeran de bû. Eskeran mîna ku di Rewşê de kiribûn, li Sarê li himber dost û dijminên wî û temamê gundiyan êşkence dikirin. Heso behetî bû! Esker bi qezetoran kişiyabûn ser Sarê, canê wê diterişandin. Bi niqe niqa dilopan şiyar ne dibû. Dema ku Rewşê komutanê qereqolê kuştibû û eskeran jî serê Rewşê di bin lingên panzêrê de kiribûn nanik, wek niha zivistan bû. Ji erd û ezmên av diherikî û mejiyê wê li ber xwe biribû. Wî, di mejiyê Rewşê de, mejiyê Sarê didît.

Serşok di qorziya odê de ye. Qorzî li başûr dinere. Serşok û şibake nêzîk hev in. Serşok bi qasî bihustekê ji erdê bilind e. Şibake li erdê dinerin. Di vê odê de ji xwe bi tenê du şibake hene. Herdu jî incex bi qasî devê tenûreke berîvanî mezin tên. Ji der ve de gava mirov di şibaka nêzîkî qorziyê re li hindur dinere, serşok bi telekî xuya dike. Raserî serşokê tam di jora dîwêr de bi qasî gokekê mezin û girover kulekek heye. Ev kulek jî bi şev her tim perdekirî ye. Bi roj maliyên Heso xwe li ber ronahiya vê kulekê dişon.

Heso bêdilî xwe ji nav livînan rabû, ber bi serşokê de meşiya û çavên xwe li qabqabkan gerandin. Qabqabk seraqet li ber serşokê ne û serşok jî di binya livînên wî re ye. Ji ser livînan qabqabk xuya dikin. Îcar ji xwe hîç pêwîst nake ku li wan bigere. Xwe daqûl kir. Rahişt herdu qabqabkan. Bi haweyê ku wê qabqabkan bixwe, li qabqabkan nerî. Qederekî li hev qulipandin û dûv re dîsa danîn erdê. Ji kûraya kezebê keserek kişand, lingên xwe hepişand qabqabkan û bi teqil rabû. Lêbelê xwezîka ranebûya, bi ketineke pir pîs li erdê veziliya! Bi rastî ji aliyekî de jî ev ketin heq kiribû. Ji ber ku him qederekî li qabqabkan temaşe kiribû û him jî di dûv re wê berevajî têxistana lingên xwe. Qabqabkan ling dizewirandin, lê dîsa jî bi xwe hayî ne dibû ku ev zewirandin ji ku tê. Qayişa fera rastê ji avê riziya bû. Û wî bi xwe jî dizanîbû. Digel vî haweyî îcar ji dêvla ku pêşî lingê xwe ê rastê bilind bike, lingê çepê bilind dike. Ji xwe wê qeweta kelêx hemû têkeve ser lingê rastê; lastîka rizyayî ji ser hev here, lingê ku ji êvar de ne hedinî ye bixile û wek bertelaşekî ji hewa de bê xwar.

Sarê mîna çûkekî ji cihê xwe firiya, »Pepûko Temo bavê te mir!« got û xwe avêt ser Heso.

»Keçê xwe ji ser min bide alî te ez fetisandim! Qey çavê te lê ye ku tu min bi dostayî bikujî, weh!..«

Lingê wî tehenî bû. Lêbelê wî digot »gwîzek derizî ye« Piştî ku Temo bi bazinê ling lîst û ling bi vir û wir de baş xirciland, bawerî pê anî ku ling fikiyaye.

»Yabo destûrê bide min ku ez herim Sirêçkê gazî Seroxan bikim. Lingê te fikiyaye...«

»Eman tu tiştekî wilo nekî! Dibe ku eskeran kemîn avêtibin dora gund, wê te bikujin. Em ê di rûnê xwe de biqiçqiçin ka bê Xwedê wê çawa bike heta sibehê...«

Di warê cebarê de doktoriya Heso hebû. Heta ji nexweşiyên heywên jî fêm dikir. Lingên gelek heywanan cebirandibû. Herwiha ling û destên insên jî. Li herêmê bi qasî Seroxan navdar bû. Îcar digel vî haweyî dîsa jî nizanîbû ku lingê wî teheniye.

»Hinek mû, hingiv, rûnê malê û çengek kizirk ji min re bînin.«

»Yabo ji dêvla rûn û kizirkan ve ez mîhekê bigurînim, ne çêtir e gelo?«

»Êh bê çi bi aqil e, wê ji min re pez bigurîne û lingê min têxe eyêr, lawê diya xwe!«

»Baş e, ji gurandina dîkê qoqo an keroşka şîne re, tu çi dibêjî?«

»Dirêj neke. Ji min re zû lepek mû, nanikek hingiv û du, sê kevçî rûnê malê bînin!«

Heso mirovekî çikûs bû, pir li ber mêl dida. Eger ne ji berberiyê ba, belkî di herêmê de bûba dewlemendê herî mezin jî.

»Temo, kuro ma te hîn jî bavê xwe nas ne kiriye bê çi mal e? Ew dikare temamê malê me li devê romiyan biqelibîne, lê dil nade ku pênc wereqeyan têxe bêrîka Reşo. Lingê wî şikestiye, qêbil nake ku em keroşkekê ser jê bikin û çermê wê bigrin ser lingê wî. Dev jê berde, bi cehnema wî kirî. Keçê Meyro Meyro, wan quzelqurtan jê re bîne, çawa dixwaze bila wilo bike, wey bimir!«

Xwarina wan, şîva ku hîn ji êvar de mabû. Xawarin hûr û roviyên heşandî û tirşika mişmişan bû. Di vê malê de li ser daxwaziya Heso her ji panzdeh, bîst rojan miheqeq wê carekê beroşek hûr û roviyên heşandî bihatana kelandin. Di eslê xwe de Heso ne ku bi rastî hej hûr û roviyên heşandî dikir, diruvê Circîs bi hûr û roviyan dixist ji ber hindê tahm ji vê xwarinê distend. Gelek caran, bêî ku malî pê agahdar bibin, wî bi dizî çend kubikên dagirtî birine besta gund, di nav pîsiyê de dane û dûv re jî şewitandine. Di kultura wî de hûr û roviyên dagirtî bi destan dihat xwarin. Lêbelê wî bi kêrê kubik û rovî pêşî diterişandin, dûv re jî dikir qitîtk û bi kevçî dixwar. Di kubikan de serê Circîs û di roviyan de qama Circîs didît.

Sarê:

»Hema bêdilî xwe ma be dîsa jî çend gepan bixwe. Sibehê wê romî bi-

girin ser gund. Bi zikê xwirînî tu ê nikaribî xwe li ber dar û sîlên wan bigirî. Wilo nabe heyran, lîçekê bixwe...«

»Keçê ez ne ketime taya lêdanê. Ma qey hindik carî min lêdan ji dest wan xwariye. Bi qasî tayên porê te şiqam û dar li min ketine. Ez ketime wê heyirê ku sibehê ez ê çawa li ser vî lingê fikyayî bikaribim bimeşim; bêî ku ew kafirê birayê te min kulek bibîne ez ê çawa bikaribim xwe li ser lingan bigirim! Ji danê esirê heta ku ro çûye ava ez li ser xênî bûm û min qelş dadigirtin. Min sê zembîl ax kişand ser xênî. Birayê te Circîs jî ji ser xaniyê xwe li min temaşe dikir. Xelkê vî gundî bi carekê ve heta ku ro ketiye tasê, li min temaşe kiriye. Îcar gava sibehê ez bi vî halî derkevim nav wan, wê ji min re çi û çi nebêjin! ‘Heso ji tirsa ku lêdanê nexwe, xwe dikulkulîne.’ Ev gotin ji bo min mirine, mirin! Xwezîka îşev vî Xwedayê mezin emanetê xwe ji min bistenda, ez bimirama û ev ecêb bi serê min de ne hatibaya!..«

Pişta xwe dabû çar balîfan û pîjaq dirêj kiribûn. Paçikê hevîr danîbû ser newqa xwe. Ji pêçik bêhneke tirş difûriya. Paçik ji pînan pev hatibû dirûtin, kevnekotî bû. Lêbelê wî ew bêhn ne dikir. Legana sifir xistibû nav şeqên xwe. Legan hawêrdor kubyayî bû. Li himber ronahiya lempê hindurê leganê qer û teniştan jî argonî dibiriqand. Di leganê de sê hûr, du roviyên zirav û nîv metro û bi qasî bihustekê roviyekî qalind, hebû. Xwarin şilekî danîbûn ber. Wî wilo xwestibû. Kevçiyekî darînî û kêreke kalanhesinî êretî di nav hûr û roviyan de bû. Doxika kevçî bi kelpik û derizî bû. Kevçî ne rengînî bû. Hûrê herî girover xistibû kefa destê xwe ê çepê, kêra kalanî bi destê xwe ê din zeft kiribû, li Sarê temaşe dikir û di dilê xwe de digot:

»Ez zilam û Sarê jî pîrek e. Ez ditirsim û ew natirse. Gelo ew vê tirsa min dibîne? Ez xwe li himberî wê piçûk dixînim. Di dînê me de cihê pîrekê tune ye; lêbelê ê min heye. Pîrek nikare bibe mîr û hakim, lê ez dikarim bibim hertişt. Heta şahidiya du pîrekan bi qasî a zilamekî ye. Mesele gava yek yekî bikuje û pîrekek li ser ê qatil bibe şahid, wê şahidiya wê qebûl nebe. Divê ku du pîrek bi hev re vê şahidiyê bikin. Lêbelê şahid eger zilamek be û ev zilam çendî pêxwas be, dîsa jî xem nake. ‘Pîrek ji bo şehweta zilêm hatiye dinyayê.’ Ew insanekî ku mirov bazdide ser yanî. Ma ez her şev baznadim ser Sarê, hi! Îcar çima ez ji eskeran ditirsim û ew natirse? Di dînê me de wezîfa pîrekê ew e ku zilêm berde ser xwe, zarokan çêke û ji gotina mêrê xwe dernekeve. Ê hema bi telaq ev ne tu ûjdan e! Sarê ji min û bavê min çêtir û mêrtir e ma qey bi tirtirê ye! Na na, pîrek mê û zil-

am jî nêr e ehmeq. Cihê ê nêr her tim li jor e. Xwedê ji nêran hez dike. Xwedê pêşî nêr û dûv re jî, mê ji nêr çêkiriye. Îcar mêr çi tiştê ku herî kilêt be tê bike jî, heqê wî ye. Her roj dev û diranên wê bişikîne, dîsa jî heqê wî ye. Pîrek bi wî, ne ew bi pîrekê heye. Zilam çawa bixwaze, pîrek mecbûrî kirinêye. Kuro ma ne mele û şêxên me dibêjin, 'Gava li zilêm rabe, zilam bixwaze û di vê navê re destê pîrekê jî di nav hevîr de be, pîrek bêdiliya wî bike û xwe bi dest ve bernede, gunehkar dibe!' Ji bo wî pîrek erdekî beyar e, çawa kirêb bike malê wî ye, weh! Ma ne şêxên me dibêjin, 'Aqilê heft pîrekean di serê mirîşkekê de ye. Û mirîşk jî nikilê xwe li gû dide; tevdide û dixwe.' Howeh li vê ecêbê, îcar mirîşka mala min, ji tu tiştî natirse! Û ez ev zir dîkê ha, ji tirsa eskeran dikim bifetisim kuro! Ê lawo hema bi telaq, Xwedê û Mihemed herdu jî li van pîrekan neheq in! Tobe estexfîrulah min xwe dîsa gunehkar kir!.. «

Sarê, bi ser vê pîrekiya xwe de îcar ji bavikê Hûran bû û hûrî û bavikê Heso jî ji bav û kalan de dijminên hev bûn. Mîna ku ev hemû ne bes bin, tew bi ser halan de pîrê xweha Circîs bû û Circîs jî serekê temamê malbatê bû! Sarê tu rê ji Heso re ne hiştibû ku Heso wek camêran bikarîba, li ser qisûr û kêmaniyên xwe hinekî biaxiviya. Di nav qerfan re ev aliyê xwe li hev dixurbiland û dida der.

Sarê got:

»Heso tu çi li min dinerî? Ma qey di dawiya vî emirî de tu dilketiyî min?« û derket hewşê.

Heso serê xwe bi ser leganê de xwar kir. Piştî ku tibabê deqîqeyekê li hûr nerî, mîna ku hûr serê Circîs be, bêî ku ji tê bike pelixand û dûv re jî bi kêrê kişiya ser. Zîqîniya kêra wî diranê mirov diqiriçand. Ne dixwest bixwe, nikarîbû bixwara. Bi xwarinê re pevdiçinî. Tam bi haweyekî erebî, bêmirês dikir û dixwar. Gava radihişt kevçî ber bi devê xwe de bilind dikir û bi hêrs dîsa diavêt nav xwarinê, ji doxika kevçî, mereq bi zend de dihate xwar, li enîşkê radiwestiya û bi ser xwarinê de dinisilî. Rîha wî ji libên dên, mîna erdê bizarkirî bûbû. Çep û rast xwe dixwirand. Geh destê xwe diavêt nav şeqên xwe mû dikişand geh ji bin çengan pirç radikir geh tiliyên xwe dixistin qulên bêvila xwe, kerik derdixist û di nav xwarinê de werdikir. Bi doxika kevçî xwarin tevdida. Nizanîbû bê çi dike. Rûn li serî vedabû. Gava serê xwe hildida û datanî, şewqa lempê di tilmika serî de diciviya, tilmikê mîna kevirê hestan çirûsk vedida.

Piştî ku eskeran qederê bîst deqîqeyekî weke tu xwê têxî êgir fîşek

teqandin, nîv seetekê bedeng man. Dûv re dîsa bêwestan bêhnikekê hawêrdor gule barandin...

* * *

Ewr dapiçiyane, ro derketiye. Xumîn û olan bi newalê ketiye. Ji newalê seranser mij û dûman bi ser silûmên çiyan de bilind dibe; çiya xuya nakin. Ji barana şevê din çem rabûye ser xwe; bi hêl û mêl diherike, dar û ber dane ber xwe û bi nav erdê binxetê de diavêje. Di hewdên qelaçên Zorava û çiyayên omeriyan de av meya ye, çal hatine dagirtin. Ji rizdên zinaran av bi ser lat û tahtan de dadiwerive. Sarinca kevnare ku li nêzîkî gund di tahtê de hatibû kolan, ji avê miştbûye. Erdên avgîr bûne gol. Balinde bilind difirin. Etlayî nakeve refên zerzûlan; ji roava ber bi rohilat de di ser gund re refek derbas dibe û yek tê. Têtî, koleke û gabelekan xwe ji qelêç berdane ser bênderên gund diçêrin. Mîna ku bêhneke din wê şapateke wek a şevê din rabe, bi lez nikilên xwe li erdê dixînin; bi haweyê ku kumika xwe şeh bikin lapûşkan diavêjin serê xwe; kumikê xwe daye ser hev û mîna çengelekî tewiyaye. Li ser bênderên jora gund, bi dû hev dikevin, xwe vedipejinînin. Reşêlekê xwe li wê navê danî û disûrike. Çend têtî ketine gevzekê, baskên xwe li hev didin û li derdora xwe çeng dibin. Zelorek ji dera ha kulkulî tê. Beraşekî xwe li ber xist, ew sekinî. Du reşêle firiyan û ên din bi carekê ve xwe melisandin. Li hewa başokeyek dilîze. Ji hewş û axuran barîna pez û orandina dewêr bi kîlometroyan deng vedide. Ker dizirin, şîhe şîha bergîlan ji bin sefikan tê. Lêbelê kûçik bêdeng in. Insan bêdeng in. Zarokan xwe dane pişt kewaran, ketine hindurê rislên genim û kulînan; di nav livînan de xwe kirine gilok û îske îska wan e digirîn. Hin ji wan bazdidin kadînan, xwe di nav kayê de vedişêrin. Qaşo dayik jî berdilê zarokên xwe digirin, bûne xemrevîn, lê ew ji zarokan bêtir digirîn. Bav dixwazin zarokan bi kab, xar û şekirê çayê bikenînin; zarok şa nabin. Ji bavan re dibêjin, »Ma hîn esker ne çûne yabo?« Paxafê girtiye hinavan kutkuta dilê wan e! Li ber çavên zarokan hertişt belê hertişt bûye esker; li hertiştî bi xof temaşe dikin! Qîran didin! Di himbêza dê û bavên xwe de mîna pelên daran dilerizîn. Bav bêçare, dê bêçare »Em çi bikin ax Xwedo!« Qîr û hewarên zarokan kezeba wan dax dike; xwîn li dayik û bavan vemiriye!

Eskeran bi sariya sibehê re, jora Zorava û derdorên gundên cîran zeft kiribûn. Bi ronahiya rojê re xwe pênc pênc ji qelêç berdan gund. Li dor gund belav bûn û ristik girtin. Digel usteymen Mehmet Bîçer sih û neh

esker hatibûn gund. Hejmara vê carê li gor hejmarên berê ku digirtin ser gund, hinekî kêm bû. Her gava digirtin ser gund kêmî pêncî, şêst eskerî ne dihatin. Komutan Mehmet Bîçer bi qama xwe ji eskeran pir ferq dikir. Mirovekî qamqut û dagirtî bû. Qesabê qereqolê Cimo digot, »Qama vî usteymenê dêqahb, metrok û pêncî û du santîm e.« Bîçer kej bû. Mîna zarok û xortên herêmê porê xwe kurt jê dikir û temberî berdida. Bi giştî serqot digeriya. Li gundan ji xwe hîç ranedihişt şifqê. Bîçer ji bajarê Enqerê bû. Li Nisêbînê rûdinişt. Ew û jina xwe ji hev cihê bûbûn. Jina wî li dibistana »Merkez ilkokulu« mamosteyî dikir. Keçek û lawek wan hebûn. Ew bîst û neh salî û jina wî jî bîst û pênc salî bû. Wî ji jinikê hez dikir, lê jinikê jê hez ne dikir. Têkiliyên jinikê ji karmend û mamosteyên hevalên xwe bêtir, bi dikandaran re hebûn.

Mehmet Bîçer li pêpîkê xist. Bi dengê pêpîkê re, ji bilî deh eskerên ku li jora gund li ser pêyan rawestiyabûn, esker hemû li ser bênderên jêra gund civiyan. Muxtar û bekçiyê gund Bedran û Remo jî di temenê de çik li ber deriyê hewşa Circîs rawestiyabûn. Navbera hewşê û eskeran mişarek bû. Bîçer bi dengekî pêt:

»Muxtarê qewad û bekçiyê qûnde, ji dêvla ku hûn wilo wek sitir li wir rawestiyane, werin xêrhatinê di me de bidin!«

Li gor şertên ku qereqolê ji gundiyan re danîbûn, gava esker bihatana gund eger muxtar li malê ba muxtar, eger muxtar ne li malê ba bekçî diva bû pêrgî wan derketa. Îcar gava ne muxtar û ne jî bekçî li gund bana, wê melê gund ya azeyekî ya jî rîhsipiyekî ev kar bikira. Nemaze ne başçawîşê qereqola Sitilîlê û ne jî komutanên qereqolên hidûd, li gor şertên ku danîbûn, meşiyane. Pêrgîn û nepêrgînî herdu jî sûc bûn. Dema ku keye, kizîr, pasban û hwd. pêrgî wan diçûn, digotin »Xiyar çi karê te li vir heye? Ma qey em rêya mala te nas nakin? Kerxanecî biceheme!« Îcar gava kesek pêrgî wan ne çûba, »Qahpino ma ne me hin qanûn ji we re danîbûn! Hûn me piçûk dibînin ha!..« digotin û lêdan li wan dikirin.

Muxtar û bekçî bi bazdan çûn ba komutên, ketin temenê û gotin:

»Emir bike qomandarê min!«

Komutan hema wilo yekser piştî ku pêhlewankî, çep û rast çend kulm ketûber bi wan ve kirin, got:

»Pêşî, kûçikan hemiyan ji gund dûr bixin û dûv re dîsa werin vir, temam qewadino!« û digel eskerên xwe li wê navê piyase kir.

Bîçer ji kûçikan pir tirs û sawêr digirt. Li herêmê gelek kûçik kuştibûn. Lêbelê digel ku ewqasî ji kûçikan bi tirs bû, tu emirê ku gundî kûçikan bi

xwedî nekin ne dida. Gotina wî qanûn bû. Û temamê xelkê herêmê jî bêlam û cîm situyê xwe ji van qanûnan re xwar dikirin. Digel vî haweyî dîsa jî wî jiyan li kûçikan serbest kiribû. Bedran û Remo ji bo ku kûçikan bidin hev û wan derxînin derveyî gund, bi nav malan ketin. Gundiyan mercên ku komutanên hidûd û başçawîşê Sitilîlê danîbûn, yek bi yek ezber kiribûn. Ji şertên komutanên hidûd yek jê, gava bigirtana ser gund, bêgotin divabû herkesî kûçikê xwe bi çolê de biterqanda. Gundiyan li ser terqandina kûçikan gelek caran bi tevayî lêdan xwaribûn. Kûçik bi çolê de ne diterqiyan. Hûto ji vê re rêyekê dibîne. Dema ku eskeran digirt ser gund, herkesî kûçikê xwe şibaq dikir û dibirin nav rezê ku li jora gund dima; kûçik bi darên behîvan ve girêdidan.

Li gundên ser keviya mayinan, jiyan bi hemû haweyê xwe merez bû. Di her guhertina komutanekî hidûd de her tim hin qedexe dihatin danîn. Gundiyan ji van qedexan re digotin »Qanûnên romê.« Komutanan di gundan de pêşî xwedîkirina hespan qedexe kirin. Dûv re bi şev ronahiya luks û lempê, dûv re çûn û hatina bajêr a bi şevê qedexe kirin. Qedexe ji qedexê veket heta ku giha şevbihêrka gund û lîstika hingulîskê. Gundiyan mîna demên rabihurî ewqasî êdî nema cesaret dikirin ku bi şev ji mala xwe derkevin û li maleke xuyayî şevbihêrkê bikin.

Bêî ku Bedran û Remo ji bo biderkirina kûçikan bangî gundiyan bikin, ji xwe ji zû de herkesî kûçikê xwe şibaq kiribû û li gasînê li bendî emirê Bedran rawestiyabûn. Di demên pêşî de, li gasînê kûçikan bêcirî dikirin û pevdiçinîn. Lêbelê di dûv re ew jî hêdî hêdî hîn bûn; ne digel hev bêcîrî û ne jî êdî pêvçûn kirin. Kûçik gihabûn deraxeke wilo têgihiştî, eger ji benda pizûran berpirsiyarê kûçikan Hûto û ji benda hûran jî berpirsiyar Cemşît, ji kûçikan re bigota »Kûçikino esker hatine gund; herin nav rez û heta ku esker li gund bin ji nav rez neyên«, wê kûçikan jî eynî wilo kiribana. Çimkî kûçikê Qasoyê pizûrî Doguj di her gava ku esker dihatin gund, bêî ku hin wî şibaq bikin wî bi xwe bazdida nav rez û hildikişiya ser bena rez li gund temaşe dikir. Dema ku esker ji gund bi rê diketin, wî dikir ewte ewt, rast berê xwe dida gund û dihat mala xwediyê xwe.

Pizûrî ji aliyê kûçikan de hinekî dewlemend bûn. Bîst û heft kûçikên wan hebûn. Hûran jî nozdeh kûçikên xwe hebûn.

Berpirsiyarê kûçikan Cemşît, berî Hûto bi rê ket. Doguj bi sîne bû. Ji bilî wî kûçikên din hemû şibaq kirîbûn. Doguj mîna ku wê esker wî û hevalên wî gulebaran bikin, ketibû pêşiya karwên, nûze nûz jê dihat û bi lez diçû.

Hûto kûçikên xwe li jêra rez û Cemşît jî ên xwe li jora rez bi darên behîvan ve girêdan. Şerîta ku Doguj pê hatibû girêdan li dor deh metroyan dirêj bû. Hûto bi armanca ku Doguj nahtoriyê li hevalên xwe bike, her tim şerîta wî dirêj berdida. Çimkî bi rastî gava kûçikan pevdiçinîn, Doguj jî êrîşî nav wan dikir, hemiyan ji tirsa bi xwe de dimîzt û bêdeng disekinîn.

»Me meseleya kûçikan hal kir qomandar. Êdî bi hêsanî hûn dikarin gund saxtî bikin.«

Bîçer li himber wan bi haweyê ku ji dinyayê re meydanê bixwîne, çû û hat û darek li kêleka Remo a çepê xist.

»Xiyar, ji min re komutanê min bibêje temam!«

Barînî pê ket:

»Temamdir qomandar!«

Bîçer li dor xwe zîzikî, xwe tibabê gazekê bilind kir û cotikî pehîn li defê sênga wî xist. Remo wek celba heriyê bi erdê ve zeliqî.

»Lawê qahpikê, komutanê min, komutanê min bibêje temam, hi hi hi!«

»Wilehî temam qomandar, ez ê bibêjim...«

Bîçer dev jê berneda. Pê li zikê wî kir û xwe bi ser de daqûl kir:

»Pêzeveng, pêzeveng, komutanê min komutanê min!..«

Remo tam ji derb ket:

»Pêzeveng qomandar û qomandar û pêzeveng...«

Bi tirkî dizanîbû. Lê ji tirsa lêdanê devê wî ketibû hev, bîr ne dibir bê çi digot.

Bîçer ji sih û sê eskeran çar qefil çêkirin û dest bi saxtîkirina gund kir. Qefila wî ji deh eskeran pêk dihat. Pêşî ji mala Celîlê hûrî dest pê kirin. Xaniyê Celîl tam di pêşiya gund de bû. Bi sipehîbûna xwe li temamê xaniyan ferq dikir. Qesirbendê omerî Kopo qesir li ser du tebaqan ava kiribû. Kevirên qesirê hemû sipî, şehkirî û bi hosteyiyek delal li ser hev hatibûn nijinandin. Ji dûr ve qesir diket nav ruyê çiyê, mîna pelekê berfê diyar dikir.

»Komutanê min me zeft kir!«

Eskeran bergîl şibandibûn hespê. Bi rastî bergîl ji bergîlê bêtir dişibiya kerên Bismilê û hinekî jî hespên kirgizî. Bergîl him reş û qemer û him jî li gor bergîlên adetî pir hûr bû. Kenêr ji bo vê bergîlê digot, »Bêdevjeng dikarim bibêjim, eger ez vê bergîlê bibim mazata Diyarbekirê û wê teslîmî kose û berkosên diyarbekirî bikim, wê bi hêsanî bikaribin bergîlê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bifroşin bismiliyan.«

Bîçer li bergîlê ecêbmayî mabû! »Ev çi tişt e, ev çawa heywan e!« digot û li dor bergîlê bale bale diçû û dihat. Piştî ku tiştek ji bergîlê fêm ne kir:

»Temam! Qaçaxçiyên şevê din ev heywan ji Sûriyê anîne. Gelo kî dizane bê vê heywanê wê bi çiqas pere bifroşin, of aman dayê!« got û kulmek bi argûşka Celîl ve zeliqand.

»Begim haşa, lê wilehî tu şaş î yaho. Çar sal e ku ez vê heywanê bi xwedî dikim. Ji başqomandarê Sitilîlê bipirse. Qomandarê min...«

Ne hişt ku gotina xwe biqedîne, kulmeke din avêt dev û bi zirt:

»Başkomutan nebêje kewaşe! Başçawîş çawa dikarin bibin başkomutan allhumme ya rebî!..«

»Pardon yaho pardon, bibexişîne qomandarê min. Erê başçawîş qomandarê Sitilîlê tam neh caran li vê bergîlê siwar hatiye. Ez bi xwe digel bergîlê gelek caran çûme nig başçawîş qomandarê mentîqê. Ji kerema xwe re jê bipirsin begê min...«

Ew hîn wilo diaxivîn, ji taxa jor dengê teqîna G3ekê hat. Hema wilo pê re ji nav gund û çarkenarên gund, teqîn bi ezmên ket û bû qîr û qiyamet! Bîçer, Celîl bi ser bergîlê de dahfand û li Bedran û Remo demaçe kişand. Eskeran jî bi dengê herî bilind:

»Kesek xwe tev nexircilîne!« gotin û G3ên xwe çep û rast li dor xwe gerandin. Di vê rewşê de hemû bêkip çar deqîqeyan bêtir rawestiyan. Piştî ku teqîn ji bayê xwe ket û yeklibkî bû, Bîçer got:

»Esker li pêpîkê xîne!«

Xwediyê pêpîkê ew bi xwe bû, wî pêpîk bi kar dianî. Pêpîk bi qasî kabê beranekî mezin pê ve daliqyayî bû, lê wî pêpîk ne didît.

Esker piştî ku got »Komutanê min pêpîk li ba te ye«, wî jî rahişt pêpîkê û dirêjî destê eskerê di nêzîkî xwe de kir.

»Lêxîne!«

Bi dengê pêpîkê re ji bilî eskerên ku li dor gund nahtorî dikirin, hemû bi bazdan hatin û li ber deriyê hewşa Celîl ketin temenê.

Bîçer bi qahr:

»Ew çi teqîn bû?«

Ji nav rêzê eskerekî dirêj

î rûgirover û esmer, sê pêyan ber bi wî de qedimî, patev da:

»Komutanê min, marekî xwe êrîşî ser min kir; min jî fîşekek berdayê û min ew kuşt.«

»Çi çi? De ka dîsa bibêje bê te got çi?«

Destê xwe ê rastê ber bi taxa pizûran de dirêj kir:

»Aha li wê taxa ha, di axurekî de ji nişkê ve marekî mezin êrîşî ser min kir. Mefera min nema û min jî fîşekek li ser danî.«

Ne wek ku wî digot. Mêr êrîşî ser ne kiribû. Xwe li ser kayê kiribû kilofîr û serê xwe di nav kilofîrê de veşartibû. Gava ku mêr dibîne, bêhnçikyayî bazdide devê deriyê kadînê û ji devê derî li ser kayê direşîne. Mar ne kuştibû. Zînê bi ser hiltê ku nema biteqîne. Marê ku Zînê kuştibû, hîn li ser kayê bêlept di halê xwe de bû.

Ji bilî qefila Bîçer hin eskeran cercûrek bi temamî û hinekan jî li dor nîv cercûrî, fîşek teqandibûn. Vê teqînê ji herkesî bêtir tesîra xwe li ser zarokan û sewêl kiribû. Lawê Temo Xelîlê şeşsalî ji tirsa bi xwe de mîztibû û hebitî bû. Meyroyê lawik xistibû himbêza xwe, digiriya û nifir dikirin. Sarê hingî ku dev destên xwe kiribû, xwîn ji pişta herdu destên wê diherikî. Hûçikên kirês û pêşmalka xwe bi carekê ve çirandibûn. Destên xwe bi hinc li hêtên oda kilskirî dixist, hêtan ji xwîna wê sor vedabû.

»Bi navê xort û zilaman bila kesek di hindur de nemîne, herkes teqeze bê vê derê! Lîsta navan bi min re ye. Eger hema yekî kêm bibînim, ji xwe pêwîst nake ez bibêjim, ez ê pêşî di diya xwe û dûv re jî di dê û jinên we hemiyan biku...im! Temam!»

Bîçer piştî ku careke din Bedran û Remo bi nav malan de rê kirin, digel eskeran ve xwe berda ser bênderên jêra gund û esker li hev kom kirin. Şeş esker ji komê tibabê sed metroyekî ber bi jêr de dûr çûn û rawestiyan. Ev eskerên din jî yek kete pey yekî, bûn rêz û rast çûn G3ên xwe teslîmî wan kirin. Di şûna G3an de rahiştin darên berû. Darên ku ji terefî gundiyan hatibûn çêkirin, kelemî bûn. Bêhna goştê insên ji daran dihat. Xwînê li wan vedabû debixî bûn. Di lêdanê de tu carî ne dişikestin.

Gundiyan ji lêdana niha re, xwe hîn ji nîvê şevê de amade kiribûn. Wan dizanîbû bê sibehê wê esker çi afatiyê bi serê wan de bînin! Mîna Heso xwarin di qirika gelekan re ne çû bû xwar. Bi teqînê re herkes ketibû hev, nema dizanîbûn bê ê çi bikirana. Tew li ba hinan, heyvanê mêraniyê nema bû; bi carekê ve ji desthilanîn ketibûn. Ji derveyî zarokan kesek raneketibû. Lempên xwe vemirandibûn û li reşê heta sibehê sihurîbûn.

Bedran û Remo ji benda hûran bûn. Di rojên ku eskeran digirtin ser gund, bêî ku ji benda hûran hin kes bangî hin kesên ji benda pizûran bikin, pizûrî ji ber xwe ve dihatin nig eskeran. Li gor kevnepoşiyan gava yekî hûrî gazî yekî pizûrî kiriba, ev yeka ha kêmanî dianî ser malbata pizûran. Lewra malbat jî ji hêla hûran ve wê tirsonek bihata qebûlkirin.

Herdu malbatan jî xwe ganêre didîtin.

Lingê Heso ji ketina şevê din hinekî diariya. Ling werimîbû. Gava qeweta xwe berdida ser ling, tevzînok bi lêş ve hildikişiyan, janê xwe dida kezebê, çîm direhelî. Lêbelê jana ling û êşkenceya ku wê ji destê eskeran bidîta ji bîr kiribû; ketibû taya ku bi lingê tehenî wê çawa bikarîba derketa pêşberî dijminên xwe. Circîs ew ber bi êvarkî de bijûn dîtibû. Bi zembîlan ax kişandibû ser xênî, li hewşê qutik hûr kiribûn, digel şivên pez rast kiribû, du caran çûbû ser birkê, xwe ji malê vedizîbû, kubikên dagirtî li bestê di nav pîsiyê dabûn û şewitandibûn.

Sarê:

»Hevalbendên te hemû li gasînê li bendî te sekinîne, zû xwe bide ser hev...«

Heso di vê kêlîka ku wê xwe berda ba eskeran, pir dixwest ku Sarê digel wî li ser mêraniyê biaxiviya; navtêdan tê de bêfiranda û çêlî fêrisiya xwe jê re kiriba. »Nîvê hezarî pênc sed e Heso netirse! Av ha li kabê ha li newqê, bide nav, nericife!..« Lê mixabin te digot qey bi geragup lîstiye, kelbetên devê wê venedikir. Sara ku ji eskeran xwîn vedirişiya di vê kêlîkê de nola bûmeke bêdeng li ber menqela êgir xwûz veteqilî bû. Diponijî. Destekî xwe danîbû ser çembilê menqelê û bi destê xwe ê din rahiştibû maşikê, xwelî vedipexirand. Maşik, mîna melhêbê di nav ariyê de dibir û dianî û hildida. Xweliyê girtibû ser rû, rû mermerî vedabû; ji eniyê gilorîkên xwêhdanê hêdî xwe berdidan herxan, ji herxan pir herxên veşartî ayan bûbûn. Di ruyê wê de mirov hemû rê, xaçerê û çivên jiyanê didît.

Heso bi dengekî melûl:

»Sarê, ma tiştekî ku tu ji min re bibêjî heye?«

»Pepûk ew çi kirasê ku te li xwe kiriye! Ew çi çakêtê ku bi ser kirês de ye! Te porê min kurkiro ma qey tu ê biçî dawetê! Te aqilê xwe xwariye, ev çi ye!..«

Heso hinekî serxweçûyî bûbû. Di rojên ku eskeran bigirta ser gund divabû şerwal li xwe kiribûya. Her tim jî wilo dikir. Çimkî di êşkencê de kirês wê sitara xwe lê ne kiriba. Felaqe hebû. Di felaqê de qûn belbelot dibû. Daliqandina serserkî hebû. Eskeran termikî ew bi dû xwe de dikişkişandin. Li wan siwar dibûn û ew li dor gund digerandin. Bi dû panzêr û cemsên xwe ve jî girêdidan.

»Keçê Sarê bi şêxê erdê li Bexdayê, tu jineke pir delal î! Te bêhna min derxist, lê. Bi telaq min hîç bîra ku şerwêl li xwe bikim ne biribû...«

Ji gasînê, Luqmên bang kir:

»Yabo yabo, de ka were! Hûrî hemû li ser bênderê bûne rêz, pîrek derketine ser xaniyan, em hemû li hêviya te ne...«

Luqman nixuriyê Heso bû. Çil û sê salî bû. Mirovekî ji xwe razî û hinekî jî dengbêj bû. Dengê wî dişibiya dengê Îsa Berwarî.

Armanca Luqman ku bavê xwe têxista nav ref û garankî bimeşiyana da ku kulkulî diyar ne kiriba. Lewra li cem eskeran bikuliya jî xem ne dikir. Çimkî dijminan wê ev seqetiya ha di derbarê lêdanê de bihesibandana. Heso ev bîr ne biribû. Luqmên bêhna xwe teng kir, ji komê veqetiya û bi bazdan hat hindur:

»Yabo Xwedê ji te razî be, eger tu ê bê were, na eger tu ê neyê em ê herin. Te em bi dereng xistin...«

»Lawo temam temam. Tu ka derkeve ez ê va bêm. Qîza min Meyro, tu jî derkeve.«

Hindur bi wî û jina wî ma. Heso wek zarokekî xwe xist himbêza Sarê, bi herdu destên wê girt, danî ser dilê xwe, eciqand û bi kelûgirî got:

»Sarê ez xulamê te bim, ez kolê te bim tu ê neyê nav eskeran. Binere vî qewadê qomandarê hidûd qebza demaçê li serê te xist, serî şikest. Dikarîbû tu bikuşta jî. Wilehilezîm eger di vê carê de jî tu derkevî himberê wî qewadî, wê te bikuje. Sarê ji min re soz bide, gidî ji malê dernekeve ez di bextê te de...«

»Na na, ez dernakevim.«

Heso li ser gotina Sarê şerwal li xwe kiribû. Şerwal qahweyî bû. Mirovekî wek tayikekî dirêj, zirav û li hevhatî bû. Bi wê rîha xwe a melkesî, derba fîlozofan pê diket. Sarê gava ew kiribû dilketibûyê. Heso jî dilketibûyê. Şerwal lêdiçû; lê ne di vê carê de. Navrana şerwêl hinekî ji qiyasê der, fireh û daketîbû. Gava dimeşiya bê li nav şeqan dixist navran ji paş ve mîna sîwanê vedibû; gavên ku girs diavêtin, sîwanê radigirt hûr dihûnand, meşa wî dibû wek a siltanan. Qutikê wî ji kirasê Meyro şê bû. Jina Luqman Fatê, berstik dirêj û girover qusandibû. Qutik ji qutik bêtir dişibiya berdilka zarokên dibistana gund. Berstikan xwe berdabû heta bi serê çiçikên wî; ji dûr ve mîna du xencerên kalankirî diyar dikirin. Xwestibû ku sako li xwe bike, lê Sarê ne hiştibû. Çakêtê Temo lê kiribû. Şekala derbê şimikî di lingan de bû. Xwe xistibû talda Luqmên û hevalbendê xwe Xelef, di nav komê de ditewtihî û ber bi komutan de dihat.

Komutan bi zirt:

»Pîsên heram bi lez werin! Li dor du seetan çêbû ku ez li vir li bendî we


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

sekinîme! Bênamûsino, bêşerefino ê ne ez ê we bixwim, bixwim bixwim!..«

Komutan her gav, berî ku dest bi lêdanê dikir, bi haweyê ku wan ji desthilanîn bixîne, pir xeber didan. Gundî baş nas dikirin. Serê berberiya di gund de kê û ne kê dikişand? Û mamosteyên fêrgeha fîtne û fesadiyê kî bûn? Nas dikir. Di keft û lepta gundiyan de derdixist ku xelkê herêmê, çendî jê ditirsin! Gava li ser hidûd dibû teqîn, di van kêlîkan de gundiyan çawa xof digirt, zarok çawa dilerizîn bi hemî dizanîbû. Tarîxa malbata hûr û pizûran û ên derdor ji Heso û Circîs çêtir dizanîbû. Kultura kurdî dinasî. Navê şahirên kurd, ji van şahiran ên navdar, kî li ku jiya bû û li ku derê bi gor bûbû dizanîbû. Ji xelkê herêmê pir didexisî. Lêbelê ewqasî jî ji muzîka kurdî hez dikir. Heyranê Meyremxana dengbêj û Hesenê Cizîrî bû. Di rojên şem û yekşeman de digel yuzbaşiyê tabûrê li bendava Nisêbînê li ber muzîka Meyremxan û Hesenê Cizîrî araq vedixwar. Bîçer li herêmê xwedî desthilatiyeke bêsînor bû. Xelk, mîna ku cin ji hesin bitirse wilo ji wî û yuzbaşiyê tabûrê ditirsiyan. Bîçer gava bixwesta, dikarîbû di bîst û çar seetan de di nav gundiyan de aşitî pêk bianiya. Çimkî di sala ku Aydin Guzel du mehekî bûbû komutanê hidûd, ji herêmê berberî rakiribû. Bi gundiyan qedemgeh kola bû. Di mala her gundiyekî de qedemgehek hebû. Bi gundiyan dar diçand. Pere ji wan xwestibû ku bi sondajê, li gelek gundan avê ji bin erdê derxîne... Herkesî ji dil û can jê hez kiribû. Bêjeya »Aydin« bi wî ketibû herêmê. Xelkê, navê wî li zarokên xwe kiribû.

Eskeran zoravî têkilhev rêz kirin. Heso û Circîs di serê rêzê de anîn kêleka hev. Di teniştа Luqmên a çepê de Îdrîsê lawê Circîs, di navbera Îdrîs û Temo de Hesûkê lawê Circîs, di temenê de repikî rawestiyabûn. Bedirxan li kêleka xalê xwe Circîs û Haco jî li kêleka xalê xwe Heso cih girtibû.

Bîçer mîna ku gundî hemû mirîşk û ew jî dîk be dorhawêr disûrikî. Ji kîn û buxzê reş vedabû! Çavên wî ji ên beytikekî bêtir dilîstin; çav mîna du bizotan di kortikan de bel bûbûn. Devê wî ne diket hev bêyefş diaxivî. Kef bi dev ketibû. Ji peşkên kefa devê wî, rîha Heso mîna daristana ku di bin berfê de bimîne, belek diyar dikir. Mirov ji kufîniya ku jê dihat heybet digirt! Te digot qey ne insan e, mar e ev. Ji rengê insên derketibû.

Bîçer, piştî ku ji eskerên xwe re got:

»Di pêşberî van xiyaran de sef bigirin!« çend gavekî ji gundiyan bi dûr ket û bi çavan hejmara wan kir. Dûv re ber bi Circîs ve qedimî; dar di nav

parxwanên wî de werkir û bi weş pehînek li zikê Heso xist. Hejmar her tim bi dêr dibû. Lêbelê vê carê bi pehînê bû.

»Weh ev çi ye! Hejmar kêm derket!!«

Hejmar temam bû, lê wî xwe ji qazî ve xaşomaşî dikir. Tam pêncî û heft pehîn li zikê wan xistibû. Di lîsta wî de ji xwe navê pêncî û heyşt kesî hebû. Ji serî de dizanîbû ku pêncî û heft kes li vir amade bûne. Bêî ku gundî pê bizanibin bi çavan ew hejmartibûn.

Bîçer ji dawiya rêzê bi bazdan ber bi Circîs de çû, li hindama Hemoyê pizûrî terpilî û devdevkî çû erdê. Mîna ku Hemo ew xistibe, awir tê firand; serê xwe bi haweyê ku »Ez ê bêhneke din te bipelixînim kûçik lawê kûçikan«, hejand û dîsa ji Circîs dest bi hejmarê kir. Vê carê jî bi dêr kir. Dar bi hinc diavêt berstika sitû, barînî bi wan diket. Xuya bû ku ji êşkencê zewqeke bêsînor distend; çimkî gava yekî ku barîn jê dihat, wî hejmar dikir dudu û hîn bi hinctir lê dixist. Di vê navê re bi dêr, pehîn jî diavêtin. Hemo ji ber pehînên wî temene xerab kiribû. Ruyê wî ji xwêhdanê şil bûbû. Bi destê xwe ê çepê zikê xwe diguvaşt. Di hindurê xwe de li hev diqulipî, xwûz bûbû. Xwêzî li ser xwêziyê dadiqurtand û diranên xwe bi ser hev de diqiriçandin. Pehîna çaran, xwe bi nav hinavên wî de kûr berdabû. Qolincan hinav zeft kiribûn, erq dihatênê. Bêhna wî zor derdiket. Hilm bi carekê ve bûbûn ax û keser; ax û keseran mejî xemrevî dikir û Hemo li ser pêyan disekinandin.

Li ser çiyayê omeriyan ewrên ku ji hêla serhedê ve wek latên zinaran perçe bi perçe tên, kom dibin. Piştî ku xwe gêr dikin, hêdî hêdî xwe ji hev vedikişînin û bi ezmên de belav dibin. Ro ji ewran diyar nake. Ezman belek bûye. Mîna ku şevê din baran ne hatibe, ji axê hîç bêhna baranê nayê. Teyrikan ji zû de ser bênderan terk kirine. Ne kewek dixwîne û ne jî çûkek li hewa dilîze. Kevok nafirin. Ji çiyê mij bilind dibe. Sura bayekî sar ji devê newalê dide der, goristana gund dialêse û bi ser gund de dixurbile. Devê newalê mîna devê cenewarekî, bi haweyê ku Zorava dabelihîne ji hev bûye! Gund qerisî û rûsar e; bi tenê ji bixêrîka Cemşîtê şivan dixaneke reş hilor dibe. Xuya dike ku tepikan dişewitînin. Dixan di nav valaya ezmên de zû belav dibe. Zarok mîna pelên daran diricifîn. Belkî jî ev ricif ne ji sermê be. Lêbelê bavên wan ji xwehdanê bûne av. Dayik ji xwêhdanê bûne av. Li kabên xwe dixînin, neperûşkan ji ruyê xwe didin, porê xwe dikişkişînin. Tew hin ji wan, por bi ser xwe de kur dikin. Bi sênga xwe girtine û berzûrî Xwedê dibin.

Heso serê xwe bilind rakir û bi haweyekî ji xwe razî peyivî:



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Komutanê min bibexişîne, ma ez dikarim bi te re hinekî serbest biaxivim?« Komutan ber pê de çû, darê xwe tam di zikê wî rakir, madê ku tirş bû tirştir kir û bi zirt:

»Erê tu dikarî serbest biaxivî!«

Heso êdî mîna şevê din ne ditirsiya. Ji komutên sawa xwe revandibû. Serê xwe bi ser komutan de tewand, ziq li çavên wî nerî û bi herdu destan:

»Tu baş dizanî ku li vî gundî tu mirov qaçaxê nake. Ji bo xatirê Xwedê û pêxember bes e te em helikandin!..«

Ew hîn wilo diaxivî dixwest bibêje, »Em jî ji vî welatî ne, em salyana xwe didin dewletê, em ji dewletê re eskeriyê dikin; me ev welat ji destê kafirên ingilîz û frensiyan xelas kir, bes vê zilmê li me bike!..« komutan xwe ne girt, bi dev û pê û lepan êrîşî ser kir û ew da ber hev. Ji xwe Heso hîn bi kulma pêşî re li erdê veziliyabû. Rîha wî ji qurm de zeft kiribû û serê wî li erdê dixist. Sûcekî mezin kiribû. Bi komutanan re, bedêla xeberdaneke wilo, kuştinbû. Circîs jî bi vê lêdana ku Heso dixwar, kêfa xwe dianî û di bin simbêlan re dikeniya.

Heso cara ku damara wî a mêraniyê digirt, dida nav. Lêbelê ew damar ji sedî sed kin bû, ji ber ku di cih de jî poşmaniya xwe dianî.

»Begê min, begê min gotinek bû û ji devê min reviya; min efû bike, efû efû...« Fêde ne kir. Bîçer piştî ku têra xwe lê xist, got:

»Lawê min esker, zû wê lîsta navan werîne!« û wek qantireke şemûs li dor xwe zîvirî. Ji zîqîniya potîna wî, Sadiq diranên xwe bi ser hev de diqiriçandin.

Emirberê wî Hesen Çawîş, bi lez dosyeke mezin da dest. Bergê dosyê reş bû. Mîna ku dosya kevin bû, qiraxên wê ên çepê hinekî kelpitî bûn. Bîçer nola karmendê hecizê, pel li hev qulipandin û bi qêrîn:

»Ez ê aniha navê we hemiyan bixwînim: Ê li vir 'ez li vir im' bila bibêje! Dengê min tê we pûştino!«

Ji bilî Heso, Circîs û mele Salar hemiyan:

»Dengê te tê me qomandarê min« got û komutên dest bi xwendina navan kir:

»1. Circîs Aslan!«

»Li vir e.«

»2. Ridvan Aslan!«

»Li vir e.«

»3. Hasan Aslan!«

»Li vir e.«

»4. Necîm Aslan!«

»Hihi qomandarrr!«

Ji bêvila Necîm xwîn dihat. Xwe daqûl kiribû û bi herdu destan bêvila xwe zeft kiribû.

Komutan dosye firand ser çavên Circîs, kulmek pê ve zeliqand û mîna marekî teyar ber bi Necîm de herikî:

»Qewad lawê qewadan, tu çawa dikarî wilo bi min re biaxivî!..«

Necîm xwest ku bibêje »Qomandarê min, yaho wilehî min ne ji tiştekî wilo got«, komutan rê neda axavtina wî, xwe metroyekê ji erdê bilind kir û cotikî pehîn avêtin nav şeqên wî. Necîmê şêstsalî sê, çar qulpan di ser hev re qulipî. Bi qulipandina pêşî re çena wî li kevir ket; taximê diranan ji dev pengizîn. Mîna gayê ku xerab ketibe, li ser piştê veziliya û bi dest û pêyan li himber darên wî kêferat kir.

»Temenê xerab nekin! Xweşik bersiva min bidin pûştino!« got û dîsa dest bi xwendina navan kir:

»5. Etman Aslan!«

»Li vir e.«

»6. Cemîl Aslan!«

»Li vir e.«

»7. Halîm Aslan!«

»Li vir e.«

»8. Cidan Aslan!«

»Li vir e.«

Bîçer pelxemek di Cidhan de werkir:

»Ev çi nave?« got û virikî darê xwe avêtê. Darê wî li ser çavê Helîmo ket.

»9. Cemşît Aslan!«

Wî bi dengekî pêt:

»Temamdir Cemşodir qomandar im.«

Bîçer ji cihê ku sekinîbû got:

»Ooohe çêlê« û pê ve qedimî.

Pêşî bi guhê wî girt û firkand. Dûv re kulmek avêt devê wî û dîsa çû di pêşberî Remo de rawestiya. Xwîn ji devê Cemşît herikî. Newêrîbû xwîna xwe paqij bikira.

»10. Bedran Aslan!«

»Li vir e.«

»11. Remo Aslan!«

»Li vir e.«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Circîs bi hêdîka pişta situyê xwe xwirand. Xwe bi ser hev de şidand, xwest ku biaxive, dev ji axavtinê berda û bi lez destê xwe ê rastê avêt kêleka xwe a çepê. Sipiyek girt. Sipiyê xerab dev lê kiribû. Şûna geza wê bi qasî mohrekê fireh, kew vedabû. Xwe dixwirand û di dilê xwe de digot »Mîratê, ma niha wextê vî îşî bû qey!«

»Qomandarê min efû bike; ma ez dikarim tiştekî ji te re bibêjim?«

Bîçer dosye da dest Hesen Çawîş û li pişt Circîs sekinî. Piştî ku bi hejmar pênc dar li termaza wî xistin, ji Hesen Çawîş re »dewam bike« got.

»12. Osman Aslan!«

»Li vir e.«

»13. Ahmet Aslan!«

Ehmed bêhnçikyayî destê xwe bilind kir:

»He he qomandar!« got û serê xwe berda ber xwe.

Bîçer bi bazdan li ber sekinî. Bi herdu milên wî girt û bi qahr kaboka xwe di zikê wî werkir. Ehmet wek çûkekî firiya dera ha û di ser hev re qulopazîbû.

»14. Îbrahim Aslan!«

»Li vir e.«

»15. Celîl Aslan!«

»Li vir e.«

»Rawest e!« Çawîş veciniqî, devê wî ket hev û li komutên nerî. Komutan pêşî serê dêr di devê Circîs de rakir, dar qederê tiliyekê di devê wî de çû. Dûv re jî bi zirt:

»Tu serbest dikarî bibêjî bê te ê çi bigota!«

Circîs di bin çavan re li Heso nerî. Heso mîna ku dizanîbû Circîs wê çi bibêje, xwe avêt wê navê û peyivî:

»Qomandarê min di axuran de heywan helikîn; destûrê bide ku pîrekên me van heywanan derxînin çêrê.«

Komutan xwe çirçirand û xwe çitikî li erdê xist:

»Dîsa tu, dîsa tu ha!« got, şiqamek di Heso werkir û berê xwe dîsa da Circîs. Vê carê jî bêî ku dar têxe devê wî, emir kir:

»Bibêje!«

»Bi rastî min ê jî ew gotin bigota qomandarê min.«

Wî dizanîbû bê ew gotina kê dubare dike. Ji qazî ve:

»Kîjan gotin?«

Heso di çepê Circîs de rawestiyabû. Circîs berê xwe da hêla rastê û bi herdu destan Heso işaret kir:

»Gotina vî zilamî yanî.«

Bîçer bi herdu kêlekên xwe girtin, oxînek kişand û li ezmên nerî.

Ewrên reş û sipî xwe bi ser Zorava de nêzîk berdabûn û digeriyan. Mîna ku ewran bi heyvê re dilîst; geh xwe dadidan ser heyvê heyv dinixumandin geh xwe diavêtên jor, heyv li jêra xwe dihiştin, mirov tê dernedixist ku heyv li jora ewran an ewr li jêra heyvê dimînin.

Bêî ku Circîs bibersivîne:

»Lawê min esker, ji cihê ku tu lê sekinîbû bidomîne« got û ber bi Sadiq de meşiya.

»16. Cimo Aslan!«

»Li vir e.«

»17. Îdrîs Aslan!«

»Li vir e.«

»18. Hesûk Aslan!«

Hesûk di tenişta Sadiq de rawestiyabû. Te digot qey dixwaze tiştekî bibêje, lê mîna zarokekî serşîrî dev nagere. Ziq li Çêwîş dinerî û deng ne dikir. Çawîş du caran navê wî xwend. Sadiq ziqitand Hesûk ku biaxive, lê ew dîsa bi xwe şiyar ne bû. Sadiq ji dêvla wî ve got:

»Hesûk Li vir e« û digel Ehmedê hûrî bi dizî kire piste pist:

»Hevalê we ji desthilanîn ketiye birako.«

»Wilo mebêje Sadiq, Hesûk dîkê neqeba ye«

»Tirtir, erê lo tu rast dibêjî. Di wextekî de dîkekî min î qoqo hebû. Karê wî ji sibehê heta ku dibû êvar, wê li hewşê zelq bikira û piştî ku zelq dikir, îcar hildikişiya ser neqebê û ziq li zelqa xwe dinerî...«

Ehmed bi Sadiq re nikarîbû derxista serî. Bi qerfan himberê Sadiq, Mîrzoyê mitirb û Remo bû. Sadiq û Remo ji tirsa serekmalbatan nikarîbûn digel hev biaxiviyana. Mîrzoyê mitirb jî dûrî wî bû.

Hesûk hîn bi xwe şiyar ne bûbû. Bîçer li ber rawestiya. Xwe li ser lingê rastê zîzikand û heta ku jê hat şiqamek tê firand. Şiqama wî dengê çapiliyekê veda. Barînî bi Hesûk ket û bi ser Sadiq de kumişî. Sadiq ew zeft kir, ne hişt ku bikeve erdê. Bîçer dîsa lê xist, lê vê carê jî bi dar û pehînan.

»Hewarê qomandarê min! Ma sûcê min çi ye, sûcê min!..«

Komutan dizanîbû bê çi dike. Armanca wî lêdan û çavtirsandinî bû. Hesûk, Hesen Çawîş ne bersivandibû. Ji komutên re li hev hatibû. Piştî ku ew baş nermijand:

»Çawîş dewam bike got« û li ber Sadiq sekinî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»19. Sabrî Aslan!«
»Li vir e.«
»20. Fesîh Aslan!«
»Li vir e.«
Bîçer ber bi Fesîh de çû:
»Îcar ev çi nav e qûn! Tu çima vî navê xwe ê qûnekî naguherînî h?!« got û kulmek li defa sênga wî xist. Fesîh serqûnkî ket, bi sênga xwe girt û serê xwe xist erdê. Bêhnekê wilo ma. Dûv re dîsa rabû ser xwe, lê qiloç sekinî.
»21. Haco Aslan!«
»Li vir e.«
Hesen Çawîş tiliya xwe danî ser navê Bozan, li jora gund nerî û bi xar dîsa dest bi xwendinê kir:
»22. Bozan Aslan!«
»Li vir e.«
»23. Esat Aslan!«
»Li vir e.«
»24. Şakîr Asma!«
»Li vir e.«
»25. Ekrem Kaçar!«
»Li vir e.«
Bîçer xwe bi ser hev de guvaşt û qêriya:
»Ulen Kaçar! Bazde bê tu çiqasî xurt e!«
Ekrem fêm ne kir. Li sênga xwe xist û bi tirkiyeke têkil kurdî:
»Yaho wilehî qomandar, ez Ekremdir Ekrem!«
Bîçer bêî ku tiştekî bibêje, darek li hestiyê çîmê wî ê birçî xist û xwe paş de çeng kir. Şemitî. Lêbelê zû bi xwe ve giha, ne ket.
Di vê navê re pîrekên taxa jorîn jî dabûn dû conegayekî sor û xişin. Conega dioriya û di derdora xwe de poş werdikirin. Piştî ku conega poşek li zikê jina Kazimê pizûrî Hilalê xist, berê xwe rast da nav koma eskeran, oriya û bi telebê hat.
»Lawê min nobedar! Wî bikuje!«
Du eskerên bi G3 li ber conegayê Kazim veteqilîn û lê girêdan. Conega bi çar gulan avêtin erdê.
Kazim bi kelûgirî:
»Qomandarê min destûrê bide me, da em wî ser jê bikin; xebînetê bila heram neçe.«
Bîçer xwe li vê gotinê hayî ne kir. Ber bi Heso û Circîs de meşiya, darê

xwe hejand û bi qahr:
»Ev conegayê lawê kîjan teresî bû?«
Circîs devê xwe tije kir ku bibêje »Ez nizanim«, Heso berî wî peyivî:
»Te conegayê min kuşt. Îcar bihêle ku em ser jê bikin...«
Gava ku Heso diaxivî, wî jî serpozka potîna xwe bi hinc li erdê dida. Ji serpozkê pirik bi ser Heso de çeng dibû. Mîna ku Heso virikî bû be, nav şeqan ji pirikê zer dikir.
Bîçer artîskî çû û hat:
»Tereso hîn diaxive jî hi! Ji dêvla ku conegayê xwe ê bêterbiye di êxur de girêbida, tew îcar wî diparêze jî!..« û li ser hev pênc şiqam li şûna hev dan.
Heso ji ber şiqamên wî tewtihî û gêj bû. Her ku wî şiqamek lê dida, ew rimekê çeng dibû. Bi şiqama dawî re serpiştkî li erdê veziliya û bi paş serê xwe girt. Serê wî li qiraxa tahtê ketibû. Serî ne şikestibû, lê bi qasî hesh-esûkekê werimî bû. Kubika werimî di serî de ji dûr ve diyar dikir.
»26. Hamît Tilkî!«
»Li vir e.«
»27. Feremez Kartal!«
»Li vir e.«
»28. Bahyeddîn Kuş!«
»Li vir e.«
»29. Fehmî Tavşan!«
»Li vir e.«
Bîçer herdu destên xwe pev re hildan:
»Hop hop, ev çi qewimî yaho! We vir tij heywan kirin, heywan lawê heywanan!« û xwe bi ser hev de kilkiland.
Hesen Çawîş rawestiya û çavên xwe li ser komê gerandin. Di lîsta wî de navê mamoste û melê gund bi qelema sor hatibû nivîsandin. Gava navên ku bi qelema sor bihatana nivîsandin, wê rabestinên komutên li himber van bi temamî cihê ba. Lê digel ku navê melê bi vî haweyî nivîsandîbû, dîsa jî mele ji gundiyan venediqetand û nola ku di gundiyan de dikir, wilo di wî de jî dikir.
»Komutanê min, ez îmam Salar Yilmaz di nav komê de nabînim.«
Salar ji dera ha bang kir:
»Ez li vir im, Çawîş qomandar!« û bin çengê xwe ê rastê xurand.
Bîçer, xwe wek dîkê elokan nepixand:
»Ooo hezretî îmam, te şaşik avêtiye ev çi mesele ye? Qey te dev ji


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

îmametiyê berdaye?..«

»Na, ez hîn ew îmamê berê me.«

»Baş e naxwe ka şaşik û cubê te?«

»Min şaş û cube avêtin.«

»Çima?«

»Li gundên ser keviya hidûd îmametiya bi şaş û cube gunehkariyê dide mirov.«

»Bêşeref hinekî vekirî biaxive vekirî!»qîr da û darê xwe di devê wî rakir.

»Berî bi du mehan gava te dîsa girtibû ser gund, eger di bîra te de were, te bi xwe bi ser cube û şaşika min de mîztibû. Cube û şaşika ku wê mirov bi ser de bimîzin, ez nikarim bi kar bînim.«

»Qewad, bêhna xwe fireh bike, ez ê niha di devê te de jî bimîzim!«

Mele nefret ji eskeran dikir. Berzanî bi dîn û îmana xwe ne dida. Bi qasî alimtiya xwe ewqasî jî mêr bû. »Herçi tirk û ereb in ne misilman in«, gotina wî bû.

Piştî ku Bîçer çend kulmisk avêtin çena mele, herdu dest bi hev re bilind kirin û Hesen Çawîş dîsa dest bi xwendina navan kir:

»30. Salar Yilmaz!«

»Li vir e.«

»31. Nezîr Gul!«

»Li vir e.«

Bîçer bi guhê Nezîr girt û firkand.

»Bê çi gulek xweşike lawê diya xwe« got û heta ku jê hat şiqamek li ruyê wî xist.

»32. Heso Kaplan!«

»Li vir e.«

»33. Lokman Kaplan!«

»Li vir e«

»34. Bedîrhan Kaplan!«

»Li vir e.«

»35. Temo Kaplan!«

»Li vir e.«

»36. Casim Kaplan!«

»Li vir e.«

»37. Simo Kaplan!«

»Li vir e.«

»38. Sadik Kaplan!«

»Li vir e.«

Bîçer piştî ku ji Hesen Çawîş re got »Bisekine, bisekine!« ji ba Heso bi bazdan hat û di nîvê rêzê de sekinî.

»Madem nav û mavên we piling e, Simo binire bê ka tu çiqasî dişibî piling!«

Simo hema bi gotina wî re, niriya. Bîçer cidiyeta xwe xerab ne kir. Işaret da Hesen Çawîş ku dîsa navan bixwîne.

»39. Halef Kaplan!«

»Li vir e.«

»40. Selîm Kaplan!«

»Li vir e.«

»41. Şehmus Kaplan!«

»Li vir e.«

»42. Hutu (yanî Hûto) Kaplan.«

»Bîr oldî qomandar! (bû yek)«

Hûto li Îzmîr Narliderê sê salan eskerî kiribû. Lêbelê bi tirkî ji »bîr oldî« pê ve tu tiştekî din hîn ne bûbû. Komutanê qerargehê, Hûto li dor pênc mehan xistibû dibistana Ali okulê, lêbelê Hûto dîsa jî fêrî tirkî ne kiribû.

Bîçer bi vî aliyê Hûto dizanîbû. Pêşî beşişî. Dûv re bi hêrs:

»Te çi got, te çi got?«

Bîçer hîn wilo diaxivî Hûto li ser hev:

»Bîr oldî qomandar bîr oldî...«

Komutan ji qelafetê Hûto ditirsiya. Hûto bi rastî jî Hûto bû. Li bavê xwe çûbû. Wek dêwekî mezin bû. Navê bavê wî jî Hûto bû. Komutên ji dûr ve piştî ku tifek tê werkir, »Min pir dewar dîtin, lê yek ji van dewaran jî ne bi qas te bû« got û işaret da Hesen Çawîş.

»43. Kerîm Kaplan!«

»Li vir e.«

»44. Hemo Kaplan!«

»Li vir e.«

»45. Kazim Kaplan!«

»Li vir e.«

»46. Zubeyîr Kaplan!«

Ji tirsan devê Zibêr ket hev û gotin di dev de asê ma. Bîçer ev aliyê wî ferq kir. Li ber rawestiya û bi qewet şiqamek li ruyê wî xist. Zibêr bi şiqama wî re vebû.

»Li vir im begê min« got û çik sekinî.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»47. Mahmût Kaplan!«
»Li vir e.«
»48. Nurî Kaplan!«
»Li vir e.«
Heso ji lêxistina ku xwaribû sergêjî bûbû. Xwe li tena ne digirt. Qeweta kelaxê xwe bi carekê ve berdabû ser gopêl û dilerizî. Li xwe danetanî ku destûra rûniştinê ji komutên bistîne. Pê ne diket; çimkî dijminê wî Circîs ev yeka ha wê wek qelsiyekê bidîta. Heso bêhemdî xwe ji hindam de li ser qûnê ket. Xwest ku rabe, lê nikarîbû.
»Ew çi ye Heso efendî? Ma te emir ji min xwest ku tu rûdine, ha!..«
Heso bi serê lêvan:
»Ez westiyam qomandar beg...«
Di aliyê rohilatî bêndera jêra gund de berqef hebûn. Eskeran êşkenceya herî giran di bin van berqefan de li gundiyan dikirin. Bîçer, Heso ji komê veqetand. Nikarîbû bimeşiya. Eskerekî zendên wî bi qayişê şidand, bi dû xwe de kişkişand û ber bi berqefan de bir.
»49. Ramazan Kurt!«
»Li vir e.«
»50. Mesut Kisa!«
»Li vir e.«
»51. Kasim Yaman!«
»Li vir e.«
»52. Mihyeddîn Serçe!«
»Li vir e.«
»53. Sîrac Kara!«
»Li vir e.«
»54. Mîrzo Aydin!«
»Li vir e.«
»55. Kener Acar!«
»Li vir e.«
»56. Alî Yaman!«
»Li vir e.«
»57. Seyithan Geyik!«
»Li vir e.«
Gundê Zorava bi zarok û jinan hinekî qelebalix bû. Bi giştî li vî gundî zewac ji sêzdeh û çardehan dest pê dikir. Ji derveyî xortên ku li bajêr dixwendin, ji nexwenda mirovên azib tune bûn. Di her malê de, bi kê-

manî çar, pênc zarok hebûn. Di lîsta komutanê hidûd de ji zarokên di pêçekê de bigirin heta ku digiha kalên sedsalî, navê herkesî hebû. Ji bilî van wekî din di gun de çend pez, ker, qantir, bergîl û dewar hebûn li ba wî nivîsîbûn. Di çiyê de çend kunên keftar û roviyan, şikeft û berqef hebûn; bi hemiyan dizanîbû. Her meh başçawîşê Sitilîlê di derheqê hejmara sewêl û zarokên nûçêbûyî de ji muxtarê gund agahdarî distend.

»Hejmar temam e! Esker bi vir de were!«

Circîs di bin boqê simbêlan re keniya û di dilê xwe de got:

»Wey mala Xwedê hezar carî ava ku doh ez li Nisêbînê nemam. Xwedê ez ji beleyek mezin filitandim! Baş e, min ê îro çi xwelî li serê xwe kiriba! Min ê çawa ew qanih kiriba ku şevê din min li hidûd ne xistiye, ez li Nisêbînê mêvanê Qalûndirêj bûm? Ya rebî bêlome be! Ez ê mûlidekê bikim setqe; ez ê bizina kol ser jê bikim...«

Esker ber bi gundiyan de hatin, darê xwe hejandin û awir di wan firandin. Tevzînok bi laşê gundiyan ve hildikişiyan; ji tirsa ku bêhneke din wê afatiyeke çawa mezin bi serê wan de bê, hemû ketibûn tayê. Ji Hemoyê pizûrî dilopên mîzê dihatin xwar. Îdrîs leganeke nîsk xwaribû. Zikê wî nepixîbû; xwe bi ser hev de diguvaşt da ku ba ji ber neçe. Temo lêva xwe dicût. Sadiq ketibû xeyal û gumanan. Şensê wî hebû ku Bîçer xwe ji bîr kir û lê ne xistibû. Devê Sadiq ê ji hev, devê şikefteke kufarî di bîra mirov de dianî. Mirov ji ruyê wî ditirsiya. Bedranê ku şêwirdarê Circîs bû û bendayetî digerand, mîna qîrê reş xeriqî bû. Te bi serê bêvilê bigirta wê biketa. Kabokên Hesûk fisiyabûn; bi zor xwe li ser pêyan radigirt. Mele Salar tehemûl ne dikir ku li eskeran temaşe bikira; serê xwe berdabû erdê û bêyefş diran diqiriçandin.

»Nîzama lêdanê bigirin qahpino!«

Gundiyan dizanîbû ku pêşî wê ji kîjan babetî lêdanê dest pê bibe. Hemiyan bi hev re herdu destên xwe dirêj kirin. Esker ji hindama xwe de rabûn ser lingekî, dar bilind kirin û bi hêl li destên wan dan. Reqîna daran li ser Zorava mîna şerê koçanîkên benpaç dilîland û deng vedidan. Xuya bû ku pir ji wan bi kîn bûn. Kîna wan di dev û çavên wan re dabû der. Bi lêdana dêr re ditengijîn; çavên wan ji xwînê tije bûbûn û kef bi devê wan ketibû. Mîna motorê ku bixebite û hîn dewra xwe ne sitendibe, her ku darek li wan dixistin, qeweta xwe ji darê ku bi dû darê din de dihat digirtin. Ji bilî Circîs, Temo, Sadiq û Salar hemiyan qîr didan. Dest û zendên Circîs yekser reş û şîn bûbûn. Zendên wî xwe li hewa ranedigirtin. Dest û zendên Salar mîna du rêsiyan pê ve daliqiyayî mabûn.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Lêbelê digel vî haweyî dîsa jî kipîn ne diketê.

Bîçer got:

»Esker rawest e!«

Helke helk bi eskeran ketibû. Mîna hespê ku tu bibezînî û tu nikaribî serî ragire, hin eskeran digel ku komutan emirê rawestinê dabû, dîsa jî darê xwe ketûber di derdora xwe de werdikirin. Piraniya gundiyan ji ber derbên darên wan, destên xwe xistibûn nav şeqên xwe û li erdê bi ser hev de diqulipîn. Îdrîs li erdê tot ketibû. Hesen Çawîş serpozka potîna xwe xistibû devê wî û digot:

»Gotina ku te berî niha ji min re gotibû bi deng bibêje kûçik!«

»Min ji te re çi gotibû?«

»Bêşeref xwe xazî neke! Te ne got ku Hemo Kaplan bi vê bûyera şevê din agahdar e!«

»Wilehî min ji te re tiştekî wilo ne gotiye...«

Pîrekên gund li taxa jor û navê li hev kom bûbûn. Li kabên xwe dixistin û porê xwe dikişandin. Sarê jî hilkişiyabû ser xênî, lingên xwe li erdê dixistin, bi erdê re pevdiçinî û li eskeran geft li ser geftê dixwar.

»Esker hûn amade ne!«

»Em amade ne komutanê min!«

Gundî yek li pişt yekî sekinandin. Li her gundiyekî eskerek siwar bû û ber bi jora gund de meşiyan. Circîs di pêşiya karwên de bû.

»Lawê min esker, ka binere bê ew pîrek çi dixwaze?«

Ê esker bi bazdan çû û li ber Sarê rawestiya:

»Xwe ji ser conega bide alî, biceheme tu li vir çi dikî!«

Hejek di destê Sarê de bû. Ji bîr kiribû ku darê xwe ê benkan bîne. Hejê xwe bi ser ê esker de hejand û bi hêrs:

»Ev hûn kafir in, hûn misilman in hûn çi teba ne? We conega kuşt, îcar bihêlin ku em ser jê bikin...«

Heso ji tirsa ku Sarê winda neke û Circîs jî ji tirsa ku komutan derbekê li wî nexîne, hindik mabû zimanê xwe daqurtînin. Sarê jina Heso û xweha Circîs bû. Dikarîbû bûba sebebê kuştina wan. Bîçer helwesta Sarê fêm kiribû. Karwan sekinand û ber bi Sarê de meşiya.

»Dêlika heram zû here mala xwe! Binere ez ê te biçirînim ha!« got û bi hinc pehînek li zikê wê xist. Sarê serpiştkî ket û bi lez rabû ser xwe. Piştî ku bi kîn tifa xwe tê werkir:

»Lawo, wileh tu ne tu zilam î, lê ez çi bikim! Hema ez kîrê te têxim dê û jina van hemiyan û hew!«

Berê xwe da tara jor û çû. Çend gavekî çû ne çû, li paş xwe zîvirî û dîsa bi hêrs got:

»Hûn ji hev re xurt in şêrgeleno! Îcar qey bi rastî jî Xwedê ne li ser heqiyê ye, gerek ez zilam û hûn jî pîrek çêkiribana...«

Bîçer demaçe lê kişand. Heso bi qêrîn »Na na!..« got û wek teyrekî firiya ber. Xwe xist devê demaça wî û situyê xwe li ber tewand.

»Min bikuje, wê nekuje. Pîrekeke dîn e. Her meh em wê dibin Xerpêtê ser textorê dînan. Ez xulamê te bim wê nekuje...«

Sarê jî sênga xwe ji demaça wî re vekiribû û diqêriya:

»Eger tu min nekujî ez keran berdim ser jina te! De bikuje! Bikuje, belkî ev bêşerefên han hinekî cesaretê ji min bigirin! Bikuje!..«

Gotinên Heso û kefa ku bi devê Sarê ketibû, Bîçer nerm kir. Bawerî pê anî ku bi rastî jî Sarê dîn e. Pîrek, zilam, zarok tu kesî nikarîbû bêemiriyeke wilo li himber komutanan bikira. Li Zivingê sê sal berê, pîra Kesûma bi destê komutanê hidûd Ali Uçuran hatibû kuştin. Ew jî jinek wek Sarê bi mêranî bû. Li himber êşkenceya Uçuran derdikeve û Uçuran jî di nav koma gundiyan de cercûr lê vala dike. Li gor wan, Sarê bi wê serhildana xwe, kuştin heq kiribû. Eger Bîçer ji zimanê wê fêm kiriba, dîn ba jî dikarîbû bikuşta. Çimkî komutanê tabûra Nisêbînê jî dînek kuştibû. Şeva ku Hinanoyê dîn li sûka Nisêbînê şevder dimîne, ew û komutan pêrgî hev tên û bi tirkî jê re dibêje »Tu komutan bî, ez jî başkomutan im. De here bi rêya xwe de!« Komutan jî cercûrê demaça xwe di serê wî de vala dike.

Mehmet Fatîh, li Circîs siwar hatibû. Fatîh mîna bertelaşekî dirêj û ewqasî jî xişin bû. Circîs jî mirovekî kin bû. Eger Circîs ne ji lêdana ku xwaribû û dest û zendên wî ji taqet ne ketibana, bi wê yextiyariya xwe dîsa jî belkî bikarîba rahişta Fatîh. Lêbelê ne Fatîh û ne jî komutanê wî, ne dixwest li êşa ku canê Circîs bi carekê ve zeft kiribû, hayî bibin. Hemiyan jî yextiyariya wî ne didît. Circîs kumişîbû erdê û qûn belot kiribû. Fatîh jî li ser pişta wî rûniştibû û mîna ku biziqitîne kerê bi darê xwe ew diziqitand. Circîs hêl dida xwe ku rabe, lê kelax bi a wî ne dikir. Lingên xwe ber bi xwe de dikişandin, xwe dida ser hev û ji nişkê ve teqil dida xwe; kabok difisiyan û dîsa deverû dikişiya erdê.

»Îmam tiro! Ma gelo, li ser pira selatê mirov li keran an li çêlekan siwar tê?«

Salar ji wahca nava xwe xwîn digiriya. Belkî ji herkesî bêtir wî lêdan xwaribû; lê ji herkesî bêtir dîsa jî wî zeximtir xuya dikir. Di bin Ali Resulê



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

heyştê û du kîlo de, mîna ku hîç lêdan ne xwaribû, rehet dimeşiya.

»Hezretî îmam, ez bi te re diaxivim qeşmer! Ma qey deng nayê te!..«

Salar di dilê xwe de got, »Kuro eger ez xwe û te herduyan nexînim, bila ez ji te bêşereftir bim lo.« Û bêhnikek ne ket wê navê, xwe bi ser tenişta çepê de avêt erdê. Resûl bi xwe re ne giha ku destan ji xwe re bike mertal; da ku serê wî li erdê nekeve. Baş bû ku eniya wî ne li ser cihekî bi zixur an li tahtekê ne ketibû. Lêbelê çepilê Salar ê çepê bi ser hev de ecinîbû. Çepil di bin ê esker de mabû. Bazinê destê wî hinekî werimî. Ali Resul piştî ku çend pehîn bi der qûna mele werkirin, »Gapîr pêwîst nake tu xwe bixînî, ez dev ji te bernadim« got û xwest ku dîsa li Salar siwar bê.

Salar ling nedan ber xwe. Ali Resul jî bi çepilê wî ê ku ecinîbû girt û bi dû xwe de kişkişand.

»Esker peya bibin!«

Eskerên Bîçer, heta bi ber deriyê hewşa Celîl li gundiyan siwar bûbûn. Navbera cihê ku esker li wan siwar hatibûn û qesira Celîl li dor du sed metrî bû. Gundiyan di halekî ne xweş de xwe gihandibûn vê derê. Gelek ji wan mîna Salar û Circîs ji taqet ketibûn; û eskeran jî herwiha ew bi dû xwe de xircilandibûn. Ji dev û ruyê gelekan xwîn diherikî. Şerwal û qutikên gelekan ji wan, ji vecircirandinê qetiyabûn.

Esker li hêlekê û gundî li hêlekê, dîsa yek kete pey yekî û sef girtin. Circîs jî li wê navê hîn rûniştîbû û bi doxîna şerwalê xwe daketibû. Doxîn qetiyabû. Bîçer ji cihê ku sekinîbû bi kubarî got:

»Circîs efendî, pêwîst nake tu şerwêl gêrêdî; hema bêhneke din ji xwe em ê şerwêl ji we hemiyan bikin. Rabe ser xwe!« û bi aliyê berqefên rohilatî gund de meşiya. Pênc, şeş gavan ne çû, li xwe zîvirî:

»Bila mirovên bejindirêj li ên bejinkin siwar bibin« û bilez dîsa meşiya.

Hesen Çawîş di ber xwe de keniya. Ji nav komê, bi çepilê Hûto girt û li ber Circîs sekinand. Di herêmê de jî mîna Hûtoyê pizûrî girs û dirêj bi tenê Hidigdigê xirbêqeplî hebû. Ev mirov tam du metro û panzdeh santîman dirêj bû. Li gor bejina xwe baş xişin jî bû. Pir xure bû. Ji bilî dema gêra bênderan, her tim birçî bû. Lingên wî çil û neh santîm bûn. Xwas digeriya. Nenûkên xwe bi kelbetên dibirîn. Herxên di binê lingên wî de mîna devê zîhên maran ji serhevçûyî, bêbinî diyar dikirin. Goşt li ser goştê qusyayî qatqatî bûbû. Qiraxên herxan wek sûstên patozê tûj dibirîn. Ji lingên wî mirov xof digirt! Di wextê bênderan de pizûriyên halxweş, nîskên xwe bi Hûto gêre dikirin. Gundiyan ew wek qirdikekî xwe didîtin. Hûto wek sînema bêpere bû. Di kêlîkên gêrê de piçûk -

mezin temamê pizûriyan derdiketin temaşa wî. Hûto heqkarê xwe pere ne distendin. Xwediyê bênderê jê re bizinek digel serî û pê, hûr û roviyan li ser teşteke girar dikir û li ber datanî. Wî jî piştî ku ev xwarin hemû dixwar, eyarek li nav şeqên xwe digerand û dirêjî nav loda sapê nîskan dibû. Di nav sêp de geh bazdida gah xwe li erdê dixist û geh jî xwe dixijiqand. Dema ku Mîrzoyê mitirb di vê rewşê de jê re li ribabê dixist, wî sapê elbeke nîsk di hikmê sê, çar seetan de hûr dikir.

Hûto ji Circîs bêtir dixwest li muxtar siwar bihata. Ji muxtêr dihenitand. Lêbelê di vê siwarhatina niha de, Circîs ba dîsa jî xem ne dikir. Çimkî Circîs mezinê muxtêr bû. Muxtêr li ser gotina Circîs ew teslîmî eskeran kiribû ku eskeriyê bike. Xwe bi ser de daqûl kir ku lê siwar bê, Circîs pêş de pengizî; li derdora xwe nerî û di dilê xwe de got:

»Gelo ne şerm e ku di nav vêqas alemê de ez rahijim vî tewtewê ha? Qaşo ez mezinê malbatekê me. Di bin emirê min de çil, pêncî mêrên bi tiving hene. Eger gava ez bixwazim, bi van mêran dikarim van eskeran tevan bidim kuştin. Ez mirovekî kal û misilman im, ez ê çawa rahijim vî zir fasiqî! Ooh tu jî lo, ev çi aqilê xerabe ye! Ez mirovekî xuyayî me, ez misilman im ew fasiq e, ez nizanim çi me ew nizanim çi ye, ev çi fikarên beredayî ne! Ma qey tu ji dewletê mezintir î lawo? Bi dû Xwedê dewlet tê. Dewlet vê yekê bi te dike, ehmeq. Ne şerm e, rahijê. Eger tu ranehijê ji xwe wê gavê şerm e. Ha tew yeke din, gava ez ranehijim vî minafiqî, Bîçer dikare bibe hevalê Heso...« û bi hêrs ket bin Hûto û ber bi berqefan de tewtihî.

Circîs bi selametî barê xwe gihand qonaxê. Lêbelê karwan hîn jî dimeşiya.

Gundî di bin berqefan de tena derpî tazî kirin. Di bêhnika tazîkirinê de tev li Salar, kesî li ber xwe neda. Eskeran mîna ku hemû bi dê û bav nas dikirin û bi salan digel wan jiya bûn, bêî ku ji wan re bibêjin, »Dijmin û dijmin werin kêleka hev«, wan bi xwe mirovên dijmin û dijmin anîn kêleka hev û dudu dudu di ber hev re vezilandin. Dûv re eskerekî telîsek qayiş anîn û li dera ha vala kirin. Qayiş hemû sixtiyan û mîna qûşa kerê qalind, pan û dirêj bûn. Bîçer li pêpîkê xist. Esker hemû ketin temenê. Û wî dest bi axavtinê kir:

»Ev bêşeref tu carî nikarin gotina bi rastî ji mirov re bibêjin. Ji ber ku jiyana wan li ser fitne û fesadiyê ava bûye. Qaçaxiyê dikin. Têkiliyên wan bi temamê qaçaxçiyên Tirkiyê re hene. Heta ez dikarim bibêjim mafiya ku îro li Tirkiyê pêtî daye, hemû bi qeweta teresên vê herêmê ye! Dijminê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dewletê ne. Bi dewleta Sûriyê re peyman danîne ku dewleta me birûxînin. Dewleta Sûrî mêl bi nîvheqekî dide wan. Helbet gava çixara Yeni Harman bi wereqe û ribekê be û çixara malboro jî bi vî heqî be, wê milet çixara malboro bikişîne. Ji Sûrî qumêş tînin, basme, cil û caw, pelên şamî, çayê, morîkan û heta bi tiştên xwarinê tînin! Armanca wan ku di warê aborî de dewletê qels bixînin. Dijminê milet û dewletê ne ev!..«

Gotinên wî bi gundiyan xerîb ne dihatin. Ji ber ku li her derê ev gotin dikirin. Heso xwe ne girt, li qûn rûnişt û bi herdu destan:

»Begê min wilehî tu şaş î yaho! Kesek ji me tu qaçaxê nake. Em ne dijminê dewletê ne. Bav û kalên me li ser vê dewletê xwe dan kuştin. Kalikê min di dema osmaniyan de tam şeş salan eskerî kir. Bavê min li dor çar salan eskerî kir û di şerê ku Atatirk bi ingilîz û frensiyan re kiribû birîndar ket. Bavê min bi yûnaniyan re şer kir, begê min.«

Heso dê gotin anîba ser raperînên kurd ku bav û bapîrên wî li himber van raperînan jî çawa şer kiribû, lê Bîçer êrîşî ser kir. Bi hinc darek li nav piştê xist.

»Gapîr gotinê bibire!..«

Heso mîna çûkê ku teyr di ser re here, defa sênga xwe xist erdê, serê xwe bi jor de rakir û ziq li ruyê wî temaşe kir. Bîçer piştî ku bi serpozka potîna xwe ruyê wî ji ser xwe guhert, pelxemek di Circîs werkir, dûv re hinekî ji wan dûr ket û qêriya:

»Circîs, tu û Heso werin vir!« Herdu li ber sekinîn.

»Circîs, wê dêlika ku berî niha êrîşî min kir xweha te ye, ne wilo?«

»Erê begê min, xweha min e û jina Heso ye.«

Bîçer demaçe ji qewlik kişand, fîşek ajot ber û devê wê xist cênîka Heso. Dûv re bi lingê xwe hinek pîsiya hişk işaret kir:

»Bixwin bêşerefino!«

Heso ponijî û kuştina Sarê anî ber çavên xwe. »Bi telaq ez ji mirina xwe natirsim, ez dikarim nexwim, bila min bikuje. Lê îcar ku min nekuje û Sarê bikuje ez ê çawa bikim!«

Gava ku ev wilo difikirî, Circîs pişka xwe xwaribû jî. Heso jî xwar.

»Esker, hemiyan têxin felaqê!«

Eskeran lingên mirovên ku di ber hev re vezilandibûn, digel hev di qayişan re derbas kirin. Qayiş şidandin, qûnên wan belot kirin û bi daran daweriqandin wan. Qîr û hewarên wan di felekan re derdiketin. Heso û Circîs pişka hev ketibûn. Lingên herduyan di qayişekê re derbas kiribûn. Ev herdu mirovên kal, ji ber jana ku felaqê dida, ziwa bûbûn. Kef bi de-

vê wan ketibû. Lêbelê wek hevalbendên xwe ne diqêriyan. Di kêlîka felaqê de diyar dikir ku Heso û Circîs çendî ji hev dihenitandin. Herduyan jî hewl dida xwe ku kelaxên wan negihên hev. Heryekî xwe bi aliyekî de qulipandibû, devê xwe xistibûn erdê û dev destên xwe dikirin.

Lêdana felaqê deh, panzdeh deqîqeyan ajotibû. Lingên hemiyan wek hebanê nepixî û qusiya bûn. Tilmiqûnên wan terişî bûn. Derpî ji xwînê şil bûbûn. Eger ev mirovên ha di rewşeke normal de bana, bi wan lingên nepixî û qusyayî wan dê tu carî nikarîbana li ser pêyan rawestiyana. Lêbelê hin ji wan mîna ku ji lingan hîç lêdan ne xwaribûn, li wê navê wek singê golik çikilîbûn. Hesen Çawîş jî, Îdrîs xistibû sintaqê û bi lêdanê ha ha jê re digot, »Zû bibêje! Ma te ji min re ne got ku Hemo qaçaxçiyan nas dike, hayê wî ji vê meseleya şevê din heye!..«

Piştî vê lêdanê li ser emirê komutan, îcar dar xistin destê van ên ku digel hev xistibûn felaqê û ji wan re gotin:

»Bi dorê li hev xînin û her ji çar daran dorê biguherînin!«

Kipkipa dilê Remo bû. Hûto û Remo pişka hev ketibûn. Remo dizanîbû bêhneke din wê Hûto çi afatiyê bi serê wî de bîne. Lê Hûto jî ne wek ku Remo difikirî ewqasî mirovekî ne bîrewer û xeşîm bû. Bi destan ji eskeran re işaret dikir û digot, »Bila dora pêşî a wî be, ez naxwazim lê bidim...« Lê fêde ne dikir. Bi wê bergerê sûcê xwe tew hîn bêtir girantir dikir û lêdan dixwar.

Dar di destê Heso de bû. Dora pêşî dabûn wî. Heso pêşî li ber xwe da. Ne dixwest li Circîs bide û xwe piçûk bixîne. Lê armanca Bîçer jî ji xwe ev bû. Dixwest şexsiyeta wan a ku mabû, wê jî têxe bin lingan. Çimkî mirovê dema ku bêşexsiyet jiyaba, dikarîbû her xerabiyê bike. Bedirxan di felaqê de ling hilda bûn û Haco bi dêr li ber rawestiyabû. Di vê bêhnikê de dixwest erd veqelişe û ew tê de here xwar. Destên xwe danîbûn ser çavên xwe, fedî dikir li Haco bineriya. Haco jî bi qasî wî fedî kiribû; berê xwe jê guhertibû û serê xwe xistibû ber xwe li erdê dinerî.

»Lan Hûto kaç oldu!«

»Bîr oldî qomandar.«

Remo bi hêrs got:

»Kuro te di diya xwe ku...ayo! Çi bîr oldî, çi pênc oldî, çi deh oldî te ez kuştim lawê kerê! Kuro dahbê heram, xwe ji ser min bide alî haho!..«

Hûto bi rastî jî hejmareke bilind dar li binê lingên wî xistibûn. Eskeran bi vê hejmarê dizanîbûn. Lêbelê wan zewq ji lêdana Hûto distend. Dixwestin her tim dora wî be, da ku bibêjin »kaç oldu« û Hûto jî ji wan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

re bibêje »bîr oldî qomandar.«

Temamê gundiyan bi daran li binê lingên hev xistibû. Di kêlîkên lêdanê de jî her eskerî ji hindama xwe de digot, »Ên ku şevê din li hidûd xistin, kî bûn? Hûn wan nas dikin...« Gundiyan jî herwiha bi haweyê »Em nizanin...« bersiv dabûn.

Bîçer bêhawe ji çap ketibû. Mîna dînan xwe ji ser vî diavêt ser ê din, li wan dixist û siqêfên kotî dikirin. Keft û leptên wî ên di kêlîkên nuh de, mirov li kêlîkên derbasbûyî poşman dikir. Kêlîkan bi haweyê meşa gêrikê, kêlîkên zilmê digindirandin. Lê dîsa jî roj ji cihê xwe ne diqeliqî. Bûbû risas. Wan ewqas lêdan xwaribû û hîn jî seet ne bûbû duwanzdehê nîvro.

»Bekçî gû! Dema ku qaçaxçî di bestê re bi jor de hilkişiyan tu çima ne ket kemîna wan, hi?..«

»Qomandarê min ez ne ketim kemîna wan, lê min li wan teqand.«

»Tu çima ne ketî kemîna wan û te çend kes ji wan ne kuştin?«

»Ez hinekî dereng bi wan agahdar bûm.«

Bi berstika wî gird. Xwest ku wî bilind bike, ling biavêje ber û bixîne. Lêbelê Remo bi qama xwe ferqeke mezin lê dikir. Dirêj bû. Nikarîbû ew bilind bikira. Da ber weşan. Remo paşûpê çû, lingên wî di hev de werqilîn û li ser piştê totlanî ket. Bîçer hilkişiya ser sênga wî û xwe kil kir. Remo bi qîr û hewar xwe qulipand ser teniştа rastê. Bîçer kumişî; lê zû bi xwe re giha ne ket erdê. Destên wî hinekî bûbûn bi herî. Eskerekî destmalka xwe dirêjî wî kir. Piştî ku destên xwe ji heriyê pqij kirin, bêdeng sekinî û li herdu destên xwe nerî. Dest li hev qulipandin, hûk kir wan û tilî bi hev firkandin. Kefa destê wî ê çepê hinekî zelhitîbû.

Li gor têgihiştina komutan, Remo bêûsûliyek mezin pê re kiribû. Komutan hildikişe ser sênga wî û ew jî sêngê jê re bernade. Mîna çêlkewê ku sipî ketibin baskên wî, xwe li ber Bîçer pirnisand.

»Qomandarê min bibexişîne, bêhemdî bû. Ji êşa canê xwe bêî ku ez li xwe hakim bibim, min ew hereket kir...«

Bîçer xwe li ser lingekî zîzikand, pelqînî ji ruyê wî anî û qêriya:

»Garaneke qaçaxçî di bestê re dimeşe, temamê gund bi dengê reqîna kevirên ku ji ber simê hespên wan dipekiyan, şiyar dibin û tu bi vê yekê şiyar nabî, ha!«

Remo bi şiqama ku bêhneke berê xwaribû, gêj bûbû û çarmêrkî rûniştibû. Bi temtêleke ku heyvanê mêraniyê li ba nemabe, bi herdu destan serê xwe hişk zeft kir û hilmekê sekinî. Dûv re serê xwe xist nav şe-

qên xwe û bi kelûgirî axivî:

»Qomandarê min, wilehî û bilehî min bi tivinga xwe heta bi qûntara çiyê daye dû wan.«

»Here tivingê, fîşekan û rapora başçawîşê Sitilîlê bîne, ez ê li wan binerim!«

Li gor mercên ku qereqolan ji bekçiyan re danîbûn, bekçî gerek nahtorî li gund kiriba; gund ji diz û eşqiyan biparasta û bûba navbeynhatê muxtêr û başçawîşê Sitilîlê. Bekçî wê têkilî malê qaçaxê û qaçaxçiyan nebûya. Ev kar diket mista esker û polîsan. Komutanan wilo digot. Lêbelê gava ku qaçaxçiyan îcar li hidûd dixistin, bi bekçî re tam berevajî gotin dikirin.

Çermê binê lingên Remo mîna çilmê mîhê nerm û tenik bûbû. Geh bi çarlepikan û geh jî qulûskirî dimeşiya. Bi halekî ne xweş tiving, fîşek û rapora başçawîşê Sitilîlê anî. Çûn û hatina wî a malê li dor neh, deh deqîqeyan girtibû. Lêbelê Bîçer ev yeka ha wek derengiyekê hesiband û çar şiqam pê vekirin.

Ji tarîxa ku rapora fîşekan hatibû nivîsandin û vir ve, qaçaxçiyan li hidûd ne xistibû. Li gor mercên ku qereqolê danîbûn, dema ku bekçî li himberî qaçaxçiyan an di parastina gund de fîşek biteqandana, di a din î rojê de mecbûr bû ku digel şahidekî an du şahidan û muxtêr biçûna nig başçawîşê Sitilîlê, rapor nuh bikira. Rapor qewîn bû. Di raporê de pênc pakêt fîşek nivîsîbûn û Remo jî şeş fîşek berdabûn.

»Ez bi tenê du fîşekên vala dibînim. Te çi kir ji herçar fîşekên din?«

Dîsa li gor mercên komutanan, di bêhnika teqînê de şev ba, bahoz ba çi diba bila biba, bekçî mecbûr bû ku fîşekên xwe ên vala bidana ser hev û fîşek wek delîl şanî başçawîşê qereqola Sitilîlê kiribana. Îcar dema ku bekçî ev yeka ha ne kiriba, başçawîş jî bûyer di derbarê firotina fîşekan de dihesiband; him lê êşkence dikir, him pere jê distendin û him jî ew dixist girtîgehê. Bekçiyê berî Remo Cemîlê hûrî li ser ku çûbû nêçîra betan, sê fîşek berdabûn. Fîşekên vala winda kiribûn û bûyer bi haweyê ku fîşek berdabûn dizan, bi başçawîş re derew kiribû. Başçawîş jî ew dabû girtin. Cemîl neh meh û sê rojan di girtîgeha Nisêbînê de raza bû.

Remo çar fîşek dabûn windakirin.

»Qomandarê min, şev him wek teniyê reş bû û him ji erd û ezmên berf û baran dibariya û him jî min bi bazdan dabû dû wan teqîn dikir. Ji ber van sebeban ez bi xwe re ne giham ku ez fîşekan bidim hev.«

»Bi rastî tu mirovekî tam qewad î. Helbet di wê şeva reş û tarî û bahozî de, nakeve aqilan ku wê mirov bikarîba fîşekên tivinga ingilîzî ku du, sê

metroyan dipengizand, bida ser hev. Yanî niha qaçaxçî ji ber te direviyan ha!«

»Erê erê, qomandarê min. Heta bi qûntara çiyê min da dû wan.«

Bîçer serê xwe ber bi ezmên de rakir, hinekî fikirî. Dûv re berê xwe da muxtêr û got:

»Bedran axa, ma ez ji bekçiyê te bawer bikim? Ma tu bi xwe bawer dikî?«

Muxtar:

»Çiqasî daye dû qaçaxçiyan ez ê wê nizanibim, lê gava ku ez hilkişiyabûm ser xênî û min li teqîna ser hidûd guhdar dikir, Remo jî wê gavê ji jora gund ber bi mala min de dihat.«

Bîçer madê xwe tirş kir û tifek tê werkir.

»Biceheme! Hûn hemû wilo virek in, hûn tu carî gotina rast ji mirov re nabêjin!..«

Ew hîn wilo diaxivî, Remo:

»Qomandarê min, wilehî wilo bû« got, di cih de gotin birî û guhê xwe bi ser dengê têlsiza ku di destê Hesen Çawîş de bû, ker kir. Çawîş têlsiz da dest Bîçer.

»...Ma em wî binin wir?«

»...Mirî ye sax e?«

»...Werînin!«

Dema ku eskeran li ser hidûd diteqand, Remo xwe berdabû bin berqefên ku lê êşkence didîtin. Berê tivinga xwe xistibû erdê û fîşek teqandibûn. Ji bo ku fîşekên wî ê çelpandî jî winda nebin, tiving di çewalê ervên re derbas kiribû. Çewal her tim di ser tivingê re daliqandîbû. Fîşek ji bo careke din ji xwe re hilanîbûn.

Ji eskerên ku li ser bêndera jora gund nahtorî dikir, yekî bang kir.

»Komutanê min, ma em wan berdin an bînin ba we?«

»Erê wan werînin vir!«

Eskeran du mirovên omerî tev li kerên wan girtibûn. Nesroyê hebîsî li ser gotina Heso, digel jina xwe Şemsê çar meşk dims anîbûn ku li Zorava bi pereyan bifroşin. Wê rojê li vî gundî bibin mêvan û di a din î rojê de herin Nisêbînê, ji xwe re hin alavên malê bikirin.

Bîçer mîna dîkê elokan li dor wan sûrikî, ketûber pehîn li Nesro xistin û darê xwe di meşkan rakir. Berî ku Bîçer biaxive Nesro:

»Begê min, barê me dims e dims« got û kete temenê. Şemsê jî destê xwe dabû ber ruyê xwe û bi haweyekî behetî li wan temaşe dikir.

Xelkê herêmê piçûk - mezin, mîna ku pez ji gur bitirse, wilo ji eskeran ditirsiyan. Her roj ya eskerên Sitilîlê ya jî ên hidûd li gundekî çiyê û deşta Nêsêbînê di ser zikê xelkê de bûn; xelk dişelihandin û êşkence li wan dikirin. Gundî ba bajarî ba, gava zarokên xwe dikirin xew û zarok raneketibana ji zarokan re digotin »Lolo emirquto, emirqutê razên, binere wê esker bên we ha!« Zarok jî bêdeng dibûn û radiketin.

Li vê herêmê selahiyeta eskerekî bêrutbe, bi qasî selahiyeta qiralekî ereb, mezin dihat. Dilê wan çawa dixwest wilo dikirin.

Di gulana sala 1950î de eskerekî Sitilîlê bi sirêçkiyan sê şixre kelbeş çinîbûn. Pêncî, şêst mêr xwas derxistibûn ser bênderên jora gund û bi hemiyan gêra sitiriyan kiribû. Gundiyekî gava eskerek li çolê, li ser rê, li ku derê dîtiba bila bidîta, mecbûr bû dev ji karê xwe berda, kar çi diba bila biba, ji vî eskerî re têketa temenê û emirê ku esker bida, pêk bianiya.

Di sala 1968an de çar eskerên qereqola Pîrebokê çil û sê mêrên sarinciyan xistibûn felaqê. Heta di vê felaqê de lingê Eshedê Cino tê şikenandin û seqet dibe. Eskerekî, temamê gundiyan dida dû xwe û gîhayê ber têlên mayinan bi wan diçinî. Ji hindama Darê heta ku digiha Cizîra Botan, her sal di mehên biharê de wek palûtê, gundî sê, çar caran birine gîhaçinînê. Di mehên havînê de jî pûş û pelax bi wan didan hev.

Di 1935–1940î de li Stilîlê wilo merc danîbûn ku gava başçawîşê qereqolê derdiket nav gund, mîna ku darbesta miriyekî di ber mirov re derbas bibe û mirov jî hema wilo yekser rabe ser xwe, çik bisekine û jê re duan bike, gundiyan dev ji karê xwe berdida û jê re diketin temenê. Lê ji ber ku Stilîlê gundekî li dor du hezar malî bû û li vî gundî dezgehên çêkirinê wek nalbendîçitiyê, kurtankirî, darteraşî, sengteraşî û qesirbendiyê hebûn, benê xwe hinekî sist dikin. Qereqol di nav gund de bû. Başçawîş jî heroj pêşenîka xwe şeh dikir û li nav malan digeriya. Kar disekinî û xelkê ji gund bar dikir. Di wan salan de barkirina ji vî gundî, li hesabê komutanan ne dihat. Çimkî Stilîlê dilê omeriyan û bûblaniyan bû. Cihekî rêser bû. Ji bona ku mirov mezinahî li hermê bikira, pêşî divabû mirov şahê Stilîlê ba.

Bîçer çav kir eskeran. Eskerekî bi çepilê Şemsê girt û ew bi nav malan de terqand.

»Tu ji ku derê yî?«

»Ez ji gundê Hebîsê me.«

»Nasnava xwe derxîne ez bibînim!«

Ji roja ku xeta mayinan hatibû danîn li herêmê, bênasnav kesekî ji

gundê xwe nikarîbû bi derekê de biçûya. Gera bênasnav qedexe bû. Heta dema şivan û gavananên li çiyê bênasnav bihatana girtin, sûc bû. Sûc jî ji du sed benqenotî dest pê dikir heta ku digiha hezaran. Mirovê cezexwir eger ji herêma bûblanî û omeriyan ba, diçû ber destê başçawîşê qereqola Sitilîlê. Başçawîş ceze lê dibirî. Lê ên nisêbînî gava li cihekî wek Cibiltînê ku navbera wê û Nisêbînê 15 km bû, bênasnav bihata girtin, li polîsxanê pere radizandin.

»Begê min li qisûrê nenere, min cûzdana xwe li mal ji bîr kiriye. Begê min...« Nesro, »Begê min, begê min...« digot û komutên jî herwiha şiqam li ruyê wî dixistin.

»Tu ê nasnava xwe ji bîr bikî ha! Tu ê bêqanûniyan bikî qewad, ha! Ma tu kitim î!« Nesro miroveki navser bû. Û bi giştî jî navserên vê bireke hineki jibîrkoyî bûn.

»Na. Lêbelê begê min, wilehî û bilehî min ji bîr kir ku ez hilgirim ser xwe.«

»Qaçaxçiyan tu şandin vir; da ku ji aqûbeta hevalê xwe tiştekî fêm bikin, ne wilo?«

Nesro bi vê gotinê cefilî, qûnaqûna du gavan paş de çû. Dûv re xwe berda ser çongan, ji komutên re çû sicûdê û bi kelûgirî:

»Ez ketim bextê te begê min tu ê min nekujî. Ez bi navê Xwedê û pêxember sund dixwim ku hay û bayê min ji tu qaçaxçiyan tune ye...«

Nesro hîn ji serî de ji desthilanîn ketibû. Çar sal berê dîsa barê wî dims e, tê Zorava û bi rê de du eskerên Sitilîlê wî zeft dikin. Esker bila sûc û sebeb dimsê wî bi erdê de dadikin û bi lêdanê parsuyekî wî dişikînin. Ji ber vê hindê ew tu carî di rêyan re ne dimeşiya, li çolbirê dixist û diçû qonaxa xwe. Lê mixabin feleka wî vê carê jî çewt geriyabû. Ew û jina xwe bi mebesta ku leqayî eskeran nebin, ji Hebîsê di çiyê re heta bi Zorava sirt û sirt, kaş û kaş, newal û newal hatibûn. Rêya ku li dor sê seetan digirt, wan li xwe kiribû pênc seet û nîv. Bi halekî zor xwe gihandibûn gund.

Bîçer lingê xwe ê rastê danî ser pişta wî. Destê xwe da ber ruyê xwe û xwe bi ser enîşkê de berda.

»Îro ne roja dan û sitendinê ye. Mirov di rojên wilo seqemî de ji mala xwe dernakeve. Rast ji min re bibêje pûşt!« got û bi dest û pê û lepan ew da ber hev.

Pir pîs lê dixist. Piştî ku ji dev û bêvila wî xwîn beliqî, êdî di navbera herdu keran de, li ser qerevîzkan da rûniştandin û digel eskerên xwe ve herçar meşkên wî ê dimsê dan ber devê qezetoran. Dims bi ser de pijiqî,

têkilî xwînê bû û bi erdê ve herikî. Ew jî mîna şikerekê bêdeng rawestiyabû. Destên xwe danîbûn ser serê xwe, serî daqûl kiribû û xwe bi ser hev de kiribû gilok.

Bi rê de ew û Şemsa xwe ketibûn xeyalan. Belkî ne bi wan xeyalên rengînîbana, di wê qir û şiliyê de wê nikarîba xwe bigihandana gund. Xwe berdabûn nav sûka Nisêbînê û bi dikan dikan geriyabûn. Çûbûn hindurê qijla wêrankirî. Nesro li vir bîst û pênc qurûş dîtibû. Şemsê ji kêfa, çarpîne xwe li erdê dabû û gotibû »Ez ê vê ribê, ji Kesranê xwe re hemî bidim bi qidamên şekirî.« Li ser daxwaziya Şemsê xwe berdabûn ber pira Eleman. Ji bo ku trênê li ser pirê bibînîn, tam çar seetan li wir rawestiyabûn. Şemsê wê ji qîza xwe a pêncsalî re şekirê qulqulkî, ji Beşîrê xwe ê heftsalî re nanê sûkê, ji Gulxana xwe a şanzdehsalî re kirasekî qelemsiltanî bikiriya. Nesro bi ken jê re gotibû, »Şemsê eger tu bixwazî, ez dikarim te bibim liqunta Elîebo. Ê ne keçê tu nizanî bê xwarina vê liquntê çiqasî xweş e! Ji kelizê, ji teyib û neyib jî xweştir e! Heft sal berê, di çarê gulanê de seet li duwanzdehê nîvro ez û Girdoyê Reşê em çûn vê liquntê. Bêî ku em navê xwarinê bizanibin, aşçî ji me re xwarinek anî, ecêb ecêb xweş bû, keçê! Hîn jî tahma wê xwarinê di bin zimanê min de ye!« Şemsê jî piştî ku axînek ji kezebê kişandibû, »Kuro Nesro, em û liqunte ha!« gotibû û gotin qulipandibû ser xarên zindoqî. Berdilkê wê ê piçûk Misto, xar jê xwestibûn.

Bîçer ji Nesro re got:

»Rabe ser xwe qewad!..«

Rabû ser xwe, lê çawa rabû! Pêşî xwe avêt lingên komutên, ling maçî kirin; dûv re hişk bi herdu destên wî girt û bêsekin li ser hev dest maçî kirin. Eger komutên pehînek li qesefa sêngê ne xistiba û ew jî serpiştkî ne ketiba, ji şêla wî dida der ku maçîkirin wê hîn pir bidomanda.

Bîçer berê xwe da koma zilaman û dîsa bi qahr:

»Ev kûçik wê mêvanê kîjan kûçikî ji we ba?« got û qelşa hindurê qûna xwe xurand.

Heso:

»Ew mêvanê min e begê min.«

»Mêvanê te ye ha!« got û ber pê de çeng bû.

Heso xwe li ser pêyan ne digirt, herwiha rûniştîbû. Bîçer lingê xwe xist sênga wî dahf da û ji Nesro re got:

»Vî qûnekî di nav dimsê de bide!«

Nesro bêî ku bifikire bi bazdan hat. Bi çepilê Heso girt û ber bi mextela


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe de kişand. Heso jî di vê navê re mîna ku li mizgeftê be, hertişt ji bîr kiribû, bi hewleke mezin laşê xwe ji pîsiyê û rêxê diparast. Mêrên hûrî bin berqefan wek qedemgehê bi kar dianîn. Navbera mextela Nesro û Heso li dor çil gavekî digirt. Bi rastî Nesro bi haweyekî kotî Heso gêr kir. Eger komutên ne gotiba »Kewaşe, bes e bes e, ma qey çavên te li kuştina wî ye, bi gêrkirina wî a bi lez û bez, belkî Heso bibeheciya jî. Mîna ku terempêl lê bixîne, hewloxwarî û bêdeng li erdê veziliyabû û herwiha zahferan ji dev diherikî.

Dîsa deng bi têlsizê ket. Hîn Bîçer ne axivîbû, hema wilo pê re girîna cemsan ji hêla Menderê bi ser gund de bilind bû. Gundiyan bi carekê ve berê xwe dan wir, ziq li rê nerîn û bêî ku bi xwe agahdar bibin, hêdî hêdî tewiyan. Gava serê cemsan diyar bûn. Ev qerevîzkî rûniştin. Di vê kêlîkê de ji bilî kuştin û malwêrankirinê tiştek ne dihat bîra kesekî ji wan. Herkes ketibû tolaqa canê xwe. Di dilê wan re, »Vê carê dora kê ji me ye?« derbas dibû. Ji çavên Sebriyê hûrî hêsir digindirîn. Zibêr berî wî giriyabû û bi serikên lêvan gotibû:

»Wey xwelî li serê min be, bi bîst û pênc qurûşan kulmek benîşt dihat. Zarok ewqasî bi dû min de giriyan ku ji Nisêbînê çend cûm benîşt ji wan re bikirim. Lê ji ber vê xesîsiya xwe a mirdalî, ne min cûmek benîşt û ne jî çend şekirên qursikî kirîn...«

Salar di ber xwe de ditewirand:

»Ev teres, îro wê hinekan ji me bikujin. Îcar ev hin xwezîka Heso ya jî Circîs ba...« Lê fikirên Circîs û Heso jî eynî mîna ên Salar bûn. Wan jî ji hev re fala kuştinê vedikir û gorên hev dikolan.

»Gava Heso bikujin, wê malbat bêserî bimîne. Di malbatê de ên ku şûna wî dagirin tune ne. Û wê demê jî gund wê bi min bimîne, çawa bixwazim ez ê wilo bikim...«

Heso jî zahferana ku berî niha avêtibû ji bîr kiribû, dims û demûşa bi laşê xwe ve ne didît û digot:

»Xwezîka Circîs kuştiba û di bedêla vê kuştinê de jî bila herdu lingên min heta bi gwîzekê jê kiribana!«

Panzêrek û cemsek li jora berqefan sekinîn. Cemseke din jî qederê kîlo metroyekê hîn ji wan dûr bû. Mirov digot qey şifêrê wê li deverekê awiqîbû, bi hesabê ku hema di cih de bigiha wan, xurt diajot. Ji nav tekerên terempêlê ên dawiyê mîna ava xortûma agirvemirînê herî dipijiqî; herî bi hewa de bilind dibû, wek dolaba êş li hev diziviri û bi lez dihat xwarê. Panzêr li pêşiya cemsê hinekî dûr sekinî. Ji heriya bi derdora panzêrê ve

mirov tê derdixist ku panzêr, li gelek gundên herêmê geriyaye. Eskeran xwe berî teymen ji cemsê avêtin. Li wê navê rêz girtin û ketin temenê. Teymen bi avêtina ku xwe ji terempêlê avêt, bi yek tûşê hat nig Bîçer. Bîçer jî, bi giraniya temamê kelaxê xwe û bi qahr got:

»Bênamûs lawê bênamûsan! Min di dê û jina te ku...o, te bi çi cesaretê ew lawê qahpikê xistiye wê terempêlê, hi!..« û bi şiqaman dabelişî ser.

»Lêbelê komutanê min, komutanê min...«

»Zû zû, wî termî bi dawiya panzêrê ve girêdin û li van herdu, sê gundan bigerînin!« Bi destê xwe Menderê, Sirêçkê û Sarincê işaret dikir. Di vê navê re jî kûçikên ku li nav rez girêdayîbûn, mîna ku ji halê xwe of kiribin, hemû bi hev re bêyefş direyan. Bîçer bi pêxêla xwe girt çirand û qîj da:

»Aaaax! eskerrr! Çend dest fîşek di ser wan kûçikan re berdin, ez teqiyam! Ez çiriyam! Hiii! Ooff!«

Çar eskeran digel hev berê G3ên xwe bi rajorî gund vekirin û li ser rez girêdan. Eskeran bîst û heft gule bi ser kûçikan de barandin, lê qet tu tesîr ne kir. Bi vê teqînê re kermkerm bi kûçikan ket, hin kûçik zûriyan û hin jê jî bi haweyê ku êrîşî ser mirov bikin reyan.

»Serokê kûçikan dahbe Hûtooo! Bi lez û bez here wan kûçikan haş bike!« komutan got, zikê xwe bel kir û kulîmeka xwe a çepê xurand. Piştî ku çîmên xwe ji hev vekirin, hinekî xwe bi ser kabokan de tewand û bi nav şeqan lîst, dîsa got:

»Esker, çend dest fîşekên din berdin wan! Min di gilika vî gundî ku...ayo!« û li meşa Hûto temaşe kir.

Eskeran mîna ku komutanê wan dixwaze Hûto bireve û ew jî ji vê reva wî zewqê bistîne, di ser serê Hûto re gule firandin. Bi dengê teqînê re pêl li Hûto ket, qîr li ser qîrê da û wek babîsokê çû. Çû lê çawa çû! Berê xwe da rohilat, li nav avzêla erdê nêzîkî gund xist û ber bi gundê Dêrê de reviya. Komutan jî ji kenan lal bûbû. Li kabên xwe dixist û bi hîre hîr digot:

»Ji xwe re li qevzên wî binerin aman ya rebî! Tu dibêjî qey qedenek bazdide!..«

Bi rastî jî qevzên ku wî diavêtin, mirov bi hêsanî dikarîbû bi qevzên hespekî kihêl qiyas bikira. Ezmên di nav şeqên wî re xuya dikir. Gava dabû nav avzêlê û bazdida, ji av û heriya ku bi dû xwe de rakiribû, teba bû, insan bû çi direviya mirov tê dernedixist.

Peşkên baranê tên. Ewrên reş û tarî çiya rapêçane, beledî vedidin. Ji ewran çiya reş vedaye. Gire gira tavan tirs û sawêrê dide. Şewq ji ezmên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

diçe, birûsk li tahtan dikeve agir ji tahtan bilind dibe. Û Zarok jî qîjan didin. Ew difikirin ku ev dengê çapiliyên eskeran e û bi bavê wan de diteqînin. Aha bêhneke din wê ev »Çapilî bi min de jî biteqe, hewarê yadê!«

Gundî hemû behetî ne! Ziq li termê ku bêhnika din eskeran ji terempêlê avêtibûn erdê, temaşe dikin. Term digel ku bi derbên qezetoran hatibû terişandin, dîsa jî ewqasî ne bi xwîn e. Zikê wî ne qelaştine, lê serê wî bi carekê ve pelixandine. Herdu kortikên çavên wî hatine xerimandin, guh û bêvil û sitir û gunên wî jê kirine. Eger ne ji şana ruyê Hisoyê licî ba, mirov wê nizanîba ku ev termê wî ye.

Hiso li hindama goristana Zorava ji serma ta girtibû, dirikrikî. Wek hevalên xwe hemiyan ew jî li ser bêr siwar hatibû. Ji goristanê hinekî bi jor de li texma Kunheftarê piştî ku dibêje »Ez diqefilim, ez nema xwe li xwe digirim«, çend deqîqe nakevin wê navê, bi ser bêr de dikumişe û nema deng jê tê. Xalûqê qubalî bi benekî naylonî ew li ser hespê girêdabû. Qapûtê xwe bi ser dadike û bi lez berê xwe didin şikeftên dorhêla Qûzo û Gurik. Xwe ji ser bestê dadigerînin, li çolbirê dixînin û didin sirtê. Dema ku karwan digihê şewlên dor gund, Hiso bêî ku kêferatê bike, hinekî dilebite. Karwan li ser daxawaziya Xalûq, Hiso li şikefteke Zivinga bi tû, datînin. Şikeft pir mezin bû. Gurikiyan di demên berê de, li dor pênc sed pezî di vê şikeftê de bi cih dikirin. Şikeft ne paqij bû, lê germ bû. Dilopan, zibilê salan bi ser hev de dewisandibû, kiribû dirg. Û karwên jî li ser van dirgan ji Hiso re agir kiribû. Hiso bi pîvana pênc gavên Xalûq ji êgir dûr vedizilînin. Piştî ku barê hespê wî datînin, hespê girênadin, hesp û bêr û Hiso di wê rewşê de dihêlin û bi lez ber bi Qubala de dimeşin. Lê mixabin karwan hîn du mişar rê navêje, Hisoyê bêkes û kûs di bin giraniya reşaya şevê de can dide.

Îcar eger ne ji hespê Hiso ba, belkî esker danegeriyana vê şikeftê û ew ecêba mezin bi vî termê ku reş û şîn vedaye, ne hatiba! Hespê, xwediyê xwe dabû dest. Eskeran hesp ji dûr ve dîtibûn û rasterê xwe lê girtibûn. Hesp ji ber wan ne reviyabû. Qefilek esker gava term kişandibûn ser tahtê û bi keviran serî dipelixandin, qefila din jî hesp dabû ber devê qezetoran.

Term li ser piştê bêsitar, şilfîtazî li wê navê avêtiye. Hiso hinekî dirêj û zehîf xuya dike. Sênga wî mîna ku tu postê karekî bigirî ser, hemû bi pirç e. Ji pirça wî a wek qîrê reş, mirov tê derdixîne ku Hiso hîn ciwan e. Sih sal derbas ne kiriye. Sê, çar qezetore li kortika qirikê xistine, zengelork di bin çenê de xwe daye ser hev, mîna hincasekê bel bûye. Herdu ferşên çon-

gan ji çerm bûne, ferş zere xuya dikin. Di şûna hev de belkî çil qezetore li kêleka wî a çepê dane. Devê birînan fireh vebûne. Bi rastî kambaxî berdane laşê wî, tu nikarî nas bikî bê kî ye ev ê ku termê wî kirine sembola qebhetê.

Bîçer piştî ku erza teymen, li ser ku çima term bi pey terempêlê ve girênedabû û term ji dehma Gurik heta Zorava bi erdê re ne xirxirandibû, şikenand. Pêşî xwest ku hema yekser term bi dû terempêlê ve girêde û li nav gund bigerîne. Lêbelê dûv re gotin guhert, »Wî wilo bihêlin!« got û bi aliyê term de meşiya. Lingê xwe ê rastê li ser defê sênga Hiso gerand û bi serpozka potînê birînên wî tev dan. Serpozk hinekî bi xwîn bû. Wî potîn di erdê da. Dûv re pê li sêngê kir, destekî xwe li ser kabê û ê din jî di kêlekê de danî. Qeweta kelaxê xwe hemû berda ser û qêriya:

»Pêzevengino bibin rêz! Yek bi yek werin li vî lawê qahpê binerin bê kî ye?«

Mele Salar ji cihê xwe qevizî, Sadiq da dû. Mele li ber term sekinî. Bîçer li çavên mele nerî.

»Wek ku çavên te şil xuya dikin, tu digirî ha! Qey tu dixwazî ez wek wî li te jî bikim!« got û heta jê hat kulmek avête devê wî.

Mele teqlekê bi ser hev de qulipî. Lêbelê li yek tuşê jî rabû ser xwe û bi dengekî melûl:

»Begê min, wilehilezîm ez vî mirovî nas nakim.«

»Lawê bênamûsan, te lê temaşe ne kir heta ku tu wî nas bikî! Li nav şeqên wî binere, belkî ji sitir û gunan tu wî nas bikî!..«

Gotinên wî dilê Salar perçe kiribû. Difikirî.

»Ma li himber vî zalimî ez dikarim çi bikim ya rebî! Ji vî mexlûqê ku termê miriyekî tîş tîş kiriye, ez ê çi bibêjim ax hewar! Ey xwedayê mezin, te ev ebdê xwe ê jar û hejar, ji bo ku çar qurûş pere qezenc bikira û kufletê xwe bi salê xista, qerisandiye û tu bi destê ebdekî xwe î din toran tê de dikî! Eger te qaçax bi vî ebdî şêrîn ne kiriba, ev ibret jî ne dihat serê wî! Îcar hinekî rehmê biavêje dilê vî zalimî ku xwe ji ser vî kelaxê tar û markirî bide alî!..«

Mele xwe daqûl kiribû û qîq li nav şeqên wî dinerî. Piştî ku kêlîkekê dirêj wilo daqûlkirî ma:

»Begê min, bi bilah û bi tilah min ew nas ne kir!« got û bi lez meşiya.

Circîs di nîvê rêzê de mîna ku ne dixwest kesek wî bibîne, ketibû talda Ridwên. Dirikrikî. Bi zor xwe li ser pêyan radigirt. Heso dabû dû Sêdiq

li erdê dinerî û xwe diquriçand. Dîsa paxafê girtibû dilê wî. Bi van qurîncekan dixwest canê xwe hinekî şiyar bike ku bikaribe xwe li tena bigire û komutên bibersivîne. Heso gava ku tirs û sawêr pê re çêdibû, her tim xwe diquriçand. Ev haweyê wî, di gelek caran de saw ji ser revandibû û ew bi cesaret kiribû. Lêbelê di vê carê de ev hawe qelp derketibû. Bi çermê laşê xwe digirt badida û hey badida, lê canê wî bi xwe şiyar ne dibû. Nenûkên xwe di çerm de diçikilandin û nenûk digihandin hev, lê dîsa jî mihf ne dikir. Xwe bi xwe digot, »Qey ez saxekî ji miriya me! Belkî jî ez mirî me, ez bi xwe nizanim...« û dev lêva xwe dikir. Lêv ji zû de ziwa bûbûn, xwînê lêv şil ne dikir. Hişk bi zimanê xwe girt, ziman kişiya û wî dev qurmê zimên kir. Rimekê bilind bû û bi ser komutên de pengizî.

»Ecelê neke Heso efendî, sebrê bike, wê dor bigihê te«, komutan got û pehînek di zikê Sadiq werkir. Qêrîn bi Sadiq ket, bi zikê xwe girt û devê xwe xiste erdê. Di wê navê re jî eskerekî li Bedrên dixist; çima ku rûniştibû.

Bîçer li dor term çû û hat û zîvirî. Ling da bin term, serzik qulipand. Pê li tilmiqûnan kir. Xwest ku wan bilewliqîne. Lêbelê tilmiqûn jî mîna temamê kelêx ji sermê bûbûn çekur, ne lewliqîn. Tif kir. Tif bi ser term de belawela hat xwarê. Kupkup bi devê wî ket, mîna ku avê di devê xwe de werde tif da ser hev, bi hêrs dîsa tif kir ser term û berê xwe da Heso.

»Tam li qula qûnê binere!..«

Heso çend kêlîk berê hebitî bû, lê ne bi qasî di vê kêlîka niha de. Rengê wî bi carekê ve zer qulipî. Çavên wî mîna du tasan vebûn, bêlept sekinî û beloq nerî. Gotinên bavê di bîrê de hatin. Bavê jê re gotibû »Lawê min heta bi miriyên xwe jî di destê eskerên romê de nehêlin, di miriyan de dar dikutin. Min bi çavên serê xwe dît.

Dema ku Eliyê Betê bi destê eskeran hat kuştin û hevêrkî ji desthilanîn ketin, eskeran jî serê hin fêrisên wan jê kirin û dar radan wan!« Lêbelê wî ji bavê xwe bawer ne kiribû; »Yabo min digot qey tu derewan dikî, ewqasî jî nabe!..«

Heso gava ku diket tengayê, gelek caran jibîrkoyî dibû û xwe belav dikir. Li gundê Cizîrê Yekmala, li Qesrikê, li Serêkaniyê, li Darê û heta li gundê Heso bi xwe di destava termê Temer de dar kutabûn.

»Hiii çawa bû kerxaneçî? Te pir lê temaşe kir. De ka bibêje bê ev qûna kîjan qûnekî ye?..«

Mîna yekî di xew de ku tu bi dêr wî şiyar bikî:

»Haa!« got û wek dînan tevxircilî.

»Bêşeref ez ji te re dibêjim ev kî ye? Tu wî nas dikî zû ji min re bibêje!«

Heso ew nas ne dikir. Belkî di temamê jiyana xwe de ev mirovê ji hevqeliştî qet ne dîtibû. Lêbelê komutan wek wî ne difikirî, xwe bi ser de kil kir:

»Qaçaxçiyê ku bikaribe di vî gundî re derbas bibe, miheqeq wê hin jî dostê wî hebin. Ev hin kî ne zû bibêje!..«

Argûşkên Heso li hev siwar bûbûn. Gava diaxivî kufînî ji dev dihat, bêje ji hev belav dibûn, tîp tazî digindirîn. Komutên jê fêm ne dikir. Bi herdu destan weş lê xist û got:

»Devê te şahidê te ye. Temam, min fêm kir ku tu wî nas dikî...«

Heso bêkeys deverû çû erdê. Tibabekî wilo ma. dûv re xwe da ser hev, bi qûnkişkê xwe gihand Casim û nema tevgeriya.

Gundiyan yek bi yek li term nerîn. Komutên him asaq di term û him jî di wan hemiyan de kir. Lêbelê gundî vê carê bi cesaret derketibûn, kesekî xwe li tiştekî ne kir xwedî. Di hin rojên wiha de hin wek Etman û Hesenê hûrî car caran, bêî ku hay û bayê wan ji qaçaxçiyan hebin an hin qaçaxçiyên kuştî nas bikin, bi asaqan xwe xistine bin telpê û derew li xwe kirine. Di sala 1959an de komutanê hidûd Atîlla, Etman û Hesenê hûrî bi mebesta ku qereqola hidûd şelihandibûn, xistibûn sintaqê. Bi êşkencê ewraq bi wan dabû îmzekirin û ew rêyî dadgehê kiribûn. Dadgehê yanzdeh sal ceze dabû wan. Li gor ku qaçaxçiyê navdar Hemoyê Hisê digot, Atîlla qereqol şelihandibû. Barê pênc, şeş qantiran çek û cebilxane û ewqas jî fîşek firotibûn wî û liciyan. Etman û Hesen şikiriya xwe anîbûn û gotibûn, »Mala Xwedê ava ku bi yanzdeh sal ceze bû, lê ne bi kuştina me û şewitandina gund bû!« Lê ji bilî Heso, Circîs, Kenêr û Salar kesî bîr ne biribû ku di vê bûyerê de, kuştin û şewitandina gund, wê bi kêrî yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê usteymenê hidûd ne hatiba.

Hesen Çawîş û du eskeran xwest ku termê Hiso ji destan girêdin. Lê Bîçer li himber vê rabestina wan derket. Term ji lingan girêdan û bi dû panzêrê ve kirin. Panzêrê hereket kir û berê xwe da taxa jor. Pîrekên ku li ber deriyê hewşan li hev kom bûbûn, reviyan hinduran. Paceyên odan girtin û xwe li zarokan pêçan. Panzêr li dor gund zîvirî û dîsa hat li cihê ku jê hereket kiribû rawestiya. Term ji ser piştê qulipî bû ser dev. Serê Hiso felqe felqe pejilî bû. Ji heriyê mejî, goşt, hestî û porê wî ji hev ne dihate fesilandin.

Bîçer piştî ku ji ê şifêr re got:

»Carekê jî di nav malan re here û were«, dîsa rahişte dêr. Darê xwe mî-

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

na şûrê qetilê avêt wî, ê din û bi qahr axivî:

»Heçê ji we de qaçaxê neke diya wî jina wî be! Qaçaxê bikin, bikin!..«

Kesekî gotinên wî lê venegerandin. Ji bilî Heso û Osmanê yextiyar herkes li ser pêyan rawestiyabû, serê xwe xistibû ber xwe û bi mitale difikirîn.

Seet yekê nîvro ye. Bîçer li pêpîkê xist, esker hemû li dor wî kom bûn.

»Zû xwe bidin ser hev ku em bi rê kevin« got û ber bi Circîs de çû.

Di vê bêhnikê de jî dîkekî sipî î şamî dabû dû mirîşkekê. Bi qîje qîj û tuxe tux hevdu li dor qesirê digerandin. Dîk tu eman ne dida mirîşkê, xwe ji ser venedikişand. Mirîşkê bêmefer xwe li nav koma gundiyan xist, melisî û dîk bazda ser ku bifisikînê. Bîçer bi xwe ne xweş anî:

»Lawê min, wî dîkî bigurînin!« got û bang Mîrzoyê mitirb kir.

»Reyisê dîk û mirîşkan Mîrzo, were vir!«

Mîrzo ji cihê ku lê sekinîbû bazda û bi haweyekî mitirbî:

»Emir bike qomandarê min ê herî mezin!«

»Vê mirîşkê çima xwe avêt nav koma me û xwe li ber dîk melisand? Dîk çima wilo di nav me de fisikand vê mirîşkê?«

Mîrzo xwe bi ser hev de qurmiçand û bi haweyekî melûl:

»Ma ez çi dizanim qomandarê min ê mezin.«

»Bi bazdanê here mirîşkên xwe bîne vir û ji wan re li ribabê bixe!«

Mîrzo, gava çîçik nuh ji hêkê derdiketin, çîçik dixistin hindurê sêlê, sêl bi agirekî hûr hêdî hedî germ dikir û ji çîçikan re li ribabê dixist. Bi vî haweyî çîçik mezin dikirin. Refek dîk û mirîşkên wî hebûn û hemû jî reqisvanî bûn. Dema ku Mîrzo li ribabê dixist û wan jî dengê ribaba wî dikir, dev ji êm berdidan û di cihê xwe de habela diperpitîn. Dîkekî wî î qoqo, bi rastî jî tam heqê reqsê didayê. Gava ku Mîrzo ew hemû li gasînê kom dikirin û ji wan re lê dixist, vî dîkî sergovendî dikir, baskên xwe ji hev vedikirin, xwe dilewliqand û ji vî serî diçû seriyê din.

Mîrzo bi sê mirîşkan, dîkekî û ribaba xwe hat. Çûn û hatina wî hemû deh deqîqe ne girtibû.

»Qomandarê min ji bo ku mirîşk bireqisin, divê ku ez bi zimanê wan bistirêm. Ew ji tirkî fêm nakin.«

»Temam, bi zimanê wan bistirê!«

Destên Mîrzo ji lêdanê werimî bûn, bi zor ribab digirt. Zîqînî bi ribabê xist, mirîşk çeng bûn û wî bi kurdî da ber hev:

»Giriyê min bi aqilê me tê

Kenê min bi halê me tê
Mirîşkino zelqa we tê
Gidî bigirin dawetê
Eman eman eman...«

Bîçer û eskerên xwe ji ken lal bûn û li erdê veziliyan. Mirzo gerek zêdî deh deqîqeyan li ribabê ne xistiba. Lê li ser emirê komutan, heta ku mirîşkên wi ji taqet ketin û di cihê xwe de melisîn, lê xist.

Bîçer Circîs xewle kir û bi aliyê berqefan de meşiyan. Bi haweyekî devliken:

»Circîs efendî...«

Xwîn bi Circîs ve hat, ruyê wî mîna gulekê vebû. Xwe li bendî gotina dûv re ne girt, bi kêf û eşq got:

»Bibêje begê min bibêje« û ziq li devê wî temaşe kir.

Bîçer destê xwe di ser serê wî re bir û anî û firkand. Bi haweyê ku bikene zor da xwe. Devê wî mîna qayişa patozê veziliya, bi tenê serikê diranan diyar kirin û bi xweş û bêş:

»Circîs efendî, ev Heso çima ewqasî dijminê te û kinêsa te ye? Wê rojê dîsa zilamekî xwe, vê carê jî bi sebeba ku ez qesabiya qereqolê ji zilamê te bistînim, şandibû nig Hesen Çawîş. Lê ji ber ku dilê min her tim ji te re dixawze, min zilamê Heso qewitand...«

»Begê min dûrî te, dûrî te, dûrî te, Heso miroveki teşqelker, pêxwas, fesad û şerxwaz e...«

»Bihêle ez peyva xwe biqedînim!«

Circîs hinekî cefilî, xwe paş de vekişand û kete temenê.

»Begê min bibexişîne, devê min bişike, ma qey min li himber begê xwe qisûrek kir?«

»Çend roj berê jî îcar Heso hate nig min û got: ‘Circîs dan û sitendinê bi qaçaxçiyan re dike.’ Lê min bi xwe bawer ne kir. Û ez naxwazim jî bawer bikim. Heşkere ji te re dibêjim ku ez ji Heso dihenitînim. Miroveki pir qure û zimandirêj e. Eger rojekê ez bibihîzim ku zilamên wî di gund de xirecirê derxînin, ê ne bavê wî melkemot be jî dîsa ew ê ji nav lepên min xelas nebe, ez ê bihêlim ku başçawîşê Sitilîlê wî bi lêdanê tirek bike. Û heta belkî ez wî rêyî girtîgehê jî bikim.«

Circîs pir dixwest ku Bîçer herwiha di biwara Heso de biaxive; rêya bersivê bide wî û ew jî şelafiyan jê re bike. Lê Bîçer jî mîna ku wî zarok bibîne, bi herdu destan ruyê wî hinekî firkand û bi lez hat ba eskerên xwe.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li terempêlê siwar bû, serê xwe di pacê re derxist, »Ez di dê û jinê we hemiyan ku..im û bi xatirê we!« got û terempêlan hereket kir. Ew li cemsa pêşî siwar hatibû. Panzêrê dabû dû cemsan. Termê Hiso jî mîna beretekî bi dû panzêrê ve bû û ber bi Menderê de sûrikîn.

* * *

Terempêl gihabûn gundê Menderê. Lêbelê zoravî ji tirsa Bîçer hîn jî wilo bêdeng, di temenê de rawestiyabûn. Eger ne ji qelebalixa pîrekan, orandina dewêr û ewte ewta kûçikan ba, kî dizane, ev bêdengî belkî tibabekî dirêj hîn jî dom bikira. Lê pîrek ji mêrên xwe wêrektir derketibûn. Bêdengiya mêran zû xerab kirin. Li bendî wan nesekinîn; dewar û pezên xwe bi çolê de rast kirin û xwe berdan ser bênderan. Teqil û pêl li zilaman ket. Dijmin û dijmin digel hev rêz girtibûn. Yek bi yek ji ber hev ketin, heryek ber bi hevalê xwe de pekiya û xwe li dera ha dan ser hev. Du komên dijmin ji hev cida rûniştin û bi ser êşa birînên xwe de tewiyan. Çar, pênc seetan lêdan xwaribûn û li ser pêyan rawestiyabûn. Eger Bîçer ji gund nedaba rê û herwiha asaq û tore di wan de kiriba, van mirovan belkî pênc seetên din heta belkî deh, panzdeh seetên din jî bi wî haweyî bikarîba xwe li ser lingan ragirtiba. Piştî ku bawerî anîn êdî Bîçer nema li wan vedigere, bi êşa canê xwe şiyar bûn û li ser wê şil û pilê bêhemd xwe ramidandin. Piçûk û mezin temamê gund bi ser bênderan de kişiyan. Qefile bi qefile dihatin. Lê Sarê di nav wan de xuya ne dikir. Meyro dabû pêşiya qefilê û bêhnçikyayî dihat. Dergûş li malê avêtibû. Xawas, servekirî û bi tena kirês bû. Hûçikên wê ên berdayî bi erdê ve dikişiyan. Pêxêla wê vekirîbû. Memikên wê ên girover di şîr de zewirîbûn, serikê memikan mîna du guhîjan di bin kirês de bel bûbûn. Wê nizanîbû ku bi wî haweyê xwe, pê li adetên civakê kiriye û meydan ji zilaman re xwendiye. Ji herkesî bêtir ew tirsiyabû. »Min kuştina bavê xwe dît, ez naxwazim kuştina Temo jî bibînim«, digot. Li gor tore û edetan şerm bû gava ku pîrekê di nav koma zilaman de, mêre xwe maçî kiriba. Lê Meyroyê, mîna ku ne di nav kevneposiyên islamê de mezin bûbû, li pêş wêqas komê, çepilên xwe li gewriya Temo gerandibûn û ew maçî dikir. Temo jî ew dahf dida û bi hêrs jê re digo »Keçê, xwe ji ser min bide alî, şerm e! Li himber bavê min tu çawa dikarî min maçî bikî!..« Lê pir jî dixwest ku devê wê ji ruyê wî, heta ji temamê laşê wî derneketa. Di nav livînan de ji bo ku Meyro xwe lê bipêça û nehişî pê re têketa têkiliyê, can dida. Gelek pîrekên din jî mîna Meyroyê kiribû. Pîrekan mûlit kiribûn

setqe ku mêr dîsa bi saxî li wan vegeriyana. Jina Cemşîtê şivan kurka ku hîn di ser hêkan de bû kiribû setqe. Cemşît bi qahr ji jina xwe re digot »Keçê Helê, ma mirov kurkê dike setqe!« Helîmê jî jê re digot »Ma ji mirîşkekê pê ve çî me hebû Cemşîtko! De îcar şikiriya xwe bi rebê banî bîne ku tu da xatirê wê mirîşkê. Eger min kurk ne kiriba setqa te, bi saxî tu ê çawa li min vegeriya!«

Bîçer û eskerên xwe zoravî êşandibûn. Canê wan bi lêdanê kiribûn wek rêsî. Parsû û serê hinekan şikenandibûn. Ling û destên wan bi daran terişandibûn. Hin jê xwîn vedirşiyan. Lê dîsa jî ev lêdana ha li gor lêdanên berê, ne tiştek bû. Zoraviyan qezenç kiribû. Kesek ji wan ne hatibû kuştin. Hebûn, hema çiqasî bi merez û êş û cefa ba, dîsa jî ji nebûnê çêtir bû. Herkesî şikiriya xwe dianî û digot »Mala wî ava ku kesek ji me bi dû terempêlan ve girêneda! Kesek ji me bi rêya nexweşxana Mêrdînê de neşand! Kesek ji me ne kuşt! Mala wî hezar hezar carî ava be ku pîra Sarê ne kuşt!..«

Li vê herêmê mirovê gava ku di sinhetê xwe de dibû pispor, civatê leqabek lê dikir. Navê Îsa, Mûsa, Mihemed, Ebû Sufyan, Tecal, Şeytan, Cibraîl, Îzraîl û hwd. hema hema li her gundî hebû. Li Zorava jî ji Sadiq re »Îsa«, ji Kenêr re«, Şeytan«, ji Xelef re »Bahlûl«, ji Zibêr re »Ebû Sufyan« digotin.

Heso ji hawhaw ketibû. Nikarîbû raba ser xwe. Lingê wî ê tehenî ji felaqê, mîna balonekê nepixîbû. Ling diariya. Dema ling dilebitand, tevzînok bi ling vê hildikişiyan agir bi kezeba wî diket. Bi pişta xwe girtibû û xwe bi ser hev de diguvaşt. Ji pehînên Bîçer canê wî birîn bûbû. Temo ew li ser pişta xwe kiribû û anîbû malê. Sarê ketibû ber pişta wî û melhema çavan di piştê de dida.

Bi berger:

»Heso laşê te xerab bûye, ka em te bibin Mêrdînê nig textor.«

Wî bi hinc destê Sarê ji ser pişta xwe heliqand:

»Textorê min di gund de ye, xwîna wî melhema birînên min e!«

Sarê qesda gotina wî fêm dikir. Lê ne dixwest ku cirê pê re bikişîne û têkeve gewriya wî. Hinekî fikirî. Xuya dikir ku hêl dida gotinên bijarte; bi van gotinan mêrê xwe nerm bike, da ku felaketeke ji a berî niha mezintir bi serê wan de neyê.

»Zarokên xelkê ji dengê tivingên eskeran hebitîne, bêhna xwe fireh bike ez bi heyran...«

»Bila ew birayê te ê kafir jî wilo bifikire! Erê keçê, ev niha tu çima hat


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

nav wan eskeran! Eger min ew derew bi wî teresî re ne kiriba niha tu kuştîbû! Ez hîn jî difikirim bê ew gotinên wilo çawa hatin bîra min!«

Sarê bi hesabê ku dilê wî xweş bike.

»Erê pîro, ma çima qey tu hindik î! Bi Xaliq tu îro tam zilam bû. Him bi aqilê xwe û him jî bi mêraniya xwe, tu gula komê bû.«

»Tew, bê çi guleke xweşik bû mêro. Tereso qûna me çilvirand, gû û mû da me û tu jî çêlî gulan ji min re dikî! Bi rastî ev jin, ev jin şeytanê mêr e! Gava dilê wê bixwaze, dikare mêr bi qasî Rûto mezin û bi qasî Şûto jî piçûk bike! Bê kê bîra gulê dibir kuro!..«

Ew hîn wilo diaxivî, Hemo gava xwe avête hindur:

»Apê Heso Xwedê xêr bike, mesele çi ye? Ji bo çi te şandibû dû min?« got û di pêşberî wî de çarmêrkî rûnişt.

»Xwedê xêr neke! Em nikarin vê tirê ji mala hûran re bihêlin. Têhildan di nav me de ji bav û kalan de tiştekî şerm bû. Lê van teresan ev bêşerefiya ha kir sêr û li me rast kirin. Carekê derew, du caran derew, sê caran derew her ku qomandarê hidûd bi eskerên xwe ve digire ser gund, vê gotinê dibêje.«

Hemo piştî ku keserek kişand, destê xwe avêt bêrîka qêpût, ji bêrîkê qutiya tûtinê derxist. Qutî mezin bû. Kenarekî wê zingar girtibû. Serê xwe bi ser qutiyê de tewand û di ber xwe de:

»Kîjan gotinê dibêje?«

Heso ji cihê xwe qevizî û mîna gindorekî bi ser çementoyê de herikî. Xwe qulipand ser kêleka çepê û bi zirt peyivî:

»Tu çima xwe ehmeqşeytanî dikî Hemo! Ma te ne dît bê Hesen Çawîş ji te re çi digot!«

»Bêhna xwe fireh bike apo«, balîf ji ber pişta xwe da alî û destê xwe avêt çeqmêq.

Temo rê nedayê, ji cihê xwe çeng bû û bi hirmet çeqmaq li ber pêxist. Çixare qalind pêçabû. Ji aliyê qûnikê ve pêxist. Dixana çixara wî mîna badokê, zirav li hev zîvirî û ber bi beştan de bilind bû.

»Apê Heso ez jî wek te difikirim. Îdrîs fesad e; bi fesadiyê mû ji bavê xwe bernedaye. Ez bawer dikim ku biwara me li cem Hesen Çawîş an û qomandarê wî kiriye.«

Temo berî bavê xwe:

»Rast e, Îdrîs mirovekî vîlikî ye. Serkêşê vîlikgerê hûran Îdrîs e. Eger wî gotineke wilo bi çawîş re ne kiriba, çawîş ji nav wêqas komê bi qirika wî ne digirt. Çawîş genitiya wî ji tiliya xwe bêhn ne kiribû. Çawîş rast dibêje.«

Heso ji nişkê ve gotin guhert:
»Ka ew rebenê Nesro li ku ye?«
Meyro:
»Apo çû mala xwe.«
»Ma wê çima nere mala xwe caminê, em di şerê top û tenq û teyaran de ne. Erê kuro niha hûn bi qedirê Mishefa Reş kin, ma çi hewcedarî pê heye ku ev xelk bi cûzdan û mizdanan li van gundik û mindikan ji xwe re bigerin, hi! Kî ji me çi bike ew pê dizanin. Me yek bi yek nas dikin. Navên me hemû li ba wan qeyd kiriye. Çend qulên teban û şikeft di van qelaç û çiyayikên me de hene, bi hemiyan dizanin. Tobe estexfîrulah, erê niha ku di navbera Tirkî û Sûriyê de, û ya jî di navbera me û van dêqereqahpên eskeran de şer hebûya, dîsa xem ne dikir lo, bila li ser me bigeriyana. Dibê de were û kirasê xwe neçirîne! Bêşerefên qomandarên hidûd, tabûra Nisêbînê û başçawîşê qereqolê lingên me xistine zikê me oof! Bûne şahên me şahên me!..«
Sarê pala xwe dabû dîwêr, li wan dinerî û kûr kûr difikirî. Gotinên mêr û lêw kezeba wê peritandibû. Ditirsiya. Xwe di halekî heyirî de didît. Di mala wê de û li pêş çavên wê mêr û law, şêwira lêdan û kuştina bira û merivên wê digerandin. Lê mixabin nikarîbû du gotinên xêrê bi wan re bikira. Bawer ne dikir ku Îdrîs muxbirî kiriye. Çimkî birayê xwe baş nas dikir, dizanîbû ku di terbiya wî de cihê muxbiriyê tune bû. Lê wê çawa bikarîba ev yeka ha ji wan re bipeyitanda? Wê bi kîjan gotinan bikarîba dinyaya Heso a reş û tarî ronahî bikira? Li gor wê ew mirovekî zikreş, bêûjdan û serxweçûyî bû. Wî bi ûjdanê xwe ê qirêj, dilê wê ê paqij dilewitand. Nava wê dikeliya dixwest bigirî, lê girî layiqî xwe ne didît. Destê xwe dabû ber ruyê xwe û bi haweyê ku Heso bi êşa dil û kezeba xwe agahdar bike, dil û kezeba Heso li gwîzên xîne, melûl melûl lê temaşe dikir. Li vî tewî bav û law e û li wî tewî jî dîsa bav û law e. Ên bi wan re jî hemû xwediyên wê ne. Bêhneke din wê xwe berdana gasînên gund û mîna teyran di hev re bifiriyana. Dê çawa bikira vê pîra perşikestî? Giriyê wê dê çawa têra hemiyan bikira! Gelo ew dilê wê ê ku bi qasî dilê teyrikekî piçûk bûbû, dê çawa bikarîba xwe li ber wê êşa mezin bigirta! Di vê bêhnikê de pir dixwest ku Mele Salar li vir ba. Di dilê xwe de ditewirand, »Belkî wî bikarîba ev zilamên xafil ku ji hîsên insanetiyê hatine dawişandin, hinekî hedayet kiriba...« Dixwest qasidekî bişîne dû melê. Û dîsa li Heso dinerî. Heso mîna hûtekî heft serî di devê derî de didît. Qasid kî diba bila biba, ew ê di bin xezeba vî hûtî de bipelixiya.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Temo zû gazî birayên xwe bike; bila herkes li vir bicive; da ku em û van teresbavên hûran çend kaban biavêjin hev!«

Sarê bêhemd ji cihê xwe qevizî. Li ber Heso sekinî, xwe bi ser de daqûl kir û bi herdu destan:

»Hey Xwedê topek li ser dilê te û dûv re jî li ser dilê Circîs xisto! Ev hûn doza çi li alemê dikin, we çi xwe raçavî hev kiriye! Ji vê rîha xwe a sipî fedî bike! Ma ne tu limêj dikî, hey Xwedê limêj qebûl nekiro! Mûyekî reş di laşê te de nemaye, ji pirça laşê xwe ê sipî fedî bike, hey malviritiyo! Ji mirina te re tirek û fisek maye, li zarokên xwe bifikire, hey ne misilman! Tiştê bû çû, çû«

Ji peşkên tifa devê Sarê, serê Heso ê keçel şil bûbû. Gotinên jina wî pê ne xweş hatibûn. Sarê li himber Hemo erza wî şikenandibû û ew piçûk xistibû. Heso hilda xwe rabe, lê nikarîbû. Eskerkî rûnişt û bi qîje wîj:

»Ê ne jina Circîsko, jina Circîsko binere ez rabim, ez ê te biçirînim ha! Waweylê, esas Circîsê herî mezin di mala min de ye û hîn jî min nas ne kiriye kuro!..«

Sarê jê danexwar:

»Wey Xwedê bike yek ji we kêr yek penêr be! Hema heçê ji we de ji ser hev vegere, ker di jina wî ...e û hew!« got û bi lez ji oda mêvanan derket.

Temo wek çipik firiya û bi nav malan ket. Hemo da xwe ku here malê, Heso peyivî:

»Bi ku de Hemo?«

»Ez dixwazim herim demaça xwe bînim.«

»Ka niha rûne heta ku kom bicive.«

Hemo şêwirdar û cîgirê Heso bû. Ev yeka ha bi dilê Sarê jî bû. Desteka Sarê û hinek jî pir ehmeqiya pizûriyan, Hemo di nav bêaqilan de kiribû aqilmend. Dema wî bixwesta dikarîbû piçekî Heso ragirta. Digel ku mirovekî nezanbû, dîsa jî gotina wî li cem Heso derbas dibû. Di gelek caran de biryarên Heso betal kiribûn û li gor lênerînên xwe kar meşandibû. Sarê jê hez dikir. Lê di rojên pevçûnan de, bi qasî ku nefret ji Heso dikir, ewqasî jî ji wî dikir. Hemo vê carê jî dikarîbû Heso haş bikira û rê nedaba pevçûnê. Lê serê wî bi xwe jî wek ê mezinê wî piçûk bûbû. Dema Hesen Çawîş lê êşkencê dike, ew Çawîş bi Îdrîs dişibîne. Ji pehînên Bîçer qolinc hatibûnê, bêî ku Heso bi xwe agahdar bike, xwe bi ser hev de eciqandibû û geft li Îdrîs û Circîs xwaribûn. Heso biderxistina pevçûnê, biryareke tam li gor dilê wî dabû.

Di hindurê nîv seetekê de ji bilî Hûto, temamê mêrên pizûriyan li oda

Heso civiyan. Pizûrî bi mêrên xwe ji hûran hindiktir bûn. Ji bilî kesên cîran, pizûrî bîst û pênc û hûrî jî sih mêrên xwe hebûn. Lê ji ber ku herdu bendan jî Hûto bi pênc mêran dihesibandin, di pevçûnê de dibûn wek hev. Dema ku gundî bi pevçûnê diketin nav hev, pênc mêrên hûrî digel hev êrîş dianîn Hûto. Ew jî eger ne bi werîsan ba dîsa jî pê nikarîbûn. Pênc zilaman bi çar werîsan Hûto dixistin navbera xwe. Heryekî bi serê werîs digirt û wek babîsokê li dor wî dizîvirîn. Piştî ku Hûto bi fenda Cemşîtê şivan dihat girêdan, îcar herpênc mêr bi daran dibelişîn ser. Lê li himber vê fendê, Hûto jî rêyekê ji xwe re dibîne. Di kêlîkên şer de hildikişiya ser xênî, du zilamên hevalbend kevir diavêtin ber û wî jî habela ev kevir di dijminên xwe de werdikirin. Avêtina kevirên wî bi xwe jî hêjayê temaşekirinê bû. Keviran li hewa mîna ferên aşan difîkand û bi teqil dihatin xwar; gurmînî bi erdê diket toz û dûman bilind dibû. Ji tirsa kevirên Hûto, hûran şer dadixistin binya bênderên jêra gund. Lê Hûto jî wî çaxî bi koçanîkan raserî wan dihat. Koçanîkên wî ji merşên mûyînî bûn. Benên koçanîkan bi kevnepotikên Sarê pêçabûn. Gava ku koçanîk dizîzikand û kevir diavêt, te digot qey topa malûmatê diteqe, xumîn û gumîn bi derdorê dixist.

Hemo li kêleka Heso pala xwe daye dîwêr û riniştiye. Luqman û Bedirxan li ber devê derî li ser pêyan digel hev dikin piste pist. Ji lepta wan xuya dike ku ew jî şer dixwazin. Heso oda xwe ji kevirên nicirandî bi haweyê bajarkî ava kiriye. Ode baş fireh e. Lêbelê pizûriyan bi qelebalixê ode li xwe teng kirine. Çar pacên odê hene. Dudu jê li başûr, herduyên din jî li roava dinerin. Ode yek tebaqe ye, lê bi qasî tebeqe û nîvekê bilind tê. Binê wê li ser qamekê ji kevir û betonê hatiye dagirtin. Ode li ser pênc maxan e. Ji hêla bakur ve du max jê li ser rewtên hesinî ne. Rewt hîn ji dema elemanan de bi dest xistine. Di gelek xaniyan de ev rewt hene. Navbera maxan yek metro ye. Max bi depan rapêçayî ne. Hin dep qelişî ne û betonê di wan re daye der. Li ser banê odê ji hêla başûr ve yektew tibabê çengekî bilind dîwarekî bi zeraqe heye. Dîwar êretî çêbûye. Kevir bêxerc reqifandine hev. Hindurê odê bêxemil e. Hindur bi du kulavên mêrdînkî raxistî ye. Kulav rengînî û nuh xuya dikin; lê herdu jî kevin in. Kilsa odê difiride û xwe bi mirov digire. Xuya ye ku kevirên kilsê baş ne şewitandine, kils nikarokî hatiye. Ji bilî sûretê Rûto li odê sûret tune ye. Sûret raserî cihê Heso daliqandî ye. Bavê wî, ji zilaman bêtir dişibe pîrekan. Mîna ku kose bû, bêrîh û simbêl û bi kezî ye. Çengelê luksê bi bin zikê xênî ve ye, luks birine aliyê malê. Sobe sar e. Lûlên wê li ser

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

enîşkekê dirêjî bixêrîkê dibin. Enîşk hinekî kupyayî ye. Menqel tije arî ye û li ber dîwarê serşokê hatiye danîn. Lempe jî tam li jora Heso daliqandî ye. Bêhna mîzê ji serşokê tê. Heso di nêzîkî wê de li ser doşekê rûniştiye. Çixarê ji çixarê pêdixin. Temo, legana ku ji bo çixarên xwe tê werkin, di nîvê odê de daniye. Ava di hindurê wê de mîna pirika binê sarincan zer xuya dike. Remo dîsa avsîrk xwariye, bêhna nêriyan jê difûre. Nûrî mîna ku şorik xwaribe, pir avê vedixwe. Bi herî û rêxa binê şekalên xwe, devê derî seyandine. Zarokek bi dilşewatî li hewşê digirî. Dengê sêwiyan ji giriyê wê te. Keçikek e, lê qîza kê ye? Gelo ne be ev keçik li ser nanê genimî digirî? Belkî jî lingên wê ên xwas di nav heriyê de qerisî ne? Kesek guh li vê zarokê nake. Hemû jî bi dengekî bilind diaxivin û şêwira şer datînin. Zirtan dikin û xwe dizirzitînin. Zibêr nav di xwe de dide. Selîm li sênga xwe dixe. Kenêr destê xwe dihejîne. Simo xeberan dide. Hemo dikene. Ji herkesî bêtir Mihoyê cîran xwe daye pêş. Ne be ev keçika ku kezebê dax dide, keça wî be? Ji ber ku kufletê wî nanê ceh dixwe. Bi gavantiya ku car caran dikir, ji hin malan lewaşên genimî distendin û zarok hînî vî nanî kiribûn. Dengê Sarê tê...

»Lawê min Luqman, ma ji bo vê pevçûnê tu çi dibêjî?«

Miho ne hişt ku Heso dawiya peyva xwe bîne. Rabû ser kaban, mîna ku gergerekê bendê ew be, destê xwe hejand:

»Em nikarin çarika bênamûsiyê bikişînin serê xwe! Circîs û lawên xwe heşkere heşkere giliyê me li cem eskeran dikin. Eger wilo bimeşe û em bêvila wan nefirkînin, bi telaq wê heta bi giliyê jinên me jî li cem eskeran bikin!..«

Miho pir dixwest ku civatê navê wî bikira Tecal. Heyranê Kenêr bû. Ji bo ku di qada wî de bilîsta, dikarîbû bûba xwedênenasê herî mezin. Yekî wilo bû ku dikarîbû bigota, »Îro gava ez li çiyê bûm, dengê kûçikan ji ezmên dihat!« Civat bi ehmeqiya xwe dikenand. Îcar Kenêr jî wê bigota »Rast e, ne tiştekî ecêb e ku dengê kûçik ji ezmên bê. Teyrek dikare cewrikekî hilgire ezmên û cewrik jî bireyê. Ma qey nabe?« Civat bi jîritiya xwe dikenand. Ferqa Kenêr û Miho ewqas bû.

Niyeta Miho û rawestinê tune bû. Wî dê hîn gelek gotinên ji xwe mezintir li nav guhê civatê xista, lê Qasoyê cîran rê lê girt û bi şêweyekî nerm:

»Lawo Miho hinekî giran be giran!«

Miho li Qaso zîvirî û beşişî:

»Kuro ma qey di nav vê civatê de wek min giran kî heye gelo? Wê rojê li Nisêbînê ez çûm ser qentarê û min xwe wezinand, bi Qurana ser çon-

ga melê ez tam nod kîlo derketim!«

Ji bilî Qaso temamê civatê pê keniya. Lêbelê ew hîn jî bi xwe şiyar ne bûbû. Devê xwe tije kir ku dîsa balê bikişîne ser Circîs, Luqman pê ve danî:

»Yabo, Îdrîs miroveki fesad û dijminê riknê malbata me ye. Ez Hesen Çawîş ji nêzîk de nas dikim. Weke hûn jî dizanin nav min û wî xweş e. Hesen ne wek Bîçer miroveki çavsor, telaqreş û derewîn e; deqarû û çavfireh e. Wê roja ku ez ji Nisêbînê dihatim gund, li hindama qereqolê Hesen pêrgî min hat. Pakêteke tûtinê dirêjî destê min kir û got ‘Luqman efendî, ez dixwazim tu vê pakêta dorsor wek diyarî ji dest min bigirî. Min pir dixwest ku ez diyariyeke mezin bidim te, lê mixabin destê min teng e.’ Min pakêt ji destê wî girt û hema wilo yekser min destê xwe avêt bêrîka şerwêl. Ji sed û pêncî wereqî bi tenê sed wereqe bi min re mabû. Min xelefa qenciya wî, bi sed wereqî lê vegerand. Eger hezar wereqe bi min re heba, bi telaq min ê ew hezar jî dabayê.«

Gotinên Luqman li telê Sadiq ket.

»Hewce nake, tu xwe ewqasî li berxînî Luqman. Piştî ku tu hatî gund, te dîsa dikarîbû hezar wereqe ji nav malan peyde bikira û bigihanda destê Hesen Çawîşê xwe.«

Gotina wî li zora Luqman çû. Piştî ku got:

»Îsa Sadiq a te tiştekî din e, ez te fêm dikim« û dîsa peyv zîvirand ser Çêwîş.

»Nizamim gelo çavê we li Hesen Çawîş ket, îro gava dar li binê lingê apê me ê Selîm dihejmart, çav dikir min kuro! Yanî wek tiştekî bibêje, ‘Luqman ez mecbûrî vê lêdanê me, min fêm bikin, weh! Ez esker im, nikarim bêdiliya qomandarê xwe bikim. Ma qey hûn dixwazin ku ez mehekê dereng herim mala xwe, hi? Bibexişînin, çênabe ku ez êşkencê bi we nekim.’«

Selîm bi coş rabû ser xwe û bi haweyê ku gotinên Luqmên bipeyitîne.

»Gava ku Hesen Çawîş bi daran daweriqandibû lingên min û ji lingan xwîn bi nav şeqên min de diherikî, çav dida min jî kuro! Heta dikire niçe niç û ax û wax jî! Luqman belkî te jî ew di wî haweyî de dîtibe, ma ne wilo bû?«

Luqman mîna ku temamê gotinên wî bipejirîne, serê xwe sê, çar caran hilda û danî. Ber bi derî de gav avêt, sekinî û di cih de li ser milê çepê zîvirî:

»Hesen Çawîş miroveki rast...«

Xwest bibêje »Hesen Çawîş mirovekî rastgo ye, hîç derewan nake«, lê ji qorziya odê Xelef lê qewimand:

»Herçi eskerên ser hidûd in, bi rastî wek qomandarên xwe teresbav in. Lêbelê divê mirov bizanibe Hesen Çawîş ji wan veqetîne û wek yekî ji xwe bibîne. Ev mirov hîç naşibe hevalên xwe, ecêb nedîno! Ma qey we ne dît, gava ku ciwange xwe berdabû ser bênderan û bi xezeb ber bi me de dihat, qomandar xwe sil kiribû, çawîş jî li min dinerî û di bin simbêlan re dikeniya. Ji kenê wî mirov tê derdixist ku çendî dost e!«

Xelef ne dixwest gotinê zû biqedîne. Eger Zibêr şifqa xwe bi hinc li erdê nedaba û ne gotiba »Xwedê ji te raziyo bes e bes e, hinekî jî dorê bide min ha!« Xelef wê civat bi dilovaniya çawîş hîn pir bisinciranda. Piştî ku got:

»Allahummesellîela mûhemmed yabo dora te, weh!«

Zibêr tewirand:

»Hesen Çawîş mêrekî di ser xwe re ye. Nizanim gelo min ev meseleya xwe û wî ji we re gotibû? Pênc roj berê, li ser rêya Qesra pêrgî min hat. Piştî ku çixareke qûnsor da min wilo got: ‘Zibêr efendî, ez dixwazim qesabiya qereqolê ji dest Cimo Aslan derxînim û te bikim qesabê qereqolê. Ma tu çi dibêjî?’ Bi rastî ji kêfan devê min çû paş guhên min lo, min nema dizanîbû bê ez ê jê re çi bibêjim kuro!«

»Malxeranebo, îro pênc roj ev xebera wilo xweş li cem te ye, û çawa te ji me re ne digot!«

»De ka bihêle Hemo, bihêle ez bibêjim a tîr hîn di binî de ye bavê mino.«

Civat bêdeng bû. Te digot qey herkesî zimanê xwe daqurtandiye, hemiyan guhê xwe bi ser Zibêr de bel kirin û ziq li devê wî nerîn. Zibêr jî mîna ku deh mêr ji malbata hûran kuştibe, du zemberîş xistin ber pişta xwe, çîmên xwe ramidandin, li Sadiq nerî û bi haweyê ku dendigan biçirisîne dest bi peyvê kir:

»Ez ji civatê hêvî dikim ku kesek tu gotinên çewt bi Çawîşê qereqola hidûdê me re neke. Di tarîxa vê qereqolê de, mirovekî bi qasî Hesen Çawîş peyde ne bûye.«

Bi van gotinan qesda Sêdiq dikir. Dizanîbû ku Sadiq nefretê ji temamê eskeran dike; dê wî bibersivîne û heta gotinên ne xweş jî pê re bike.

Heso xwe ne girt:

»Erê Xwedê ji te razî be Sufyan, tiştê ku em dizanin nebêje. Hesen Çawîş mirovekî çendî bêbav û bênamûs e em hemû pê dizanin. Te civat di mereqê de fetisand, ka zû bibêje bê ji te re çi gotibû wî bêşeref î, weh!«

Zibêr mîna ku Sêdiq biqeherîne bêhnikekê ji dil keniya. Kenê wî hinekî hovane bû. Sadiq ji bo vî kenî her tim jê re digot »Kuro Zibêr, tu wek bergîlê dikenî, şîhe şîh ji te tê!« Zibêr piştî ku hin ji civatê jî bi hîre hîra kenê xwe kenand, qûna xwe ji ser kulêv hilda û danî, cira xwe xweş kir û dîsa bi mirçe mirç:

»Yabo, gelî civatê, baş li min guhdar bikin, bi navê Hesen Çawîş dostekî me li qereqola hidûd çêbûye..«

Nûrî pala xwe dabû serşokê û di nav şekalan de rûniştîbû. Serşok bi qasî dikekê ji erdê bilind bû. Zibêr jî li dawiya odê bû. Nûrî wek pilingekî qevizî, li ber Zibêr rawestiya û destê wî ramûsand:

»Ez xulamê te bim xalê me ê Ebû Sufyan, yabo bêje bê tu ê çi bibêjî, te em çirandin haho! Vî Mihemedî çawa bi te re derxist serî!«

»Temam temam xwarzê, ka rabe here cihê xwe, ez ê bibêjim« û tozekî din keniya:

»Erê ey cemahet, Hesen Çawîş bûye hevalê me! Wî got ku ‘Ez bûme hevalbendê pizûriyan. Ez hewedariya vê bendê li cem qomandar dikim... ’ Ê ne we ne dît bê çiqasî kêfa xwe ji min re dianî!«

Civatê bi mûçinkê peyv ji devê Zibêr kişandibû. Ne hiştin ku Zibêr dirêj bike, gelekan jê bi yek devî:

»Na loo!«

»Erê erê, wilehilezîm wilo lo!«

Simo ji dil got:

»De îcar divê em vê dostayê ji dest xwe bernedin, eman eman ha!«

Heso keniya û qerfên xwe kirin:

»Niha tu bi qedirê Xwedê û pêxember kî Zibêr, ev tu ji dil dibêjî? Eger bi rastî wilo be, îcar çima hûn nabêjin em ketin dana Xwedê lawo! Bi xêra vî lawikî belkî barê zilma qomandaran hinekî ji ser me sivik bibe û bar bigindire ser milên segbavê Circîs û tuxmê wî!«

Zibêr xwe tevxirciland. Çîmên xwe ên radayî bi lez kişandin, zemberîş ji ber piştê herikî. Ew li herka zemberîşê hayî ne bû. Xwe pal da, reqînî bi dîwêr ket, qêriya û hişk bi serê xwe girt. Patika serî di cih de bi qasî xarekê werimî.

Sadiq beşişî:

»Kuro Zibêr, qey te derew kir lawo, loma serê te li dîwêr ket.«

»Ooh tu jî lo, ê hema bi telaq xilafî di gotina min de tune bû, ha!«

Hemo:

»Ez jî bawer dikim ku Zibêr rast dibêje. Ji ber ku pêleyek berê, dema

Bîçer gazî min kir û ez çûm qereqolê, Hesen Çawîş wek hudhudk li ber destên min diçû û dihat. Ling ne xist bin xwe, rûneniştt. Xizmet ji min re dikir kuro! Bi destê xwe çemçikeke av ji min re anî. Şabelot dan min. Mewîjên bêdendik ji min re anîn. 'Hemo amca' digot, kuro!..«

Sadiq hêviya gotinên wiha jê ne dikir. Xwe aciz dikir û di ber xwe de dikire niçe niç. Di dawiyê de xwe ne girt:

»Hemo, gava Çawîş ev zir camêr be, îcar çima em vî zir camêrî ji dêvla te û apê Heso ji xwe re nakin mezinê malbatê?«

»Sadiq hewce nake tu gotinan bi vir de û wir de bikişînî, xweşik bibêje ku ez ji pevçûnê ditirsim. Ji serî de keft û lepta te bala min kişandiye. Her mirovê ku bi qencî çêlî Çêwîş kiriye, tu di pêşiyê de bûye kelem û te ew terpilandiye.«

Sadiq rabû ser xwe û di nîvê civatê de sekinî. Berê xwe da Hemo û bi zirt:

»Heçê ji min û te de hema aniha Circîs û lawên wî hemiyan bi ser hev de nekuje û tev li sîlehê xwe nere xwe teslîmî çawîşê te, qomandarê te û generalên romiyên te neke, çarika jina wî li serê wî be! De rabe ha!«

Hemo hilda xwe ku rabe. Heso bi ser wan de hilbû, herdu li cihê xwe rûniştin. Heso bêî ku xwe bide pişt yekî ji wan, bêhna xwe teng kir:

»Ez, kerê Stenbolê berdim ser heftê û heft sûlala Hesen Çawîşo! Lêbelê birayê min, lawê bavê min Sadiq, tu çima me fêm nakî? Eger em pîşê bi eskeran nekin û bi temamî xwe ji wan bişon, wê yarê gonê Circîsko halê me bike halê helawçiyan. Cimo û Hacoyê pêşî çawa hevrikê hev bûn, em û Circîsko jî wilo ji bav û kalan de hevrikê hev in. Haco xwe ji dewletê dûr kir û li himber romiyan bi şer sekinî. Îcar Cimko çi kir tu dizanî? Li himber Haco bû hevalê romiyan û li kuştina Haco geriya. Bi eskeran re derket taqîbata vî fêrisî. Haco kete çembera Circîsko yanî Cimko, serê 'siltanê hevêrkan' jê kir û teslîmî romiyan kir. Hişê xwe bîne serê xwe ehmeq. Dema Circîsko bibîne ku me xwe ji eskeran vegirtiye, ew ê ji îro bêtir xwe di bin eskeran de vezilîne û me hemiyan bi aqûbeta Haco şa bike. Sadiq min digot qey tu bi aqil î, lê bi rastî carina tu xwe wek zarokan xaşomaşî dikî. Zû rabin ser xwe û herin lep û ruyên hev!«

Herduyan jî tu carî bêemiriya wî ne kiribû. Çûn lep û ruyên hev.

Sadiq bi qahr peyivî û ber bi serşokê de meşiya:

»Eskeran mala me viritandiye û em jî li dostaniya eskeran digerin!«

Gotina wî li hesabê Heso ne hat:

»Li cihê xwe rûne, bêşeref! Îsa heq ji vê şêwira niha dernakeve, ev ne

karê wî ye. Em şerekî şeytanî datînin. Di vî şerî de ne Îsa, Şeytan ji me re lazim e, te fêm kir bê min çi got?..«

Sadiq deng ne kir û serê xwe berda ber xwe. Lê Kenêr jî di bin simbêlan re keniya.

Sadiq û Hemo him pismam û him jî hevlingên hev bûn. Bi keçên Heso re zewicî bûn. Carina li ser berberiyê bi devjengê radibûn hev, lê engirandina wan hemû ew bêhnik bû. Hemo û temamê gundiyan Sadiq wek gula civatê didîtin. Hemo digot, »Civata bêî Sadiq wek girara bêrûn e. Civat bi Sadiq xweş e.«

Sadiq hevalê berberiyê bû, lê ne bi haweyê ku wan dikir. Ew jî mîna Sarê dijminê eskeran bû. Ji dijminahiya eskeran pê ve, ji xwe gerek tiştekî din nefikiriya. Ji ber ku eskeran bavê wî jî kuştibûn. Bê dê û bav, li ber destê Sarê û Heso mezin bûbû. Li gor wî, esker pêxember diba çi diba bila biba, divabû bihata kuştin. Wî her tim digot, »Ez bi yek şertî, aşitiyê digel hûran qebûl dikim. Em ê eskeran bikujin û em birayên hev in.«

* * *

Civata pizûran dawî li şêwira xwe anîbû. Di civînê de biryara pevçûnê sitendibûn. Xwe ji pevçûnê re hazir dikirin, hindik mabû ku xwe berdana gasînan, lê ji taxa jêr dengê Circîs ber bi taxa jor de bilind bû:

»Lolo pizûriyên muxbirçîîî! Bêşerefino, bênamûsino, ji pişt jinên xwe derkevin; îro roja me û we ye! Xwe berdin meydana şer! Hesoyê fisek, ji dêvla ku tu keviran bi ser dawa me de bigindirîne, were sênga xwe bide sênga min berazî ku ez te bi terbiye bikim! Qaqubuxe qaqubuxe!..«

Circîs zilamên xwe hemû dabûn dora xwe. Di nav zilaman re ji vî serî diçû wî serî û mîna kewan qaqubuxe ji Heso dixwest. Te digot qey ew eşîra Lûlû û êv ên din jî eşîra Zûlû ne, herkesî rahiştibû dar, çakûç, bivir, sêgulîk, melhêb, debûz û şîşên tenûran. Ji bilî van çekan wekî din jî gelekan jê, xencer bi xwe re hilanîbûn. Perîxanê dabû nav koma zilaman, xwe ber bi Circîs de dikişand û digot, »Qamboncîko tu bûye kafir! Tu doza çi li vî miletî dikî hey kûçikan laşê te xwaro!..« Lêbelê Bozanê lawê wê, ew hişk zeft kiribû û bi nav pîrekan de dahf dida.

Dilê Heso ji kînê di ser hev re diwerqilî. Di vê bêhnika ku dengê dijminê wî ê kevnar di guhê wî de olan dikir û ew dawetî meydana şer dikir, ji bo ku hinekî bi aqilî bifikire gotinên tirovirî neke, xwe piçûk nexîne û danekeve deraxa dijmin, temamê giraniya xwe berdabû ser mejî. Xwe bi


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ser hev de dihesirand, lê mejî jî mîna dilê wî ziwa bûbû, li ser qenciyê çerx ne dikir. Ji bo ku aqilê xwe ê mayî jî bernede, gopal di lingê xwe ê birîndar de radikir. Xwe ne girt, qêriya:

»Kuro vî ez çirandim haho! Ma qey mêrekî ku devê wî tije fîşek bike û me hemiyan rûpak derxîne, di malbata min de tune ye!« û pizûriyan bi kîn xwe di hûran werkirin.

Ji qahra nava xwe hinan jê mîna serxweşan rê ne birin ser deriyê hewşê, xwe di ser sêncê re qevizandin û li yek tûşê xwe avêtin tara jêr. Pêşî di nav malan de wek qertelan di hev re firiyan. Dûv re sênga bi sênga hev kişandin ser bênderên ku hîn ji xwîna wan ziwa ne bûbûn û bi keviran li ber hev pan bûn. Kevirên yeklep li hewa dizîvirîn, geh li bin guhê hev diketin çirûskan pêtî didan, reqîn ji ezmên dihat geh li pişta yekî diketin dengê çifteyekê vedidan. Li aliyekî navtêdanên mêraniyê, fort û zirt û li aliyekî jî dîsa qîr û hewar û giriyê dayik û zarokan bû. Bi kevirê Luqman serê Haco pelixî û di nav xwînê de gevizî. Ketina wî sênga vî bi mêraniya sikakê nepixand. Berê xwe da Bozan û nav di xwe da:

»Ez nihîtê neqeba me! Kî ferx e, kî ribat e xuya kir! Tubbb werin min, werin min!..«

Metika Luqmên Perîxanê jî xwe avêtibû ser kelaxê lawê xwe, porê xwe dikişand, li kaba xwe dixist û bi dilşewatî digot:

»Lolo lawo, lolo ciwano, li min evdalê, li min pepûkê ez ê nifiran li kê bikim? Ez ê porê xwe bi ser kê de kur bikim? Ez ê çawa bigirîm? Li hêlekê lawên min û li hêlekê jî biraziyên min!..«

Bi ketina Haco re bayê şer bi carekê ve qulipî. Kevir nema di hev werkirin. Herkes bi aliyekî de bazda; dudu dudu, sisê sisê, çar çar xwe avêtin ber kuçan û demaçe li hev kişandin. Eger Haco bi derba Luqmên re wilo zû ne ketiba, belkî şûna kevir, demaçê negirta. Çimkî herdu rexan jî di hemû pevçûnên xwe de heta ku li aliyekî tam teng nebûya, bi destpêka pevçûnê re tu carî dest ne diavêtin çekan. Wan baş dizanîbû gava ji terefekî mêrek bihata kuştin, wê terefê din him ji gund derketa, him talan bûba û him jî çend mêrên wan ên sereke bihatana girtin. Ji ber vê hindê, heta ku kêr ne gihaba hestî hevdu ne dikuştin. Digel ku piraniya wan bi tiving bûn, dîsa jî ji şerê tivingê direviyan.

Di kuç û kolanên gund de bi demaçan û navtêdanan tibabê çarîkekê hev bersivandin û gotinên kotî bi hev re kirin. Cîgirên serekmalbatan Bedran û Hemo di qorzîbirên navtarê de bi xeberan, mîna mitirban di-

avêtin ber hev. Bedran, »Lawê Xipşê, min sûnd xwariye ku te bikujim û wê dîlbera jina te bi xwe bihêlim!« Hemo jî digot »Lawê tirê, min ji xwe ji zû de dor li ser a te daniye!..«

Mîrzoyê mitirb, mamosteyê gund Erol Satici û Mele Salar pêşî xwestin ku wan ji hev navcî bikin. Lêbelê wê kê li wan guhdar kiriba? Hemû ji hev dagirtî, mîna guran har bûbûn. Mîrzo û Salar di nav şeg û pekên wan de birîn bûn û ber bi mal de bazdan. Mîrzo zarokên xwe xistin hindur, ji jina xwe Melesê re got, »Hek, keçê rabe reqsê!« û rahişt ribabê.

»Binya mala me bi dika
Hewa sibê hênika
Dadan me qûncilika
Em bûn dimsê elbika
Kesî neda lotika...«

Piştî ku Hesûk newqa Luqmên bi xwîn kir, pîrekên herdu hêlan bi qîr û hewar xwe avêtin nav meydana şer. Pîrekan dest dan hev, ketin navbera wan û rêz girtin; çarikên xwe ji serê xwe kirin avêtin wê navê û gotin:

»Heçê ku şer bidomîne çarika jina wî li serê wî be!..«

Li gor adetên civatê, dema pîrekê çarik biavêta ser zilêm û zilêm li pîrekê guhdar ne kiriba, pir şerm dibû! Îcar di pevçûnên van herdu malbatan de, kêm caran zilaman wek pîrekan kiriye û şer rawestandine. Rawestandina şer a di vê carê de her çiqasî pîrek bûbin sebeb jî, di eslê xwe de ji ber ku herdu rex jî ji hal ketibûn şer rawestiya. Nema dikarîbûn pevçûn bidomandana. Bi derbên kevir û daran ji benda pizûran sêzdeh û ji benda hûran jî neh kes birîndar bûbûn. Di nav birîndaran de ê herî giran Haco bû.

Herkesî destê xwe di ber xwe re berda û li hev kom bûn. Pîrekan destên xwe sivik girtin. Bergîl, metreh, lihêf û werîs anîn ku Haco rakin bajêr. Lêbelê Circîs erza wan şikenand, »Haco wê nere nig textor!« û heta ku jê hat pehînek li nav pişta Perîxanê xist. Zilaman, Haco xistin nav merşekî mûyînî û di nav xwe re birin oda Circîs.

Birîna Haco giran bû. Ji patika serê xwe derb xwaribû. Kevir bi qasî du movikên tiliyê serê wî qelaştibû. Li dor nîv seetê li erdê bêhiş ketibû. Xwîn pir winda kiribû. Madê wî mîna quşûfê zer vedabû. Haco di her bêhnikê de dikarîbû bimira jî. Circîs ev yeka ha fêm kiribû. Dizanîbû ku lawê wî di rewşeke xerab de ye. Eger Hacoyê xwe ê ku darîçav jê hez dikir


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û ew di ser temamê malbatê re digirt, nebira nig doktor, dibû ku şev di ser re derbas ne bûba û çira mala wî bitefiya. Bi mebesta ku demaçên xwe veşêre, xwe ji zilaman vedizîbû. Di qorziya êxur a herî tarî de çong berdabûn erdê û li ser lawê xwe, mîna baranê rondîk dibarandin. Tep li serê xwe didan, dev destên xwe dikir, zibil bi ser xwe dadikir û bi îske îsk digot:

»Eger ez te bibim textor, wê ew Hesokê bêşeref bavê te qelsek bibîne û navê min bi muxbirçitiyê derxîne. Ez naxwazim ev navê pîs bê ser malbata min. Lawo situyê bavê te bişike, gerek min nehişta tu têkilî nav şer bibî!..«

Circîs gava Hacoyê xwe bibra nig doktor, dê doktor bi pevçûna gund agahdar bûba. Wî, doktor û polîs û esker yekqumaş didît. Amintî bi doktoran ne dianî. Doktor dikarîbû di derbarê bûyerê de, xeber bigihanda esker û polîsan. Wê gavê jî davabû gilî bikira. Û gilîkirê pêşî jî, ew li ba ê din piçûk dixist. Lêbelê di eslê xwe de a bi rastî ne wilo bû. Di sala ku hevalbendê wî Sekvan hat kuştin, berî herkesî wî bazdabû qereqola Sitilîlê û gilî li Hemo û Luqmên kiribû. Wî baş dizanîbû heta ku kuştin çêneba, bi giliyê ku bikira wê zerar ne gihandiba dijminê xwe.

Heso beşdarî nav şer ne bûbû. Ji ber ku pevçûn jê ne dihat. Ji lêdana eskeran canê wî hemû ecinîbû, xwe li ser pêyan ranedigirt. Bi lingê xwe ê seqet helbet wê nikarîba çend gopal dawişandana Circîs. Li hindur bi dîwaran re şer kiribû. Di kêlîka ku deng bi demaçan ketibû, wî jî bêrawestîn gopalê xwe li betonê xistibû, serikê gopêl şikenandibû. Serê xwe bêkeys li dîwarên odê dabû, serî zelhitandibû û gotibû »Ha wilo ha! Ez çavên we bixwim; îro roja belavkirina namûsê ye. Yekî ji wan sax bernedin, hemiyan bikujin; ev gund ya wê bi me û ya jî bi dêqahpan bimîne!« Lêbelê Circîs ji serî heta dawî xwe ji qada şer bernedabû; li gor zirtên xwe derketibû. Di şer de him serê wî hatibû şikestin û him jî ji nav pişta xwe sê derb kevir xwaribûn. Bi şikestina serê xwe mîna ku welatek feteh kiribe, bi xwe şanaz bûbû. Xwîna ku ji serî bi ser kincan de herikî bû û kinc kiribûn kulîlk, hemû wek terfî û rutbe dîtibûn. Pir dixwest ku destekî wî bihata şikestin, da ku di civatê de zimanê wî hîn bêtir dirêj bûba û bigota »Ez kurdûnde me, howeh li vê ecêbê! Wê lawên Hesoko neh zilaman ji me li erdê vezilînin û em ê jî bidin dû jinan û bazdin hindurê qul û qulêran, ha! Ê ne çi fêde Hesoko, dua ji vî destê min ê şikestî re bike. Eger ne ji destê min ê şikestîba, qe min yek ji we li ser lingan dihişt...«

* * *

Pizûrî hemû li oda Heso civiyan. Fîşeka ku Hesûk berdabû Luqmên, kêleka wî a çepê birîn kiribû. Birîna wî li ser lingan bi ispîrtoyê paqij kirin û ser birînê bi kitaneke qêlêrî pêçan. Ji bilî Sadiq, herkesî xwest ku biçin qereqola Sitilîlê gilî, lê Heso li himber wan derket:

»We tu gû belav ne kiriye heta ku em ya jî ew herin gilî bikin. Li ser pevçûnên wilo bêxwîn me gelek caran gilî li hev kiriye, lêbelê ne bûye tiştek. Mehkemê ne em û ne jî himberên me hepis kiriye. Bila sebeb êm ê dîsa herin devê çawîşê Sitilîlê tije pere bikin û wê çawîş tiştekî ji me re neke. Qilawizekî bişînin ser xênî. Eger gava we dît hin ji wan ber bi Sitilîlê an rêya Îpekê de çûn, bizanibin ku ew ê herin gilî. Ev fisekî bila pêşî ji wan derkeve. Em nikarin xwe li himber Circîsko piçûk bixînin!..«

Heso gava wilo diaxivî çavên xwe ji ser Hemo danedigerandin. Bi haweyê ku »Te çi ma hin ji zuryeta Circîs ne kuştin?« awir tê difirandin. Bi qahr kefika gopalê xwe ê kelpitî di doşekê radikir. Gava kefik ji doşekê dikişand, hiriyê xwe li sîxikên qurmiçî digirt pê re dida der û li ser ruyê doşekê belav dibû. Di nav şeqên wî re doşekê mîna seradê qulqulkî diyar dikir. Pir bi heyecan diaxivî. Mirov digot qey pevçûna berî niha, wî bi tena serê xwe kiriye ku ewqasî helke helk pê ketibû.

Hemo:

»Lê ezbenî, mirovek ji me bi derba demaçê hatiye birîndar kirin. Birîna birîndarê me her çendî ne giran be jî, ji ber ku bi demaçê birîn bûye mehkeme wê wan sûcdar bibîne û hinekan ji wan têxe hepsê.«

Heso pêşî zor da xwe ku henekê xwe bi aqilê wî bike û bi ken wî bibersivîne. Lê heq jê derneket. Xwêziya xwe daqurtand û hêdî hêdî:

»Me jî serê yekî ji wan pelixandî ye. Bi saloxdanan distek xwîn ji serê wî hatiye û li erdê tibabê seetekê bêhiş ketiye. Ez wilo bawer dikim dema wî bibin nig textor, wê textor kêmî du mehan raporê nedêyê. Îcar mehkeme jî wê vê rapora textor a du mehan, li ser me tam bi du sal heps bide rûniştandiin.«

»Rast e, wê birîndarê wan raporê bistîne. Heta gava bikaribin ji me bêtir pera bidin textor, bêşik textor wê vê raporê bike sê meh. Heta belkî bike çar meh jî. Meseleya raporê li ser pereyan û jêhatîbûnê ye. Lêbelê apo, di vir de bi qasî ku ez dibînim, mîna ku tu di ser hin tiştan re diqevize.«

Heso bi vê gotinê veciniqî. Serê xwe ber bi Hemo de xwar kir û dîsa bi zirt peyivî:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Çawa yabo qurbano, te çi got, te çi got? De ka dîsa bibêje.«

»Ez dibêjim ku em gilî bikin wê baştir be. Ji me û wan ew ê bêtir zerara xwe bibînin. Çimkî gava textor birîna ê me bibîne ew ê bizanibe ku bi demaçê birîn bûye û rapora xwe wilo girêde. Di wê navê re, qe em jî ne mirî ne, em ê devê textor tije pere bikin. Eger me dît textor xwe tam bi dest me ve berda, ji xwe wî çaxî jî em ê bihêlin ku gulê demaçê bi gulê tivingê biguherîne. Bi raporeke wilo tebût, di îfadên xwe de em çendî derewan bikin û bibêjin ku hemiyan bi sîlehan êrîşî ser me kiriye jî, mehkeme wê derewên me wek rastiyê qebûl bike. Çimkî nikare neke. Ji ber ku rapor wek şûrê hezretî Elî bi hiner û qewet e!

Heso ji dil keniya:

»De ka bise Xwedê ji te raziyo, wilehilezîm te hiland lo. Te bihar ji me re anî kabokê. Xwezîka wek ku tu dibêjî, wilo bi rehetî ba.

Di mehkeman de helbet derba sîleh ji derba kevir bêtir sergêjiyê dide dijmin û zimanê mirov dirêj dike. Lêbelê mirovê me ê ku qaşo bi demaçê birîndar bûye, tiştek pê ne hatiye. Gule di ser çermê wî re xijiqî ye, mîna bista sincirî çerm alastiye û derbas bûye. Birîn şikê çêdike. Eger gava yek nebêje ev birîna gulê demaçê ye, wê mirov hîç bîr nebe ku birîn, birîna gule ye ji xwe.«

Hemo piştî ku got »Apo tu şaş î, gule perçek goşt ji kêleka Luqmên revandiye« û cihê xwe guhezt.

Heso bi gotina wî xwe mecbûr dît ku dîsa li birînê binere.

»Luqman ka were vir, ez careke din li birîna te binerim. Em ê bibînin bê bi rastî ez an hûn şaş in.«

Kenêr:

»Bi rastî, ez nizanim bê hûn dixwazin çi isbat bikin. Porê me di berberiyê de sipî bû, min pêncî derbas kir, navê me bû Şeytan û hûn rê nadin min ku ez çend gotinan ji we re bibêjim!«

Ev Kenêr jî fitnebazekî ku Zibêr nikarîbû av li destê wî bikira. Ji xwarin û vexwarinê bêtir hej berberiyê dikir. Di vî warî de bi qasî navê xwe jîr bû. Û ewqasî jî diz bû. Ji bo berberiyê çi lazim dihat, li ba wî peyde dibû. Xerabiyê di destê wî de wek seetê kar dikir. Bi tirkî wek bilbil dipeyivî. Dizanîbû bixwenda û binivîsanda. Ji bo ku navê şeytaniyê li xwe rast bike, Quran û kitêbên dînî û heta ên felekî jî xwendibûn. Mele nikarîbûn pê re têketana devjengê. Bêî izna wî melan newêrîbû meletiya gund bikira. Tiştê ku dibihîst hîç ji bîr ne dikir. Ewqasî devliken û wensxweş bû, heta bi fesadiya wî zewq dida mirov. Siqêfên wî wek şekir bûn. Ji diziyê

zewq distend. Didizî û dîsa li xwedî vedigerand. Malê diziyê ne dixwar. Deftera wî heta bi dev dagirtiye.

Rojekê ew û melê Xerêb li sûka Nisêbînê li hev rast tên. Mele gotinên ne xweş pê re dike. Ew jî bi xwe re hiltîne. Kenêr di şeva terawîhan de dikeve mizgefta Xerêb. Di van kêlîkên ku mele û sofî bi cezmê ketine, ji bilî şekala melê ên hemiyan didize û li çiyê dişewitîne. Bi kurtî, sofî ji mele dikevin şikê ku ev ê diz zilamê wî bûye. Çavreşiyê diavêjin melê û dûv re jî wî ji gund der dikin.

Jina Selîm û jina wî li ser dora tenûrê pevdiçin. Jina ê din serê jina wî dişikîne. Kenêr dîsa bi xwe re hiltîne. Di şeveke ku herkes li ser xaniyan razaye ew hildikişe ser xaniyê Selîm. Derpiyê jinikê ji ber serê wê radike û bi dîrekê text ve dadiliqîne. Dibe sibeh herkes derpî dibîne. Ev ji bo jinikê eybeke mezin bû! Selîm ji bo vê yekê, dev û ruyê jina xwe dipelixîne.

Çend sal berê jî şêxê Tinatê li ser daxwaziya Sarê bi rêya hin endamên PDKTyê hatibû gund. Şêx herdu bendan li hev tîne. Lê li ser daxwaziya şêx, Heso mala Kenêr jî ji gund rakir bir Sarincê. Îcar vî mirovê fesad di hikmê neh rojan de sarincî berdan pêxêla hev. Yanî heyfa Zorava ji Sarincê hilanî. Kenêr piştî ku li Sarincê berberiyê li dar dixîne, bi mêvanî her roj diçe Gundik û gundikiyan jî berdide hev. Îcar dema ku berê xwe dide kuçûkiyan, aşitiya Heso û Circîs bîst û sê rojên xwe dadigire û aşitî têk diçe. Li ser daxwaziya Sarê û Heso Kenêr dîsa malê tîne gund. Sarê digot, »Eger me ew kafir dîsa ne anîba vî gundî, wê mentîqê hevdu biqelanda!« Wî jî gotina wê erê dkir, »Pîrê rast dibêje, min xistibû serê xwe ku temamê mentîqê berdim hev. Û dûv re jî şêx bixirînim...« Gundiyan navê wî kiribû »Şeytan!« û wî jî pir kêfa xwe bi vî navî dianî. Gava ku ji gund diçû gundên derdorê, zilamê ku pêşî ew didît hildikişiya ser xênî û bi dengê bilind bang dikir:

»Hat hat hat! Şeytan hat! Ey gundîno, bi telaq min tu gotinên xerab bi kesekî ji we re ne kiriye! Şeytan derewan dike, bawer nekin! Haho haho Şeytan hat, hat hat!..«

Di derbarê »Roja qiyametê« de gava ku melê gund digot:

»Di vê rojê de insan, mê û nêr, şilfîtazî ne û bi bafîka ku hev nebînin Xwedayê mezin çavên wan dixe nava serê wan.« Kenêr jî wê bigota »Xwedê bi aqilî ne fikiriye. Eger bi rastî wek ku tu dibêjî wilo be mele, ez ê xwe daqûl bikim û li pîrekan binerim...«

Rihê wî ji şêx û melan diçû. Misilmanî qebûl dikir, lê ne limêj û ne jî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rojî digirt. Ji xwe tu carî xwe helal ne dikir, her tim bi cenabet bû. Li ser vê yeka ha, ew û jina xwe gelek caran ketibûn qirika hev. Di dûmahîkê de jinik pê re dernaxîne serî û wî bi wî haweyî qebûlî nav livîna xwe dike. Temamê herêmê pê dizanîbû. Wan bi xwe digot.

Li cephê Circîs jî çend fitnebazên zîrek hebûn, lê ne digihan toza Kenêr. Di nav wan de ê herî meşhûr lawê Circîs Hesûk bû. Ji wî re jî digotin »Abanos.« Kenêr dersek dabû wî jî. Xwe ji Kenêr pir mezintir didît û di derbarê wî de li her derê zimandirêjî dikir. Rojek havînê seet li dor duwanzdehê nîvro ye. Hesûk ji Stilîlê tê gund. Kenêr maskê girêdide, eyaran li xwe dipêçe û diçe ser dara ziyareta Pîrkemêl. Dar di nav mezel de ye û rê di be re derbas dibe. Dinya bêpêjin e û kesek li wê navê tune ye. Hesûk digihê hindama darê, Kenêr bi dengekî ecêb diqêre û xwe ji darê diavêje ber. Hesûk di cih de ji desthilanîn dikeve û lal dibe. Kenêr direve. Hesûk jî li wê navê vezilandî dimîne heta ku şivan wî dibînin. Li gor ku digotin, li dor sê seetan li erdê mabû. Hesûk birin nig gelek şêxan, birin ba doktoran û dîsa jî bi ser xwe ve ne hat. Di dûmahîkê de Kenêr pereyekî baş ji bavê wî distîne û bi haweyên xwe, wî dîsa dike ê berê. Li ser ku çima ew rehet kiribû, demekê dilê wî û Heso jî ji hev mabû.

Heso bi qahr got:

»Kî dibêje em ê rê nedin te birayê me ê Şeytan! Tu topa mahlûmatê yî, tu teyara Atatirk î, tu bomba dawî ye; bêhna xwe fireh bike, ey serekê temamê şeytanan!..«

Luqman di nîvê odê de li ser kursiyekî piçûk û bêpiştek dan rûniştandin. Luqman bi qelafet bû; mîna bertelaşekî sitûr, gîtirqalind û li ser xwe bû. Sermezin, rûgirover û esmer bû. Bêvilşerbikî bû, lê simbêlan ev aliyê bêvila wî dinixumand. Simbêlên xwe bi haweyê omerkî bada bû. Serikên simbêlan li mewîjê xistibû; serik mîna qiloçên beranan li ser ruyê wî rawestiyabûn. Enîbeş, birhûqalind û çavreş bû. Damarên mêraniyê di eniya wî de vekirî diyar dikirin. Kelefên qûnê xwe bi çar kenarên kursiyê de berdabûn, kursî di bin de vêl rawestiyabû. Xwas bû. Bi tenê lingê wî ê çepê bi gore bû. Gore reş û naylonî bû. Panî û sertiliyên gorê qetiyabûn. Lê wî bi tiliya xwe a qilîçanê gore li ser ferşê ling radigirt. Herdu destê xwe danîbûn ser çongan û bi alîkariya destan temamê qeweta xwe berdabû ser lingan. Damarên ku di ferşên lingên wî de bel bûbûn, mirov dikarîbû yek bi yek bihejmartana. Kurkekî gewr lê bû. Xuya dikir ku kevin bû. Serpişt û berstika wî zelhitî bû. Di bin kurk de bi tenê sertaziyekî cawsipî li xwe kiribû. Sertaziyê wî ji sipî, rişk û guyê kêçan pitpitkî diyar dikir. Di qilêrê

de debixî bû. Qilêr, xwîn û xwêhdana ku di laşê wî de gihabû hev, mîna bereta gayekî bêhn dida. Dema ku çepilê xwe bilind dikir, wek ku ba li beretê bixîne, ji nişkê ve wexma bin çeng hawêrdor difûriya; bêvil di wexmê de dixitimî û sergêjî bi mirov re çêdikir. Luqman di nav xwe de tena şerwêl tazî kirin û nola libên tizbiyê li dor wî xelek girtin. Heso rê neda kesî. Tiliya xwe a işaretê tam hilda, bi qahr di birîna wî a zengirê de rakir û got »Ku derê vê birînê dişibe a demaçê, hi?«

Bi lepta wî re barînî bi Luqmên ket:

»Ayy yabo! Xwedê ji te raziyo te ez kuştim hinekî bi hêdî!« û pêl lê ket.

Eger ne ji Casim ba, ew ê miheqeq serpiştkî di kursî werba. Lê Casim jêhatî derket, ew hişk zeft kir û ne hişt tê werbe.

Birîn ne wek ku Heso digot ewqasî piçûk bû. Gule bêî ku çermê tenik qul bike, di bin çermê qalind re firiyabû. Dewsa birînê ji hêla ku gule lê ketibû bi qasî serikê şûjinê û ji hêla ku derbas kiribû jî bi qasî mewîjekê fireh xuya dikir. Herwiha di navbera pêş û paşê birînê de li ser çerm, işareta tiştekî ku çerm alastibe an şîş kiribe tune bû. Dema ku wan Luqman nuh anîbû odê, Heso berî herkesî qutikê wî jê şemirandibû û li birîna wî temaşe kiribû. Qutik û şerwal ji rexê birînê ve yekser bi xwîn bû; xwînê di qazaxê wî ê hirî re dabû der û gihabû çakêt. Gerek ji herkesî çêtir wî ji rastiya birînê fêm kiribûya. Ji ber ku pîş bi dermên û doktoriyê dikir. Him gulê gava ku li ser tiliyekê çerm şîş kiriba, ewqase xwîn dê ji çerm nehata.

Hemo bêvila xwe firkand û bêî ku bêvilê berde axivî:

»Apo, gule çerm şîş ne kiriye, di bin goş re firiyaye. Di birînê re du qul xuya dikin, baş lê binere.«

Heso paş de gav avêt. Lê gotina ku berî niha kiribû, bi haweyekî aqilane parast:

»Rast e, wek we ye; gule di bin goşt re firiyaye. Lê dîsa jî ne hêja ye ku mirov xwe bi vê birînê re biherimîne û biçe gilî. Birayên mino, divê em hev fêm bikin. Textor ewladê zinê ne. Ew dikare baweriyê bi gule neyne û bibêje ku, vî mirovî bi şûjinê çermê xwe qul kiriye. Lêbelê eger baweriyê bi gule bîne jî, wê tu raporeke wilo hêja nenivîsîne.«

Heso a di dilê xwe de hîn ji serî de gotibû. Lê ji bilî Kenêr kesî ew fêm ne kiribû ku dixwest, gule hinekî bi berjêr de çûba, hinavên lawê wî biterişiyana û bi delîlên qewîn biçuya gilî.

Hemo û Miho bi yekdevî:

»Apê Heso eger tu bi a me bikî, em gilî bikin baştir e.«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Çima baştir e? De ka wê bibêjin.«

Hemo:

»Baştir e ji ber ku bi kêmanî hema wê esker doza sîlehan li wan bikin. Ez Circîs baş nas dikim: Li ber lêdanê xwe nagire û wê sîlehan teslîm bike. Îcar ma ne baş e ku him esker li dijminê me bixîne û him jî sîlehên wan ji wan bistîne?«

Gotina vî ji herkesî bêtir li hesabê Miho hat. Xwest ku piştgiriya Hemo bike, lê Sadiq madê xwe tirş kir:

»Na na, ezbenî ne wilo ye. Dema ku gilî serguherî têhildana sîlehan bû, ew jî wê di sîlehên me hildin. Hûn baş nafikirin. Him ji xwe gilî bi malbata me nakeve, mirovên qels gilî dikin.«

Heso:

»Sadiq rast dibêje. Ez jî di wê baweriyê de me. Vî eskerî dema sîleh ji dijminê me sitend, wê ji me jî bistîne. Bi berberiya nav me dizanin. Ji bo vê berberiyê em her meh qiyameteke pere didin wan! Di gundekî de, gava terefekî rahişt sîlehan, bêdevjeng terefê din jî wê rahijê. Eskerên tirk ne zarok in, ji me çêtir dizanin. Vê meseleyê qut bikin. Em jî gilî nekin heta ku ew li me gilî nekin. Ma tu çi dibêjî serekê şeytanan?«

Kenêr bêsebir di cihê xwe de diqeliqî û çixare ji çixarê pêdixist. Di her şevbihêrkê de civatê ew dabaş digirt û wî jî tiştek bêbersiv bernedida. Ji herkesî bêtir ew dipeyivî. Îcar Heso jî di her rojên qewamê de gava bi koma xwe re rûdinişt, ne dihişt ku Kenêr bipeyive. Ew dihişt dawiyê. Wî bi vê yekê dixwest ku Kenêr lê hûr bibe, gotinên civatê wek melhêbê di bêndera mejiyê xwe de bi kar bîne û dûv re biryara xwe bide. Di vî warî de gotina wî her tim rast derketibû. Heso ew wek wezîrê xwe didît. Lêbelê digel ku wî bi xwe jî bi vê yeka ha dizanîbû, dîsa jî lez li xwe dikir û diqeliqî.

»Mirovên qels gilî dikin. Her çiqasî ev gotin rast be jî, di bingehê xwe de xurtên mezin qels bi xwe ne. Ew giliyên wan ji xurtayê tê. Îcar ku em a din bibêjin...«

Giran peyivî civat tênegiha. Wî bi van gotinên xwe ên tevlihev xwest ku Sêdiq ji derb bixîne. Li nav çavê wî dinerî û diaxivî. Çi gotina ku li hesabê wî nehata, bi gotineke qewîn fik dikir. Yekî agir, ê din av dipijiqand. Dinyaya wan ji hev cihê bû. Yek dojehî yek bihuştî bû. Wek şahirên nezan nizane bê çi dibêje, çend gotinên girover û ziwa, ku şil ba belkî bi derekê ve bizeliqiya, digindirîne wê navê, xwe zana diyar dike û direve.

Civatê bi yek devî:

»Me fêm ne kir bê te çi got. Tu ka a pêşî biqedîne, dûv re were ser a din...«

Vî fesadî wê çi bigota? Nikarîbû tiştek bigota. Bi haweyê ku civat pir xeşîm û ew jî pir jîr e xwe nepixand:

»We fêm ne kiribe ez çi bikim yanî! Erê, helbet esker û heta hikûmet jî dizane ku sîlehên me hene. Çavên xwe ji me re digirin, ji bo ku em hev bikujin. Lêbelê gava me dev ji sîlehan berda û me dijminê xwe ne kuşt, wê dijmin jî wek me bike gelo? Na. Yanî gava em nerin gilî, wê Circîs jî nere gilî gelo? Wê here. Helbet berberî ne baş e. Lêbelê ma wê Circîs dev ji berberiyê berde, hi? Na. Circîs niha li qereqolê ye« û devê xwe girt.

»Yanî tu dibêjî em gilî bikin?«

»Erê apê Heso.«

Simo:

»Eger hûn bi amin bikin, em ê çend deremêtan di bin xaniyê Crcîs de bi cih bikin û hemiyan bikujin. ku ne bi wilo be, em ê tu carî ji qereqol û mereqolan xelas nebin. Heta ku Circîs û zuryeta xwe hebin, em ê her tim li ber devê deriyê qereqolan bin û hew!«

Heso:

»Wileh tu baş dibêjî, lê nizanim bê ez ê çi ji te re bibêjim...«

Vî Simo jî di sinhetê xwe ê fesadiyê de bi Zibêr re gav diavêt. Lêbelê ji konebaziyê bêtir ehmeqşeytanî bû. Belkî tozekê ji Zibêr li pêştir ya jî li paştir bû. Gundiyan demekê jê re »Deqdenos« gotin û dûv re dev ji vî navî berdan û bi navê wî ê rastî bang kirênê. Wî ne bi tenê ev gund, dinya dabû ber xwe. Hesin, kaplo, barûd, deremêd, pîl, empûl û têl li xwe civandibûn ku sîlehekî çêke. Û bi vî sîlehî temamê dinyayê bişewitîne. Sîleh çêdikir û ji Kenêr re digot:

»Howeh kuro, ez li teqandinê dimînim heyirî! Ez nizanim bê ez ê çawa vî sîlehî biteqînim ku tiştek bi min neyê...«

Kenêr jî digot:

»Bi rastî terî ji te kêm e. Dibe ku ez bikaribim rêyeke teqandinê ji te re bibînim, lê ehmeqo gava ku te bi vî sîlehî tiştekî bi rih li vê dinyayê ne hişt, tu ê bi tena serê xwe çi bikî? Tu ê kê û kê berdî hev, tu ê bêfesadî çawa bikaribî bijî?..«

Gotina vî dikeve serê wî, dev ji wêrankirina dinyayê berdide. Aliyê Simo ê herî girîng ku motomanekî ji serxweçûyî bû. Gava ku derewên beloq dikirin û civat li himber derewên wî disekinî, derew pê dibûn rastî û wek rastiyê diparastin. Ji ser a xwe danediket.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji wîzwîza çûk û teyrikên çolê xuya dikir ku royê xwe berdaye tasê, qasekî din wê here ava û Zorava dê dîsa di bin reşaya ezmên de bimîne. Çûkên beytik ji xwe ji zû de ketibûn hêlînên xwe û xwe di nav qirş û palê de veşartibûn. Ji zerzûl û reşêlan, darên behîvên nav rez bi carekê ve reş bûbûn. Kolekan hîn xwe ji ser bênderên gund neda bûn alî. Lê wan jî bi lez nikil di erdê radikirin. Hin zarokan mêrdewan li ber xaniyan danîbûn û li qulê çûkan dixebitîn. Mele Salar li ber deriyê mala xwe haziriya bang-danê dikir. Êşkencek giran dîtibû. Bi zorê xwe li ser lingan digirt. Ew jî eger pala xwe nedaba hêtekî. Civata Heso jî digel ku bi seetan birçî û tî bi heraret axivîbûn, heta ku mele bang ne daye, ne Xwedê û pêxember, ne limêj û ne jî zikê wan ê birçî hatibû bîra wan. Ji bilî ku xerabiya hev bi-fikirin hîç, erê hîç tiştek di bîra wan de ne hatibû. Reşayê xwe berdabû hinduran, ode tarî bûbû. Lê wan ji hingama ku dikirin, bîr ne dibirin ku lempê ji xwe re pêxin. Di vê navê re, ji herkesî bêtir halê Kazimê pizûrî ne xweş bû. Kazim tibabê du seetan bûbû ku li ser xênî qilawizî li nav malan dikir. Ji serma dirikrikî. Li ser qesira Circîs pêgirtiyê hûran Ekremê torî jî wek Kazim bûbû qilawiz û ziq li mala Heso temaşe dikir.

»Weh mele bang dide! Çi zû bû mixrib, wey wey wey!..«

Xelef destê xwe avêt zincîrê ji bêrîkê seet kişand û ber bi çavên xwe de anî. Hindur reş bû, seet ji hev ne fesiland. Rabû ser xwe û wek dînan li dor xwe nerî. Li pencerê digeriya. Pencere li pişt bû, lê aqil ne dikir ku li pişt xwe bizîvire. Ew hîn di wê rewşê de bû, Zibêr ji devê derî peyivî::

»Wey erê bi Xwedê Heso, kuro bi rastî mixrib e! Seet pênc û çarîkek bûye. Melê gerek li pêncan azan bida« û derket.

Sadiq ji dil keniya:

»Kuro qey mele jî wek me xurifiye, lawo...«

Sîrac keniya:

»Xwedê ji te raziyo Sadiq qe seet jî naxurif e!«

Sadiq di bersiva wî de:

»Belê belê ew jî dixurife. Di hindurê seetê de şeytan heye. Bi telaq şey-tan jî nikare bi vî gundî. Me qûn li şeytên qetandiye, îcar em ê çawa qûnê li melê ku tew hîn nikare bifire, neqetînin! Bêhna xwe fireh bikin, hûn ê bibînin eger mele di vî gundî de hiş berneda, mêja eşa bi hesabê nîvro û a nîvro jî bi hesabê eşa ne kir û berê me hemiyan neda bakur, ji xwe bila ez ne ji pişta bavê xwe bim...«

Civat hemû rabû ser xwe. Herkes bi haweyê ku bi şev dîsa li mala Heso li hev bicivin, garankî ji odê derketin. Lê Sarê li hindurê malê

pêrgî wan hat:

»Pizûrîno bi ku de? Lawo me şîva we kavirek ser jê kiriye, şîv hazir e. Ma ne eyb e ku hûn bêşîv ji mala me derkevin? Qey hûn me kêm dibînin?..«

Sadiq gotina wê birî û bi dengekî bilind got:

»Keçê pîrê hema ez bi heyrana te bim, lê! De ka were ez destê te maçî bikim, were! Ê hema bi telaq tu ji me hemiyan bi namûstir î. Eferim, diya Luqmên eferim.«

Sarê pêşî keniya; dûv re destê xwe bilind kir û bi hêrs got:

»Na na Sadiq, ez ne diya wî bênamûsî me; ez diya Reşoyê çavreş im, çavreş. Ker di diya Luqmên û temamê zaroyên min...n!« û li hindurê malê vegeriya.

Bi peyva ku Sarê got »Me kavir ser jê kiriye«, qurpînî bi dilê Heso ket. Qasekî xaşomaşî bû. Dûv re mîna ku hin jê re bibêjin, »Pêwîst nake êdî tu xwe aciz bikî. Kavir nema bi rih dibe, şikiriya xwe bîne ku jinikê ga ser jê ne kiriye birako!«

Sarê aveke hênik bi ser dilê wan ê helhilî de dakiribû. Şîva wan goşt û tirşika fasûliyan bû. Ji du mehan carekê bi zor û heft belan incex ruyê goşt didîtin. Ew jî ya fêrîkeke ku zarokan derb lê daba, ya mirîşkeke ku bi êşê ketiba û ya jî cûmek goştê meksûd bû. Di nav neh, deh kufletên hûr û mûr de mirîşkek wê bûba çi? Wê kê bixwara û kê nexwara? Heta belkî hinan ji wan ji salê heta salê ruyê goşt jî ne dîtibûn. Hemû bêî ku li bendî gotina mezinê malê Heso rawestin, bê ka mezin çi dibêje, di cih de li hindurê odê vegeriyan. Dualî sef girtin. Çong berdan erdê, eskerkî rûniştin û cihên xwe xweş kirin. Baş bû ku Sêdiq bîr bir û lempe pêxist. Eger ne ji Sêdiq ba, kî dizane belkî di wê rewşa tarî de, hemiyan dê şîva xwe bixwarana û dîsa bi devjengan rahiştibana hev. Sarê disteke goştê pez ji wan re li êgir kiribû. Ev pez kavir e û goştê kêvir bi qasî goştê berxên hilikî xweş bû. Hiş û sewdan ji serê wan firiyabû. Hemiyan dixwest xwe bi heyrana Sarê bikin. Zibêr di bin tesîra goşt de ji hawhaw ketibû. Ji dilê wî dihat ku Sarê bi gotinên herî kubar bipesinîne, lê gotinên layiqî mezinahiya wê, ne didîtin. Devê xwe xistibû guhê Miho û bi dizî jê re digot, »Ez dest û lingên wê maçî dikim, maçî dikim maçî dikim...« Eger Sarê di vê kêlîkê de, ji xwe fedî ne kiriba û bi siqêfên kotî dabelişiya civatê, ji kêfa şîvê re belkî gelekan ji wan ew siqêf ne bihîstibana jî. Dualî birçî bûn; him birçiyê goşt û him jî birçiyê fesadiyê bûn. Dîsa eger Sarê aqilî kiriba û ji serî de civat bi vê bûyera xwe agahdar kiriba, miheqeq wê hin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mirovan bi milama qenciya vê pîremerdê, seyra devjengê lîçekî serguherî xêrxwaziyê kiriba, an devjeng dê ewqasî genî nebûya. Ji rewşa wan xuya dikir ku çendî li ber goşt ketibûn. Mirov di çavên wan re didît ku ew di vê bîstikê de ji goşt pê ve tiştekî din ne difikirîn. Ji bilî Heso hemiyan mîna guran bi awirên xwe ên birçî devê deriyê odê hûr hûr dibirîn.

Teqe req ji aliyê malê bilind bû, çingîniya firaxan li odê deng veda. Pêl kete civatê. Herkesî mîna ku xwarin li ber be, xwe ji xwarinê re hazir kir û ziq li devê derî nerîn. Dema ku Temo bi leganeke birinc û ser birincê jî tije goşt kete hindur, herkes ji hindama xwe de bêhemd rabû ser xwe û bi haweyê ku heryek terbiya xwe şanî ê din bide ji hev re gotin, »Kuro eyb e ji we re, hinekî alî Temo bikin, weh!« Legan di ser destên hev re herikandin dawiya odê û li ser kom bûn. Lê Sadiq hevalên xwe nas dikir. Digel legana duduyan hîn bi rê de li hewşê got, »Leganeke din hat, leganeke din« û bi lez xwe avête hindurê odê. Bi dû wî de Meyro hat. Li ser destên wê sêniyeke dorniqirî tije birinc û ser birincê yekser bi goşt nixumandî bû. Xuya bû ku bi lez sênî dagirtibû. Qiraxên sêniyê ji libên birincê paqij ne bûbûn. Birincê ji nîvê sêniyê bêtir, li ser qiraxan diyar dikir. Lê Meyro hîn ne gihabû ber Heso, li şekalan likumî, hindik mabû bike-ta. Meyro li ber xwe ket û xwe hinekî bi ser hev de qurmiçand. Sadiq bi exlaqê xweha xwe dizanîbû ku çendî dilkeçikî ye, dikare di cih de bigrî. Keniya û got:

»Keçê ez jî li şûna te terpilîm. Wan şekalan ji wir biavêjin« û yekser sênî ji dest girt.

Sênî li ber Heso danî û bi lez dîsa li hindurê malê vegeriya. Sadiq ji aliyekî de û Temo ji aliyekî de, tam pênc sênî tirşik kişandin hindur. Sênî sifir bûn. Hinekî mezin bûn.

Meyro jineke dirêj, gewr û xwînşêrîn, henûn û misixur bû. Vê pîreka diltenik, wek zarokên ku hîn ji dinyê fêm ne kiribûn, nizanîbû bigota »Na.« Kê çi jê bixwesta wê didayê. Heso carina henek dikirin û jê re digot »Keçê, xwe hînî gotina na-nabe, bike. Binere hin dikarin ramûsanan ji te bixwazin. Ji bo ku tu xwe bi dest kesî bernede, xwe hînî van herdu gotinan bike... «

Zarokan bi satilan av dikişand odê. Lêbelê hayê kê ji avê hebû. Digel ku hemiyan ewqas lêdan xwaribûn û dûv re jî şerekî mezin kiribûn, qaşo gerek bi satilan av vexwaribana, ava çi! Di vê dema ku herkesî xwe dadaye xwarinê û nehişî gepê dadiqurtîne, ji ser xênî dengê Kazimê pizûrî hat, »Hûto hat, Hûto!«

Bi dengê Kazim re Sadiq keniya. Lê ên din mîna ku tu cereke ava qerisî bi ser wan dakî di cih de rawestiyan. Tepsiya Heso ji ser çongan herikî; birinc û tirşik rijiya û goşt bi ser doşekê de belav bû. Heso di dilê xwe de piçpiçî. Di dawiyê de xwe ne girt û teqiya:

»Wey ne li ser xêrê bê! Xwedê heft topan li mala wî xîne! Erê hûn bi qedirê Mishefa Reş kin, ma niha wextê hatina wî bû lo!«

Raberdana Heso a li himber Hûto bi dilê hemiyan bû. Pir dixwestin ku Heso bêyefş jê re xeberan bide û ew jî hîn siviktir bikaribin gepan bihepişînin devê xwe. Çimkî bêdengiya di ser xwarina bi tevayî de, rê li xwarina bi fahşitî digirt; mirov li hev dinerî ji hev fedî dikir û bi isûl dixwar. Lê mixabin Heso jî mîna ku bêisûliyek kiribe, devê xwe girt û bi geremola dor xwe daket.

»Zibêr, nebêje ku Miho ehmeq e û ez ne dîtime ha. Min dît bê te çawa bi xezeb pariyek goşt xist paşila xwe.«

Zibêr li vî gundî xwedî erd û pismamê Heso bû. Ev yeka ha hîç pê ne diket. Belkî jî dizî pê re bûbû wek nexweşiyekê.

Wî jî wek wî devê xwe xist guhê wî û bi dizî jê re got:

»Hişşş deng neke. Tu jî bidize lawo, keysa me lê hatiye.«

Miho piştî ku di ber xwe de beşişî:

»Kuro ji xwe ji zû de min paşila xwe dagirtiye. Lê ma te dît ku bê min çawa bêrîkên qapût ên hindur ji birincê dagirtine?«

»Na lo! Lawo min digot qey bêjiyê mezin ez im, lê tu ji min jî hîn bêjîtir î! Wileh ne ez bi diziya goştê te û ne jî bi diziya birinca te hisiyame.«

»Miho, ser darên behîvan tije reşêle bûne, hema piştî ku civat belav bibe ez û tu em ê herin wan. Binere eman eman bila kesek pê nehise! Em ê çima van tiredînan bikin şirîkê xwe. Lawo, bi Quran heryek ji me wê disteke goşt bigihêyê!«

»Temam temam, min fêm kir, em ê herin, qut bike, dîwar bi qul in hişşş!«

Di her şevên zivistanê û bi giştî jî di rojên seqemî de reşêle û herwiha gelek teyr û tilûrên din jî bi refan li ser darên behîvan dilûstin. Ji ber ku rez duperçe bû, perçê jêr ê Circîs û ê jor jî ê Heso bû û darên behîvan jî hemû di nav rezê Heso de bûn, hûrî ji goştê teyr û tilûran mahrûm diman. Pizûrî her şev diçûn nêçîrê û zembîlên xwe ji goştê teyrikan dadigirtin.

Hûto hîn li dor rez bû, Doguj bêhna wî kiribû û bi lez û bez çûbû pêşiyê. Hûto destên xwe li situyê wî gerandibû û ruyê xwe bi ruyê wî ve


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

firkandibû. Doguj ji Temo bêtir hogirî wî bûbû. Bi rastî ev kûçik te digot qey ne heywan bû, mîna insên fehman û bîr dibir. Dema ku eskeran bi G3an li Hûto girêdabû û Hûto ber bi Dêrê de direviya, Doguj jî hilkişiyabû ser bena rez û bi hêrs direya. Ji rakêşîn û kêferatê, toqa hesinî situyê wî birîbû. Situ bi xwîn bûbû.

Hûto gava xwe avêt hindurê odê û li paş xwe nerî. Kûçik ne dît. Kûçik berî wî ketibû hindur, lê hayî ne bûbû. Heso qîr da:

»Haho ev çi ecêb e! Lawê berêz zû wî kûçikî derke!«

Lê Sadiq bi haweyê ku lewlewa Heso bibire û herwilo Hûto jî li ber xwe nekeve, sivik pêrgî wan rabû. Li ber kûçik rawestiya, destê xwe di ser serê wî re bîr û anî.

»Ji xwe re li vî kûçik-insanî binerin, bê çiqasî bi aqil e. Mêrik hatiye civatê ha. Qey dixwaze şîretan li hinan ji me bike« û digel Hûto bi kûçik re derketin hewşê.

Di wê navê re jî Heso bi ser Sêdiq de dikir birebir:

»Kuro destê xwe nede wî kûçikî, te xwe herimand!..«

Hemo û Xelef ji ser xwarinê vekişiyabûn. Vekişandina wan di esasê xwe de ne ji ber ku têr xwaribûn, ji bo Hûto ev camêrî kiribûn. Hema çawa ba, Hûto hevalê wan û dijminê dijminê wan bû. Him ma ne wî jî wek wan, di vê roja seqemî de ji destê eskeran êş û cefa kişandibû. Pariyek goşt û çend lep birinca ku Sarê xîç çêkiribû, bixwara wê çi bûba qey. Ji bilî wan, kesî xwe ji ser sifrê neda alî û sifre ji dêwê malbata xwe re bernedan.

Hûto bêî ku hin jê re bibêjin »Kerem bike ser xwarinê«, hema wilo li bayê hatina xwe kabok berdan erdê, zendik çikilandin û destên xwe ji xwarinê re vemaltin. Lê mixabin hinekî dereng mabû. Ji xwe goşt hîn ji serî de qediyabû. Birinc jî gihabû terka dawiyê, binê leganê diyar dikir. Rewş pê zor hat. Di ruyê wî re xuya dikir; rû reş gewirî bû. Pêşî destê xwe ê çepê avêt leganê û bi tenişta wê girt. Birinca Sarê tam çivir bû; te digot qey bi rûn kelandibû, birinc di nav rûn de mixmixî bû. Hûto serê tiliyên xwe xistin binê leganê û bi tiliya girdikê tenişta leganê dewisand. Wî çiqasî dewisand tilî jî ewqasî çû xwar. Terkek mabû ku leganê qul bike, ji nişkê ve tilî hilda û di dilê xwe de got, »Miheqeq pîra Sarê hesabê min û xwarinê kiriye.« Lê gerek hîn ji serî de wilo bifikiriya. Ji ber ku her tim gava Sarê didît xwarin û gava ku xwarin didît, Sarê dihat bîra wî. Di vî gundî de bi tenê Sarê qîmetê wî digirt û ew fêm dikir. Ji destên diya xwe bêtir, ji destên wê tahmtîtk xwaribûn. Eger ne ji Sarê ba, belkî wilo betil jî mezin ne bûbaya. Piştî ku Sarê hat bîra wî, hîn nuh bêhna wî derket û

lepê xwe dirêjî hindurê leganê kir. Bi tûşa pêşî re şiyar ne bû ku digel birincê goşt jî hebû. Çawa lepê duduyan avêt devê xwe, rûnê di binê leganê de û cûmek dûv, kortika qirikê şil kir. Mîna gulekê vebû. Pê hisiya ku bi birincê re goşt jî heye û birinc birinca ber goşt e. Vê carê jî tam bi haweyekî hovane kişiya ser. Bi herdu lepan xwarin da ber hev û mîna dewlên li ser devê bîr û birkan, lepek hilda û yek danî. Lê çi fêde, tu xwarin nema bû. Di vê kêlîka ku binê leganê bi kefa destê xwe paqij dikir û kef dialast, ji beragirka xwarinê dengê Sadiq hat:

»Hûto xwe bigire, ez bi leganeke birinc û goşt bi te ve giham.«

Hûto ji kêfa xwarinê re serxweş ketibû. Ji cihê ku lê rûniştîbû çeng bû, qêriya, »Ooox goşt, goşt!« û bi haweyê hirçê xwe kiland. Legana tije birinc û goşt ji destê Sadiq revand û li wê navê ket ser.

»Howeh kuro, îro hindik mabû ku qomandar pîra me bikuşta! Ez dibê Xwedê di ber pîra me de ciwange feda kir, hûn çi dibên? Ciwange kir setqa wê.« Civat hemû pê keniya.

Hûto heta ku bûbû zilam jî bawer ne dikir ku Xwedê li ezmên rûdine. Niha jî bawer ne dikir. Ji bo ku dilê Sarê jê nemîne wilo dikir. Li gor wî Xwedê insanekî wek çiyakî mezin bû û çênedibû ku ev çiya bêsenede û menede li hewa rûnişta. Ji xwe hîç bawerî bi pêxember ne dianî. Sarê pêxember pê insan dabû naskirin û jê re gotibû »Pêxember û şêx difirin ba Xwedê.« Ecêbmayî dima! »Yanî bêî ku li terempêl û teyaran siwarên ha!..« Ne diket serê wî û ne jî dixwest ku dilê Sarê ji xwe bihêle. Mereq dikir ku insan çawa bêbask, terempêl û teyare dikarin bifirin. Di rojeke havînê de bi sariya sibehê re diçe ser qesira Şêx Ataullahê tinatî, herdu lingên wî zeft dike, wek koçanîkekî dizîzikîne û dizîzikîne, li ezmên temaşe dike û virikî diavêje. Şêx hîn li hewa ye can dide. Li gor ku digotin, serê şêx dipelixe û hestîk sax di canê wî de namîne. Îcar piştî vê bûyerê tam bawerî pê anîbû ku insan bêbask, terempêl û balafir wê nikaribin bifirin. Gava Sarê jê re digot »Te çima şêxê me ji qesirê avêt?« Dikeniya, »Min digo ka ez ê binerim bê ev insan çawa difirin! Wek teyran, wek çûkan wek ordekan difirin gelo!..« Lê mixabin piştî bûyerê hema bi çend rojekî, li xwe mikur tê ku Kenêr ew şandiye ser şêx.

Limêj dikir, lê limêja wî ne ji bo Xwedê, ji bo ebdan bû. Reketeke limêj bi sêniyeke birinc, du reket bi çar şekirên çayê, sê reket bi kulmeke mewîj, çar reket bi pariyekî goşt dikir. Destlimêjgirtin, niyetanîn û limêjkirina wî jî hemû evqask bû, »Xwedê qebûl bike, amîn.«

Xutbe bi çil zilamî dibû. Dîsa rojeke înê ye û Hûto di gundê Bamidê re


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

derbasî Eferê dibe. Zilamek ji xutba bamidiyan kêm e. Ji bo ku Xwedê xutba wan qebûl bikira, divabû hejmara wan bûba çil. Ji Hûto re li hev hatibû. Li ser hêkên elokê bazarê digirin. Hûto, »Sisê« ew »Dudu« dibêjin. Di dûmahîkê de herdu teref jî ji hev danaxwin û xutbe li erdê dimîne. Pîra wî Sarê bi vê liberxwedana wî pir kêfa xwe anîbû û pênc hêkên elokê jê re qelandibûn.

Heso:

»Erê erê, ji bo ku xanim li ser pira selatê li kêvir siwarê û tu jî bi dûvê wî bigirî, Xwedê ev qencî bi te kir ku qomandar pîra te ne kuşt.«

Kêr li Sarê disût û di nava xwe de dikeliya.

»Vê jinikê ez talan kirim! Birinc bi me ve ne hişt. Sibe, dusibe başçawîş bê mala me û bibîne ku me birinc jê re li êgir ne kiriye, em ê çi xweliyê li serê xwe bikin! Bi telaq başçawîşê tirek vê carê bi lêdanê wê min tirek bike...«

Heso carekê bi sedema ku birinc û goştê elokê ji başçawîş re çênekiribû, di mala xwe de ji destên wî du şiqam xwaribûn. Başçawîş jê re gotibû »Her ku ez hatim mala te, tu ê ji min re goştê elokekê li ser birincê bikî û li ber min deynî. Eger hema rojekê ez bibihîzim ku te ji eskerê min re elok an mirîşk ser jê ne kiribe, ji xwe pêwîst nake ez ji te re bibêjim. Tu bi min dizanî bê ez çendî bêbav lawê bêbavan im!..«

Bi rastî li ser kiryara ku Sarê kiribû, Heso kirasê xwe biçiranda dîsa jî heqê wî bû. Ji tirsa ku başçawîş wî di mala wî de li pêş zar û zêçên wî pîs neke, nîv telîs birinc kirîbû û Sarê jî ew birinc hemû ji hevalbendên wî re li êgir kiribû. Lê gerek dîsa jî şikiriya xwe bianiya ku Sarê, ji dêvla elokan kavir ser jê kiribû. Eger elokên ku ji bo başçawîş bi qinê gwîzan xwedî dikirin, hemû ser jê kiribana wê çawa bûba! Gelo wê di şûna van elokan de ên wilo qelew, elokên kirînê li herêmê peyde bûbana? Başçawîş gotibû, »Eloka ku ez bixwim divê qelew be. Goştê eloka qelew xweş e...« Başçawîş ji lezeta goştê elokê fêm dikir. Ji ber ku zivistanan xwarina wî her tim elok bûn.

Dabaşa civatê li ser Hûto û xwarina wî bû. Lê Heso jî ketibû newala guman xeman, kûr û dûr difikirî. Xwarin nêvcî xwaribû. Sêniya xwarinê li aliyê malê vegerandibû û zikê xwe bi avê nepixandibû.

»Ma tu ne çû hin gundên derdor?«

Hûto bi xwarinê daketibû. Kengî deng diçûyê. Heso vê carê jî bi dengekî pêt:

»Lawê berêz Hûto, ez ji te re dibêjim!«

»Bibêje xalo bibêje, ma te çi got? Bi tirba bavê te kim xalo deng ne hat min.«

»Ma tu ji qelêç danegeriya gundên derdor?«

»Belê xalo, ez dageriyam Atxê.«

Hemo xwe avêt nav gotinê keniya û bi qerf:

»Malneketo, tu çû heta bi Atxê ha!«

Heso dîsa bi qahr:

»Ma qey kafiristanî bû ku kesî bi xêra xwe gezek nan neda te! Tu wilo birçî ji gund bi rê kirin, ha!«

Hûto li bendî ku gepa xwe daqurtîne û dûv re wî bibersivîne ranewestiya. Bi dengekî hêdî di ber xwe de:

»Jina Şehabê atxî Fatimê tam pênc nanê tenûrê dabûn min« û bi lez lepê xwe di nav birincê rakir.

Miho keniya; kenê wî wek ên keçikên ku bi fitbolê dilistin, bi şîqe şîq bû. Bala civatê kişand. Wî guh neda wan û got:

»Lawo Hûto hinekî ji xwe fedî bike. Xwarin ji ber te nareve hêdî hêdî bixwe te em hetikandin! Baş e ku kesî xerîb di nav me de tune ye.«

Hûto nizanîbû derewan bike. Dema ku dikir jî dikeniya. Bi kenê xwe, xwe dida dest. Di ser kirina derewên wî re bi giştî rojek derbas ne dibû. Bi roj derew dikir û bi şev jî li xwe mikur dihat. Carina jî bêhnikek di ser re derbas ne dibû. Rojî ne digirt. Lê dema ku jê re digotin, »Ma tu bi rojî yî?« Wî jî digot »Erê« û bi şev jî di civatê de wê bigota »Min henekê xwe bi we kir, ez ne bi rojî bûm ha.« Li gor civata herêmê gelek prensîpên wî ên baş hebûn. Bêbextî ne dikir. Bêhnfireh, dilpaqij û sernerm bû. Zexelî li dor peyde ne dibû, miroveki jêhatî û suxrekir bû. Eger ne ji Heso bûya, ew ê tu carî beşdarî pevçûnên gund ne bûya. Wî jî wek Sarê, Perîxanê, mamostê gund, Mîrzoyê mitirb û mele Salar aşitî dixwest.

Kenêr jê hez dikir. Bi haweyê ku bala civatê ji ser Hûto bikişîne û Hûto wek insên bi rehetî bikaribe xwarina xwe bixwe, bi dengekî têr axivî:

»Ey civat, gelo kesek ji we fikiriye gava ku em başçawîşê Sitilîlê bi vê pevçûna xwe a îro agahdar nekin, başçawîş wê çawa afatê bi serê me de bîne?« û bi serê xwe işareta zûxwarinê da Hûto.

Ev gotineke ne xweş bû. Bi gotina wî re firte firt bi Heso ket, mîna ku cerek av biherike bin, di cihê xwe de qeliqî û axîn kişand. Qasekî li bîn zikê xênî temaşe kir, serê xwe berda ber xwe, bi melûlî got:

»Îcar ev ne bû. Bi rastî me ev yeka ha ji bîr kiribû« û çavên xwe zîvirandin ser Hemo. Civat bêdeng bû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hûto bi kêf got:

»Xalê Şeytan, kuro hema ez destê te maçî bikim û hew! Erê willeehh!! Te heyfa min ji wan hilanî, lo! Gepek xwarin bê çi ye ne dihiştin ez bixwim kuro. De îcar bigirîn hi! Ji sibehê de henekê xwe bi aqilê min dikin. Û tu ji xwe re li aqilê wan binere. ku ne xalê min Şeytan heq ji we derkeve, ma kî dikare bi we!..«

Hûto tam ji dil digot û dikeniya.

Gundiyan ji Kenêr re »Apê Şeytan« û Hûto jî jê re »Xalê Şeytan« digot. Gundiyan gava jê dipirsî, »Tu çima wek me wî bi nav nakî?« Wî jî digot, »Xal ji apan çêtir in. Ap pîs in. Gava bavê mirov dimire, ap diya mirov li xwe mahr dikin. Lêbelê herçi xalin, vê bênamûsiyê qebûl nakin. Ji xwe fedî dikin ku diya mirov li xwe mahr bikin.« Li gor pîvanên wî, xweh çi bû jinbir jî ew bû.

Zibêr bi haweyê ku dora axavtinê revandibe ango niha neaxive wê hîç dor negihêyê, bi lez xwe da ser hev û got:

»Em û mala hûran ji bav û kalan de dijminên hev ên xwînê nin. Me bi sedan mêr ji hev kuştine. Û em ê hîn jî pir ji hev bikujin. Lê îcar a ku nakeve serê min, nizanim bê ev hûn çima ewqasî li himber eybê pîkolê dikin. Me pêşiyan gotineke heye dibêjin, 'Dijminayî bêminetî ye.' Yanî dibêjin ku mirov çi di dijminê xwe de bike, ne eyb e. Di destê me de gelek delîl hene ku bi van delîlan em ê bikaribin Circîskê serşûtik û hevalên wî di qereqolan de bi lêdanê bikin kûçik lawê hezar kûçikî. Hûn çima gilîkirinê eyb dibînin? Eger gava bi muxbiriyê mirov wê bikaribe dijminê xwe birîn bike û ji vê yekê reviya muxbiriya wî ne kir, navê vê dibe tirsonekî. Di berberiyê de eyb û fedî tune ye. Tu di dijminê xwe de çi bikî şeref e. Dijminayî bêminetî ye...«

Zibêr devê xwe tije kir ku bibêje, »Mirov gerek heta bi çîçika dijminê xwe jî bikuje!« Lê Sêdiq bi hêrs destê xwe hejand:

»Wî kurmancê ku gotiye, 'Dijminayî bêminetî ye!' bêşeref e! Bi bêşerefiyê mirov bi şeref nabe; bêşerefî navê xwe her dîsa bêşerefî ye. Bi bafîka ku mirov dijminê xwe qels bixîne, mirov nabe muxbirçiyê eskerên quncilik. Wilehî xweş bazar e: Ji aliyekî de li meydana şer bi mêranî dijminê xwe bigevizîne û ji aliyekî de jî bibe muxbirçî ha! Wilo şeref nabe...«

Berî ku Hemo bersiva wî bide, Miho rabû ser kabokan, hêl da xwe ku ber bi Sadiq de bê. Ji bîr kiribû ku bêrîkên wî ên qapût tije birinc bû. Çawa hat, ji bêrîkan birinc bi nav şeqên wî de rijiya. Baş bû ku di tenişt Zibêr de rûniştîbû. Zibêr birinc ferq kir. Hişk bi çepilê wî girt.

»Bisekine! Xwedê ji te raziyo ma tu nabînî ku apê Heso diaxive, weh!«

Herkes ji aliyê xwe de bi dengê bilind ji aş û baş diaxivî. Kesî rê ne dida kesî. Kê çi digot ê din nizanîbû ew çi dibêje. Mezinahiya Heso hatibû jibîrkirin. Ji bilî Hûto mîna dîkên elokan herkesî xwe dabû pêş û gotinên ji xwe mezintir dikirin. Ji van gotinên xwe jî pirole zewq distendin. Bêwestan çixare ji çixarê pêdixistin. Hindurê odê ji dixana çixara wan tarî bûbû. Pace hemû girtîbûn lê derî vekirîbû. Ew jî ne ji ber dixanê, ji ber ku ji aliyê malê her kêlî çayê ji wan re dihat. Dixanê mîna konekî reş î bêsitûn xwe dabû jora wan, bin zikê xênî ji dixanê diyar ne dikir. Dema mirov ji der dihate hindur mîna ku mirov xwe bide ser bayê qulika qedemgehê, hilmeke pîs dida pozê mirov. Hemû ji destê goşt û tirşika fasûliyan kewişî bûn. Gelekan ji wan zêde zêde xawribû; zik li wan nepixîbû û ha ha fis dikirin. Destê wan ji axavtinê ne dibû ku çar, pênc deqîqeyan xwe dûrî civatê bigirin û destavekê bikin.

»Sadiq, lawê min tu her tim bi haweyê mêranî li meseleyan dinerî. Hinekî jî bi konebazî bifikire. Berberiya bêdek û dolab xwedîkuj e. Mirov wê him pêxember be û him jî berberiyê bike, wilo nabe. Berberî dîn û ûjdên nas nake. Di berberiyê de mirov li heq û hiqûq nagere, hertiştî dide nav lingan û pê lê dikê.«

Sêdiq, mîna ku apê wî bi van gotinên xwe qebheteke mezin kiribe, ziq li Heso dinerî. Li ser hevdu hilm li çixara xwe xistin. Agirê çixarê giha tiliyan, çixare bi lez avêt hindama derî. Qutiya xwe a tûtinê bi hêlekê de û çeqmaq bi hêlekê de avêt. Keserek veda û bi xem got:

»Yanî apo tu dibêjî mirov bi bafîka ku dijminê xwe bide girtin, li ba sawcî û hakiman dikare derewan bike, telaqê xwe biavêje û destê xwe li Quranê xîne ha!«

»Erê erê. Ma îcar çi xem e qey lawê min.«

Bi haweyekî pirecêb:

»Batil batil, haho! Ma ne qaşo em misilman in. Mirovê misilman çima kirî bi derewan destê xwe li Quranê xîne; li ser navê Xwedê sund bixwe û telaqê xwe biavêje!«

Heso mîna ku henekê xwe pê bike, beşişî û serê xwe hejand:

»Kuro misilmanî ji xwe ev e. Wey xwelî li serê te be, bi jin û zarok e û hîn jî misilmanî nas ne kiriye. Pêxember sellellahûwessellem di Qurana xwe de gotiye, xwîn bi xwînê. Mirovê ku zilm li te kir, tu jî zilmê lê bike, ne guneh e. Mirovê ku li ba çawîş û mawîş û hakim û makiman bi derewan bextê xwe avêt, bi Quran û telaqê jinberdanê sûnd xwar, tu jî tam


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wek wî bike, ne guneh e. Ev gotinên pêxemberê me ne, sellellahû eleyhî wesellem. Qe em ji pêxember ne mezintir in. Em ebdên wî ne. Em mecbûr in bi a wî bikin...«

Zibêr piştî ku dît Heso jî wek wî li def û zirnê dixîne û Sêdiq neheq dike, bi aqilê Sadiq keniya û xwe nepixand. Ne hişt ku Heso peyva xwe biqedîne, eniya xwe xurand û serê xwe wek ê jojî bi wê navê de dirêj kir.

»Hûn hîn naşî ne. Temenê me di berberiyê de çû. Me ev porê xwe li ber dar û deviyan sipî ne kiriye, birako. Berberî li ser esasê fen û fûtan dimeşe. Dinya bi xwe, wilo ava bûye. Tacirê gava nizanibe derewan bike, nikare bibe tacir. Di berberiyê de telaqreşî û bêbextî şertê herî mezin e. Çimkî berberî siyaset e. Û siyaset jî vîlikgerî ye. Heft, heyşt seetên me çêbûn ku bi devjengê me daye ber hev û em çêlî tiştên beredayî dikin. Ev çi aqil e! Pêşiyan bi derewan ne gotine, 'Ê ku ku...a kera te, divê tu jî biku...î çêleka wî, da qatix li ber biherime û nema bikaribe şîr û mastê wê bixwe!' Hişê xwe qenc werînin serê xwe, rabin da em biçin gilî. Eger em neçin gilî û xwe ji insafa şeref û namûsa ku Sadiq efendî neh, deh seete serê me pê mijûl kiriye re berdin, Circîsê qûnreş wê biçe gilî. Circîsko mirovek ji me bi demaçê birîn kiriye; ev firseteke bi şîr û şekir e ji bo me. Pêşiyên me dibêjin ku...«

Xwest bibêje, »Cihê ku destê te herêyê lingên xwe jî têxêyê«, lê Sadiq peyva wî birî. Destê xwe avêt bêrîka xwe sed wereqe derxist û li ber rûnişt:

»Ma van pêşiyên me qe hîç gotineke baş ne gotiye, çi qewimî yasitar! Te pêşiyên kurmancan hemû rezîl kirin. Bi tenê hema gotinekê bi qencî ji devê wan bextreşan bibêje, eger min ev sed wereqe neda te, bila ez lawê berêz bim!«

Zibêr keniya û li pereyan nerî. Devê wî bihustekê ji ser hev çû. Diranên wî ên pêşî, mû ji ên keroşkê bernedabûn. Hewl da xwe ku gotineke baş bibêje, Kenêr awir tê firand. Wî pala xwe da dîwêr û dîsa li Kenêr nerî. Lê Kenêr jî awir hîn dijwartir kir.

»Hi, i, erê lo, pêşiyên me tiştekî baş ne kirine heta ku gotinên wan jî baş bin. Na na, pêşiyên me gotinên xerab ne gotine ku tu xwe ewqasî zivêr dikî Sadiq! Gotinên wan hemû ji Quranê ne yanî« û herdu destên xwe dirêjî paşila xwe kirin.

Paşil dixuriya. Goştê ku xistibû paşilê bi ser tazî de berdabû. Goşt ji germa canê wî mixmixî û mizeloqî bûbû. Dohn xwe bi nav pirçê de berdabû, pirç û goşt mîna rês li hev pêçabû. Sipî bi bêhna tewêş har û degel bûbûn. Xwe ji ber kevîkên dirûnê bi ser lêş de berdabûn û bi lez di-

geriyan. Canê wî bi dijwarî gez dikirin. Herwiha xwe dixurand û di cihê xwe de bêwestan diqeliqî. Di dawiyê de xwe ne girt.

»De ka ji kerema xwe re hinekî raweste Sadiq, ez ê herim avekê birjînim û dûv re bêm tiştekî ji te re bibêjim« û bi lez ji odê derket.

»Heso ez jî dibêjim me ne baş kir. Gerek me gilî kiriba. Di vir de kêmaniya me a herî mezin ku ji sibeha Xwedê de heta niha, çima em bi xwe şiyar ne bûne û herwilo em pûç û vala peyivîne.«

»Tu çi dibêjî Xelef? Em çima pûç û vala peyivîne?«

Xelef bêî ku li tiştekî binere, qasekî çavên xwe kutkutandin û bi mijankên xwe lîst. Palika çavê wî ê çepê dixuriya. Lê wî eniya xwe xurand.

»Ma ne çima! Me du tiştên ku bi temamî ji hev cihê bûn têkilhev kirine û em li ser peyivîne. Gilîkirin tiştek e û muxbirî tiştek e. Bi giliyê ku em di neyarê xwe de bikin, em nabin muxbirçî. Em ê di tiving û demaçên wan hilnedin, lê em ê bibêjin ku bi sîlehan êrîşî ser me kirine. Gelî civatê ma ne wek min e, hûn bi qedirê Xwedê kin lo? Ma we ev fikira min çawa dît?«

Heso çavên xwe li ser civatê gerandin. Civat di bin simbêlan re bi gotina Xelef dikeniya. Herkesî dixwest bi qerefekê wî bibersivîne. Lê ji ber ku ew jî bi qasî Heso yextiyar bû, newêrîbûn. Çavên hemiyan li ser Sêdiq bû ku ew hema devê xwe veke, pirqînî li wan keve û serbest bikaribin bikenin. Sadiq devê xwe tije kir ku bibêje, »Heft çîrokên hirçê hebûn û herheft jî li ser dareke hirmiyan bû...« Heso berî wî, bi qahr got:

»Heh, bê çi aqilmendekî mezin e! Aqilê wî pola dibire pola!« û li Hemo nerî.

»Ma tu çi dibêjî yabo qurbano? Aqil ji aqilan çêtir heye. Em hemû îro xurifî ne, kesek ji me tiştekî ji tiştekî dernaxîne. Wilehilezîm çiftî ji ber me tê. Xezebek li pêşiya vî gundî heye bê bêlome be! Îcar hema Xwedê bike ev xezeb li mala Circîsko biqelibe!« Destê xwe ber bi Xelef de vekir û gotina xwe domand:

»Mêro qaşo aqil dide me, hi. Em ê gilî bikin û bibêjin ku wan him sîleh berdane me û him jî sîlehên wan tune ne. Felekê neheqî li te kiriye ku tu ne kiriyî siltanê welêt. Hemo, de ka li tûrikê xwe binere, belkî tiştekî xêrê tê de hebe. Serê min nema çerx dike, we ez tê de teqinandim...«

Di vê hingamê de xortek ket derî. Lawê Zibêr bû.

»Apê Şeytan, mîha we şevder maye. Jinapa min Kejê got ku bila here lê bigere.«

Da xwe ku rabe, Heso ne hişt. Ji qazî ve rabû ser xwe, kengî diçû. Destê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wî ji fesadiyê ne dibû. Ji bo wî fesadî, ji liqûmên Diyarbekirê jî xweştir bû. Jina wî bi malê xwe dizanîbû ku ew ê neyê. Pênc deqîqe ne ketin wê navê, ew bi xwe hat.

»Kuro, rîha te di vê fesadiyê de sipî bû, bes e bes! Zaroyên zaroyên te çêbûn, hey Xwedê ezman bi ser de xisto! Şeytan bû te zoriya wî jî bir! Erê tu doza çi li ometa Mihemed dikî, hey gura pezkuşto! Sê mîhên me hene; yek virikî bûye, yek bi zerdikê ketiye, yek şevder maye û tu jî li vê derê agir dipijiqînî melayiketan!..«

Kejê pîrekeke dirêj, dagirtî, esmer û xwînşêrîn bû. Wek Sarê henekçî û limêjkir jî bû. Ji çîmê xwe ê çepê dikuliya. Çîm bawî bûbû. Di mehên bihar û havînê de salê neh, deh caran diçû ziyareta Girnewas. Li ser gir şevekê, du şevan radiza û due dikirin. Lê mixabin her ku bi wir de diçû, çîmê wê hîn xerabtir dibû. Gundiyan qerfên xwe pê dikirin:

»Pîra Kejê, eger tu ne jina apê me Şeytên ba, wê xalê me Girnewas tu di deqîqeyekê de rehet kiriba. Ew mîrê cina ye û ê me jî serekê temamê melaka ye. Mêrik ji Şeytên newêre destê xwe dirêjî te bike. Mahra wî ji ser xwe rake, tu ê bibînî bê wê xalê me Girnewas çawa devê xwe têxe birîna çîmê te...«

Ew jî dikeniya:

»Yabo eger mesele ev be, hema em ê şevekê bibin jina mîrê cinan jî, ma wê çi bibe qey. Şeytanê we, bi qasî fesadiya xwe ji min hez dike... Îcar şeva ku min xwe xist bin mîr û mîr jî bazda ser min, bila ew jî bifire ezmên û bi melayiketan re şer bike...«

Pênc law û sê qîzên wê hebûn. Sê lawên wê mû ji bavê xwe bernedabûn. Pîrê li xwe dixist, digiriya û digot »Bavê we şeytan û hûn jî sê şeytan, ev dinya wê çawa bikaribe barê we hilgire! Xwedê ometa Mihemed ji we bisitirîne!..« nifir li wan dikir û berzûrî Xwedê dibû.

»Keçê Pîrê te ez hetikandim, temam bimeşe ez va hatim!« û bi rastî vê carê rabû ser xwe.

Heso ruyê xwe tirş kir:

»Bibêje û dûv re here!«

Kenêr li ser pêyan got:

»Ji serî de ez hevalê gilî bûm. Û min ji te re got. Te xwe ji bîr kir û min jî newêrîbû deng bikira. Bûye şev, ez ê ji niha pê ve çi bibêjim? Ez bawer nakim ku himberên me jî wek me bêaqil fikirîbin« û meşiya.

Heso fêm kir bê Kenêr çi got. Ji cihê xwe çeng bû:

»Bi telaqê jinberdanê Circîsko em xapandin! Tu rast dibêjî. Wî bîr bir

û me bîr nebir, wax li vê ecêbê! Gava bi roj xwe ji gund berdabûya, me ê bizanîbûya ku diçe gilî. Yarê gonê xwe li bendî şevê hişt. Bi şêxê li erdê Bexdayê niha li ba mêrik di temenêde ye. Ez zilamê xwe nas dikim bê, çi dol e.«

Dîsa civatê baş fêm ne kir ku Kenêr çi gotiye.

Miho xwe ne girt:

»Apê Heso, ma apê Şeytan ji te re çi got?«

»Got ku Circîs niha li qereqolê ye û giliyê me dike. Û em jî ji hev re çîrokan dibêjin...«

Zibêr bi hinc destê xwe li kulêv xist, toz bi ser çavên wî de bilind bû.

»Pêşiyên me bi derewan ne gotine,'bêhna fireh ji qelsayê tê!' Ji bo gilîkirinê mû bi serê zimanê me ve şîn hat, lê te bi a me ne kir, apê mino. Bi rastî ez îro tiştekî ji te fêm nakim, tu pir bêhnfireh xuya yî. Ma qey tu me qels dibînî?«

Destê xwe ber bi Hûto û Luqmên de vekir û peyv domand:

»Hindur ji dêwan dagirtiye. Mîna dêwên me çend dêw di malbata hûran de hene gelo ku tu van teyran li me çêdikî? Dev ji taswasê berde. Tu ji çi ditirsî malneketo?..«

Vê carê jî rabû ser xwe, ber bi deriyê odê de meşiya û destê xwe hejand:

»Bi tenê hema bibêje 'erê', emir bike û te jê tune be! Bi telaq ez ê rahijim devziravê û ketûber li hemiyan bireşînim! Ez ê bikujim û bikujim heta ku tenterûs sax ji wan nemîne!..«

Hemo bi Zibêr ve rabû û bi çepilê wî girt.

»De ka were rûne Xwedê ji te razî. Tu gelekî kelgerm î. Bavo mirov karan dike, lê ne bi temtêla te...«

Zibêr rûnişt. Minêkarbû rûne. Ji bilî Hemo, kesî ew cidî ne girt. Civatê pê dizanîbû ku zirçonekî zilaman e. Dîwarê ku bi gotinan lê kiribû ji dûr ve delal diyar dikir, lê qelşên dîwaran fireh berdabûn, da ku di van qelşan re bi hêsanî bikariba ferşik berdana. Ji aliyekî de hewl dida kevirên bijarte ku dîwar sipehî xuya bike û ji aliyekî de jî bi cebleke şilek dîwar diseyand. Eger Hemo ew nedaba rûniştandin, ew ê dîsa jî rûnişta. Di derî re berdayê ew ê di şibakê re bihata. Eger ode bêderî û şibakebana, miheqeq dê dîsa jî rêyek ji xwe re dîtiba. Heraqê fesadiyê bû. Çêvên wî ên zerdoqî di nava serî de dilîstin. Bi hesabê avrijandinê goşt di nav keviran de veşartibû û karê xwe tebût kiribû. Sipiyên berî niha ew nema gez dikirin. Tu sebeb jê re tune bû ku rûneništa.

Xelef ji nişkê ve destê xwe bilind kir:

»Ji sibehê de ez li civatê guhdar dikim. Di vê civatê de ê ku herî hindik peyiviye yek jê ez im. Bi rastî, Zibêr miroveki berberçî ye û ji berberiyê jî baş fêm dike. Gerek ji serî de me bi a wî kiriba.«

Zibêr pala xwe tam da dîwêr û destê xwe hejand:

»Erê, pêşiyên me bi derewan ne gotine, 'Eger aqilê qûnê heba, wê tir ne kiriba.' Em bêaqil in« û li Sêdiq nerî.

Gotina wî li hesabê Miho hat.

»Wey devê te tije şekir be Zibêr lo, tu pir xweş dibêjî! Bi serê bavê xwe kim îşev tu tam dihilînî ha! Lawo tu wek aliman dipeyivî.«

Sadiq bi xwe ne xweş anî. Bi dengekî pêt got:

Miho, tu çi wek wan dîkên ku ji pevçûnê direvin bin kirasê pîrekan û di bin kirês de dixutxutînin, te xwe xistiyê berpala Nûrî! Rabe li qûn rûne û bipeyive ku em hinekî aqil ji te bigirin. Civat hewcedarê şîretên te ye« û berê xwe da Hûto:

»Ma ne wilo ye Hûto?«

Berî ku Hûto wî bibersivîne, bi lez li seeta xwe nerî. Lingê xwe ê rastê bi şid li erdê xist û bi qahr got:

»Hoooweh li vê ecêbê, ji destê Circîsko, em ji sitiranên pişka kurdî jî man! Îşev wê Meyremxanê sitiraba...«

Hûto li hindama derî neh, deh şekal li hev kom kiribûn, li ser wan rûniştibû û nenûkên xwe dikoja. Mîna ku di civatê de ne rûniştîbe, xwe bi xwe geh dikeniya û geh jî bi Sarê re li ser kavirê ku ser jê kiribû diaxivî.

»Te got çi Sadiq?«

»Miho dibêje ku Zibêr dişibe şêx û melan, ma rast e?«

»Na ne rast e, Zibêr dişibe goşt û Miho jî dişibe tirşikê.«

Civat hemû keniya û heryekî tiştek got.

Sadiq bi serê bêvila xwe peyivî:

»Zibêr û Miho, kuro hayê we ji we hebe, wileh ev zilam îşev dikare we bixwe...« Ew hîn wilo diaxivî, jina Hûto bi teşteke girar ket hindur.

»Hûto, min ji te re girar, hêkên qelandî û kîsikek şekirê hûr ê çayê aniye«

Hûto bêhnçikyayî pê ve rabû û teşt ji destê wê girt. Piştî ku got:

»Keçê Hitê eferim lê!« xwe dada hêkan û bi yektûşê re hêk dabelihandin.

Hitê, deh hêk qursikî qelandibûn û li ser girarê kiribûn. Girar bi hêkan nixumandibû. Hûto piştî ku hêk hemû xwarin û kîsikê şekir vala kir nav satila avê, devliken peyivî:

»Keçê girara xwe bibe û zû here malê!« û nehişî kişiya ser avê.

Civat ji ken li piştê rast bûbû. Lê herçi Hûto bû ji xwe hîç ne xema wî bû. Wî bi keft û lepta xwe ji civatê û civatê jî ji wî zewq distend. Li gor civatê, ew mirovekî dahbe bû. Lê li gor wî îcar, him benda pizûran û him jî penda hûran herdu jî zir ehmeq bûn. Wî bi haweyekî din li jiyanê temaşe dikir û digot:

»Jiyan jin e, xwarin e, ger e, nêçîr û lîstika bi kûçikan re ye. Axx! Ma ku nozdeh jinên min ên wek nozdeh dîwaran wilo bi qelafet hebana û bi zikê têr her şev min bazda ser yekê wê çi bûba qey! Kuro ev Xwedê jî bi rastî mirovekî pir ecêb e lo, ez bi qasî girekî mezin û Hitikê jî bi qasî kizinekê hûr xuliqandiye! Îcar Xwedêko, tew bi ser halan de ew kizin xistiye bin vî zir girê ha jî! Hûn bi qedirê xwedê kin, ma niha ev jî ûjdan e hi!..«

Seet bûbû dehê şevê. Û şevbihêrk hîn jî belav ne bûbû. Ji bilî rojên pevçûnan, şevbihêrk bi giştî seet li dor nehan belav dibû. Zoravî zû radiketin û zû jî radibûn. Di rastiya xwe de xelkê herêmê hemû jî mîna zoraviyan zû radiketin. Pizûriyan bi destpêka komcivîna xwe re, pêşî, tibabekî dirêj bi devjengê li hev sor kirin. Devjenga wan jî pir tirovirî bû. Heryekî bi gerevêre ji xwe re tiştek digot. Kesî li kesî guhdar ne dikir. Dûv re bêî ku bi xwe bizanibin hêdî hêdî bêhemd, devjeng serguherî mêr û mêraniyê kirin. Xwe wek teyrên baz, dijminên xwe wek mirîşkan dîtin û di wan re firiyan. Teyran kirin şîqe şîq, bi hewa de gur dan xwe û mirîşk ber bi koxik û kadînan de ajotin. Ne xew û westan, ne dîn û ûjdan û ne jî xwedê û pêxemberê ku jê re îbadet dikirin di bîra kesekî de dihat. Herkesî dixwest her tim dora axavtinê a wî be, ji wî pê ve kesek neaxive û ew jî herwiha postê dijminê xwe tije pûş bike û dûv re jî agir berdêyê. Qirêja binê zemanan bi ser mejiyê hev de berdidan û bi kîn hevdu radikirin serserê silûmên çiyayan; wek şêr û pilingan xwe dadidan hev û ber bi newalên bêbinî de digindirîn. Keleman canê wan qul dikir xwîn dipijiqî. Lê ne bi êşa canê xwe agahar dibûn û ne jî ew xwîna gevez didîtin. Rehê mêraniyê di eniya wan de bel bûbûn, agir ji devê wan diçû. Hemû jî heraqên berberiyê bûn. Ji fesadiyê, gotinên genî û zirtekiyê heşkere zewq distendin. Ji xêrê gotinek ji devê kesî dernediket. Soba odê bi qasî şikerekê mezin bû, êzing li ber bûn û zivistan bû. Lê wan ew zir soba ha ne didît heta ku agirekî ji xwe re bikin.

»Ê ne dîtin û gotin nabe wek hev, ê ne we nedît bê min çi kambaxî bi Feremezko de anî! Min tam ew di qorziya xênî de zeft kiribû, min serê wî xistibû nav şeqên xwe û kulm li ser kulmê li qerpika devê wî dixist. Ji ber

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kulmên min digiriya. Lawê tirekê xwe diavêt bextê min, hi.«

Casimê ku darek ji çena xwe xwaribû û çena wî wek qoqekî ta werimî bû, ji dera ha rabû ser kaban.

»Apê Sufyan hema te bext dabayê wê çi bûba qey. Mêrê ku teslîm bû mirov lênaxe.«

»Hûn hîn zarok in, tahma şîr ji devê we tê. Çi dibêjin pêşiyên me? 'Ku te girt bernede û ku te berda jî bi dû nekeve.' Min ew girtibû carekê. Ma çêdibû ku min hitka wî daneda û ew wilo qûnziwa berda ha!«

Heso mîna ku ji dil bikene, kenekî beloq kir.

»Ebû Sufyan vê carê ne bû, te ev gotina pêşiyan çewt tefsîr kir...«

Sadiq ne dipeyivî. Xewa wî dihat. Serê wî jî şikestibû. Di vê navberê de jî Hemo bêî ku bala civatê bikişîne ser xwe, pişta situyê xwe bi hêdî hêdî difirkand. Ridwên debûz avêtibû serê wî, lê li pişta situ ketibû. Damarên situyê wî li hev geriya bûn situ nepişî bû, bi zor li çep û rastê xwe dinerî. Ji bo ku kesek vî aliyê wî ferq neke, pir zor dida xwe heta ku situyê xwe dizîvirand. Di dawiyê de xwe ne girt, ne hişt ku Heso peyva xwe biqedîne.

»Dema ku min demaçe ji qewlik kişand, Circîsko ev lepta min dît û bi yekbêhnê bazda hindur. Yarê gonê fêm kiribû ku ez ê wî bikujim. Bi rastî min ji dil du fîşek li ser kirin, lê bêbavo ji gulên demaçê xurtir diçû...«

Xelefê ku bi derba destîbivirê Sebrî li erdê veziliyabû û ji kulîmeka xwe a çepê wek kamyonên Anter vêl diçû, dest pê kir:

»Xwezîka ji xêra mala Xwedê re we dîtiba û hew! Min kevirekî yeklepî li termaza Sebrîko xist. Lawê yadika xwe di bin derba kevirê min de mîna rewtekî tewiya û dawiyê jî xwe li ser lingan ne girt û li erdê veziliya. Lêbelê ew di wê rewşê de û min kevirekî din jî pê ve zeliqand. Nema deng jê hat. Eger miribe baş e û eger ne miribe ji xwe segbavo tu carî nema dimire...«

Xelef dixwest lingên xwe bi lingên mêrxasên civatê re rada. Lê heq jê dernediket. Nizanîbû ku derew bi xwe hinereke, herkes nikare derewan bike. Civat bi derewên xwe dihisand û xwe li keleman diqeliband. Sebrî mirovekî sih salî û ew jî şêstsalî bû. Di tayê wî de Necîm hebû. Eger derewên xwe di biwara Necîm de bigotana, belkî civatê jê bawer bikira û di bin simbêlan re ewqasî pê ne keniyaba.

»Bi rastî heta niha min nizanîbû ku Luqman di pevçûnê de ewqasî jêhatî bû. Min bi çavên serê xwe ew dît. Kevirên wî fût ne diçûn, yekederb hûrî li erdê vedizilandin. Eger zaroyên Circîsko dest neavêtina

demaçan, bi telaq Luqmên wê yek ji wan sax bernedaba! Bala min kişand, nizanim hûn jî bi wî dengî hisiyan gelo? Dema ku Luqman kevir li serê Haco xist, dengê reqîniya kevirê wî di felekan re derket! Ecêbnedîno qahfûrê serê insên çiqasî qewîn e, wey bavo!«

Luqmên xwe nepixand û di bersiva ev ê serşikestî de got û got:

»Ma ez biraziyê kê me apê Selîm! Te heta niha ez çawa didîtim qey! Bila Hesûk duekarê wê dayika xwe be û hew. Eger ne ji ew a fiqirpîs ba, ma min yek ji wan li ser lingan dihişt, weh!..«

Luqman digel wê dengbêjiya xwe a hêja, zirçonekî zilaman jî bû. Carina teyb datanî ber xwe û kaseta Bişarê Çeto, Hemê Gozê û Elîyê Betê datanî ser. Li ber dengê teybê dihat eşqê, ji ser xwe diçû, xwe wek Hemê Gozê didît û bi navtêdanan diqêriya. Carekê ronîvro rahişt tivinga xwe, hilkişiya çiyê. Piştî ku çarhawêrî xwe kozik û çeper danîn, Bişarê Çeto û tabûreke esker di van kozikan de bi cih kir û bi tivingê ji vê kozikê avête kozika din. Ji kozikên vala helbet wê deng ne hatiba. Lê wî rêya wê jî dîtibû. Di vê gava ku wî ev şerê wilo çetîn dikir, ji kozika himber xwe, hişt ku Bişarê Çeto gazî wî bike:

»Hemê Gozê tu mêrekî nesêle yî, were rayê...«

Di bersiva Bişarê Çeto de xwe bi xwe dîsa wî got:

»Ez Hemê me, Hemê Gozê me, kilê çavê Sirmê me...« û êrîşî ser kozika Bişar kir. Li gor sitranê, Hemê Bişar ne kuştibû. Lê wî di kozikê de Bişar dabû ber xenceran û çend cendekên generalan jî bi ser de qulipandibûn.

Carekê jî li ber sitrana şerê Şêx Mahmûd ku Kawîs Axa digot, hate eşqê.

Şeveke havînê ye. Zilamên pizûriyan li ser oda Heso rûniştîne û şevbihêrkê dikin. Temo radyoya kurdî vedike. Kawîs Axa distirê. Luqman moca radyoyê heta bi niqra dawî dizîvirîne û herdu guhên xwe bi ser radyoyê de miç dike:

»De loyloy, de loylo, şerekî qewimî li çiyayê Kermanşê li derî Wanê. Şêx Mahmûd kekê Şêx Hadî bavê Nezîr... hewara kurd xayino!..«

Luqman li sênga xwe xist, »Tubb tubb, xwe bigirin ez têm hewara we ...« û xwe ji ser xênî avêt erdê. Bêî ku rahije tivingê, bi bazdan berê xwe da qereqola hidûd.

Heso:

»Kuro Hûto bide ser piştê, lawê qahpikê çû çû! Wî zeft bike kuro!..«

Sarê jî bi ken:

»Heçê wî bigire ez kîrê wî di jina wan kim! Kuro Heso, bihêle bihêle bi-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

la here, belkî ruyê vê mentîqa bênamûs li ser destê me sipî bibe. Bihêle bila çend qûncilikan bikuje!..« Lê mixabin gava Sarê wilo diaxivî, Hûto ji zû de dabû dû lawê wê û ew zeft jî kiribû. Eger Hûto ji serî de dengê Sarê kiriba, belkî bi dû lawê wê ne ketiba û hertişt wek ku wê dixwest encam daba. Mirovê ku bikarîba Luqman zeft kiriba, di nav temamê gundiyan de tune bû. Luqman dêw bû, lê Hûto jî dêwê heftserî bû. Bi tenê Hûto, heq ji Luqmên derdiket.

Civat sist bûbû. Hilma xewê avêtibû ser çavên wan, yek yek diçûn mala xwe. Sîrac, Hûto û Meshûd ji zû de şevbihêrk terk kiribûn û li malê ketibûn xewa şêrîn.

Di vê civatê de, ên ku herî hindik peyivîbûn Kerîm û Xelef bûn.

»Kerîmo, de ka tu tiştekî bibêje, tu hîç ne peyivî. Tu îro dîsa ne di nav şer de bû...«

Miho gotina Sadiq birî.

»Belkî dîsa raza bû.«

Sadiq:

»Ma te ev şerê me ê îro, şevê din di xew de ne dîtibû ku te ji me re ne got, lo? Te me pê agahdar kiriba, me ê haziriya xwe kiriba Xwedê ji te re razî be.«

»Min şer ne dît, lê min tiştekî ji şer mezintir dît.«

»Xwedê xêr bike, çi bû gidî!«

»Min dît ku birûsk li xaniyê Circîs diket, xanî bi ser hemiyan de diherifî û hemû dimirin.«

Gotina wî bi temamê civatê xweş hat. Keniyan. Zibêr bi kenê xwe li hemiyan ferq kir û rabû ser kaban:

»Lawo ev çi xewneke delal bû! Wey hema Xwedê vê xewna te, hezar carî qebûl bike!..«

Kerîm fitneyî ne dikir. Miroveki xeyalperest û ewqasî jî henûn bû. Heta ku ji destê wî dihat, beşdarî pevçûnan ne dibû. Heyşt salan »ilk okul« xwendibû. Ji rastiya jiyanê bêtir li gor xewnê dimeşiya. Wî navê gelek serokên welatan dizanîbû. Di xewnê de didît û bi ro jî li tiştê ku dîtibû digeriya. Şevekê di xewna xwe de Robert Kennedî dibîne û xwe berdide ser rêya Îpekê ku here Emerîkayê. Kennedî ew dawetî Emerîkayê kiribû. Îcar baş bû ku jina wî zû bi çûna wî dihise. Xeberê dide Heso ku Kerîm li ser rêya Îpekê ye û ew ê bi derinan de here. Heso û Kenêr xwe kar dikin. Kenêr bi dû de diçe Nisêbînê û Heso jî diçe Mêrdînê. Kenêr Kerîm li Cizîra Botan zeft dike û wî vedigerîne malê. Jina Kerîm dev ji

karê xwe ê malê berdabû û herwiha bi dû mêrê xwe de digeriya. Carina bêî ku Heso çûba Nisêbînê an Mêrdînê, Kerîm di civatê de jê re digot, »Tu bi xêrhatî Apê Heso, ma li Nisêbînê îro çi hebû?«

Civata Heso bêpêjin sekinî û guh da ser hewşê.

»Malê malê, jinapa Sarê, de ka werin derî ji min re vekin«, dengê mamostê gund Erol ji pişt deriyê hewşê dihat.

Sadiq ji cihê xwe rimekê bilind bû; « Wey kuro ev dengê mahelimê me ye« got û bi bazdan ji odê derket.

Sarê ji wahca nava xwe re ne hatibû civatê. Li ser sicada xwe rûniştibû selewat dikişandin û due dikirin. Bi hatina mamoste re xewê ji ser çavê civatê avêt. Herkesî xêrhatin di mamoste da û guhên xwe bi ser de miç kirin. Hemiyan jî dizanîbû ku ev mirovê ha bi armanca xêrxwaziyekê di nav wan de bike, hatiye şevbihêrkê. Ew gelek caran bi vî karê wiha rabûbû. Zibêr ji mereqan hinavên xwe dixwarin. Rabûbû ser kaban û bêsebir li devê mamoste dinerî.

»Xwedê xêr bike mahelimê delal, vê nîvşeva ha çi hewal li te qewimiye gelo?«

Heso birhûyên xwe hildan û bi haweyê ku erza Zibêr bişikîne, awir tê vedan.

»Xwedê ji te raziyo hinekî giran be giran! Bihêle bila mêrik bêhna xwe berde, weh! Qe ne teyr e, bifire. Çi di bin de hebe wê ji me re bibêje. Temo çayeke giran ji vî mêvanê me ê ezîz re bîne...«

Sadiq çixarek da dest mamoste û çeqmaq li ber pêxist. Mamoste hilmeke dirêj kişand, devê wî di nav dixanê de winda bû. Mîna ku bêisûliyek kiribe, serê xwe berda ber xwe û hêdî hêdî dixan berda. Dixanê ji navikê û berjor de xwe lê pêça û bi hemd bilind bû.

Gava Sarê ew dît, bi kêf got:

»Weyla, ji xwe re lê binerin bê kî hatiye kuro! Wey tu ji wir û heta bi vir di ser herdu çavên min re hatiye, ey mêvanê delal!«

Mamoste ji ber Sarê rabû ser xwe.

»Herdu çavên te di nav nûrê de bimînin, ez têm destê te. De ka were li kêleka min rûne, pîrika min a delal. Sê roj çêbûn ku min tu ne dîtiye. Bi rastî min bêriya sohbeta te kiribû...«

Sarê li tenişt Sêdiq rûnişt. Hûçikên xwe hildan. Li mamoste nerî, destê xwe li ser civatê gerand û got:

»Ez bi qurban, dev ji vî miletê xerabe berde. Li xêrê tiştek ji van dernakeve. Xwedê me ji xezaba wan bisitirîne. Zikê hemiyan ji fitne û fe-

sadiyê bûye teniya binê beroşê. Wek araqvexwiran nehişî bûne, kesek ji wan nizane bê çidike. Kulibî ne, xurifî ne! Lê îcar binere, bê tu zarokên me bi aqil nakî. Dev ji zilaman berde, bi zarokan dakeve...«

Te digot qey civatê zimanê xwe daqurtandibû, herkes di cihê xwe de bêdeng sekinîbû û li pîrê guhdarî dikir. Mamoste di dilê xwe de digot:

»Ez heyrana cesareta te me. Insaniyet bi ên wek te li ser pêyan disekine. Eger ne ji te ba, wê ev gund ji zû de wêran bûbûya. Xwezîka tu mezinê dewleta Tirkiyê ba. Belkî bi saya serê te, em tirk jî bûbana insan û me zilm li we kurdan ne kiriba û kurd û tirk wek biran bi hev re jiyabana. Kî dizane belkî wê demê em tirk jî, bi qeweta kurdan careke din bûbana mezinê dinyayê. Em zilmê li we dikin. Ez ji xwe fedî dikim ku ez tirk im! Lêbelê pîrê, mîna we kurdan ên xerab û ên qenc di me de jî hene. Ez hêvî dikim ku tu, me ji hev cihê bike...«

Heso bi haweyekî devli

ken:

»Lêlê pîrê, bes e bes, te eyarê me tije pûş kir!«

»Çima bes e pîro! Ji sibeha Xwedê de hûn dipeyivin û kesî ji we re ne got, hûn çima dipeyivin. Ma qey ez ji Eyşika Ereb im, ez ê jî çend gotinan bibêjim da bêhna min derkeve...«

Heso hîn bêtir keniya:

»Keçê niha ne hewara bêhn derketinê ye, li cihê xwe rûne. Ji xwe re li aqilê wê binerin kuro, ku dibêje ez ê ‘bêhna xwe berdim’. Ma me çi safî kiriye heta ku tu bêhna xwe berdî. Ka bise, em hevdu baş biçirînin û dûv re bêhna xwe li me berde. Ma te got çi jina min?«

Pirqînî li civatê ket, herkes keniya. Sarê gava ku Heso jê re digot »Jina min«, xwe aciz dikir û li Heso tam sor dibû.

Sarê bi hêrs:

»Ez li cihê xwe rûniştî me Heso beg! Ez jina te me yanî çi! Xwedê, dikarîbû tu jî bikira jina min, ma ne ji xwe. Bibêjin bibêjin, hevdu biçirînin, bipeqînin, Xwedê bike ku yek ji we bi kêr ê din bi penêr be!« û bi qahr li Zibêr nerî.

Zibêr serê xwe berda ber xwe û bi lez qutiya tûtinê vekir.

»Jinapa me Sarê rast dibêje. Bi rastî em nizanin bê em doza çi li hev dikin. Kalik û malikên me du sed, sê sed sal berê li ser hûr û pizûrê xezalekê hevdu dikujin. Erê lo, ma dibe ku mirov li ser tiştên wilo beredayî hîn jî bi hev re berberiyê bike. Dewra heywên çû. Îro dewra terempêl û teyaran e. Heydê em ê bibêjin di dema wan de belkî hûr û pizûr bi qîmet

bûn, lê îro sûka Nisêbîne tije hûr û pizûr û serûpê ne. Wê rojê min ji qesapxanê hûr û pizûrên zir gayekî bi sê wereqeyan kirî«

Xwest ku bibêje, »Min serê gê jî bi mecîdiyekî kirî«, Sêdiq zendê Sarê niqurçand:

»Zibêr, bi telaq ya tu ê bihêlî Erol efendî bipeyive û ya jî ez ê nehêlim ku tu serê gê bikirî. Te hûr û pizûr kirîn, me deng ne kir. Bû dereng, şev qariya. Civat dixwaze belav bibe. Bihêle ku Erol efendî çend gotinan ji me re bibêje.«

Sadiq bi Zibêr dizanîbû ku derewan dike. Hûr û pizûr ne kirîbûn. Gotin di cih de qut kir.

»Kerem bike Erol efendî« û pala xwe da diwêr.

»Na na, gotina xwe bidomîne wê dor bigihê min. Tu ecela min tune ye. Bi rastî tu xweş dibêjî. Tiştekî baş ji berberiyê, pevçûn û kuştinê dernakeve. Di berberiyê de nan tune ye, bi tenê kuştin û malwêranî heye. Hûn hemû feqîr in. Ji dêvla ku hûn bi hev dakevin ji xwe re kar bikin. Bi qasî ku ez dizanim li vî gundî, li dor heyşt hezar donim erdê çandiniyê heye. Sê, çar terektoran bikirin û cot bikin. Di nav erdên xwe de avê derxînin û pembo biçînin. Li qelaçên gund çend çiftlikên heywanan çêkin. Hûn hemû jî ji beytarekî bêtir ji heywên fêm dikin. Heywan li qelaçên we bi xwedî dibe. Zaroyên xwe bişînin unîversîtan. Ma ne wilo ye apê Heso?«

»Ooh tu jî lo! Erol efendî tu ji bihuştê xeber didî. Ziman bêhestî ye, tu çi bixwazî ew ê bibêje. Gotin rehet e, kirin zor e. Em bi kêrî terektor û çiftlik û miftlikan nayên.«

Destê xwe ber bi Luqmên de vekir:

»Aha tu ji xwe re li xwarziyê Circîsko binere, bê çi zir qelafet li ser e û xelk wî birîn dikin, kuro! Wê ew ê ji min re terektoran biajo, ha. Ma terektorên ku bikaribin xwe di bin wî de bigirin hene gelo? Wê Temoyê ku ji pevçûnan direve şifêrtiyê bike hi! Bi telaq ew ê terektorê li me biqelibîne û me hemiyan bi cehnemê şa bike. Circîsko nahêle em dewlemend bibin, Erol efendî. Nahêle ku em ji xwe re kar û emelekî bîkîn. Em nikarin qereqola Stilîlê, polîs û mehkeman bi wî bihêlin û bi kar û maran dakevin, çavê min. Ev zîlam cigîrê Tecêl e. Xwedê ew jî bo fîtne û fesadîyê çêkiriye.«

»Na na, ne wilo ye apê Heso, her insan tecalê xwe ye. Bi rastî mirov tiştekî ji we fêm nake. Hûn bi devê xwe dibêjin ku Xwedê derd daye derman jî pê re daye. Xwedê him rêya rast û him jî rêya xerab herdu pêş ebdê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe kiriye. Zarokên we nexweş dikevin, hûn nabin ser textor. Dema ku zarok dimire jî, hûn dibêjin, 'Xwedê wilo xwestibû.' Hûn hevdu dikujin û hûn vê yeka ha dixin situyê Xwedê. Hûn li ba eskeran fitneya hev dikin û hûn di vê fitneyê de Şeytên berpirsyar digirin. Xerabiyê bi hev nekin, dilê xwe safî bikin. Xwedê ne dijminê insên e.«

»Erol efendî tu Circîsko bi qasî min nas nakî. Telaqreşî, bêbextî û hemû tiştên pîs ketîne hestîyê wî. Eger fitne û fesadî bi tenê di xwîna wî de ba, belkî mirov bikarîba çarek ji xwîna wî re bidîta.«

Erol beşişî:

»Min ev gotina te fêm ne kir, apê Heso. Te ê ji xwîna wî re çareke çawa bidîta?«

»Ma ne bi dû Xwedê de pere tên? Erê lo. Mirov dikare bi qeweta pereyan, dinyê serûqûnî hev bike. Min ê devê textoran ji pereyan dagirta û textoran jî wê ew xwîna wî a genî bi carekê ve biguherta. Lê pîsî ketiye temamê hestiyên wî. Rebenê textoran wê çawa bikaribin qerqodê wî ê telomelî biguherin! Hew rêyeke wê heye, ew jî kuştine.«

Erol fêm kir ku di vê rewşa ne xweş de devjengê bidomîne wê baştir nebe.

»Apê Heso, ez ji mala apê Circîs têm. Wek ku ez ê niha ji te re bibêjim, min ji wî re jî wilo gotiye.

Ez hêvî dikim ku hûn li hev gilî nekin. Tiştê ku bû, çû. Meseleyê mezin nekin. Hişê xwe werînin serê xwe û dev ji berberiyê berdin. Ji xwe re kar bikin. Li zarokên xwe bifikirin, wan bi hev re nekin dijmin. Li welatê min, xelkê ji zû de dev ji berberiyê berdaye. Herkes ji xwe re kar dike û haha dewlemend dibe. Dev ji vê dijminatiya xwe bi xwe berdin, apê Heso. Ma hema heta dinya hebe, hûn ê wilo bi hev dakevin!..«

Mamoste mirovekî têgihiştî û aştîxwaz bû. Ev heft sal bûn ku li gund mamosteyî dikir. Tirk bû. Dema ku ew û jina xwe Songul hatibûn gund gotineke bi kurdî jî nizanîbû. Xwe hînî zimanê kurdî kiribû. Mamoste ji gundiyekî bêtir kar dikir. Bi gundiyan re diçû çiyê êzing dikirin. Digel xortan bi çirê, babûtan, kab û xar û pereyan dilîst. Fêrî gelek govendên kurdî bûbû. Ew û jina xwe diçûn şevbihêrkên gundiyan. Pez, mirîşk û elok bi xwedî dikirin. Ji mamosteyekî bêtir diruvê gundiyekî bi Erol diket. Di nav temamê gundiyan de bi qedir û qîmet bû. Nav wî û Sarê pir xweş bû. Sarê jê hez dikir. Di destpêka hatina wî de, Sarê çavreşî avêtibûyê. Ew jî ji ber ku mamoste bi zimanê kurdî nizanîbû. Li gora Sarê, mirovê ku bi tirkî bipeyiviya esker bû. Û hîletê wê jî ji eskeran diçû.

Sarê heta ku mamoste xwe hînî zimanê kurdî ne kiriye û mamoste jê re ne gotiye, »Tirk jî wek kurmancan miletek e; di vî miletî de jî pîrek, zilam, zarok û yextiyar hene«, nizanî bû ku tirk milet e. Wê digot qey her mirovê ku bi tirkî dipeyive, ya esker e û ya jî zilamê eskeran e.

* * *

Civata pizûriyan seet li dor duwanzdehê şevê belav bû. Ji bilî çend kesan, civatê di bin serokatiya Heso de bi tifaq, biryara gilîkirinê dabû. Sitendina biryareke wilo ji Sarê bêtir tesîra xwe li ser Sadiq kiribû. Sarê ne dixwest ku başçawîş bi pevçûna gundiyan agahdar bibe. Gava başçawîş bi pevçûnê agahdar bûba, wê herdu hêl hîn bêtir li hev sor kiribana; mesele dê mezintir bûbaya û şerekî ji vî şerê îro hîn dijwartir, li dar ketibûya. Di vî şerî de kî dizane belkî ji malbatan dê çar, pênc mêr bihatana kuştin. Lê Sadiq hîç wek Sarê ne difikirî. Li gor wî eger hûran deh mêr ji wan kuştibana, dîsa jî divabû kesekî ji wan li malbata hûran gilî ne kiriba. Malbatê xwe neavêta tor û bextê eskeran û li heyfan negeriya û hertişt bi qeweta zend û bendên xwe kiriba. Wî gotibû, »Mirovên qels gilî dikin.« Lê wî tu carî xwe bi malbatî qels qebûl ne kiribû. Heta tu malbat mîna malbata xwe mêrkuj û berberçî, ne didîtin. Li hindurê malê bi qahr piyase dikir, li serê xwe dixist û ji jina xwe re digot, »Pizûriyan bi vê qerarê dîsa xwe hetikand! Xwe piçûk, dijmin mezin kirin. Hûrî çi ne ku li himber me rabin!..«

Heso û Hemo bi banga sibehê re wê biçûna qereqola Sitilîlê. Civat hemû belav bûbû. Heso li hindurê odê bi tenê mabû. Xwe bi ser hev de kiribû gilok, guhê xwe bi ser aliyê malê de xwar kiribû û kûr kûr difikirî. Di vê kêlîkê de xwe mîna serşîrekî bêqewet didît. Pir dixwest ku biçe aliyê malê razê û bi haweyekî dostanî xwe bigihîne Sarê, da ku di derheqê vî gilî de him Sarê haş bike û him jî di vê navê re ji xwe re hinek cesaretê jê bistîne. Ji xwe re digot, »Eger ez xwe bi haweyekî negihînim xemrevîna xwe, ez ê çawa bikaribim vê tirsê ji nava xwe biavêjim û bi dilekî rehet rakevim!« Xwe di rewşeke pir çetîn de didît. Hêviya wî bi tenê Sarê bû. Dîtin û lênerînên Sarê ji bo xwe pir girîng didîtin. Lê mixabin Sarê jî di nav livînan de geft lê dixwarin, dawa xwe ji kevirên hestep dadigirt û bi ser serê wî de werdikirin. Ji xewa çavên wî venedibûn. Şeva çûyî hîç raneketibû. Bi roj ji eskeran pir lêdan xwaribû. Li ser hev pênc, şeş gep xwarin ne xwaribû. Di civatê de bi seetan axivîbû. Mejiyê xwe li ser ku çiqekê di Circîs de bike pir xebitandibû, mejî westiyabû. Serê wî, mîna


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

boqa pîvaza bêavmayî bi ser kelêx de dixiliya. Kelaxê wî bi carekê ve li hev geriyabû, nikarîbû xwe biqeliqanda. Hişkiling ketibû. Lê dîsa jî xewa wî ne dihat. Ji tirsan ketibû tayê. Dilerizî. Bi melûlî digot »Weh, ez ji desthilanîn ketim, dîsa çi bi min hat ya rebî! Keçê malik şewitiyê hema dengekî bikuxe, belkî ev tirs ji ser min here!..« Sibehê wê biçûya nig amirhêzekî ku wî him dê bertîl bidayê û lêdan jê bixwara û him jî dê li gor lênerîn û daxwazên wî, gilî li dijminê xwe bikira. Ji eskeran nefret dikir. Lê ev nefreta wî ne ji ber ku xwe kurd û esker jî tirk didîtin, hemû ji tirsan bû. Ji eskeran ewqasî ditirsiya ku, gava Sîracê cîranê wî ji eskeriyê bi cilên xwe ên eskerî teskere sitendibû û di cavêtê de bi van cilan rûniştibû, wî heta sê rojan cesaret ne kiribû ku here Sîrac bibîne û xêrhatinekê tê bide. Li mala wî bi cilên eskerî wêne peyde ne dibûn. Hemû wêneyên xwe ên ku di dema eskeriyê de kişandibûn, çirandibûn û heta bi ser wan de mîztibû. Ji tirsa wî tu mêrê pizûrî newêrîbû wêneyekî xwe ku bi cilên eskerî kişandibû, li mala xwe daliqanda. Heso qedexe kiribû. Bi qasî ku ji eskeran û cilên eskerî aciziya xwe dianî, ewqasî jî ji zimanê tirkî aciz bû. Ji ber vî zimanî ne dixwest ku neviyên wî li dibistanê bixwînin. Eger ne ji Sarê ba, heta belkî ji malbata wî kesekî ruyê dibistanê ne dîtiba. Di salên ku li bajarê Edîrnê eskerî dikir, fêrî tirkî û xwendin û nivîsandinê bûbû. Pir dixwest ku vî zimanî ji bîr bike. Lê mixabin berberiya gundikî, mecala ku tirkî ji bîr bike ne didayê. Çima ku berî hertiştî dijminê wî Circîs, hinekî bi tirkî dizanîbû. Herduyan her ji çendekî hev ber bi başçawîş, komutan û dadgeran de digindirandin. Di berberiyê de zimanê tirkî çekekî mezin bû. Eger xwe ji vî çekî bi dûr xistiba, helbet wî çaxî jî wê nikarîba li qereqola Sitilîlê, li ba komutanên hidûd û dadgeran bi hêsanî fesadiya Circîs bikira; herwiha malê xwe li devê wan biqelibanda ku Circîs tam biperçiqiya û wî jî ji vê perçiqandinê zewq bistenda.

Heso di nav livînan de tibabekî ponijî. Bêî ku Sarê bibîne hîç ne dixwest razê. Carina hêl dida xwe ku here aliyê malê, xwe biavêje tor û bextê wê û vekirî jê re bibêje:

»Ez muhtacê şefqeta te me. Ez bi qeweta te li ser pêyan disekinim. Êdî bes e sergiraniyan li min bike malikwêranê. Bawer bike şêrîna min, eger ne ji wê mêrxasiya te a bêsînor ba, min ê tu carî nikarîba ne mezinahiya malbatê û ne jî bi tu kesî re berberî bikira. Ma gelo bi rastî qey heta niha te hîn jî ji min fêm ne kiriye ku ez mirovekî çendî tirsonek im? Tinaziyan li min neke êzîdî keça êzîdiyan! Ax de ka were ez bi qurbanê lê!..«

Lêbelê adetên wan, rê ne dida ku xwe bigihîne Sara xwe. Li ba wan, jin

li erdê, zilam jî li ser doşekê rûdinişt. Jin desmalka zilêm bû. Jinê wê bida nav rêxê, tepik çêkiribana û zilam jî dê bi halê wê bikeniya û simbêl babidana. Jin bi qelen bû. Heqê wê li herêma wî pênc, şeş hezar wereqe dikir. Jina ku di civata wî de bêrûmet dihat qebûl kirin, helbet divabû bi bazdan xwe biavêta bin lihêfa wî û xwe jê re vegirta. Digot û dibiland, »Ez zilam û ew jî pîrek e, gerek ew bihata nig min û li halê min bipirsiya...« Sarê jî bûbû kevirê aramê, bêdeng di nav livînên xwe de ji kûr û dûr difikirî. Di dawiyê de Heso xwe ne girt, bi hêrs lihêf ji ser xwe avêt û qêriya:

»Lêlê pîrê pîrê! De ka bêhnikekê were odê em ji xwe re mijûl bibin...«

Sarê mîna ku razayî be deng nebir xwe. Wê ji dûr ve li cavata pizûriyan guhdar kiribû. Di civatê de kî çawa axivîbû û civat li ser çi biryarê belav bûbû bi hemî dizanîbû. Ji Heso hatibû bêvilê, ne dixwest wî bibîne. Temo jî wek her tim dîsa ketibû himbêza Meyro, xew lê giran bûbû. Heso piştî ku gazî Sarê kir, xwe bêhnikekê ker kir. Lê deng ji aliyê malê ne hat.

Bi qahr got, »Ez xwe dixapînim, pîrê nayê nig min! Min xwest, ez xwe hinekî giran bikim ku li himber wê ewqasî kêm ne kevim. Lê wilo xuya ye ku ez çi bikim wê fêde neke« û ji nav livînan çeng bû erdê.

Lempe pêketî û fitîla wê jî tam hildayî ye. Di bin ronahiya lempê de ji dîwarên bi kilsa nikarokî hawêrdor çirûsk diçin; çirûsk bi ser lempe de dixurbilin. Ode tije şewq e. Lê ew bi destpelikandinê li gopalê xwe digere. Bîr nabe ku her der ronahî ye. Eger bi çavan hawêrdora xwe tev bide, ew ê bi hêsanî bikarîbe gopal û şekala xwe bibîne. Lê aqil nake. Ji bîr kiriye ku lingê wî birîn bûye û wê bi vî lingî bêsenede nikaribe bimeşe. Tirsê girtiye hinavan, rê nabe ser tiştekî. Di vê kêlîkê de eger dengê çapiliyekê an gotineke bi tirkî bibihize, miheqeq wê ya dilê wî bisekine û ya jî wê ji hiş bikeve. Xwîn lê vemirî ye, mîna şimê zer veda ye. Nikare rabe ser xwe ji qidûm ketiye. Bi herdu destan ji çep û rastê qurîncekan dide xwe. Bi neperûşkan êrîşî canê xwe dike. Sênga wî a hemû bi pirç, ji neperûşkan mîna cotê qelaçan belek diyar dike. Dixwaze ku li ser çarlepikan bimeşe. Lê dest û lingên wî mîna ku ji hev bêrî bûne, yek ji yekî re nabe destek, heryek li halê xwe diçe. Xwe ber bi deriyê odê de gindorkî gindirand û bi dengekî melûl û şewat peyivî:

»Ooof! Keçê hey agir bi mala bavê ketê, ev çima tu bi min ve nayê lê!..«

Sarê qêriya:

»Naletulah, tobe ya rebî tobe!« û pêrgî wî ve meşiya.

Heso bi giştî di dema ku tirs lê peyde dibû, pir dixwest ku Sarê bi cilên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe ên bûkanî li ba wî rûne û hîç ranebe. Di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku xatûna wî bi cilên xwe ên bûkanî derkeve pêşberî wî. Di vî warî de digel ku wê jî bi qasî dînê xwe jê hez dikir, wek vê bêhnika berî niha dîsa jî zilm lê dikir.

Dema ku Heso çav li Sarê ket, mîna ku hîç tirs pê re çênebûbû xwe da ser hev û rûnişt. Destê xwe dirêjî destê Sarê kir, rabû ser xwe û bi fen got:

»Keçê ma te nizanîbû ku ez ê di nav wê hingama pizûriyan de nikaribim xwarinê bixwim? Ji êvara Xwedê de gezek nan ne çûye nava min. Eger ez îşev jî tiştekî nexwim, sibehê ez ê nikaribim xwe li tena bigirim, weh! De ka pêşî ji kerema xwe re hinek xwarin ji min re bîne.«

Sarê tiştek li xwe çênekir. Mîna ku ji hertiştî bêhay bû, bi şefqet destê xwe da destê Heso, ket ber pala wî û ew rast bir ser cihê wî. Piştî ku Heso di nav livînan de veziland, bêdeng berê xwe da aliyê malê û meşiya. Bi rastî di vê bêhnikê de ji kêfa, şûr simbêlê Heso ne dibirî. Pişta xwe dabû zemberîşan, bi kêf rîha xwe difirkand, xwe dinepixand û digot »Min pê re xweşik lîst. Bi yek fenê min jinik haş kir...«

Di vê dema ku wilo xwe bi xwe diaxivî, xwe aqilmezin û Sarê jî aqilpiçûk didît, heyvanê tirsê li ser nema bû. Ji kêfa ku wê pîrê kengî lê vegere qûna wî erd ne digirt. Hatina pîrê dilê wî av da bû, av hemû lê bûbû şehwet û li temamê kelaxê wî belav bûbû. Canê wî ê ku pênc şeş deqîqe berê ji tirsan mîna pelê çilo dilerizî, di vê kêlîkê de ji cesareta pîrê wek gokekê zewirî bû. Mêranî pê re gihabû hev, doxîna şerwêl vekiribû. Bi destekî li sênga xwe dida û bi destê din jî nav şeqên xwe difirkand. Dev lêvên xwe dikir. Bêsebir ziq li devê deriyê odê dinerî. Dema pêjina Sarê li hewşê kir, bi lez şerwal daxist; hişk bi qereqopkê xwe girt û di doşekê de bir û anî.

»Ma tu ê li ser livînan xwarina xwe bixwî an li ser kulêv?«

»Na na, laşê min hinekî cemidî ye, ez naxwazim li ser kulêv bixwim« û xwe bi ser hev de guvaşt.

Sarê ber pê de çû. Xwest ku çîmên wî rade û tepsiya xwarinê li ser çîman deyne. Lê wî wek pêhlewanan tepsî ji dest girt, avêt dera ha û ji nişkê ve xwe çeng kir newqa wê. Bi ser xwe de kişand, xist bin xwe û devê xwe xist gwîzeka qirikê.

»Kuro xurifiyo, li ber vê ronahiya lempê tu kirî çi bikî! Ma niha wextê vî tiştî ye!«

Heso lê har bûbû. Bi haweyekî serxweçûyî got:

»Keçê bi telaq ne ronahiya lempê, eger ronahiya şintaqê be jî ez ê bikim

lê« û bi lez derpî jê şemirand.

Sarê ji aliyekî de xwe bi dest ve berda û ji aliyekî de jî mîna ku zor lê hatibe, bi hêrs peyivî:

»Ji vê rîha xwe a bihustekê dirêj fedî bike! Îşev ne şeva gon û gadanê ye, sofî!..«

Lê Heso jî mîna ku bi cesareta wê re têkeve şehwetê, wê çiqasî bi sistî li ber xwe dida, ew jî ewqasî lê sor dibû. Her gotina wê, te digot qey şirinqeke xwîn ji canê xwe berdida canê wî. Di nav lepên wî de mîna zarokekî bêqewet ketibû.

»Sofî, te miradê xwe kir, êdî ji ser min rabe. Te ez behdilandim.«

Wê wilo digot. Lê di eslê xwe de qet jî ne dixwest ku Heso, xwe ji ser kelaxê wê bide alî. Gava ku diaxivî, guhê Heso ê çepê xistibû devê xwe. Bi herdu destan, pişta wî hişk zeft kiribû û bi ser xwe de diheciqand. Ji Heso bêtir wê »gon û gadan« dixwest. Helke helk lê ketibû. Lê ji ber ku di civata wê de »gon û gadan« bi tenê heqê zilêm bû, ji mêrê xwe fedî dikir ku daxwaza xwe a şehwetî vekirî bigota. Wê tu carî xwe pêşkêşî mêrê xwe ne kiribû, mêr her tim hatibû ser livîna wê. Li gor wan, tiştekî pir şerm bû ku jinê ev yeka ha ji mêr bixwesta.

Heso ji zewqê mest bûbû, lê ne bi qasî Sarê. Taximên diranên wan ji helke helk û kêferata şehwetê, ji devê wan herikîbûn ser doşekê. Qirika Sarê ji girêza Heso bi carekê ve şil bûbû. Xwêhdana Sarê li kirasê wê dabû der, kiras hemû qermiçî bû.

Heso piştî ku got:

»Keçê Sarê, bi telaq tu jineke pir delal î lê! Keçê te ez ho kirim! Xwedê tu carî bizrê te ji dinyayê kêm neke«, rîha xwe li ser memikên wê hinekî gerand û bi hindama dîwêr de xwe serpiştkî qulipand. Sarê xwest ku lihêfê bi ser dake, lê wî berî wê bi guhikê lihêfê girt û kişand. Destekî xwe danî ser zikê Sarê û ê din xist bin serê xwe û ziq li bin zikê xênî nerî. Di vê rewşê de, herdu jî tibabekî bêdeng man.

»Heso, te û pizûriyan we çi xist serê hev? We hofka xwe çawa gerand? Hûn ê gilî bikin an na?«

»Ma tu dixwazî ez çawa bikim? Ev bêbavê çawîş wê ji me re nebêje çi, gelo?«

»Tu çawa dikî bike, lê gilî neke. Gilî bi kêrî me nayê, şerm e.«

»Ez jî dizanim ku gilî bi kêrî me nayê û şerm e; lê em mecbûrê gilîkirinê ne, Sarê. Çawîş wê wilo bi hêsanî dev ji me bernede.

»Ji ber çi hûn xwe mecbûr dibînin?«

»Ji ber ku wê ew kafirê birayê te li me gilî bike, em xwe mecbûr dibînin.«

Sarê bi hinc tepek li sênga wî xist, destê xwe danî ser dilê wî û bi hêrs got:

»Vî dilê xwe ê qirêjî hinekî paqij bigire hey xanî bi ser de ketiyo! Ji êvara Xwedê de pizûriyan yek bi yek ji ser odê qilawizî li mala Circîs dikirin. Eger Circîs xwe ji gund berdaba, ji van qilawizan hinan jê miheqeq wê pêjina wî kiribana. Kûçik wê miheqeq li reşê wî bireyana. Circîs ne mar e ku li erdê bisûrike û xuya nebe, ne teyr e ku bi ezmên de bifire û kesek wî nebîne. Zikê te ji kîn û buxzê reş bûye, tu tu carî nikarî ji xêrê bifikirî. Ez her tim ji te re dibêjim mast, şîr û penêr pir bixwe ku ew hinavên te ên reş hinekî sipî bibin! Hey Xwedê bi ser de ketiyo hilmek û pifek ji te re maye tu ê bimirî, li zarokên xwe bifikire!..«

Dema ku Sarê bi vê bêhntengijiyê diaxivî, Heso jî bêdeng rawestiyabû û lê guhdar dikir.

»Tiştekî ku tu bibêjî êdî ma, xweha Circîsko?«

Sarê xwe da ser hev:

»Bibêje bê tu ê çi bibêjî xurifiyo« û xwest ku rabe.

Heso rê nedayê.

»Keçê bi telaqê jinberdanê ew birayê te ê fesad niha li qereqola Sitilîlê li ba çawîş rûniştiye û ew û çawîş herdu jî zewran li me dişidînin. Ez ji zarokiya wî de wî nas dikim bê çi ê ber golik e. Bi rastî di derbarê vî gilî de ez bi xwe dereng şiyar bûm. Gerek ji zû de ez li qereqolê bama. Birayê te bi hosteyî ez xapandim. Gur e gur!«

»Tu bêbextiyan lê dikî. Ma hema qey wê qilawizekî ew ne dîtiba. Ma ji bo Xwedê hema wê kûçikekî jî xwe êrîşî reşê wî ne kiribaya, haho!«

»Keçê ehmeqê, çima tu ji min fêm nakî? Ez ji te re dibêjim ku birayê te ez xapandim. Îcar mirovê gava ku bikaribe siyasetçiyekî wek min mezin bixapîne, hayhay wê bikaribe vê mentîqê hemî bixapîne. Wî xwe ji qilawizan vedizî, yanî qilawiz jî xapandin, dibêjim. Lê çawa ne hiştiye ku kûçikên gund pê agahdar bibin, kûçik bi çi haweyî xapandine? Ez niha li ser wê difikirim...«

Gotinên Heso dilê Sarê careke din birîn kiribûn. Wê, bi hêviya ku şer mezintir nebe xwarin ji Heso re anîbû, xizmet jê re kiribû û heta xwe bi dest ve jî berdabû. Ruyê wê ê ku berî niha bi nîv seetekê di deryaya şehwetê de bi qasî bihara nîsanê geş bûbû, di vê bêhnikê de mîna mehkûmên binê zindanan çilmisî bûbû. Xwêziyeke wek zilindêr tal xwe

dabû qurmê zimên, gewrî di xwêziyê de xitimî bû. Bi destveberdana xwe mîna ku qebheteke mezin kiribe didît, kelaxê xwe ji ê Heso bi dûr xistibû, xwe bi ser hev de guvaştibû û ji kûr û dûr difikirî. Heso ji xwe bêtir dixwest ew biaxive, lê şûr devê wê venedikir.

»Keçê pîrê, çi bi te hatiye! Te bi me çiloyê xwe kir, lê te kidase lê ne kir. Wilo nabe ku tu hertiştî qurmiçî bihêle û birevî. De ka bibêje ez li te guhdar dikim, aqil ji aqilan çêtir heye, helala min...«

Heso bi fen pê re diaxivî. Bi tenê tiştek jê dixwest, ew jî cesaret bû. Dixwest ku herwiha mijara wan, li ser çawîş be; Sarê hêrs bibe, siqêfan bi çawîş re bike, ku rehê mêraniyê tê bigerin.

»Heso ma tu dixawzî ez çi bibêjim? Te temamê rêyan li ber min girtin. Qûna ku hînî tiran bûbe, tu paçan jî têxê ew ê dîsa tira xwe bike. Êdî gotin bêfêde ye. Ma ne ez çi bibêjim, tu ê dîsa jî wek xwe bikî û here gilî. Tu û Circîs hûn herdu jî ne ji xêra ometa Mihemed re hatine dinyayê. Hûn herdu bûne wek du kevjalan, lingekî we li der yek li gorê ye, ji mirina we re tirek û fisek maye. Hinekî li zarokên xwe bifikirin hey Xwedê deh top li mala we xisto« û ji nav livînan çeng bû dera ha.

Heso xwe da ser hev û li qûn rûnişt. Pêşî ruyê xwe bi herdu destan firkand, dûv re çavên xwe hinekî kutkutandin û bi dengekî hêdî got:

»Pêwîst nake ku tu xwe ewqasî ji min zivêr bikî. Tu baş bi min dizanî ku ez ne heraqê berberiyê me. Sebebê vê nexweşiyê birayê te ye. Bi rastî Circîs kûra xerabiyê ye. Di vî gundî de xerabiya ku ew dike, kafir jî nakin yanî. Polpolê bi ser min de neke. Bawer bike ez jî bi qasî te ji vê berberiyê zivêr im. Hinekî bêhna xwe fireh bike. De ka were li kêleka min rûne, were were...«

Bi rastî Heso di her gava ku diçû livîna Sarê, pir bêhnfireh dibû û li dor seetekê serê wî pir dixebitî. Di vê seetê de dinya wek qutîkê li ber vedibû, Circîs çi bikira, wî didît. Wî jî bi vî aliyê xwe dizanîbû. Eger ev mirov di civateke jîr û zana de jiyaba, bi hinera eşqa Sarê ji sedî sed wê bomba atomê çêbikira û li ser gotina pîrê bombe biavêta Enqerê û belkî temamê Tirkiyê jî.

Sarê li pêşberî wî li ser kulêv çarmêrkî rûnişt û kitana xwe da serê xwe. Kitan ji qilêrê debixî bû. Gava ku serê xwe daqûl dikir, ziq li ber xwe dinerî û diaxivî, kitanê di bin ronahiya lempê de belek diyar dikir.

»Heso, ji bo ku ev şer hêdî bi hêdî biferike, gilî meke. Tişt ji tiştan mezintir hene. Pevçûna pizûr û hûran a îro bêkuştin derbas bû. Ev tiştekî bedew bû. Qey Xwedê li halê me nerî bû ku dîsa kesek ne hat kuştin. Ez xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

diavêjim bextê te û Xwedê, ez kolê te bim, gilî meke! Xebîneta van xortên me ên nesêlê, bila dîsa neyên kuştin. Pars zor e. Xwedê kesî ji gund û waran bi welatên xerîbiyê de celî neke. Erê, tu jî wek min dizanî ku xerîbî û pars çendî zor e! Hêj heta çend sal berê, em li ser kuştinê ji gundê xwe derketî bûn. Ma te çi zû ew qiriktalî û xizanî ji bîr kir, malneviritiyo! Gilî meke ez bi qurban...«

Dema ku Sarê wilo bi kelûgirî diaxivî, Heso jî destê xwe dabû ber ruyê xwe, mîna ku hişê wî li ser wê be, li nav çavên wê temaşe dikir û ji kûr û dûr difikirî. Nezaretxana qereqolê dihat bîra wî. Nezaretxane ji zindanên osmaniyan jî bi xoftir bû. Navê wê di deftera qereqolê de wek »Nezaretxane« hatibû nivîsandin, lê dîsa jî herkesî jê re »zindan« digot. Demên raborî mîna filîmekî yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn. Di zindanê de mar hatibûyê, ji desthilanîn ne ketibû, wî û mêr hev girtibû û mar fetisandibû. Girtina wî dihat bîrê. Li qereqola Stilîlê çawa êşkence dîtibû, çawa berzûrî Xwedê bûbû û dest û lingên başçawîş maçî kiribûn, weke pirûskên êgir li ber çavên wî pêdiket û vedimirîn. Lawê Necîmê hûrî çifte bi xwe de teqandibû û hatibû kuştin. Lê Circîs û hevalbendên xwe ew kuştin xistibûn situyê wî. Circîs bertîl dabû başçawîşê Sitilîlê, hakim û sawciyê dadgeha Mêrdînê. Li dadgehê Necîm li wî û Hemoyê biraziyê wî dabû. Li himber wî, guhdar û temamê heyeta dadgehê bi Quranê sûnd xwaribû, telaqê xwe avêtibû ku qesas ew bûn. Ew û Hemo çar salan li girtîgeha Mêrdînê raketibûn. Malbata wî him hatibû talan kirin û him jî derketî bûbûn.

Heso piştî ku ji kezebê axîneke kûr kişand, xwe li ser kêleka çepê pal da, ziq li Sarê nerî û got:

»Ez te fêm dikim. Ez dizanim ku bi berberiya vî gundî ji herkesî bêtir, tu diêşî. Li aliyekî şer mala bavê te ye û li aliyekî jî zaroyên te ne. Lewra kî zoriya kê bibe dîsa jî hey ji te re ne xêr e. Lê pîrê, ma çi ji destê min tê?«

Sarê ne hişt ku Heso gotina xwe biqedîne. Bi kerb ji cihê xwe qevizî, destê xwe hejand, »Hertişt ji destê te tê!« got û ber pê de meşiya.

Kulavê ku li ser rûniştibû hîn derbas ne kiribû, kiras li nav lingan herbilî û ji hindam de devdevkî bi ser çementoyê de kumişî. Eger Heso destên xwe jê re ne kiribana mertal, dê ruyê wê miheqeq xwîn bûbûya.

»Tu derewan dikî, tu dikarî vî agirî vemirînî. Tu miroveki zikreş û dexsok î. Fesadî ketiye xwîna te. Hedana te bê wê nayê. Temamê vî gundî dizane ku Circîs îşev li mala xwe ye. Lê ji êvara Xwedê de te xistiye serê xwe ku Circîs bi fen û fûtan xwe ji herkesî vediziye û çûye qereqolê gilî.

Dilê xwe hinekî safî bike, hey ji rehma Xwedê û Mihemed mahrûm bûyo!..«

Heso ji aliyekî de xwe bi Sarê re beşişand û ji aliyekî de jî di dilê xwe de got:

»Bi rastî tuxmê pîrekê tuxmekî beredayî ye. Pîrê çar, pênc deqîqe berê gava ez berdabûm ser xwe, ji zewqê hindik mabû biteqiya. Ez maçî dikirim û rîha min dialast. Îcar niha jî mîna ku ne ew pîra berê be, bûye barût û bi min de diteqe. Ma ne hey gema wê di dest min de ye, ez berê wê bidim ku ew ê bi wir de here. Pêwîst nake ku ez a rast jê re bibêjim. Ez ê dereweké lê bikim û ew ê jî qanih bibe û hew.«

Bi rastî jî Heso gava bixwesta di cih de dikarîbû Sarê him ji xwe biengiranda û him jî haş bikira.

»Pîra eskerdijmin, dîsa çi li te qewimiye! Keçê bes bi min de biteqe, bihêle ez bipeyivim. Mala Xwedê ava ku tu him nêr çênekiriye û him jî tu kiriye jina min. Bi qesem te ê mêr bi saxî bibiraştana, ha! Hinekî bêhna xwe fireh bike ku em tiştekî têxin serê hev.«

Bi vê gotinê re ruyê Sarê mîna gulekê vebû. Cihê xwe xweş kir û bi kemlanî:

»Bêhna min fireh e, bibêje bê tu ê çi bibêjî, ez li te guhdar dikim.«

»Ji bilî Sadiq, me pizûriyan di civîna xwe a îşev de bi tifaqî qerar da ku ez û Hemo em ê bi sariya sibehê re herin qereqolê gilî. Lê madem ku tu ewqasî bi vî gilî ne xweş e, ez ji bona te dikarim niyeta xwe biguherînim. Îcar bila gotin di nav min û te de bimîne. Binere tu gotinê dernexînî, ha!«

»Şerm e ku tu wilo dibêjî Heso. Ma te hîç bihîstiye ku min tu carî gotinên te ji xelkê re gotine?«

»Na. Min ne ji tiştekî got, xwe zivêr neke. Lê dîsa jî mirov hevdu şîret bike baş e.

Ji ber ku dilê min ji Circîs bi xuşûş e, sibehê ez û Hemo em ê herin qereqolê. Eger Circîs berî me ne çûbe qereqolê û gilî li me ne kiribe, em ê jî vê çûna xwe bi haweyê sertêdanekê ji çawîş re bînin zimên. Û na eger Circîs berî me xwe gihandibe çêwîş, ji xwe wî çaxî jî êdî bêminetî ye. Tiştê ku ji destê me bê, em ê tê de bikin. Ma te got çi, Sarê? Tu vê fikira min dihecibînî, an na?«

Sarê xwe çeng kir destê wî û ew bi ser xwe de kişand. Devê xwe xist ruyê wî û bû mirçe mirça wê:

»Wey tu tim hebî lo! Xwedê tu carî sifra te kêm neke. Te vê carê, tam wek camêran kir. Te min ne şikand. Te qedirê min girt. Tiştekî baş ji xer-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

abiyê dernakeve Heso, dawiya xerabiyê dîsa xerabî ye. Bi soza mêrên çê ha, ku Circîs ne li wir be, tu gilî nakî ne wilo?«

»Bi soz ku wek te derkeve,

ez ê gilî nekim.«

Heso gihabû armanca xwe. Sarê haş kiribû. Di vê kêlîkê de baş pê dizanîbû ku çawa bixwaze, êdî Sarê jî wê wilo li gor dilê wî biaxive.

Heso bi haweyê ku wê têxe dilê xwe lê nerî:

»Sibehê ma ne divê em di dest xwe de tiştekî ji bênamûsê çêwîş re bibin. Em nikarin wilo destvala bi ser de herin. Howeh li vê ecêbê, em bêî wî nikarin malê xwe bixwin, kuro! De ka tiştekî bibêje pîrê, ma em kavirekî an dîkekî elokan jê re bibin?« û çixareke pêçayî ji qutya xwe derxist.

Sarê di bersiva wî de pêşî bi herdu destan û bi hinc şiqam li çongên xwe xist, dûv re porê xwe kişand û bi qahr got:

»Ez kerê Stenbolê berdim ser jina çêwîş û hefsed bavê wî! Tiştekî jê re nebin! Waweylê, tu dibêjî qey ev eskerên qûncilik hemû şirîkên bavên me ne. Bila li we bide û tiştekî jê re nebin. Bav û kalan bi derewan ne gotine, 'Berxê nêr ji kêrê re ye.' Ji lêdanê netirse, Heso. Ma ne hey wê te nekuje, hema bila li te bide, wê çi bibe qey pepûko!«

Heso weke keftarekî bêdeng rawestiyabû û li Sarê guhdar dikir. Xuya bû ku gotinên wê bandor li ser kiribûn. Çavên wî mîna du xarên zindoqî li hev dizîvirîn û dilîstin. Tevzînokên mêraniyê habela bi kelaxê wî ve hildikişiyan, mûyê canê wî rabûbûn, xwêhdaneke sar bi eniya wî ketibû, eniyê ji xwêhdanê dibiriqand. Eger di vê bêhnikê de ordiya tirk bi carekê ve li himber wî sekinîba, belkî hîç tirs ne ketiba dilê wî û êrîşî ser temamê ordiyê kiriba.

Sarê, bi giştî gava mijara eskeran dihat qanê, rê ne dida guhdaran, ji herkesî bêtir ew diaxivî. Lê mixabin di vê şeva ku Heso ewqasî muhtacê gotinên wê bû, wê jî di vî warî de gotin kin dibirî û di cihê xwe de bêdeng disekinî. Piştî ku Heso hinekî serbixwe ponijî, serê xwe hejand:

»Hey gidî Sarê hey, bila kurmanciya gewr û şerê tivingê ba, te ê bidîta bê min ê çi kambaxî bi serê van qûncilikên romê de bianiya. Lê em çi bikin, bila mala felekê xerab bibe ku em kurmanc jî ne kirin tiştek. Barê dewletê giran e, mesele ne bi tenê çawîş e, li pişt çêwîş zir dewletek heye lêêê! Destê bi tenê deng jê nayê.«

Di vê navê re keniya, serê xwe berda ber xwe û dîsa dest pê kir:

»Heylo weylo, ev Hesoyê hejhijî ku nikare bi qelsemêrekî wek Circîs re serî derxe, îcar tew hîn ew ê bikaribe bêemiriya çêwîş jî bike, lawê tirê!

Berxan jê re nebe, kaviran, elokan, dîk û mirîşkan, hêkan jê re nebe, quzelqurtê jê re nebe baş e. Lêbelê ka ew mêrê wilo gubgub e! Gelo mêrekî wilo dilweqî û gunmezin li vê dinyayê heye! Bi tenê yek heye, ew jî Xwedê ye. Ji Xwedê pê ve kes nikare bi van segbavên tirkan. Keçê bi telaq ew jî hevalê wan e. Kes nabe hevalê qelsan, herkes dibe hevalê xurtan.«

Sarê bi qahr rabû ser xwe û berê xwe da derî. Gava xwe avêt ku bimeşe, lê ne meşiya, di cih de li paş xwe fitilî û xwe bi ser Heso de daqûl kir:

»Hêviya min ji wî rebê banî ku lingê te ê din jî bişikîne. Bes bi Xwedê re kufiriyan bike, wê Xwedê xanî bi ser me de biherifîne, rîhsipiyo. Ji çawîşê xwe re tu çi dibî bibe û bes xwe biberizîne Xwedê!«

Heso mîna ku mar bireve bin, ji nişkê ve çeng bû, li Sarê nerî. Piştî ku got:

»Erê erê Sarê!« û dîsa bi ken çûyê:

»Kesî tu polê Xwedayê te ne firandiye ku tu xwe li ser dixeyidînî. Bi rastî divê mirov carina kufiriyan jî bike. Di kufiriyan de xêr û selamet heye. Eger ku ez bi Xwedê re ne kufirîbama, ez ê çawa bi xwe şiyar bûbama ku ez bi lingekî me! Howeh li vê ecêba kesnedîtî, ji êvar de em bîst, sih zilam li hev rûniştine, heryek ji me bi aqilê xwe tahtan diqelêşe û çewaleke gotin dike, lê nayê bîra kesî ji me ku lingê min fikyayî ye! Bi vî lingê fikyayî mirov wê çawa heta qereqola Sitilîlê bimeşe! Keçê tu çi wilo wek eskeran di ser serê min re sekiniyî, zimanê min ji tîna kişiya avinê bide min!«

Sarê bi lez ber bi serşokê de çû. Satil tije av bû.

»Kuro Heso ez tasê nabînim. Ne be ku ji vê civata îşev hinekan jê tasa me dizî be?« û li dor xwe nerî.

»Ê hema bi telaq ku hinekan ew tasa me ya delal dizîbe, ez ê sedûbavekî ji wan çêkim. Min ew tasa sifrînî ji sifirkerên Mêrdînê, tam bi pênc wereqeyan kirîbû. Du ritil av diçûnê...«

Tas di navbera Sarê û Heso de li ser çementoyê bû. Dema ku wî av xwestibû, ziq li ava hindurê tasê nerîbû. Binê tasê bi hindur de kubyayî bû, tibabê bihustekê fireh û bi qasî tiliyekê jî bilind bû. Gava ku mirov bi destekî av pê vedixwar, kubika wê li bêvila mirov disekinî, avê xwe bi aliyekî de berdida, mirov jî ji mecbûrî fir dikir. Tas li himamên Mêrdînê bi kar dihat. Lê Heso ew ji Ebû Şeqloyê sifirker bi hesabê ku avê pê vexwin, biha kirîbû. Li gor wî tiştekî pir luks bû.

Sarê piştî ku poşmaniya xwe anî:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Hiş di serê me de nemaye, me gunehê xelkê jî hilanî«, rahişt tasa tije av dirêjî destê Heso kir û dîsa li pêşberî wî rûnişt.

Derdora tasê bi carekê ve ji rûn dibiriqand. Temamê civatê av pê vexwaribû, bêhna zinix jê difûriya. Heso piştî ku çar qurt li avê xistin »ohyan« got û hema wilo bi gotina xwe re domand:

»Erê kuro li vê ecêbê, belkî herkes xurifî bû, ma ez çawa bîr nabim ku lingê min fikyayî ye! Eger me bizanîba ku sibe sersal e, ehmeqekî ez bi vî lingê min ê fikyayî agahdar kiribama, ma min kengî ev barê gilîkirinê digirt ser pişta xwe. Tobe tobe ya rebî! Ev bêhişiya min hemû ji destê Circîsko ye!«

Sarê bi ruyekî sar û qermiçî:

»Nizanim bê tu çima xwe ewqasî zivêr dikî, lo. Xem nake, kêmaniyek bû, we kir. Îcar pêwîst nake tu vê meseleyê ewqasî mezin bikî. Tiştê çû mede dû, Xwedê ji te razî. Ne mirin e ku ra lê nebe.«

»Çawa yanî ne mirin e ku ra lê nebe? Ma tu dixwazî ez çawa bikim?«

Di vê navê re dengê ewte ewta çend kûçikan ji tara jêrê dihat. Bi dengê kûçikan re Heso gotin birî û bi xof li Sarê nerî! Lê Sarê jî bêî ku pacê veke, li ber pacê ser pêyan sekinî û guhê xwe da ser kûçikan. Bêhnek ne çû, deng ji Doguj jî hat. Doguj mîna ku bi dû dizan bikeve, bi hime him xwe dadida.

Dilê wî sivik sivik lê xist:

»Keçê pîrê, ev dengê Doguj e. Ev kûçik vala nareyê. Ne be ku Circîsko esker anîbin ser me an Circîsko ji gilî vegeriyabe?« û lihêf bi ser serê xwe dakir.

Gelek ne çû deng ji kûçikan biliya. Lê Heso hîn jî lihêf ji ser xwe ne avêtibû.

»Kuro ma tu raza? Rabe ser xwe, çend gotinên min mane, ez ê wan jî ji te re bibêjim û herim razêm.«

»Bibêje pîrika Reşo, bibêjbê bê tu ê çi xweliyê li serê min kî!«

»Sibehê bi xêr li bergîla xwe siwarê, dîkekî elokan bi xwe re hilîne û here ba çêwîş. Ji xwe wek ku me gotibû, eger Circîs tu gilî ne kiribe, hûn ê jî vê çûna xwe ji çêwîş re bi haweyê serdana sersalê bînin zimên û hew.«

Heso ji nişkê ve lihêv ji ser xwe avêt. Bi hêrs kulma xwe li doşekê xist, toz ji doşekê bi ser ruyê wî de bilind bû. Kuxiya. Kuxuka wî ne sekinî. Lê wî guh neda kuxukê û zorî da xwe:

»Keçê ma tu nizanî ku bi kavir û beran û gîsk û nêriyan em diçin serdana çawîş û midîrê Stilîlê, hi! Ma me di kîjan rojê de, ji wan re bi elokê

re beran ne biriye ku tu xwe wilo li ehmeqî datînî û xaşomaşo dipeyivî! Li dera ha rûne û li min guhdar bike, bê ji roja ku gundê Stilîlê bûye nihye û heta niha, min bi destê xwe çend pez ji segbavê midîr û çawîşan re birine, ez ê dîsa hemî yek bi yek di bîra te de bînim. Belkî pêncî carî ku ez vê meseleyê ji te re bi dar ve dikim, bila vê carê jî bibe pêncî û yek, qey ev jî qedera me ye bavo...«

Sarê û Heso her sal berî cejna Remezanê û Qurbanê bi mebesta ku Heso pezekî ji çawîş re nebe, wek şêr û piling li ber hev pandibûn û bi gotinên dijwar radihijtin hev. Sarê jineke merd û ewqasî jî berberçî bû. Çavtengî li dor peyde ne dibû. Ji ber vê merdî û mêraniya wê, dost û dijmin, temamê gundiyan qedir û qîmet didanê. Lê ji eskeran pir bi kîn bû. Qet ne dixwest ku ne ji mala wê û ne jî ji mala gundîyekî firingek bigiha destê eskerekî. Her sal hin alîgirên Berzanî gava li herêmê bi dizî pere didan hev, Sarê berî ku van alîgiran ji mala xwe bi rê bike, pêşî digel gundiyên hevalbend li odê bi civatî rûdiniştin û hesabê ku di sala çûyî de çend mirîşk, dîk û elok û pez û hwd. gihabûn çêwîş, dikir. Bihayê mirîşk, dîk û elok û pezên ku gihabûn çêwîş li hesêb dixist, hemû dikir pere û dida alîgiran. Ev pere jî bi mebesta ku Berzanî şer bi tirkan re dikir dida. Alîgiran wilo xistibû serê wê.

Heso jî wek wê ji eskeran bi kîn bû. Lê wî, dan û sitendina bi eskeran re mecbûriyeteke mezin didît. Eger wî jî wek Sarê kiriba, belkî tu carî nikarîba li gundê Zorava rûnişta. Ji ber ku serokatiya herêma ku ew lê rûniştîbû, eskeran dikir. Li vê herêmê hebûn û nebûna mirov, hemû bi insafa esker û polîsan ve hatibû girêdan. Tirkan hemû dezgehên dewletî li herêmê damezirandibûn, lê berpirsiyarê hemiyan jî esker û polîs bûn. Muxtarên gundan, reyisê belediyan û hwd. hemû li ser daxwaza komutan û komîsêran dihatin hilbijartin.

Xelkê herêmê mîna ku di demên raborî de bêş didan axan, wilo bêş didan midîr û komutanan. Di navbera salên 1930 û 1940î de ku dewlet li herêma omeriyan tam hakim dibe, îcar bi navê »Eyda Çawîş û Midîrê Stilîlê«, bêdevjeng salê du caran ji bo midîr û komutên di cejna Remezan û Qurbanê de pere didan hev. Dûv re piştî demekê, li ser emirê midîr û komutên, muxtaran vê carê jî bi sebeba »Cejna Komarê« salê sê caran pere dan hev. Talana ku di herêmê de dibû, di nav komutanê hidûd, yuzbaşiyê tabûra Nisêbîne, başçawîş û Midîrê Sitilîlê de par ve dibû. Hertiştên xwe bi şêwir û tifaq dikirin. Cezê nedana bêşê, giran bû. Mirovê dema ku bêş qebûl ne kiriba, ji teref komutên êşkenceyeke mezin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

didît. Muxtarê gundê Cinata Girdo carekê ji ber ku bêşê bîst rojan dereng tîne meqamê komutên, komutan wî sê seetan bi darê ve dadiliqîne.

Heso ji destê midîr û komutanên qereqola Stilîlê pir kişandibû. Malê wî pir xwaribûn. Êşkence pê kiribûn. Ew di nezazaretxana qereqolê de gelek rojan bênan û av hiştibûn. Ji ber van sedeman bû ku wî, navê temamê midîr û çawîşên ku hatibûn Stilîlê bi carekê ve ezber kiribûn.

»Ez naxwazim li te guhdar bikim. Bûye nîvê şevê. Eger ez xwe bikim wek te û li te guhdar bikim wê li me bibe sibeh. Min çi ji te û çawîş û mawîşa ye! Xwedê bike tu malê xwe hemî bide wan teresan, wey bimir!..«

Heso piştî ku got »Baş e baş e, ez ê bi çend gotinên girover kin lê bixim«, rabû ser kabokan. Ji kûraya kezebê keserek veda, serê xwe hejand û bi herdu destan tewirand:

»Di roja ku romiyan navê xwe li gundê Stilîlê kir û ji çawîşê qereqolê mezintir midîrek anîn vî gundî, guran li ba şikefta Kunheftarê tam nozdeh mîhên me kuştibûn. Ez wê tarîxê qet ji bîr nakim, Sarê. Îcar ji wê rojê û heta niha, tam hivdeh midîr û bîst û neh qomandar li Stilîlê bi cih û war bûne...«

»Heso, niha ne wextê vî hesabî ye. Şev derbas bû. Hinekî ji xwe re razê ku tu bi wext xwe bigihînî qereqolê.«

Heso xwe aciz kir.

»Keçê bihêle, ez gotina xwe biqedînim! Şev derbas bû bi esfelesafilîn kirî, weh!..«

Sarê xwe bi ser hev de guvaşt, devê xwe tije kir ku bipeyive, Heso rê nedayê.

»Di roja ku romiyan navê Sitilîlê kiriye 'Akarsu' û heta niha, min 33 beran, 24 kavir, 13 nêrî û 18 gîsk dane midîr û çawîşan. Îcar bi dest pereyên ku min dane wan, ji xwe nayên tu hesaban! Lawên teresan ji kîsê me, hemû bûn xwediyên milyonan!..«

Ew hîn wilo diaxivî, Sarê rabû ser xwe û destên xwe bi hev firkandin. Piştî ku bêhnekê wilo sekinî ma:

»Hema bêbeleyeke mezin ev

tav jî di ser me re derbas bûbûya, ya rebî« û berê xwe da xaniyê malê.

Bûbû derengî şevê. Reşaya ewran xwe berdabû ser gundê Zorava, ji bestê gund xuya ne dikir. Çemê ku bi ro li dor du metroyan rabûbû ser xwe û mîna aşan deng dida, dapiçiyabû. Bi zorê dengê destarekî jê dihat. Kûçik ne direyan. Herder bêpêjin bû. Lê Heso hîn jî raneketibû. Xwe

serpiştkî vezilandibû, ziq li maxên bin zikê odê dinerî û ji kûr û dûr difikirî.

* * *

Banga sibehê lê xistibû. Ji çiyê qebeqeba kewan dihat. Mijê xwe berdabû ser gund. Bê ne dixurbiland, lê dîsa jî sar bû. Ji mijê qelaçên gund diyar ne dikirin. Deng ji çem biliya bû. Çem mîna marekî teyar bêpêjin diherikî. Çûkên beytik serê xwe di hêlînan re derdixistin û dîsa dikişandin hêlînan. Cesaret ne dikirin ku bifirin. Dîkan bang didan. Yekdengan çêlek dioriyan. Kebaniyên malan hîn ji xew ranebûbûn. Dixan ji hilorîkan ne diçû. Melê gund dîsa azan nedabû. Li ser rêya Îpekê çûn û hatin tune bû. Eskeran xwe ji tabiyan bernedabûn.

Ji mala Heso, Sarê berî herkesî şiyar bû. Kirasekî gewr î gulgulî bi ser taziyê xwe de berda. Li benikê pişta xwe geriya, çavê wê bi hepiriya Meyroyê ket. Bêmefer destê xwe dirêjî hepiriyê kir û bi yek tûşê newqa xwe girêda. Kirasê wê ji newqê û berjor de hawêrdor mîna balonekê nepixî. Ji nepxa kirês û qermîçonkên hûr, vekirî diyar dikir ku newqa xwe çendî bi ser hev de şidandiye. Barşewala rabûbû ser xwe. Bêderpî raza bû. Avika Heso gihabû derpiyê wê. Li gor dînê wan, derpî herimî ya jî mekrûh bûbû. Hîn bi şev derpî li hev pêçabû û xistibû bin balîfa xwe ku bi roj bişo. Ber bi derî de bazda û mîna ku tiştekî xwe ji bîr kiribe ji nişkê ve sekinî. Pêşî li texma ku zarok raketîbûn, nerî. Dûv re xwe bi ser çongan de tewand û di şibakê re li der ve temaşe kir. Ji mijê her der wek hêkê sipî xuya dikir. Bi dû ku got, »Li min pepûkê berf bariyaye! Wê Heso di vê berfê de çawa here nig çêwîş!« û xwas xwe çeng kir hewşê.

Da nav pirikê û ber bi odê de meşiya. Gavên xwe fireh û sivik avêtin. Ji çelpe çelpa lingên wê pirik bi ser çîman û kirês de dipekiya. Kirasê debixî, ji qilêrê bûbû wek şemedanê, av ne dikişand.

»Heso Heso qiriko, rabe ser xwe, ro hilat!«

Heso digel ku hişkiling ketibû dîsa jî hetanî derengî şevê raneketibû. Xwe bi xwe civat çêkiribû. Geh çawîş dianî gund, geh ew diçû nig çêwîş geh Circîs li ba çawîş didît geft li hevalbendên xwe dixwar û digot, »Hela ez xericîm, min nezanî kir û ez ne çûm gilî, ma we çima bi a min kir û hûn ne çûn gilî?..« Bi vê taswasê raketibû. Xew lê giran bûbû. Du balîf xistibûn bin serê xwe û li ser piştê di xew re çûbû. Balîf ji ser hev çûbûn: Yek ber bi piştê de û yek jî bi ser çementoyê de şemitîbû. Te digot qey bazinê situyê wî xiliyabû, qotê serî bêlept û senede li hewa sekinîbû. Devê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wî mîna zîhayekî birçî ji hev vekirîbû. Ji kortika qirika xwe hewa distend. Lê ew jî bi zor. Kefinc bi devê wî ketibû. Rîh û simbêlan ji kefincê wek dara ku di bin berfê de bimîne, xuya dikir.

»Kuro Heso hey agir bi mala bavê keto, zû rabe ser xwe!..«

Sarê hişk bi milê wî ê çepê girt û bi hêrs hejand. Heso veciniqî. Nehişî çeng bû, rabû ser xwe û bi dengekî pêt got:

»Ez xulamê jina te bim begê min, tu ê bes li min bidî, te ez bi lêdanê kuştim!«

»Kuro begê çi! Ez Sarê me, Sarê!«

Heso giriya û çarmêrkî rûniştin. Bi kirasê jina xwe girt, lingên wê maçî kirin û dîsa bi kelûgirî axivî:

»Begê min, ez kûçikê ber deriyê te bim, hema vê carê min bibexişîne ma qey wê çi bibe! Ûy ûy ûy!..«

Sarê piştî ku got:

»Hey min xweliya heft welatan li serê te kiro, qaşo tiro zilam e« û bi bazdan ji odê derket.

Meyro xwe li ser teniştа rastê pal dabû û zaroka xwe şîr dida. Temo kelefekî wê xistibû nav şeqên xwe. Herdu çepilên xwe di newqa wê re derbas kiribûn, devê xwe bi movikên pişta wê ve didewisand û ew bi ser xwe de diguvaşt. Dixwest wê maçî bike, têhna wî ne dişikest, îcar dev lê dikirê. Ji girêza devê wî pişta jinikê şil bûbû. Wê jî xwe di nav çepilên wî de xiloxavî kiribû. Mijandina memikan di hisên şehwetê de tevgeriyabûn û bêhemdî xwe ji navikê û ber jêr de hertiştê xwe jê re berdabû. Ji helke helka wê, temamê qul û qulikên di canê wê de vebûbûn, can di cên de wek asfincê dimijt. Xwêhdaneke hûr bi eniya wê ketibû. Rehên sitû dijenîn, reh bel bûbûn. Di lepta tilmiqûnan de lêvên wê diricifîn. Tilmiqûnan kiribû seyran. Ji reqsa mijankan dixuya ku di jêr û ber jêra wê de çawa xunav dibare. Eger di vê bêhnikê de Sarê ne hatiba, ji sedî sed vê jinikê Temo radikir govendê.

Sarê bêhnçikyayî got:

»Keçê Meyro zû deyl Temo bike!« û ber bi dergûşê de meşiya.

Temo ji nişkê ve xwe da ser hev. Kaboka wî li kêleka Meyro ket, Meyro xûz bû û barînî bi zarokê ket.

»Dîsa çi tofan li me rabûye pîrê!«

»Zû rabe ser xwe ku dibêje çi tofan li me rabûye, tofana herî mezin li me rabûye, bavê te dîn bûye!..«

»Tu çi dibêjî lê? Bavê min çawa dîn bûye!«

»Kuro wilehî din bûye, ma qey tu ji min yeqîn nakî? Mêro, min li ber çavên xwe wek çêwîş dibîne. Dest û lingên min maçî dike, xwe diavêje tor û bextê min û dibêje ‘Begê min, qomandarê min, ez kûçikê te bim, min bibexişîne..’«

Temo bi van gotinan ji tesîra şahwetê derket û xwe da ser hev. Rahişt mîkutkê Nêrgizê bi hêdî li dergûşê xist û beşişî:

»Yadê, niha tu bi qedirê Xwedê kî, bavê min bi rastî ji te re gotiye ‘begê min’ hi?«

»Lo lo te porê yadê kur kiro, xwezîka hema bi tenê bi qomandar ba jî! Ji aş û baş dabû nav û digot...«

Dema ku Temo û diya xwe ketin hindurê odê, Heso pala xwe dabû dîwêr û difikirî. Dizanîbû ku tiştek lê qewimiye, lê çi tişt e tê dernedixist.

»Yabo xwe pev bixe, bû dereng. Ma te xwe ji bîra kir ku tu û Hemo hûn ê bi sariya sibehê re biçûna nig çêwîş?«

Heso di bin çavan re awir dan Sarê. Çavên xwe tibabekî ji ser ne guherand. Dûv re hilda xwe ku rabe, nikarîbû. Wek dînan li dor xwe nerî:

»Esas dijminê min ê mezin di mala min de ye« û berê xwe da Sarê û vê carê jî bi dengê bilind:

»Keçê ma te nizanîbû ku min ê bi şeveqê re xwe bigihanda ba quzelqurtê çêwîş! Te çima deyl min ne kir?..«

Sarê mîna ku ji hertiştî bêhayî be, tena tena ber bi satila avê de meşiya. Hûçikên wê ên dirêj û vekirî mîna tûmên şahfela bi dû cencerê ve xwe berdabûn ser çementoyê, çemento dialast û bi dû de dikişiyan. Tas di hindurê serşokê de bû. Xwe bi ser tasê de daqûl kir, çena wê li dîwarê dikê ket. Mîna ku çena wê li dîwêr ne ketibe, tişt li xwe çênekir, bêdeng rahişt tasê û bi kirasê xwe paqij kir. Tas di satilê dakir û ber bi Heso de çû:

»Vê avê vexwe belkî hişê te bê serê te.«

Heso serê xwe tam rakir û ziq li ruyê wê nerî. Xwe bi ser hev de hilqerast û qiriçand. Ji halê wî xuya dikir ku ne dixwest gotinên çort bi Sarê re bike. Bi destekî ferşê kaboka xwe zeft kir, destê din bilind kir û hejand:

»Xweha Circîsko îcar çi ye? Ma qey tu dixwazî ez bibim kafir? Di vê rojiya remezanê de ez ê çawa avê vexwim!«

»Kuro tu xurifiyî xurifî, here ba şêx û mişayixan bila ji te re nivîştekê çêkin. Bavê Luqman te aqilê xwe berdaye...«

Wî ne hişt ku ew dawiya gotina xwe bîne, destê xwe li tasê da û av hemû bi ser de rijiya. Xwe qulipand ser piştê, qotê serê wî li dîwarê odê ket.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Ay yabo! Lo Xwedê, qey bi rastî tu ne li ser edaletê yî! Ez ji bo te rojiya xwe naxwim û tu jî serê min li dîwaran dixî, ha!..«

Sarê bi lez ji hindur derket. Temo xwe ne girt pirqînî pê ket û zorî da ken.

»Lawê kerê, ev çi hewala we ye îro! Diya te ji xwe fedî neke avê bi ser min dadike û tu jî bi min dikenî! Ma wê çima jinik ji xwe fedî bike, yabo qurbano, insanê ku mirov nîh...ê û ji xwe fedî ne kir, ne taseke av, dikare kûzeke av bi ser mirov de dake. Xanima diya te niha av bi ser min de dakir û êvarê jî wê min berde ser xwe. Ha ji te re birako, pîrek ev e ha.«

»Bavê min ê delal, xwe ewqasî zivêr neke, lê tu li diya min neheqiyê dikî. Îro ne Remezan e, te rojiya çi girtiye?«

Heso bi van gotinan mîna ku tu cerek ava qerisî bi ser dakî, di cihê xwe de sar bû. Serê xwe berda ber xwe û bêhis û pis sekinî. Piştî ku bêhnekê ponijî, keniya:

»Wey li aqilê min û bavê min be, Xwedê serê min li dîwaran dixe û ez dîsa jî bi ser hişê xwe ve nayêm. Xwedê dixwaze min şiyar bike û Sarê dike horî, tasek ji ava kewserê dixe destê Eynulheyata min ku ez ji destê wê vexim û bibim horiyê wê ê nêr. Û dîsa jî ez bi xwe şiyar nabim. Bi rastî di vê sibeha sersalê de, ez jî wek gelek şêxên kurkur e dikarîbûm bifiriyama ezmanan...«

Heso çiqasî digot, Temo jî ewqasî dikeniya. Şerwalekî gewr î bi navran li xwe kiribû. Şerwal li ser navikê şidandibû. Gava ku dikeniya zikê wî ê bel wek kodika êş dihejhijî.

»Yabo, bi van henekan tu dixwazî gotinê ji ser xwe biqulipînî, min bike hevalê xwe ku bi zanatî te xwe li dînitiyê daniye û dînitiya xwe wek jîrîtiyê bi min bide qebûlkirin. Lê ez bawer nakim ku tu ê bikaribî vê yekê bi diya min bide daqurtandin. Xweha Circîs pîrekeke yeman e!..«

Ew hîn wilo diaxivîn, Hemo qapûtê wî di dest de û kete devê derî.

»Weh weh, ev çi ye apo! Tew min digot qey ez dereng mame, apê min deyl ji min kiriye û çûye. Zarok sersala xwe didin hev, ro qamekê hilatiye û hîn jî tu di nav livînan de yî. De zû zû xwe kar bike, te li me kire dereng!«

Heso piştî ku ji Temo re,« Ji min re taseke av bîne«, li Hemo nerî. Qutiya tûtinê avêt ber û got:

»Bavê mino, hêdî hêdî bêhna xwe fireh bike. Ne tu di şer de yî û ne jî ez di cebhê de me. Em ê herin weh! Dereng be, wê çi bibe qey. Ez kerê Stenbolê berdim ser jina çêwîş, tiştê ku ji qûna wî û bavê wî tê bila texsîr

neke. Ma ne hey lêdan e, hema bila li me bide. Erê, de ka bibêje bê çima te ew bedil li xwe kiriye? Dibêje qey em ê herin dawetê. Qerewat ji te kêm e, te qerewatek jî girêda...«

Hemo bedilekî reş li xwe kiribû. Bedil hîn ji dema zavetiya wî de mabû. Di rojên ku diçû Nisêbînê û qereqola Sitilîlê li xwe dikir. Jina wî di her cara ku bedil dişûşt, pêşî dikeland. Bedil ji rengê xwe derketibû, nîvgewrî bûbû. Wek kîsê hesarê her derên wî bi qermîçonk û li hev tewyayî bû. Gava rûdinişt, pantor bi jor de hildikişiya, gurçikên çîmê di navbera gorê û delingan de wek serê zarokên heft rojî xuya dikirin. Qutikekî qedîfeyî sor di bin çakêt de li xwe kiribû. Berstika qutik û çakêt li hev geriyabûn, heta ku mirov ne çûba ber û tam bala xwe nedabayê, mirov tê dernedixist ku berstika qutik bi çakêt an a çakêt bi qutik ve ye. Qayiş di sê qulpikên şerwêl ên paş re derbas ne kiribû. Qutik ji pêş ve di bin qayişê û pantor de bû û ji paş ve di bin qayişê re xwe bi ser pantor de berdabû. Qayiş naylonî û sipî û bizmik mezenî bû. Bizmik tam li ser navikê rûniştibû, ji dûr ve wek nalekî diyar dikir.

»Apo ma ne çêtir e ku ez bi bedil derkevim meqamê çêwîş? Bedil mirov kubar dide xuyakirin. Bila çawîş bizanibe ku em ne ji malbateke wilo hayela nin, em malbateke mezin û ji xwe razî ne...«

Heso ji qahra nava xwe, bi gu

hikê lihêfê girtibû, tiliya xwe wek şûjinê di guhik de radikir û hirî dikişand. Geh ji qurm de bi rîha xwe digirt, çena xwe diheciqand û çavên xwe dikutkutandin. Te digot qey li ser mûristanê rûniştibû, di cihê xwe de habela diqeliqî.

»Bes e bes e, te ez kirim heban! Eger hema tu du gotinên din bibêjî, bi Mishefa Reş ez ê ji hev belav bibim! Mêrik ji malmezina ye, kubar û ji xwe razî ye, hi. Bê çi qure ye. Tu li şerwalê wî, tu li çakêtê wî, tu li halê wî, tu li fiqrê wî binere. Yanî niha tu bi xwe dizanî ku tu bûyî wek lewleba meşkê. Aha doh bû, Circîsko demaçe li ser me vala kir...«

»Yabo, pêşî xwirîniya xwe bişikîne û dûv re wê çixarê bikişîne.«

»Dirêj neke! Metrehê li ser bergîlê baş bişidîne. Girikeke penêrê bi sîrik, du, sê pîvazan û çend nanan têxe tûrik. Ji pîrê re bibêje, eger bastêq mabe, du top pastêq û sê, çar çeng mewîj jî wekî din têxe kîsikekî û biavêje binê tûrik.«

Temo wek pûtekî li ser lingan sekinîbû û bi hirmet li bavê xwe guhdar dikir.

»Ha, kuro bise neçe, min a herî girîng ji bîr kiriye!«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Bibêje yabo.«

»Tûtin tûtin! Lawê qahpikê çawîş, bi ser birîndariya me de dikare me şeş, heft rojan jî têxe zindana qereqolê. Di cihê teng de çixare sebir û wens e. Eger li malê kîsekî naylonî peyde nebe, bila pîrê tûtinê ji me re têxe kîsê şekir. Ha, berî ku tu here vê jî ji bîr neke, neh, deh tax pel jî têxe nav tûtinê.«

Hemo çixare dipêçan. Haziriya ku bi rê de bikişînin, dikir. Gotina Heso pê beloq hat, keniya:

»Apo ewqas tûtin û pel hewce nake. Ez bawer nakim ku çawîş me biavêje zindanê.«

Heso hîn nîvê çixara xwe ne kişandibû, qûnika çixarê di nav lêvên xwe de bir û anî û bi serikên lêvan çixare pekand ser çementoyê. Li xwirînî çixare kişandibû. Ji devê wî bêhneke wek peza ku bi saxî di nav êgir de bikizire, dihat.

»Tu bi qasî min van bêbavên r

omiyan nas nakî, Hemo. Nan û ava wan li ser kabên wan in. Romî çi ji camêriyê fêm dikin? Em ê dîsa jî bi tedbîr herin.«

Hemo di dilê xwe de beşişî. Devê wî ji hev veziliya û çenawî a qewsikî bi jor de bilind bû. Destê xwe danî ser qebza demaçê û bi kubasên qewlikê demaçê lîst. Kubase girtin û vekirin. Wek beruyên ku di nav agirê sobê de biteqin, qupînî ji kubasan dihat. Di bin tesîra hinera demaçê de, bi haweyekî ji xwe razî peyivî:

»Apo bi rastî tu miroveki pir bi aqil î, romî bêbav in. Ji qenciyê tiştekî fêm nakin. Çawa ji wan re baş be wilo dikin« û keysa xwe li rûniştinê xweş kir.

Bi lez xwêziya xwe daqurtand, xwest ku axavtinê bidomîne, lê Temo ji hewşê bi dengekî hêl bang kir:

»Yabo hertişt temame, êdî hûn dikarin bi rê kevin.«

Heso xwe da ser hev ku rabe, lê nikarîbû. Hemo mîna pisîkê xwe çeng kir ber û bi zendê wî ê rastê girt. Kete bin pala wî û ber bi derî ve meşiyan. Sarê di devê derî de pêrgî wan hat. Şerwal, qutik, êlek û şifqa Heso li ser milan û ferek qundera wî jî di destê wê de bû. Serê xwe hejand û liklikî:

»Waweylê waweylê, kuro ev îro çi bi we hatiye, we aqilê xwe xwariye qey! Li min pepûkê Heso bi vî halî tu ê çawa here ba çawîş!«

Heso milê xwe ê çepê da dîwêr. Pêşî ziq li lingê xwe ê pêçayî, dûv re jî li bejna xwe nerî û got:

»Xweha Circîsko, halê min çawa ye qey? Ez wek bivir im, bivir.«

Sarê dîsa keniya. Piştî ku ji Heso re got »Gotinê dirêj neke«, ket bin çepilê wî û ew kişand hindurê odê, li Temo û Hemo nerî û bi hêrs peyv domand:

»Erê me fêm kir ku mezinê pizûriyan Heso beg, ji şevê din û vir ve xurifî ye. Lêbelê ma hûn jî xurifî ne ku hûn ê vî xurifiyê ha bi tena bêceme û fanêreyê sertazî bibin meqamê çêwîş!«

Hemiyan li hev temaşe kir û bi aqilê xwe keniyan. Hemo destekî xwe danîbû ser demaça xwe, bi destekî jî devê xwe girtibû û habela di bin simbêlan re dikeniya. Sarê cilên Heso lê dikirin.

»Kuro bêhna genî ketiye lingê te ê pêçayî. Vî mûyî ji ser lingê xwe biavêje.«

Heso di nav lepên Sarê de bêtaqet ketibû. Mîna zarokekî sêwî ku li dikana beqêl binere, ne bikaribe tiştekî bikire û ne jî bi ser bavê xwe de bigrî, melûl melûl lê temaşe dikir.

»Heso ez bi te re dipeyivim, bêhna miraran ji lingê te tê. Bi vî lingê genî çênabe ku tu here meqamê çêwîş, eyb e. Çawîş wê henekên xwe bi te bike, tu ê piçûk bikevî.«

»Oh tu jî lê, lingê min pir dixwire. Ev jî tê wê manê ku ez ê zû rehet bibim. Cebarê cihê xwe girtiye, xwir elemeta cebarê ye. Ev ne karê te ye, li ser tiştekî din bipeyive.«

Wî dixwest ku Sarê, behsa mêraniyê bike û nav tê bide.

»Baş e, goreke hirî bikişîne ser, hema çawa be gore wê hinekî bêhnê bigire.«

»Keçê bi wê Mishefa Reş tu bi aqil î, lê. Bê kê bîra vê yekê dibir, kuro! Zû ji min re gorê bîne û bila devê te jî hîç nesekine.«

Temo bi hefsarê bergîlê girtibû û di nav pirikê de sekinîbû. Bergîlê her ji bêhnikekê simên xwe li erdê dixistin, pirik li derdorê belav dibû.

»De ka wê bergîlê hinekî ber bi dikê de bîne, ku dîsa pîra diya te qerfên xwe bi me neke. Bi rastî ku ne ji pîrê be halê min tune ye. Pîrê xeleka navbera hindur û derve ye. Ez bi hinera aqilê wê incex dikarim xwe li tena bigirim.«

Ruyê Sarê bi van gotinan mîna gulekê vebû. Devê wê bihustekê ji ser hev çû. Zor da xwe ku nekene, lê dîsa jî hinekî teriqand. Kitana xwe da ber devê xwe û bi haweyekî kubar got:

»Devê te xweş be pîro. Hinekî bilezînin rêya we dûr e« û girikeke penêr û hefsarê bergîlê da dest Heso.

Kîsekî çapanî di dest Hemo de bû. Çarox girêdabûn û qundera xwe jî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xistibû kîs. Bêqapût bû.

»Ew çi kîsê di destê te de ye birazî?«

»Qundera min tê de ye apo. Bi xêr gava ku em gihan Stilîlê, ez ê çaroxan deynim qunderê girêdim û derkevim himber çêwîş, da bizanibe em ne mirov in hov in; bi çavên maqûlan li me binere û hinekî bi terbiye bi me re bipeyive...«

Ew hîn wilo diaxivî, Sarê bêhnçikyayî bazda hindurê malê. Hilmek ne çû, ji hindur derket. Kurkê Heso û çefiya wî li ser milê wê bûn. Du şev berê gava Heso bi kurk derketibû hewşê guh dabû ser qaçaxçiyan û di nav pirikê de ketibû, kurk di heriyê de mabû. Sarê kurk ne şûştibû. Di devê deriyê hewşê de giha Heso.

»Lo lo pîro, hey te xwelî li serê min kiro, ma tu ê çawa di vê qir û qefalê de bêkurk bide ser rêyan!..«

Heso û Hemo bi rê ketin. Sarê jî taseke av bi dû wan de rijand. Heso henekê xwe bi aqilê wê kir:

»Pîrê tasek hindike, satilekê birijîne ku oxira me tam hilê. Howeh ev pîrek çiqasî bêaqil in!«

Ro tibabekî bilind bûbû. Mija ku berî niha bi seetekê her der nixumandibû, belav bûbû. Ewr li rajorê çiyê di ser hev re diqulipîn û ber bi deştê de digindirîn. Reşêle û qijakan xwe berdabûn ser sergoyan. Xortan xefk li ber wan vedabûn. Hinekan jî li ser sêncan şaqûl vedabûn. Zarokan kincên xwe ên herî xweşik li xwe kiribûn; di gasînên gund de wek kulîlkên biharê rengareng xuya dikirin. Garankî dabûn dû hev, heryek kîsikek di destê wî de bû û mal bi mal li şekirê sersalê digeriyan. Pê li destûrên kal û bavên xwe kiribûn. Mê û nêr bi hev re dilîstin, dikeniyan, diterpilîn, diketin, ji kêfa şekir re yekser radibûn ser xwe û bêmefer xwe diavêtin hindurên malan. Derdora devê wan ji şekirê qulqulkî wek soringê dixuya. Hinekan derbikên demaçan berdidan, hinekan xwe li gasînan qulopazî dikirin û bi babûtan dilîstin. Qîzên herdu bendan jî xwe berdabûn ser birka gund, bi darên tuyê ve hêlan çêkiribûn. Hinek ji wan ketibûn hêlanê û hinekan jî bi hûrizî dilîst û bi sitiranên evînî diavêtin ber hev. Dilîlandin. Dengê lîlelîlên wan li ser gund belav dibû, agir bi dilê xortan dixist. Kûçikan li ser bênderan digel hev dilîstin. Yek direviya ên din didan pey wî, yekî xwe diavêt erdê ên din ew li erdê digevizandin. Hin gundî çûbûn ber çem lêmişt didan hev û hin jî li ber dîwaran xwe dabûn berberojkê. Ji dîwarên kelpîçkirî qirşik dikişandin û li ber diranên xwe ên bi zeng dixebitîn. Ava zer bi nav diranên wan ketibû, tif ne dikirin

û dadiqurtandin. Qurmên diranan ji çixarê reş bûbûn. Mîrzoyê mitirb jî daketibû ser bênderên binya gund, birek xort li xwe vehewandibûn û ji wan re li ribabê dixist. Xortan di vê bêhnikê de dijminatî ji bîr kiribûn. Hûto serê govendê dikişand. Lefahiya Hitê di destê wî de liba dibû, çarpîne xwe li erdê dixist û habela qîr didan.

»Ha wilo ha wilo, ez çavên we bixwim xortino. Ji dil lêxînin, îro heye sibe tune ye. Çep çep çep, rast lêxîne, çep vegere, ha ha ha hûr bîde ber, hûr. Mîrzo xurfanî xurfanî, kuro xurfanî lêxe!«

Mîrzo mitirbekî di ser xwe re bû. Xweş dikarîbû govend rakira. Hostê ribabê û govendê bû. Ji reqisvanan fêm dikir. Wî dizanîbû ku gula govendê Hûto ye. Gotina wî ne dişikenand. Li gor dilê wî diçû.

»Hêêê hê hê hê, kezîzerê kezîzer, tu di ser çavên min re wer
Xulam wan memkên te bim, serê memkan dane der
Wek tiriyê Zinarê, nêvî sor û nêvî zer
Tahma memkên te xweş in, wek penêrê nav koçer
Ha ha ha ha....

Lêêêê lê lê lê, kezîzerê kezîzer, kezîzerê lewendê
Te dilê min kemitand, aqil ji serê min sitendê
Keçê were ji nav malan, têx gerdenê bazbendê
Destê xwe di destê min xe, da em xweş bikin govendê
Hêêê hê hê hê, bişewitîne, bişewitîne!..

Oooo, kezîzerê kezîzer, malxerabê de ka wer
Ez nexweş im, bawî me, ji te re dêbêm çar xeber
Eger bi aqilê te keve, ber bi mala me de wer
Xulam wî fistanê zer, memik di bin de girover
Selewat li navê pêxember!
Allahumesellî alaseyidîna mûhemmed!
Hêê...«

Hûto ji zewqê nepişî bû. Xortan pê re nikarîbû derxista serî. Geh bi milan geh bi sêngê diçûyê. Te digot qey canê wî bêhestî ye. Her aliyekî xwe bi haweyekî dilivand. Mirov dixwest hema bixwe û vexwe û herwiha lê binere. Hûto qeranê govendê bû.

»Mîrzo Mîrzo! Li cîranê biqewimîne, cîranê cîranê...«



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mîrzo di cih de sitiran diqulipand û Hûto dîsa lê germ dibû.

Dema ku Heso û Hemo xwe ji gund berdan û ber bi qelêç de meşiyan, êdî herkesî dizanîbû ku wê ev camêr herin Stilîlê gilî. Heso mîna ku ne dixwest kesek wî bibîne, xwe li ser bergîlê qiloç kiribû, dar li ser dêr li bergîlê dixist. Bergîl bi lewk diçû. Zixur ji ber simên wê dipengizîn li tahtan diketin, reqîniya zixuran li newalê dengê çepikan vedidan. Lêmiştvanan mîna ku çerçî bê gund, hemiyan dev ji danheva dar û beran berdabûn û li wan temaşe dikirin. Hemo destê xwe danîbû ser kêleka xwe hişk bi qewlikê demaçê girtibû û di ber bergîlê re dibeziya.

»Lo waaa yabo, yabo, yabo!..«

Heso veciniqî, »Ev wek dengê Temo ye« got û hefsarê bergîlê kişand.

Xwest ku bergîlê ragire. Lê bergîl germ bûbû ne sekinî û wî ji nişkê ve li paş xwe nerî. Di vê kêlîkê de qirdê wî, tevgeriyabû. Eger Hemo pê re ne gihaba, ew ê bi ser lingê xwe ê seqet de ji bergîlê bihata xwar. Belkî di vê carê de ling bişikesta û heta sax ba wilo seqet bimeşiya.

»Hooweh li vê ecêba kesnedîtî! Em çiqasî rast diavêjin, çep dikeve. Em xwe ji beleyan disitirînin, bele pêxêla me bernadin. Tersbavê qirdê min bûye dijminê serê min. Segbav madem tu ewqasî mêr î, de here Circîsko bixapîne û wî di zinaran de werke, hi! Herkes dikare bergîlkan bixapîne, lawê tirê...«

»Apo hinekî bêhna xwe fireh bike. Ji ketina te mezintir bele li pêşiya me hene. Xwe nekufirî ne.«

Gotina Hemo li telê Heso ket. Ruyê xwe tirş kir û destê xwe hejand:

»Çi bele li pêşiya me hene, yabo qurbano! Ez dizanim ku tu qesda çawîş dikî, ez ne zarokê te me. Ez dizanim bê tu çi dibêjî. Ez, kerê Stenbolê berdim ser sûlala çêwîş! Hema çiqase belê wî hebin bila hemiyan bîne pêşiya min, ez bavê xezebê me!..«

Çixare di devê Temo de bû û bi bazdan dihat. Te digot qey ji nav agirê hêtûnê baz dida, ji dûr ve dixaneke gewr ji serê wî diçû. Çifta bavê xwe a dulûle xistibû destê xwe û rextê fîşekan jî berevajî li newqa xwe girêdabû. Li pişta rez giha wan. Bêhn lê çikiyabû. Bi zor hilma xwe berdida û dikişand.

»Malneketino, ma mirov çawa dikare sîlehê xwe ji bîr bike! Heta bi kevirên vî welatî jî dijminên me ne...«

Hemo xwe nepixand. Piştî ku got »Ez pismamê te me Temo, ez bêdemaçe narim ser destavê«, wek generalê ku ji dûr ve li şer temaşe dikir, sekinî. Destekî xwe xist kêlekê, ê din jî danî ser qebza demaçê û gotin

domand:

»Demaça map û bi sê cercûrên xwe ve li pişta pismamê te girêdayî ne. Te dît bê ez çiqasî bi tedbîr im, ya.«

Heso çifte û rext ji dest Temo girt û herdu jî xistin situyê xwe. Bi qahr got:

»Me pir li xwe kir dereng« û bi hinc darek di bergîlê de werkir.

Bergîl ji cihê xwe çeng bû û bêserî meşiya.

»Apo apo, hêdî hêdî...«

»Qut bike, bide ber apo û gavên xwe dirêj rade!«

Heso û Hemo pişta rez derbas kiribûn. Gihabûn Zinarê Mêşê. Sirt û sirt diçûn. Temo li ser tahteke bi xincirî rûniştibû. Pişta xwe dabû bê, berê wî ketibû gund. Sarê jî dabû pey şopa Temo û fîşekên wî didan hev. Sarê ji Temo mîna alekê diyar dikir. Lê Temo digel ku lê dinerî, te digot qey wê nabîne, hîç di eynê xwe de dernedixist, pel li çixara xwe ya ku pêçabû dipêça û diponijî. Li dor sih salên wî bû ku tûtin dikişand û hîn jî nizanîbû çixare bipêça. Heta ku çixareke qut û qalind dipêça, du, sê pel diqetandin.

»Temo Temo, hey mala bavê şewitiyo, kuro lawê kûçik were fîşekên xwe bide hev...«

Qurpînî ji dilê Temo hat. Ruyê wî zer gewirî. Ji heyecanê çixare avêt, kîsikê tûtinê li wê navê hişt, rabû ser xwe û wek dînan li dor xwe nerî. Bêhnikekê wilo li ser lingan ma. Dûv re jî mîna ku dinya hemû li ber çavên wî bûbe deşt, êretî da nav xirêm û ber bi diya xwe de bazda.

»Lawê kerê, fîşekên ku te dane erdê ji sed metroyî xuya dikin, fîşekên xwe bide hev. Kuro ma keliz bi min re ye ku tu tê ba min, fîşekên xwe bide hev, weh!«

Fîşek hemû qahweyî bûn. Di nav lat û tahtan de wek xurman diyar dikirin. Xwe bi xwe peyivî:

»Tu çawa li xwe hayî nabî û fîşekên xwe nabînî? Bavê min vê yeka ha bibihîze, wê ji min re nebêje çi?« û çongên xwe berdan erdê û li ser şilayê rûnişt.

Sarê heta ku gihabû binya rez duwanzdeh fîşek dabûn hev. Heft ji wan yekgule û ên din jî nehgule bûn. Temo mîna teyrê beretan lepên xwe dada hindurê pêşmalka diya xwe, fîşek hemû di bêrîka qêpût de danîn û bêgotin ji diya xwe dûr ket. Heso û Hemo tibabekî baş dûr çûbûn. Lê hîn jî ji ber çavan ne ketibûn, reşên wan xuya dikir. Dengê qîrên Temo wek ewran di ser serê wan re diqulipî û di qûntara çiyê de disekinî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heso ji Hemo re got, »Dîsa çi hewar e! Ev îro çi xezeb bi serê me de rijiyaye! Ka binere bê lawê kerê îcar çi dixwaze« û devê xwe ji tifê dagirt bi qahr tif erdê kir.

Tifa wî li ber bê belav bû, peşkên wê li li ser ruyê Hemo ketin. Hemo bêdilî xwe ruyê xwe ji tifa Heso paqij kir û bi bazdan ber bi Temo de çû. Li bayê bezê lingên wî li hev aliqîn, berê wî ket kevirekî mezin bêserî bi ser kevir de heriqî û li erdê veziliya. Dîsa baş bû ku serê wî li kevir neket. Çermê sîvanoka wî a rastê, kaboka wî û herdu kefên destên wî hinekî selixîbûn. Cihên selixî bi xwîn ne bûbûn. Qebza demaçê di xavika tenişta wî de çûbû xwar, tenişt êşiya bû. Lê wî li xwe ne kir tiştek, wek çipik rabû ser xwe û bi aliyê Temo de çû.

»Ha pismam, Xwedê xêr bike dîsa çi hewal e?«

Temo sor û mor bûbû. Rivîn ji ruyê wî diçû. Pişta wî ji xwêhdanê şil bûbû, hilmê di porê wî de dida der. Destê xwe avêt hindurê bêrîka qêpût. Bêrîk bi qul bû, fîşekan xwe berdabûn hindurê betên. Fîşek ne dîtin. Di cih de rûnişt.

»Heywax li mala hûran be! Qeda Xwedê bi mala hûran keve!« û bi kulman li serê xwe xist.

Hemo wek mehkûmê ku çav li eskeran bikeve, ji nişkê ve cefilî! Xwe bi ser Temo de tewand, bi milê wî ê rastê girt, hejand û sivik got:

»Pismam de ka zû bibêje, te ez di mereqê de kuştim. Ma qey mala hûran hin ji me kuştine, hi?«

»Na bavê mino na na, mesele ne ew e. Mala hûran çi kûçik in ku bikaribin me bikujin...«

Xwest bibêje »Hûrî wek pîrekan e« Hemo rê nedayê. Ziq li hindurê çavên wî nerî, li ser qerevîzkan rûnişt û hinekî bi zirt got:

»Naxwe çi? Te ez ji desthilanîn xistim, zû bibêje!«

»Min ji lez û bezan fîşekên çiftê hemû dabûn erdê. Piştî ku min û pîrê me fîşek dan hev«, rahişt guhikê qêpût hilda ku bibêje, »Min fîşek xistibûn vê mîrata bêrîkê«, fîşek lebitîn. Çavên wî wek lempekê vebûn û bi kêf got:

»Wey va di vir de ne kuro!«

Bi yekcarê re qapût ji ser xwe şemirand. Tam di vê navê re du kewan ji wî alî û vî aliyê çiyê avêtin ber hev. Bêhnikek ne çû, çarhawêr kewan xwend û bi hev re ketin hingamê. Dengê qebeqeba wan wek dengê mîtralyozan xwirîn bi newalê dixist. Te digot qey çiyê dawet girtiye; dar û devî li ber bayê tavan û di nav wê hingamê de mîna ku direqisîn dihe-

jiyan. Temo hertişt ji bîr kir, nema peyivî û guh da ser dengê kewan. Hemo jî li bayê bezê fîşek ji hindurê betên derxistin, qapût avêt nav keviran û rehwankî bazda.

Heso kum dabû serê xwe, şefqe li ser kum û çefiya sipî jî li ser şifqê girêdabû. Bi çefiyê û kurkê xwe ê ku ji heriyê belek bûbû ji dûr ve wek şêxê ku di silûkê de istîxfar dianî, li ser bergîlê bêwestan dihejhijî. Canê wî mîna rêsiyekî li hev geriyabû. Kelaxê wî giran bûbû. Bi zikê birçî çixare ji çixarê pêdixist. Dixana çixarê û penêrê bi sîrik ba pê re çêkiribû. Hewl dida ku bi dizî bayê zikê xwe berde, lê nikarîbû. Metreha bergîlê tenik û bergîl jî zeîf bû. Hestiyên navpişta bergîlê wek pişta mêsî bel bûbûn. Navpişt di kortika qûna wî de tam rûniştibû, ne dihişt ku bê berde. Ba hemû lê dibû qolinc û li canê wî digeriya. Ji nêza dilê wî li hev diket, lê madê wî ne diçû xwarinê. Hîç ne dixwest ku derek ji kelaxê wî biqeliqe. Lê mixabin bergîlê jî hîç bi a wî ne dikir, di cihê xwe de bêhereket ne disekinî; habela lingekî xwe hildida û yek datanî.

»Mesele çi bû? Çi dixwest?« got û nav şeqên xwe xwirand.

Hemo bêhna xwe girt û di bersiva wî de sivik peyivî:

»Fîşekên çiftê ji xwe de xistibûn, apo.«

Heso darek li termaza bergîlê xist, bergîl çeng bû. Piştî ku got »Na lo!« bi lez rext ji situyê xwe derxist û li fîşekan nerî.

Di rext de bi tenê du fîşek hebûn.

»De îcar ji xwe re li vê ecêbê binerin! Kûçik lawê kûçikan dixwaze bi dostayî me têxe xefka Circîsko û me bide kuştin. Howeh kuro, pênc lawên min hene û yek jî li min ne hatiye! Teresan bi ser xalanên xwe ve çûne. Xwezîka hema li diya xwe hatibana. Diya wan hema çawa be, ji çawîş û eskeran natirse. Herpênc jî nezan, kerûgêj, dahbelorî û tirsonek in. Tu dibêjî qey ne ji heyvanê min in, ava min di wan de ne geriyaye.«

»Apo tu neheqiyan li pismamên min dikî. Herpênc lawên te jî mêrxas in. Ma mêrên wek Luqman li ser rûyê vê dinyayê hene gelo? Luqman şêrekî zozana ye.«

Heso di bersiva wî de destê xwe ji nişkê ve bilind kir ku bibêje, »Luqman ne tu gû yî«, bergîl cefilî û lingên xwe dirêj radan. Heso bi ser qûşê de herikî. Hindik mabû ku bikeve, Hemo pê re giha ew zeft kir.

»Kuro îro çi bi vê bergîlê hatiye! Hertiştî bermeqlûbî min dike. Ez wê disekinînim ew dimeşe, ez wê diajom ew disekine, ez destê xwe hildidim ew dikeve kirê min û lotikan dide. Ne be gelo Sarê şevê din êm nedabe vê mîratê?«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Heywan e lê negire. Belkî jî tî bûye ji tîbûna van mizuriyan dike.«

Heso hinekî beşişî. Dilê xwe bi xwe şewitand û henekê xwe bi xwe kir:

»Ez kurdûnde me. Wey xwelî li serê min û bavê min be ku ez jî bi law im. Di şeva ku ew çêbûn xwezîka di wan şevan de ez li êş qeraş bûma. Du lawên min xwe li gundê Sirêçkê vezilandine, kî bavê wan bikuje ew li xwe naqewimînin û bi hewara bavê xwe de nayên. Yek ketiye bersêla jina xwe nên dipêje, Circîs hewarê tîne ser bavê wî û ew bi xwe nahise. Yek jê bi gulên lawê Circîsko ji mirinê radibe û cesaret nake ku derbekê di dijminên xwe ên xwînê de werke. Yek jê rext bermeqlûb li pişta xwe girêdide û bi gaziya bavê xwe de tê. Ez bêdûnde me. Ez nema dizanim bê ez ê çi bibêjim. Wilehî ne ez û ne jî rebena Sarê em ewqasî ne xerab bûn, lo. Sarê bi wê pîrekiya xwe dikare berberiyê bi temamê vê mentîqê re bike. Eger ji van zarokan hema yek jê bi ser min an bi ser diya xwe ve çûba, îro belkî ez patîşahê welêt bûbama.«

Bergîl bi lez diçû. Hemo dabû dû. Bergîlê çiqasî dilezand, Sitilîlê jî ewqasî nêzîk dibû. Dilê Heso kûr diniqirand, ji tirsan tiktik dikir. Hîç ne dixwest ku dawî li rê bê, ji bo ku çêwîş nebîne. Lê ne dixwest ku rê ewqasî dûr be jî, ji bo ku deqîqeyekê berî deqîqeyekê derkeve hizûra çêwîş; eyarê Circîs ji pûş û pelaxê binepixîne. Her ku ber bi Stilîlê ve diçûn, tirsê jî ewqasî lê zêde dikir. Wî dil diavêt ku ji dêvla Hemo Sarê pê re ba. Di nav re, bêî ku Sarê bûba dabaş, bandilhewa çêlî Sarê dikir. Ne dixwest navê wê ji ser zimanê wî bikeve. Her ji bêhnikekê wê gotin bi vir û wir de bigindiranda û di dawiyê de dîsa gotin bizîviranda ser Sarê. Lê Hemo fêm ne dikir. Car caran di dilê xwe de digot, »Ez çi difikirim û ew behsa çi ji min re dike!..«

»Apo me şikefta Kunheftarê jî derbas kir, ha. Bi telaq me qûn li rê qetand nîvê bêtir çû. Rêya me hemû hilmek û pifek maye. Apo eyb nebe, ma gelo te îfada xwe hazir kiriye bê tu ê ji çêwîş re çi bibêjî? Ma ne divê ku îfadên me hev bigirin. Ez wek te ne bi aqil û ne jî baş bi tirkî dizanim. De ka min li berxîne ku ez ji xwe re ezber bikim, rêya me hîn pir maye.«

Heso destê xwe avêt bêrîka kurk ku qutiya tûtinê derxîne. Qutî ne dît. Bi lez destê xwe dirêjî bêrîka din kir. Qutî ne di wê de bû jî. Vaca vaca hejiya. Mîna ku mar here bin ji nişkê ve xwe bilind kir û bêkeys destên xwe çep û rast avêtin. Destê wî li bêrîka şerwêl ket, çingînî ji qutiyê hat, lê ew dîsa jî bi qutiyê agahdar ne bû.

»Tu li çi digerî apo?«

»Kuro ez çiqasî li vê mîratmaya qutiya xwe digerim xuya nake. Sarê çi

bi qutiya min kiriye?«

Hemo hema yekser qutiya xwe ji bêrîka qêpût derxist. Çixareke pêçayî xist nav lêvên wî û çeqmaq li ber pêxist. Fitîla çeqmêq kişiyayî bû. Agir xwe çeng kir rîha wî; xwe paş de vekişand û bi zirt got:

»Kuro te ez şewitandim, weh! Ev îro çi xezeb bi serê me de bariyaye, alahûmme ya rebî!«

Peşkên baranê dihatin. Ezmên ji ewran belek xuya dikir. Ewran mîna ku şer bi royê re dikirin, ro xistibûn çembera xwe û bêyefş xwe dadidan ser. Royê yek dahf dida ê din xwe dida ber. Ew hîn wilo yekî din dihat. Tîrêjên royê qels dihatin xwar. Te digot qey ewran ew di xwe de guvaştine, pir cemidî bûn. Heso dirikrikî.

Dîsa bi hêrs got, »Çixareke din bide min!« û destê xwe danî ser dilê xwe.

Ba pê re gihabû hev, hûr û roviyên wî werimî bûn. Tesîra wermê xwe dabû jor, jan ji sêngê diçû wî digot qey dil diêşe. Xwîn di sêngê de dikeliya. Xwêhdaneke cemidî bi eniyê ketibû. Eger bayê zikê xwe berdaba belkî hinekî bêhna wî fireh bûbûya û wilo bi zirt neaxiviya.

»Tu dixwazî ez çi ji te re bibêjim bavê mino? Li dor sih salî ye ku tu bi min re tê qereqolan, mehkeman, quzelqurt û mizelqurtan. Eger heta niha tu hînî îfade û mîfadan ne bûbî, hema dev jê biqere wilo bimîne û hew.«

»Tu rast dibêjî apo, gerek ez hîn bûbama. Ez bawer dikim ku min terbiya te baş girtiye. Lê dîsa jî aqil ji aqilan çêtir heye. Mirov bi hev bişêwire, baş e.«

Heso bêhna xwe hîn tengtir kir. Dixwest ku bi deng bipeyive. Wî çiqasî dengê xwe hildida dengê wî jî ewqasî nizim diket.

»Mala bavê şewitiyo, îro du roj e em li ser ku em ê ji çêwîş re çawa derewan bikin, bextê xwe biavêjin, bi Quranê sûnd bixwin û jina xwe berdin, dipeyivin. Ma qey te civîna me a şevê din ji bîr kir? Li ser vê meseleyê em kûr û dûr peyivî bûn. Ma qey tu nizanî derewan bikî? Hema zorî bide derewan û hew. Ha baş bû ku te anî bîra min, binere binere, gerek em sertazî herin hindurê qereqolê û li ba çawîş û eskeran temena xwe hîç xerab nekin! Gava çêwîş ji te pirsî û te dît ku tu ê nikaribî wî bibersivînî, apê min vê pirsê çêtir dizane bibêje. A din, dibe ku ez xwe ji bîr bikim, îcar tu xwe ji bîr neke: Qedexeye ku mirov bi bergîlê û çiftê here hewşa qereqolê. Cezê vê yekê giran e!«

Gotina xwe di cih de birî, serê bergîlê ragirt bergîl sekinî. Bi lez çifte ji situyê xwe kir, da dest Hemo û bi dizî got:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Binere, aha li serserê şikêrê ye ha! Eger te lê xist, bi telaq wê oxira me hilê û çawîş jî wê hertiştî wek me bike. Û na eger te lê ne xist, ji xwe wî çaxî jî wê mala me bivirite û çawîş me ji vî welatî celî bike.«

Li jora wan kundekî li ser şikêrekê berê xwe dabû royê, pişta wî ketibû wan û hêdî hêdî ji xwe re dixwend. Hemo du fîşekên nehgule ajotin hindurê çifta dulûle. Di ber latekî mezin de çong berdan erdê û li ber kund veteqilî. Kund mîna ku hîç hayê wî ji wan tune bû, xwendina xwe didomand. Çiftê agir pijiqand, olan bi newalê ket. Cefil li temamê teyr û tilûran ket û heryek bi aliyekî de firiya. Hemo bêhnçikyayî erîşî ser şikêrê kir. Kund li dor şikêrê disûrikî, nikarîbû bifiriya. Wî xwe avêt ser, kund bi saxî girt. Gule lê ne ketibûn. Baskê wî ê çepê ji qurm de elem girtibû. Tije sipî bû. Xuya bû, bi mebesta ku xwe ji sipiyan xalî bike xwe dabû ber royê. Hemo, ji bo ku Heso bixapîne û xwe nîşandar rê bide, bi herdu çîqên kund girt û çep û rast kişandin. Kund di nav lepên wî de ji êşa nava xwe dikir wîqe wîq û wî jî bi haweyê ku ji wî dengî zewqê bistîne, hêdî hêdî ew diçirand. Dûv re sê caran li ser hev cendekê wî li şikêrê xist û avêt dera ha.

»Kuro agir bi mala bavê neketo, wî bîne vir ku ez jî îmana xwe kamil bikim!«

Heso bi kêf piştî ku sê caran tif kir kund, çengek perî ji nav sirta piştê rakir avêt erdê û got:

»Hemo hîç mereqan neke, Xwedê li pişta me ye. Oxira me hilat. Çawîş wê di destê me de wek hevirmêşê nerm bibe. Hewce nake tu serê xwe bi tu îfadan biêşînî, tu çawa bibêjî wê çawîş ji te yeqîn bike.«

Bikuştina teyrikekî mîna ku dinya hemû bûbe a wan, serxweş ketin û bêser û ber peyivîn. Hemo jî xwe bi aqil didît û qeşmeriyên xwe bi aqilê pîrekan dikir.

Nêzîkayî li gundê Atxê kirin. Gund di newalê de ye. Çend xanî jê hinekî ji gund dûr di berpala çiyê de û çendek jî tam di sirta çiyê de hatine avakirin. Atxê ji Zorava piçûktir e. Li vî gundî çar bavik hene û herçar jî bi hev re di berberiyê dene. Debara wan bi giştî li ser sewêl û êzingan dibe. Ji salê heta salê hêviya wan ew e ku çiya şîn bê, dar û deviyan bibirin û bifiroşin berîvaniyan; qatix ji devê zarokên xwe qut bikin, kar û berxan bifroşin, bikin pere û wan pereyan jî hemî li devê çawîş, dadger û sawciyan biqelibînin.

Ro ji ewran xuya nake. Bayê reş peşkên baranê dixurbilîne. Ba, dixana ku ji hilorîkên xaniyan derdikeve, nahêle ku bi ser çiyê keve, di newalê de

difetisîne. Mij cih bi cih, ji best û newalan bi ser çiyê de bilind dibe. Silûmên çiyayên omeriyan û ezman ji dûr ve mîna ku gihane hev, her der ezman diyar dike. Baranê bi comerdî erd av daye, bêhna axê ji erdê difûre.

Heso û Hemo xwe ji ser gund dagerandin û di rohilatî gund re meşiyan. Kûçikan xwe berdan pêşiya wan. Kûçikekî jê bi haweyê ku wan bidire, êrîş kir. Hemo kevirek li nav parxwanên wî xist, waqînî pê ket û reviya.

Heso di ber xwe de beşişî, li gund nerî û bi qerf got:

»Terî ji xelkê vî gundî kêm e, heyvanê aqil bê çi ye, di serê yekî ji wan de tune ye.«

»Çima apo?«

»Erê, ma çima ne çima, ma mirov li ser hêlîneke kewê heft mêran ji hev dikuje!«

»Bi rastî ew meseleya kuştina wan çawa bû? Ez di wê gavê de naşî bûm, xweş nayê bîra min.«

»Dirgoyê Evdo ku xwedî jin û zarok bû û sê xortên gund bi hev re diçin nêçîrê. Li çiyê hêlîneke kewê bi yanzdeh hêkan dibînin. Kê ji wan pêşî hêlîn dîtiye, ez ê nizanibim. Herçar li ser ku min pêşî hêlîn dîtiye, hêlîn a min e li hev nakin. Dirgoyê Evdo jî li herseyan dixe; hêlînê radike û her yanzdeh hêkên kewê ji xwe re dibe. Li ser vê yekê gundî bi çifte û tivingan dikevin nav hev û di şerê pêşî de Dirgo û ji malbata Nihîtan jî Ceblo tê kuştin. Bi dû wê kuştinê de malê hev talan kirin, bertîl dan çawîşê Sitilîlê, hakim û sawciyên Nisêbîn û Mêrdînê û li hev gilî kirin. Hevdu xistin hepsan. Hin ji wan ji gund derketin, bûn parsek. Hin ji wan bi çiyan ketin, bûn eşqiya; dewar û pezên xelkê dizîn û ji terefî esker û xelkê hatin kuştin. Ji xwe re li vê ecêbê binere, zarokên wan ji nêza kîrê hev dimijin û ew jî çend qurûşên ku ji firotina êzingan bi dest dixînin, hemî di berberiyê de serf dikin! Bi telaq çawîşê Sitilîlê bi wan kêf kiriye. Ji bilî pere, hêk û elokên ku didin çêwîş, bi kêmanî her meh pezekî, duduyan jî jê re dibin.«

»Yanî tu dibêjî ev berberiya ku di vî gundî de dibe, hîn ji wan deman de ye?«

»Erê erê. Berberî hemû hîn li ser wê hêlînê ye. Ma bi tenê ev gund, berberiya ku di gundên derdora me û temamê omeriyan de dibe, hemû ya li ser ku golik çima ketiye ziyanan, cîran eloka cîrên dizî ye, gavan di xew re çûye dewar ketine nav rez û pelmêw xwarine û herwekî din. Li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

gundê Qûzo li ser pevçûna kûçikan sê mêr ji hev kuştin. Ma mirov li ser ku kûçikan çima li hevxistiye hev dikuje! Li Gurik Mala Çarqulî û Mala Hemê, li ser ku kerê Gemşo bazdaye ser kera Qelşo, vê yekê dikin meseleya namûs û bênamûsiyê û di hev re difirin. Bi tûşa pêşî re sê mêran ji hev digevizînin. Erê niha tu bi qedirê Xwedê kî, ma mirov li ser ku çima kero bazdaye ser kerê hev dikuje, lo! Howeh li ezameta vî Xaliqê mezin, bê ev kurmancên me çiqasî ehmeq çêkirine, wey bavo!..«

Gund derbas kirin, ketin nav çavê xirêm û bi kêş ve hilkişiyan. Bergîl bêqewet bû. Helke helk û fire fir lê ket, zimanê wê kişiya û her ji bêhnikekê tir kirin. Tengaya xaçerêkên xirêm bergîl bêtir ji taqet dixist, dihejhijî û diçû.

»Vê bergîlê bisekinîne ez ê dakevim û bimeşim.«

»Apo çênabe, tu ê bi vî lingê xwe ê şikestî çawa bimeşî!«

»Erê bavê min, ma tu nabînî bê jinik çawa tiran dike! Ma ne eyb e ku ew dibin min de berde û ez jî hîn bikaribim lê siwarêm, hi!«

Li vê herêmê jî, gava mêr li heywanekê siwar bihata û heywanê dibin de tir kiriba, mîna ku wî tir kiribe li ber xwe diket û ji heywanê peya dibû. Û Heso jî mirovekî ku tam girêdayî tradisyonên civakê bû. Bergîlê ne tirek, neh, deh tir li ser hev kiribûn. Heso pir li ber xwe ketibû.

»Lawê berêz, ez ji te re dibêjim, zû vê mîratmayê bisekinîne ez ê jê peya bibim, weh!«

Hemo bergîl sekinand. Rahişt Heso li ser tahtê danî û li kêleka wî rûnişt.

»Ew qesira Hesenê Hecî ye ne wilo?«

»Erê apo.«

»Bêbavo malê qeranekî li ser e. Ji bilî dewar û mewaran li dor sê sed, çar sed pezê wî heye. Kî dizane bê çiqas pereyên wî ên girêdayî niha hene. Xwedê dizane bê çend çewal zêr di xeşîmên qesira wî de veşartîne. Gava ku Xwedê bide mirov, nabêje tu lawê kê yî?«

»Apo ma qey ew jî bêşê nade çawîş?«

»Bi rastî tu carina tam dibî wek zarokan. Ma li vî welatî ê ku bêşê nade çawîş û mawîşan heye ku tu vê gotina zarokî dibêjî, hi! Herçi esker e, rebê me ye! Mirov ji rebê xwe re îbadetê dike û setqan dide. Îcar bêbavo malê kafirekî li ser e, howeh!«

»Helbet wê malê kafirekî li ser be: Navê camêriyê bê çi ye, li ba tune ye. Mêvanan nahewîne. Kuflet ji dew, meyir û nan û pîvazê pê ve tiştekî din naxwe. Sal dizîvire şîveke bi goşt li êgir nakin. Zilam û pîrekan tahma

goşt ji bîr kiriye û zarok jî ji xwe nizanin bê goşt çi tişt e. Û berberiyê jî nake. Ê, îcar çima wê dewlemend nebe, yabo qurbano!«

Heso keserek veda û ziq li Hemo nerî.

»Min ewqasî da dû te û van bênamûsên lawên xwe, yekî ji we çiqek di vî zilamî de ne kir. Hûn jî mêr in qaşo. Di dema xortaniya xwe de, li vê birekê malek nemaye ku min dewar û pez jê ne dizî be. Li ser diziyê ez û Sarê em her roj pevdiçûn. Ne bi dilê wê bû. Lê dîsa jî min dikir. Ez mêr bûm û ew jin bû. Jin mahrkiriya mêr e, divabû wê bi a min bikira û dengê xwe dernexista...«

Heso dizî kiribû, lê ne diziya pez û dewêr bû. Çend carekî çend mirîşk û elokên hevalbendên xwe dizîbûn. Sarê pê dihise; vê yekê jê qebûl nake. Ew jî ji mecbûrî diziyê diterikîne. Di eslê xwe de wî ne dixwest wilo biaxive. Problema wî hemû Sarê bû, ne dixwest ku Sarê ji bîra wî here. Ji bo ku mijara wan seraqet li ser Sarê be, wilo bêpîvan diaxivî. Hemo li ber destê wî mezin bûbû û cîgirê wî bû, lê wî Hemo ehmeqekî beredayî didît. Sarê car caran digot, »Eger ev jî wek Heso û Circîs zikreş û aqilşeytanî ba, ev gund ji zû de wê xerab bûbaya.« Hemo bi a jina xwe dikir. Jina wî Zînê qîza Sarê bû û wê jî bi a diya xwe dikir. Sarê bi rêya qîza xwe mezinayî li Hemo dikir. Wê kêfa xwe dianî ku qîza wê, di wî de geriyabû. Ji Sarê re bi şîr û şekir li hev hatibû. Di rêya zavê re niquteke av bi ser agirê dijminatiyê dadikir. Lê mixabin di eşîretiya wan de, şerm bû ku mêr bi a jinê kiriba. Ji ber vê yeka ha, ev aliyê Hemo ji teref civatê her tim dihat rexnekirin. Civatê car caran bi çavekî piçûk lê dinerî. Wan, pîrek bêrûmet didît û pîrekê jî ev yeka ha bi xwe xweş dianî. Li gor dînê wan Xwedê, pîrek di kelaxê zilêm de fesilandibû û pêşkêşî zilêm kiribû. Ji bo ku Adem pê biwenise ew ji »Bin milê Adem« afirandibû. Civata Heso ji pîrekê re digot, « Ev mexlûq bi tenê ji bo kêfa nav livînan hatiye dinyayê.«

Ewr li jora wan li hev diciviyan.

»Hemo ewr li hev digerin, xuya dike ku wê baraneke pir pîs li me bide der. Zû rabe ser xwe. Berî ku baran li me bide der, bi haweyekî em xwe bigihînin serê sirtê. Li wir berpal û berqef hene.«

Heso ne dixwest li bergîlê siwarê. Lê ne dixwest li pişta Hemo jî siwarê. Xwest ku bi çarlepikan bimeşe, ew jî nikarîbû. Ziq li herdu çavên Hemo nerî.

»Îcar em çi bikin bavê mino! Ji te û bergîlê divê ez li yekî ji we siwarêm.«

Hemo fêm kir ku apê wî naxwaze li bergîlê siwarê, ditirse ku dîsa ba ji ber wê here û êdî ew jî ji fedîbûna nema bikaribe serê xwe rake. Ji bin tah-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ta ku herdu li ser rûniştibûn ji nişkê ve pirtînîyek bi hêl hat, Heso rimekê bilind bû. Gopalê xwe bi hinc li erdê xist:

»Wey mîratmayê, ev te di bin vê tahtê de çi dikir! Hey qeda Xwedê bi te ke ve, ma niha wextê te û firê bû, hi! Te hinavên min qetandin!«

Sûsikek bû. Sûsikê wek tîra ku tu ji kevên biavêjî ji lûs fir da xwe û rast xwe berda newalê. Dengê qurpe qurpa wê heta cihê ku xwe lê danî ji hev qut ne bû.

»Apo heta ku em bi sirtê kevin, ez ê rahijim te. Ez bawer dikim gava em ji xirêm xelas bibin, wê bergîl bi rehetî bikaribe te hilgire...«

Heso bêdilî xwe lê siwar hat. Hemo bi destekî bi hefsarê bergîlê girtibû û bi destê din jî lingê wî ê seqet ji latan diparast. Qapût û çakêt jî ji xwe ne kiribû. Herduyan jî aqil ne dikir ku Heso dikarîbû bi hefsarê bergîlê bigirta. Gava Heso bergîl rapêşî xwe kiriba, wê Hemo jî herdu destên xwe bi hêsanî bilivanda û wê ewqasî ne betilîba. Eger qapût û çakêt ji xwe kiriba belkî rê ewqasî lê zor ne kiriba. Heso xwe bi ser hev de guvaştibû, ji dûr ve wek kefjalekî xuya dikir. Wî digot qey ez xwe çiqasî bi ser hev de biguvêşim, ez ê ewqasî sivik bibim û em ê bê teşqele bi kêş kevin. Xîze xîz bi gewriya Hemo ketibû. Pelxemek wî dihat û yek diçû. Fedî dikir ku bikuxe û pelxemê biavêje. Îcar wek gayê ku kayina xwe bîne, dengekî bi kuf û pif derdixist. Ji xwêhdanê bûbû av. Eger rêya wan hinekî dirêj ba, ew ê ji xwêhdanê miheqeq bişewliqiya. Gavên xwe geh kin geh dirêj radidan. Zor dida xwe ku li ser lat û tahtan bimeşe. Binê çaroxan şayik bûn, erd şil û bi pûş û pelax bû, her tim dikarîbû bişemitiya.

Bayê ber baranê peşk dixurbilandin, peşkan mîna tepiskan li ruyê wan dida, agir ji rû diçû. Hawêrdor ewr di ser hev re diqulipîn û beledî vedidan. Birûskê li tahtan dixist toz û dûman bilind dibû û bêhna şewt û barûdê difûrand. Deng ji teyr û tilûr û tebayan û tu rihberî ne dihat. Bêhnek ne ket wê navê, ewran çiya nixumand, her der reş xeriqî, çar alî ezman pêket û vemirî. Pêşî bayekî xurt rabû, ba di newalê de li hev qulipî, wek ku li borîzana şer bixîne fîkand û ji nişkê ve baranê da der. Tîrêjên baranê mîna ku di safokê re dihatin xwarê bêqutbir rast xwe berdidan newalê. Hawêrdor ji lat û tahtan peqpeqonkên avê bilind dibûn, dengê camcamk û çepikan didan. Ji serê sirtê binê newalê wek deryayeke bêbinî xuya dikir. Mirov heybet dikir ku lê temaşe bikira.

Heso û Hemo di berpala çiyê de bergîl li ber baranê êretî berdabûn û xwe dabûn ber berqefekê.

»Ev çi xezeb e îro! Di temamê emirê min de nayê bîra min ku bi vê

ecêbê baran bariyaye! Niyeta Xwedê xerab e, bi telaq ew ê terizê jî li me bibarîne, lo!«

»Carina ewrên wilo dijwar çêdibin, şap e zû derbas dibe. Bêhnikeke din wê ewr biferikin û baran nema bê. Ha ha binere, li rajorî me ronahî ket ezmên. Baranê jî va ye qut kir. Ma tu ne birçî yî apo?«

»Ma çawa ez ne birçî me, lê

xwezîka hema min bikarîba gepeke ziqûm bixwara« û destê xwe avêt bêrîka êlek.

Xwest ku li seetê binere. Seet li mal mabû.

»Me seeta xwe jî ji bîr kiriye yabo. Lê ez bawer dikim, wê nîvro bûbe. Heta ku tu xwarinê ji me re hazir bikî, ez ê destlimêja xwe bigirim û çend rekhetan bikim.«

Di wê bêhnikê de ne xwedayê rehm û bereketê, ku jê re îbadet bikira, ê zilm û zorê dihat bîra wî. Ne dixwest limêj bike. Zikê wî ji bê nepixîbû. Bi mebesta ku bê ji ber xwe ber de, limêj dikir mahne.

Hemo bi lez tûrik ji ser bergîlê anî û hema di cih de vekir. Nan ji baranê bûbû hevîr, bastêq bûbû wek nanê şilikî. Nan û penêr ji ava ku ji tûtinê dawerivîbû, zer veda bûn. Rahişt pîvazekê. Pîvaz yeklepî û destarkî bû. Di kefa destê xwe de gerand, bêhn kir, dûv re danî ser kaba xwe û bi hinc kulmek lê da. Navika pîvazê pekiya dera ha, pîvaz perçiqî. Nehişî tiliyên xwe di nên de çikandin, lepeke hevîr bi tiliyan ve hat û bi sê, çar pel pîvaz re ew hevîr avêt devê xwe.

»Ma tu limêj nakî, apo?«

»Na lo, ez poşman bûm, halê me ne besî me ye, tew hîn em ê limêj jî bikin. Dûv re em ê ji xwe re qeza bikin. Dibê qey Xwedê bi xema limêja min e. Ma nabîne ku em di çi kûçkaniyê de ne, hi!..«

Li gor ku dihat gotin, gava Heso di sala 1965an de diçe hecê, Şeytên naricimîne û bêî ku heca xwe bike vedigere malê. Heso li cihê ku hecî Şeytên diricimînin, damara wî a berberiyê pê digire û bi dengekî bilind ji heciyan re dibêje:

»De keviran biavêjênê, de! De wî berdin ser jina xwe, de! Eger wî ne nî ...aba jina we hemiyan, we tif ne dikirê û kevir tê wernedikirin! Min niha fêm kir ku bi rastî Şeytan tiştekî pir mezin û ewqasî jî mêrxas e; ku ewqasî ne mezin û mêrxas ba, wê ev misilmankên ha, bi vê ecêba kesnedîtî nebana dijminê wî, weh!« Qebûl ne dikir ku kesek jê re bibêje »Hecî Heso.« Piştî ku ji hecê vegeriyabû, ev gotina dînî, »Nalet li Şeytên be!« terikandibû û misilmaniyeke li gor xwe çêkiribû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heso lîçek penêr û pelek pîvaz avêt devê xwe. Bi zorê daqurtand. Gepa duduyan ne xwar û ji nişkê ve bi herdu destan li sênga xwe da.

»Pere pere! Kuro lawo Hemo, ka pere! Min û wê dijminbava jina xwe, me ji bîr kiriye ku ez pereyan bi xwe re bînim. De ka îcar bibêje min, bê em ê çi xweliyê li serê xwe û bavê xwe bikin! Em ê çawa bêpere herin ba dêqahpê çawîş, hi!«

Hemo bi haweyê xulamên axeyên omeriyan, destê xwe li sênga xwe xist:

»Ez biraziyê te me, ma min ê çawa ev meseleya ewqasî mihîm, ji bîr kiriba! ku em devê çawîş tije pere nekin, em ê çawa bikaribin Circîsko li bin guhê erdê bixin! Em ê têxin devê çawîş û tê de bihepişînin heta ku ew jî devê Circîsko tije mîz bike...«

Bêhna Heso hat ber. Ji kêfan re dikir bifiriya. Rîha xwe firkand, çefiya ku li serê xwe pêçabû vekir û rahişt şefqê danî ser çonga xwe. Li nav şeqên xwe nerî û bêhnikekê ponijî. Bêî ku kum ji serê xwe bike serî di kum de xwirand, ji dil keserek veda û di ber xwe de eşheda xwe bi Xwedê û pêxemberê xwe anî.

»Eşhedûenla îlahe îllellah! Ya rebî tu xefûr û kerîm î. Hertişt ji te eyan û beyan e. Eger te pere neavêtana dilê Hemo û em wilo bêpere bi ser çawîş ve biçûna, ma wê çi bi serê me ne kiriba!..«

Baran ferikiye. Deng bi sirûştê ketiye, hawêrdor teyrik difirin. Dengê wan û xwuşîniya ava ku ji pozê zinaran, co û cobar û berpalan diherike, di xume xuma çem de digihê hev; di qûntarên çiyê de li hev vedigere; wek senfoniyeke dilşewat vedide û di nav perê ewran de difetise. Mij, cih bi cih xwe ji ser çiyan berdide û di newalan de dicive. Bayekî hêwî di sirtê de dixurbile, mijê dialêse û bi jêr de disûrike. Tam di qorzîbira rohilat û bakur de ezmên sahî vedaye. Hewd di avê de meyane, av di hewdan de dibiriqîne. Di qelîştekên kevir û kuçan re avê daye der; her derî çiyê bûye avtêzanek. Kunmişk fetisî ne. Ji keziyên dar û deviyan bi hemd dilopên avê diniqutin û bi nermî xwe bi nava axê de berdidin. Sirûştê bi vê şapata berî niha beraveke xweş kiriye. Qirş û qal û arava çiyê bi nav çem de avêtiye. Çikçikonk boçikên xwe ên rengînî mîna baweşînkên siltanan vekirine, boçik hêdî hêdî hiltên û datên. Bi kêf ji ser vê tahtê dipengizîn ser tahta din û kubar li dû xwe dinerîn. Mîna ku bi sirûştê re ketine eşqê, nikilên xwe di erdê de dibin û tînîn û xwe vedipejinînin. Beraşe li hewa dilîzin. Teyr nizm difirin. Li dera ha kundekî xwe li ser qûçekê daniye û bi haweyekî kemlan li hawêrdora xwe temaşe dike. Wîqe wîqa roviyekî ji

dûr tê. Pêjina guran nayê. Xuyay ye ku keroşk hîn ji mexelên xwe ranebûne. Ji çiyayê himber nêrkewekî qert li dor xwe dizîvire û bi haweyekî serxweçûyî bêwestan dixwîne. Gava pişta wî dikeve newalê, dengê qebqeba wî, di newala din de digere û wek dengê gîtarê belav dibe. Dema berê wî dikeve newalê, îcar mirov dibêje qey komeke derwêş li ser serê çiyê li erbanê dixînin, wilo deng dide.

Heso, destê xwe dirêjî gopêl kir û bi qahr got:

»Xwe bide ser hev da berî baraneke din li me bide der, em xwe bigihînin wî bênamûsê çawîş. Me ji Xwedê fêm kir, mêrik hevalê mêro ye. Lawo wileh zilm e, lê em çi bikin! Ma mirov di vê roja ku teban nikarin ji qulên xwe derkevin, ji mala xwe derdikeve, hi! Kuro hirç, keftar, gur û beraz çi ne li ber me! Tebayên herî mezin, em bi xwe ne! Howeh li vê ecêbê, me tiştek ji vê heyata xwe fêm ne kir û ne kir! Ez ê bazdim ser xweha Circîs, Circîs jî wê bazde ser xweha min, çawîş û temamê eskeran jî wê bazdin ser xweha min û wî! Tu dibînî bê çi xweş e, ne wilo! Lawê Şûtiko nikare bibe zilam û dev ji berberiyê berde. Bi kuştina wî incex em ê bikaribin ji esker û qomandar û çawîş û mawîşan xelas bibin...«

Dilê Hemo bi halê wî şewitî. Bi qewlikê demaçê girt eciqand û xwe bi ser hev de qiriçand:

»Ma tu dibêjî ez wî bikujim? Erê hema destûrê bide min û hew. Hi ihi ez ê niha herim wî saqoçermî bikim!«

Heso bi haweyê ku bê min çi xwelî li serê xwe kir min wilo got, axivî:

»Lo bavo tu jî lo, de heydê bi rêya xwe de, heydê...«

Tibabê du kîlometroyan rêya wan mabû. Lê ji ber ku Sitilîlê di hindurê newalê de bû, hawêrdora wê bi çiyan rapêçayî bû û ew jî ne di rê de dimeşiyan, rê ji du kîlometroyan zêdetir bûbû. Di berpala çiyê re meşiyan, xwe ji berpalê bernedan û berpal û berpal çûn heta ku gihan nav bexçeyên sitilîliyan. Piştî ku çem derbas kirin, li hindama mala Şaqûlo rawestiyan. Navbera mala Şaqûlo û qereqolê li dor du sed metroyekî hebû. Hemo bergîl sekinand, qapût ji xwe kir da dest Heso û rahişt kîsikê ku qundera wî tê de bû. Pala xwe da darê, şemitî. Lê dîsa pala xwe dayê. Li ser qerevîzkan bi lez çarox ji lingên xwe kirin û qundere girêda. Qundere û goreyên di hindurê qunderê de ji baranê şil bûbûn. Lingên wî bi zor diçûn qunderê. Demaça xwe, çifta Heso û rextê wî di şemedanê de pêçan, kir kîs û kîs di nav sêncên diriyan de veşart. Heso ji serma ku xwaribû û tirsa çêwîş, dilerizî. Devê wî ketibû hev. Ji bo ku Hemo vî aliyê wî nebîne, kuxuya, serê bergîlê berda û lingên xwe li newqa wê hejand.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Apo apo bisekine!..«

Apo nesekinî. Hemo di hewşa qereqolê de gihayê.

Nobedarê qereqolê pêrgî wan hat. Du, sê metroyan ji wan bi dûr xwe berda ser kabokan, berê tivingê xist zikê wan û bi hêrs got:

»Hûn kî ne? Zû destê xwe bilind bikin û navê xwe bibêjin!«

Bergîl ji deng û keft û lepta ê esker cefilî û bêserî li hewşa qereqolê li hev doç bû. Ji ber ku axavtina bi kurdî li qereqolê û cem eskeran qedexe bû, Heso bi tirkiyeke xwar qêriya:

»Lawo Hemo, apo bergîl ket!« û serdevkî di bergîlê werbû.

Ew li erdê veziliyabû, ay û ûya wî bû û Hemo jî hîn destê wî li hewa û di temenê de ziq li ê esker dinerî.

Heso êşiyabû. Gopalê wî di zikê wî de çûbû, hinav eciqîbûn. Di esasê xwe de, ji vê bûyerê dîsa jî sivik filitîbû.

»Qûnekê heram, zilam ketiye, zû here wî rake!«

Ê esker her çiqasî bi zirt digot »Here wî rake!« Hemo hîn bêtir xwe bi ser hev de dişidand û destên xwe bilind dikirin. Ewqasî bi tirkî nizanîbû. Jê werê ku wî çiqasî destên xwe bilind bikirana, ê esker jî wê ewqasî bi nermî pê re biaxiviya. Ji xwe çakêt lê teng bû, îcar baran jî lê hatibû. Ev hemû ne bes bû, tew bi ser halan de bişkok jî girêdabûn. Çakêt tam lê ziqziqî bû, zendên wî rast ne dibûn. Çakêt qutik hildabû jor, serikê dûçika qûnê bêsitar mabû. Di halekî pir ne xweş de bû. Lê şensê wî baş geriya, ji hindurê qereqolê bi lez eskerekî din derket. Ê esker li ser bayê rêya xwe şiqamek pê ve zeliqand û ew saxtî kir. Dûv re bi destê wî girt û ber bi Heso de kişand. Piştî ku Heso jî hema wilo li erdê saxtî kir û got »Bêşeref, vî gapîrî rake û werin hindurê qereqolê!« bi bazdan çû.

Dilê Hemo dilerizî. Nehişî li çep û rastê xwe dinerî, nizanîbû bê wê çi bikira.

»Kuro Hemo, Hemo hişê xwe bîne serê xwe! Ev te aqilê xwe winda kiriye, çi bi te hatiye, weh! Rahije min û min bibe hindurê qereqolê!«

Hemo ew bersêngî xwe kir, çû hindurê qereqolê û di nîvê salonê de sekinî. Li derdora xwe nerî ku cihekî bibîne û Heso li wir bide rûniştandin. Li ber deriyê ku diçû oda çêwîş pênc kursî rêzkirîbûn. Wî bêî ku destûrê ji eskeran bixwaze, destê xwe dirêjî kursiyekî kir. Eskerekî girs î dirêj, jê re digotin »Fatîh«, pehînek li zendê Hemo xist kursî ji dest pekiya.

»Qeşmer ew kursî ne ji bo we li wir hatine danîn! Hûn kengî wilo mezin bûne heta ku hûn li ser kursiyan rûnin, ha!« û bi serê xwe qorziya salonê işaret kir.

Hemo Heso li ser çementoyê danî û bi bazdan hat li ber Fatîh sekinî.

»Emir bike qomandarê min!« û temene girt.

Deling û serê delingên pantorê wî seranser herî girtibû. Heriya binê qundera wî ser çementoyê lewitandibû. Li gor isûl û adetên qereqolê, ev sûc bû. Bi bergîlê hatibûn hewşa qereqolê, ev jî sûc dihat hesibandin. Baş bi tirkî nizanîbûn, gotinên eskeran bi wan dubare kiribûn esker aciz bûbûn, sûc bû. Bi ser de jî sergirêdayî ketibûn hewşa qereqolê. Ji rêyeke dûr di qir û qefaliyê de hatibûn û pir westiyabûn. Û bedêla her sûcî jî lêdan û pere bûn. Dixwestin ku esker wan wek xwe insan bibînin û di meqamê wan de bikaribin li ser kursiyan rûnin. Ma ne ji ber vê yekê bû ku Hemo bedil li xwe kiribû.

Eskerekî hûrik bêhnekê li Fatîh nerî. Dûv re berê xwe da Heso, guh da ser halê wî û di dilê xwe de got û biland:

»Rûniştina li ser kursiyê ne tiştekî ewqasî mezin bû. Eger van belengazan, ew rûmet ji qada me ya desthilatdar bidîtana, belkî hişê wan bihata serê wan û dev ji berberiya navxweyî berdana. Him ma ne qaşo herdu alî jî misilman in. Yanî pêxember û Xwedayê me û wan yek e. Em jî û ew jî em pev re rojî digirin û difitirin. Cejna me û wan yek e. Em û wan berê xwe didin Mekê û di mizgeftekê de limêj dikin. Ew jî, em jî zekatê didin. Me bi hev re li ingilîz û yûnaniyan xistibû û em hatibûn kuştin. Me zir dewletek bi qeweta van çêkir. Di şerê Korê de dîsa ev bûn. Kafir û xayinên herî mezin em bi xwe ne ku me ew kuştin û me welatê wan talan kir! Û bi ser de jî qîzên wan jinên me ne. Ji pîrekên xwe ên ku bêisûliyek kiribû re dibêjin, ‘Hesêbî eskerekî bazda ser, xem nake, wê efû bike!’ Ev çi zilm e! Ev çi dîn e! Ev çi ûjdan e! Ev çi heq û hiqûq û edalet e! Ma ne qaşo em misilman hemû birayên hev bûn. Ev dinyaya ‘fanî’ ne a yekî ji me bû. Xwedê dinya ji bo pêxemberê me ava kiribû û ne hiştibû ku ev pêxember sed salekî li vê dinyayê bijî. Seyr e! Ey Xwedê, te çima xwe daye pişt me û tu bi me re pê li van hêsîran dikî! Em di malên wan de li ser doşekên hirî û zemberîşan rûdinin; zikê xwe ji goştê berx, kar û elokan û birincê dikin pêpîk. Û bi ser de jî em dest dirêjî nav livîna wan dikin! Me bikujin, me heq kiriye!..« û ber bi hindurê qawîşê de lezand.

Fatîh piştî ku kulmek û çar şiqam li dev û ruyê Hemo xistin, dest bi xeberan kir:

»Bênamûs lawê bênamûsan, kûçik lawê kûçikan, zû here wê bergîlê ji hewşê derxîne!«

Hemo bêî ku destên xwe bihejîne û xwîna ku ji bêvilê diherike paqij


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bike, di temenê de wek pisîkê ji cihê xwe çeng bû û bi bergîlê ve çû. Fatîh madê xwe ê tirş hîn tirştir kir, tifî çep û rastê xwe kir û ji salonê derket. Bêhnek ne ket wê navê, çefiyeke belek ku di xwînê de debixîbû xist destê Heso.

»Gapîr, bi vî paçikî pêşî heriya ser çementoyê paqij bike û dûv re jî bi paçikê ku te li serê xwe pêçabû ziwa bike« û pehînek li termaza wî xist.

Heso di nava xwe de dikeliya, lê ew kela wî ne ji ber rabestinên ku ê esker pê re dikir. Di dilê xwe de digot, »Ê ne Circîsko, Xwedê ji min û te re kerîm e, kuştina te bi destê min e« û çefî bi çementoyê ve didewisand.

Çefî a Fermanê sitilîlî bû. Çend roj berê gava başçawîş û jina xwe li nav gund digerin, Ferman jî ji dûr ve bi haweyekî balkêş li jina wî temaşe dike. Başçawîş wî dibîne û vê yeka ha bi xwe ne xweş tîne. Wî digire û li wê navê dide ber kulm û şiqaman. Dûv re jî wî dikişîne qereqolê, lê êşkencê dike û çar şev û çar rojan di zindanê de dihêle. Jina çawîş ne pîrekeke ewqasî xweşik jî bû. Bi tenê tilmiqûnên wê girover û mezin bûn. Xweşikbûna wê ji wir dihat. Pantorên teng li xwe dikirin. Gava dimeşiya tilmiqûnan hev disût, serê tilmikan di pantor de dizewirîn, wek du hinaran bel dibûn û hêdî hêdî dihejhijîn. Ferman xort bû û pîrekên bi pantor hîn ne dîtibûn. Li herêmê ji bilî xortan kêm zilaman pantor li xwe dikirin. Xort û zilamên sitilîliyan ji tirsa lêdanê, di her gava ku başçawîş bi jina xwe re li nav gund digeriya, serê xwe dixistin ber xwe, li erdê temaşe dikirin û bi lez kolanên gund diterikandin. Dema ku jina wî diçû qehwa gund, herkesî berê xwe jê diguhert û yeko yeko belav dibûn. Beqalê gund Kermoyê kulek, destek datanî ser çavên xwe û bi destê din jî tişt û mişt dirêjî destê jinikê dikirin. Jinik jî pir gerok bû, roja xwe ji malê bêtir li nav gund derbas dikir. Baş bû ku ewqasî ne dihat gund. Ji destê wê gelek xortan xwe ji gund dabûn alî. Di eslê xwe de başçawîş ji aliyê jinê de ne miroveki ewqasî dilxerab bû jî. Ji ber ku jinik, bi tena serê xwe li bajaran digeriya. Diçû bendava Nisêbînê seyrangehê. Li bajêr gelek hevalên wê ên dikandar hebûn. Li malên wan radiket. Diçû Mêrdînê. Li wir jî hevalên wê hebûn. Geh li malên wan geh li hotêlan radiza. Lê digel vî haweyî başçawîş dîsa jî hîç tahmûl ne dikir ku xortên sitilîliyan li jina wî temaşe bikirana.

Heso bi qûnkişkê hindurê salonê paqij dikir. Tirsa çend rojan û serma ku bi rê de xwaribû di dilê wî de li hev geriyabû. Mîna ku dendikê şebeşan biçirisîne, her ji bêhnikekê taximên diranan li hev diketin. Lêv tam bi hev zeliqî bûn û rîha wî wek dara ku pelên xwe biweşîne, diricifî.

Fatîh ji qurm de bi rîha wî girt û xwe bi ser de zirzitand:

»Pîsê heram, dengê xwe hilde û bibêje bê tu çi dibêjî! Tu siqêfan dikî ha!«

»Begê min wilehî ez tu tiştî nabêjim yaho. Haşa, ma ez kî me ku ez ê bikaribim gotinên xerab bi zatekî wek te mezin re bikim. Te tu qisûr ne kiriye begê min. Qisûr hemû ji me ye. Dibe ku me hinekî hûn zivêr kiribin, xete ji piçûkan efû ji mezinan, me bibexişîne.«

Bi destê Fatîh girt, kir ku maçî bike. Fatîh destê wî heliqand û xwe jê vekişand.

Heso li ber xwe neket. Dîsa situyê xwe jê re tewand û lingê xwe ê seqet işaret kir:

»Aha binere begê min, lingê min şikestî ye. Circîs Aslan« û di cih de sekinî.

Soza ku şevê din bi Sarê re dabû hat bîrê. Fikirî û fikirî û da ber hev. Aliyekî wî yî pêxemberî hebû. Çawa ku pêxember, xelîfe, siltan û qiralên dinyayê jî gava diçûn şer, jin bi xwe re dibirin; ji zewqa ku jinê dida wan bêhnfireh dibûn û serast biryar didan, Heso jî wilo fikirîbû. Ji bo ku bizanibe Circîs çûye gilî an na? bi Sarê re raza bû. Jê re soz dabû ku Circîs ne çûba qereqolê û gilî lê ne kiriba, wî jî wê ji vê hatina xwe re rêyek bidîta û behsa pevçûna doh ji eskeran re ne kiriba. Piştî ku di dil xwe de got »Na na, ew hatiye vê qereqolê û gilî li me kiriye, ma ne Kenêr jî wek min fikirîbû!« û bi ê esker re tevda:

»Begê min, Circîs hinavên min bi lêdanê birîn kirine, ji destê lêdana wî, îro çend roj in min nan ne xwariye; dilê min ji nêza li hev dikeve, ez pir diêşim, pir!..«

Heso, herçi esker bûn xweş nas dikirin. Dizanîbû ku çiqasî xwe ji Fatîh re deyne, gava ku çend qurûşekî nedêyê wê fêde neke. Lêbelê mîna ku vê yekê hîç nizanibe, dîsa jî xwe jê re datanî.

»Begê min, ê ne te ne dît bê Circîs Aslan û zaroyên xwe û muxtarê gund Bedran Aslan, çi afatî bi serê me de anîn!..«

Fatîh destê xwe di nava wî rakir, bi dengekî bilind û sivik sivik peyivî:

»Kûçik, ev tu çi dibêjî! Circîs mircîs, Bedran medran heywan in, insan in çi ne ev!«

Eger hema bêhnek din Hemo ne hatiba, Fatîh wê Heso bi şiqaman gêj kiriba.

»Lawo Hemo zû pereyan derxîne!»got û xwe dada çakêtê wî.

Bi berstikê girt û bi teqil ew ber bi xwe de kişkişand. Bişkoka jor di

qulpikê de şikest çakêt vebû; wî wek zarokan destên xwe di paxila wî de gerandin. Qewlik ne dît. Vê carê jî bi kurdî û bi wahc peyivî:

»Kuro kanîn pere!« û bi herdu destan pêxêla Hemo hejand.

Fatîh bi gotina wî re piştî ku pehînek di pişta Hemo de werkir, hestiyê kefa destê xwe li eniyê xist, serê wî li dîwêr ket. Taximên diranan ji dev pekiyan. Taximê jor bi ser çefiya ku pê salon paqij dikir gindirî û tîtikî xwe palda. Hersê diranên wî ên pêş ji çamûrê xuya ne dikirin.

»Qeprax, ma vir mala te û bavê te ye ku tu bi zimanê kirokî diaxivî, ha!..«

Wî herdu destên xwe bilind kirin û bi haweyekî kelûgirî:

»Pir estexfîrulah begê min! Ez jî nizanim bê çawa ji devê min derket. Min di hizûra cenabê te de pîsiyek kir, min bibexişîne...«

Hemo qewlik li ser taziyê xwe girêdabû. Bi lez ji ser tazî kir û dirêjî destê Heso kir. Qewlik ji çermê gê bû. Zînê qewlik li ser sê taxan bi nexê şimakirî dirûtibû. Xwêhdanê li qewlik vedabû şima nerm kiribû û şimê di qulikên dirûnan re dabû der. Heso bêmefer qewlik vekir, serê xwe bi ser de bi haweyê ku Fatîh nebîne tewand û destê xwe di nav taxên pereyan de li kaxeta herî piçûk gerand. Pere hemû 2700 wereqên tirkî bûn. Çar kaxet jê pênc sed pênc sed, sisê jê sed sed, pênc jê pêncî pêncî, yek deh û ên din jî hemû bîst bîst bûn. Pereyekî pir bû. Heso tu carî bi ewqas pere ne dihat qereqolê. Eger bi rê de bizanibûya ku ewqas pere li ser Hemo ne, miheqeq wê du hezar jê di bin tahtekê de veşartibana. Bîst wereqe xistin destê Fatîh.

»Aha wilo gapîr were îmanê!»got û çû.

Vî hîn salon derbas ne kiribû yekî din hat. Ev ê ku dihat Cengîz bû. Heso bi hatina wî kêfxweş bû. Rîha xwe firkand û keniya:

»Ooo Cengîz bey, ev tu li ku derê bû yaho, tu ne xuya bû! Agir bi malê neketo ji sibeha Xwedê de em li vir di vî halê ne xweş de, tu li vir e û tu nayê bi me ve ha!..«

Cengiz bêdeng bêhnekê li wan nerî. Dûv re paniya potîna xwe tam xist defa sênga Hemo û bi dîwêr ve eciqand. Çavên Hemo wek du xarên zindoqî lîstin. Piştî ku şiqamek şelpand patika serê Heso, xwe bi ser de tewand û kire zirte zirt:

»Hûn li gund tivingan berdidin hev ha! Ê ne îşev em ê we bi lêdanê tirek bikin!..«

Heso wek çûkê ku başoke di ser re bifire, xwe melisandibû û ziq li kortikên çavên wî dinerî. Lê ecêbmayî mabû. Di dilê xwe de got, »Haho ev

tirk çi miletekî bêbav e!«

Berî niha bi sih û çar rojan dê û bavê Cengiz ji bajarê Gelîbolûyê hatibûn Sitilîlê. Heso bi mebesta ku lawê wan li himber Circîs bi kar bîne, ew ezimandibûn. Du şevan li mala wî raketibûn. Ew biribûn Nisêbînê û tam 1050 wereqe li wan mesref kiribû. Ji mala xwe bi qedir û qîmet bi rê kiribûn. Cengiz nanê wî pir xwaribû. Car caran pere jê xwestibûn û wî jî dabûyê.

»Cengiz beg, ha ji te re jî bîst wereqe!«

Cengiz bîst wereqên wî heliqandin. Tiliya xwe a girdikê danî ser gwîzeka qirika wî tilî di gwîzekê de çû xwar û devê xwe anî ber guhê wî:

»Yextiyarê qûnvirik bîst hindik e, pêncî bide min!«

Heso bêkip pêncî wereqe dayê. Cengiz çû.

»Apo, min tiştek ji exlaqê van eskeran fêm ne kir, him pereyan ji me distînin û him jî li me dixin!«

Heso tiliya xwe anî ber devê xwe:

»Hişşş dengê xwe neke, bi a wan bike« û wî hiş ne kir.

»Lawê min, her çi tirk e qahpe. Ma tu ne çûyî kerxanê hîç? Pîreka qahp bêfedî ye. Perda ruyê wê qetiyaye. Him te berdide ser xwe û him jî gava tiştekî te li hesabê wê ne hat, tiliyê diavêje qûnê û ji te re 'qûnekê heram' dibêje. Ev tirk miletekî wilo ye ku şipya dikarin di diya xwe û rûniştî jî di a mirov nin! Pîrekên wan li kerxana Mêrdînê û Diyarbekirê ez pêncî carî şipya berdame ser xwe!..« destê xwe li sênga xwe dixist û bi teqil digot.

Di eslê xwe de Heso, li Diyarbekirê carekê çûbû kerxanê, lê tiştek bi jinikê ne kiribû. Jê re »abla« gotibû. Jinik jî perê xwe jê distîne, çend şimikan tê wer dike û wî ji odê diavêje. Ji Sarê pê ve doxîna wî li tu pîrekê venebûbû.

»Lêbelê apo, ma ne Aydin Guzel jî tirk bû. Ew wek melayiketekî bû. Berberî ji nav me rakiribû, destava di axuran de qedexe kiribû. Eskerên wî ji dêvla ku li qaçaxê bigeriyana, îcar di kadîn û axuran de li gû digeriyan...«

Heso ji dil keniya:

»Erê kuro, ma ne tê bîra te bê wî dêqahpê Circîs li ser cebilê qûna xwe çend caran pere dan! Howeh kuro, ew Aydino bê çi zilamekî baş bû, bi me gû ji axur û maxur û bin sefirne û mefirnan derbasî çalan kiribû. Gava qaçaxçiyan li hidûd dixistin jî, wî gotinek çort bê çi ye, bi me re ne dikir...«

»Ax ku tirk hemû wilo wek wî qenc û bedew bana...«



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Tirk û qenc ha, Aydino ne tirk bû ehmeq! Ew miheqeq ji tuxmê yûnaniyan bû. Ma te hîç eskerekî bedew, xweşik û porzer ditiye? Aydino xortekî porzer û li hevhatî bû. Di qîzaniya xwe de porê Sarê jî hinekî zer bû. Pêxemberê me bi xwe jî hej porzeran kiriye. Yanî Aydin Guzelo bi tirkî peyivî be, wê bibe çi! Ez jî bi tirkî dizanim, îcar ma ez bûm tirk, tu bi qedirê xwedê kî, lo! Circîsko çi be tirk ew in; tuxmê wan yek e...«

Heso hîn di bin tesîra van gotinên xwe ên mêranî de bû, eskerek bi lez derbas bû û hilkişiya jor.

»Hê hê esker efendî, patîşahim, allahê min pere pere!..«

Lê ê esker hîç guh nedayê.

»Apo, ma tu dibêjî esker wê hîn jî bi ser me de bên?«

Xwîn di Heso de geriyabû. Sawa xwe revandibû. Kaxetên bîst bîst û pêncî pêncî ji hev veqetandibûn, xistibûn du bêrîkên şerwêl û qewlik li ser taziyê xwe girêdabû.

Keniya û got:

»Helbet wê bên, pere hene pere! Ji xeynî çawîş tam yanzdeh esker li vê qereqolê ne, ew ê niha yek bi yek bên û destê xwe li ber min vegirin. Ez ê jî bidim; ji bo ku wan li Circîs tam sor bikim û şerefa wî têxim bin lingan. Şeref û namûs bi pereyan tê parastin, birako. Ma ku ne bi qeweta pereyan be, em ê çawa bikaribin nehêlin ku di vê qereqolê de esker pê li şerefa me bikin! Camêrî bi pereyan dibe. Ma te feqîrekî camêr dîtiye? Na, te ne dîtiye. Feqîr bixwazin jî nikarin bibin camêr. Heta mirov bi pereyan dikare bihuştê jî bikire. Xêr û xêrat bi pereyan dibin. Mirovê ku nikaribe dehî û heqîqan bide, wê çawa di ser pira selatê re derbas bibe, hi? Feqîr nikarin ciwangan bikirin û wan bikin dehî û heqîqe ku li ser pira selatê li wan siwarên û di pirê wernebin. Wey li halên feqîran be!..«

Hemo devê xwe bi gotineke mezin dagirt, wî rê nedayê. Xwêzî di qirika Hemo de ma, ji mecbûrî pala xwe da dîwêr.

»Hemo!«

»Çi ye apo?«

»Niha bi rastî dikeve serê te jî ku mirov li wê dinyayê li ser pira selatê li ciwangan û golik û molikan siwar tê? Mirov li ser bênderê nikare li golik siwarê, îcar wê mirov çawa bikaribe li ser wê pira ku ji devê şûr ziravtir e li golik siwarê!«

»Apo ez xulamê te me dev ji van kufiriyan berde. Em di cîhekî teng de ne, vir ne cihê wê ye.«

»Ehmeqê heram, ku dibêje vir ne cihê wê ye. Ji xwe vir tam cihê wê ye.

Xwedê dev ji vê qereqolê berdaye. Di vir de kî ji Xwedê re çi bibêje jê re dimîne. Çimkî gava te lingên xwe avêt hindurê hewşa qereqolê, melayiketên ku xêr û gunehan dinivîsînin ji ser herdu milên te difirin û tu bi tena serê xwe dimînî.«

Heso wê hîn gelek tişt bigotana, lê ê esker ne hişt.

»Qûnekino hûn çi dipeyivin?»got û kulma xwe bilind kir ku li devê Hemo xîne.

Heso destê xwe ji kulma wî re kir mertal, bîst wereqê di kefa destê wî de ji ê esker xuya kir. Esker kulma xwe danî; bêdeng pere berdan bêrîkê, wek dînan li dor xwe nerî û bi lez çû.

»Lawê qûndekê ecemî ye, ha. Hîn baş fêm ne kiriye ku bê mirov xwe çawa difroşe. Erê kuro, min sed carî ji te re got ku bazde ser diya Cengiz, lê te bi amin ne kir. Jinikê xwe bi te ve dixwirand, dilketibû te. Eger te bazda ser, îro lawê wê jî wê wilo li serê me ne kiriba. Lawê tirê heyfa ku te çima baznedaye ser dê, ji me hiltîne!«

»Apo, mêvan bûn. Ma dibû ku mirov bazda ser mêvana xwe?«

»Bênamûs, ku dibê ma dibû! Çawa ne dibû, pêşî gerek mirov di wê mêvana xwe...»got û di cih de qut kir.

Eskerekî din bi rê de bû. Êdî hedê wî bû biaxiviya. Ê esker hîn sê, çar metroyan ji wan dûr bû, wî destê xwe hilda. Bîst wereqe bi tiliya xwe a girdikê û işaretê girt û dest hejand. Dûv re ji nişkê ve destê xwe danî, avêt bêrîkê û pêncî wereqe derxist.

»Begê min Yavuz, ev jî xelata te ye, min ji te re hilanîbû.«

Yavuz zilamekî dirêj î dagirtî bû. Heso pir jê ditirsiya. Zalim bû. Carekê di mala wî de bi sebeba ku çima goştê elokê jê re çênekiriye, di tepsika hêkên qelandî û beroşa birincê de tif dike û du kulman li argûşkên wî dixîne. Argûşk ji ser hev diçe û Heso li dor mehekê nexweş dikeve. Û du caran jî wî li qereqolê dixe felaqê.

Yavuz piştî ku qotê serê Heso teptipand û bi qot de tif kir, li ber Hemo çong berdan. Hişk bi berstika wî girt û bi qahr got:

»Lawê qahpikê, ev te hîç ji destê min lêdan xwariye gelo?«

Hemo wek lempa ber bê, di cih de xwîn lê vemirî. Gewde serî ranegirt, sitû xiliya û bi dengekî xeniqî lêv ji ser hev çûn:

»Na begê min.«

Hemo kilkiland.

»Na ha! Ê ne îşev bi lêdanê ez ê di jina te...im!«

Dûv re ji qurm de bi herdu guhên wî girt û hêdî hêdî rabû ser xwe. Her


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ku wî hildida xwe, Hemo jî wek hêlîna zelore, piç bi piç pê re bilind dibû. Serê wî çar caran li dîwêr xist û hîç jî kirpînî ne ketê.

Piştî ku ji Heso re got:

»Min di Xwedayê te kut...o, ji bo mêrxasekî wek min, ma pêncî wereqe ne hindike, hi!« û kulmek li devê wî xist.

Lêva wî a jor bi kulmê re ecinî. Xwîn jê ne hat. Heso çi pereyên ku di bêrîkan de hebûn kir qefil û bêî ku tiştekî bibêje avêt ber lingên wî. Ji ber ku piraniya eskeran hertiştê xwe bi plan di mista başçawîş de dikirin, Yavuz rahişt du kaxetên pêncî pêncî; wek çixarê pêça û rîha Heso pê şeh kir. Piştî bêhnekê bişkokên pantor ji qulpikan kir, serê qereqopkê xwe derxist pere pê firkand û firkand û berda bêrîka xwe. Dûv re jî ji kezebê elq da xwe û pelxemeke mezin tam di kortika serî de werkir. Pelxem di navbera birhûyan re wek ava cokê bi lez herikî, herdu çavên wî şil kirin, xwe berda ser simbêlan û li wir civiya. Heso pelxem bi zendê xwe ê rastê paqij kir. Ji enîşkê heta ku digiha bazinê dest, pelxemê wek pizana pez xuya dikir.

»Qûngenî bi êvarkî re em ê hevdu bibînin!« nav şeqên xwe firkand û çû.

Li gor adetên eşîrên herêmê, bi haweyê ku esker kir sûcekî mezin bû. Cezê wê jêkirin bû. Li himber vê yeka ha kirpînî ne ket Heso, lêbelê di dilê xwe de jî bêdeng nema:

»Bi kêmanî gerek min bigota, 'begê min eyb e, têra me li me bixîne û vî tiştê xwe di ser me re nehejîne. Ê bi te ve bi me jî ve heye. Yanî a ku tu dikî mêranî ye?' Oh tu jî lo, dibû ku li min bida û lingê min ê din jî bişikenanda. Ez tirsiyam. Na, dema ku bi bafîka qaçaxçiyan li tabûra Nisêbînê yuzbaşî di devê min de mîzt, ez li himber rabûm û min qiyamet rakir! Destekî min şikenand û dîsa jî min jê danexwar. Baş e, çima niha min ew mêraniya ha nekir, hi? Ji xwedayê min re xeber da, min dîsa li xwe ne qewimand. Îcar çi yanî? Bila xwedayê te li ser xwe bixeyidiya, bavê mino. Ji tirsa lêdanê mirov çawa dikare xwe ewqasî piçûk bixîne! Na na, ne ez, Circîs piçûk e. Bi telaq eger min bizanîbûya ku wê bi desthilanîna min re, teresan nebûna hevalên wî kafirî, min ê tofan rakiribûya! Lê ez çi bikim ax!..«

Başçawîş li qata jor di meqamê xwe de rûniştibû. Bêî ku van herdu mirovan bi xwe agahdar bike, bi hostayî hertişt ji wir îdare dikir. Di rojên ku gundî pevdiçûn, wî jî eskerên xwe li hev dicivandin û planê ku wê çawa bikaribin gundiyan pir bişelihînin û ji şexsiyetê bikin, dikirin.

Şelihandin û bêşexsiyetkirin du pirensîpên qereqolê ên esasî bûn. Gava insan bêmal û pere dibû, manewiyeta wî jî qels diket û li ser tiştekî herî sivik dikarîbû xwe piçûk bixista. Mirovê birçî nikarîbû baş bifikiriya. Lênerînên wî mij û xumamî bûn, rûniştî tiştekî wî î tebût tune bû. Şexsiyeta feqîrnezanan di destê zaliman de wek hevîr rû dida û komutanên herêmê jî bi vê yeka ha baş dizanîbûn.

»Apo, min bergîl bir mala Şaqûlo. Wî û jina xwe silav li te dikirin. Dixwazin ku em îşev mêvanên wan bin. Gava ku ez hatim, jina wî dest bi haziriya şîva me kiribû jî...«

Heso bi haweyê ku lê guhdar dikir, bêdeng sekinîbû. Xeyalan mîna ewran girtibû ser mejiyê wî, ewrek diherikî ê din dihat. Ê esker siqêf bi xwedayê wî re kiribûn. Dixwest daqurtîne, lê dikir ne dikir ne diçû xwar. Circîs ji bîr kiribû. Ji kûr û dûr diponijî û giraniya aqilê xwe hemû berdabû ser islamê, Xwedê û edaleta wî. Li xwe difikirî. Misilman bû û îbadet ji Xwedê re dikir. Bi xwe re ketibû devjengê.

»Niha bi rastî qey ev Xwedê vê zilmê nabîne gelo?

— Belê dibîne.

— Baş e, çima deng nake?

— Qey îman bi te re nemaye ji ber vê yekê.

— Na, ne wilo ye.

— Ma Sarê û mele Salar jî bêîman in?

— Na, ez bawer nakim. Ew îmankamil in.

— Baş e, Xwedê çima li ser zilma ku esker bi wan re dikin, deng nake?

— Qey Xwedê qedera wan wilo nivîsiye?

— Weh weh, ew insan in baş in û îbadetê ji Xwedê re dikin. Hevalê wî nin. Îcar Xwedê çima qedera hevalên xwe wilo xerab dinivîsîne?

— Bi rastî di vir de tiştek heye.

— Na lo, belkî ji ber ku xweha Circîs e, Xwedê wilo qeder li eniya wê nivîsiye.

Erê wê çima binivîsîne, weh!

— Hertişt bi emirê Xwedê dibe, ma tu ji Xwedê çêtir dizanî? Zêde neçe, ewqas!

— Yanî niha ev esker bi emirê Xwedê li me dixin!

— Erê. Gava Xwedê qebûl neke, ew nikarin li te xînin.

— Yanî niha li nezaretxana Mêrdînê polîsan ew jopên ku dixistin min û di devê min de dimîztin, bi emirê Xwedê bû?

— Erê. Gava Xwedê ew yeka ha bi wan şêrîn ne kiriba, nikarîbûn jop


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

têxistana te.

— Yanî niha insan bi emirê Xwedê çêdibin û dimrin?

— Erê. Hertişt bi emirê Xwedê çêdibe û dimire.

— Naxwe Şeytan jî bi emirê Xwedê bûye Şeytan.

— Erê. Gava Xwedê nexwesta, dikarîbû ew ne kira Şeytan.

— Xwedê Şeytên li himber kê bi kar tîne?

— Li himber insên.

— Baş e, Xwedê çima insên çêdike? Û him wan û Şeytên û him jî wan xwe bi xwe berdide hev? Çi fêda wî tê de heye? Yanî niha Xwedê Circîsko berdide pêxêla min! Ha lawo Hemo, hejmar bû çend?«

»Ez dibêjim heft.«

»Kuro tu şaş î bavo. Gerek ya sisê ya jî bûbe çar. Wilo xuya dike ku ev segbav wê me biêşînin.«

Heso piştî ku ji hecê vegeriyabû di derbarê dîn û Xwedê de gelek caran bi melê gund re devjeng girtibû. Berê jî ev aliyê wî hebû lê ne ewqas bû. Eger di herêmê de hin ilimzanên olnenas hebûna, wê bi rehetî Heso li himber Xwedê rakiribana. Wê demê jî miheqeq dê dev ji berberiyê berda û li tifaqiyê bigeriya.

»Apo, ez dibêjim, gava ku em derketin meqamê çawîş, em ê giliyên eskerên wî jî li ba bikin. Ma tu çi dibêjî?«

Heso li ser hev du dengan kuxuya. Kuxuka wî hinekî hişk bû. Bi sênga xwe girt. Kuxuk dîsa hatêyê, lê wî hewl da ku nekuxe. Serê xwe berda ber xwe û bi dizî got:

»Lawê min, ma kûçik goştê kûçik dixwe?«

»Na apo.«

Piştî ku beşişî, pişta situyê xwe xurand. Dûv re tena tena got:

»Belê belê, gava birçî be dixwe û hey dixwe.«

»Min fêm ne kir.«

»Eger gava ez bikaribim sê, çar hezarekî berdim devê çawîş, ew ê li pêş çavên min di devê eskerên xwe de bimîze.«

»Lêbelê apo çawîş ne miroveki birçî ye.«

»Tu çiqasî bide insên ew ê dîsa jî çavbirçî be. Insan mexlûqekî derewîn û bêbext e, tu carî têr naxwe.«

»Ma pêxember jî?«

»Erê erê, derewîn û dewlemendên herî mezin ji xwe pêxember bûne. Kafirên ku bi teyaran ezmên diçirînin nikarin xwe bigihînin Xwedê, lê pêxemberan îcar xistine serê van insankên ehmeq ku bi rastî firiyane û

çûne ba Xwedakê wan. Ma ji vê derewê mezintir derew hene gelo! Erê niha tu çima nabêjî, bê Xwedê doza çi li vî Şeytanî dike?«

Hemo bi destê wî girt, hejand û maçî kir.

»Apo, ez xulamê te bim tu ê bes bikufirî. Di vî cihê teng de û...«

Wî bi qahr destê xwe kişand:

»Kerê çolê, çi cihê teng! Vir tam cihê wê ye. Ma di cehnemê de jî em ê nikaribin bipeyivin, weh! Hayê Xwedêko û pêxemberkê wî, ji ên li cehnemê tune ye. Ew bi ên li bihuştê daketine. Kuro bi telaq heta ku em li vê qereqolê bin, em ji wan re çi bibêjin wê ji me re bimîne. Ma ne ez dev ji wan bernadim, ez ê dilê xwe li wan hênik bikim. Çima ma em ne wek çawîş in ku rojê barek gotinên kotî bi wan re dike û qet jî tiştekî pê nakin! Çawîş!..«

Dengê wî bilind derket. Eskerê hûrik ku dilê xwe bi halê wî şewitandibû, li ber sekinî. Xwe bi ser de tewand, tiliya xwe anî ber devê xwe û got:

»Amca, hişşş!«

Heso bi haweyekî serxweçûyî bi destê wî ê çepê girt û hejand:

»Ha ji te re jî bîst wereqe!«

Ê esker li ber xwe ket. Bi hêdîka destê xwe ji nav ên wî kişand û bêî ku pereyan bigire, bêdeng çû.

»Lawê xanim, hindik dît, hindik! Çima ne sed wereqe bû, ranahijêyê.

Erê ezbenî, te Şeytan ji êgir afirand û te ew kir serekê hemû melayiketan. Ev jî çiqasî rast e, ez ê nizanibim. Ez li gor kitêbên te bi te re dikim. Û te Adem jî ji heriyê û zibil û mibil afirand. Bi bafîka ku Şeytan ji Adem re naçe sicûdê, tu vê yeka ha wek bêemiriyê qebûl dikî û wî ceze dikî. Agir wê çawa ji zibil re here sicûdê, ev çi edalet e! Lêbelê ma ne Adem jî bêemiriya te kiribû, te çima ew ceze ne kir? Tu Adem ji bihuştê, mîna ku te ew ceze kiribû diavêjî. Lê tu kê dixapînî! Di eslê xwe de, te rudba Şeytên bi Adem vekiriye. Te insan kiriye hertişt û mezinê hertiştî. Te ji insên cîgir û wekîl ji xwe re çêkirine. Tu wan li melekan siwar dikî û dibî meqamê xwe. Tu ji insên, ên wek Îsa qenc û wek Circîs pîs diafirînî û tu wan berdidî hev. Tu doza çi li insên dikî? Qey te insan ji bo ku pevbiçin û tu jî ji vê pevçûna wan ji xwe re zewqê bistînî, çêkiriye hi?..«

Deriyê ku ji odan dihat salonê hesinî bû. Derî bi boyaxeke renkxwelî boyax bûbû û li ser vê boyaxê jî dîsa bi boyaxa sor ala Tirkiyê hatibû çêkirin. Ji kêşa boyaxê dida der ku boyaxker esker bûne. Cih bi cih şûna firçê beloq dixuya. Pencereke piçûk di derî de bû. Cama wê zere bû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hema di ser perwaza derî re sûretekî Atatirk î mezin daliqandîbû. Wek vî sûretî mezin sûretekî wî î din jî, ji aliyê hindur ve bi ser deriyê ku li hewşê dinerî daliqandîbû. Herdu Atatirk jî bi cilên eskerî bûn. Atatirkek li ser latekî bilind sekinîbû û bi destê xwe ê rastê mîna ku dijmin işaret bike dirêj radabû û ê din jî li ser hespekî girs î qer bi haweyê ku hicûm bike di hereketê de bû. Hindurê salonê yekser bi boyaxa eskerî hatibû boyax kirin. Li ser dîwaran bi tîpên mezin hatibû nivîsîn ku tirk firtone ye! Tirk bahoz e! Tirk diperçiqîne! Tirkek himberî dinyayê ye! Wey xwezî bi dilê wî ê ku bibêje ez tirk im! Dîwar bêşibake bûn. Di derî re ronahiyê dida hindur. Ronahiya şikefteke kufarî çiqas bû a vê salonê jî ewqas bû. Ê hoste, miheqeq wê qereqol di hersê çar mehên havînî de ava kiribe. Eger bîr biriba ku ronahiya zivistanê wê tu carî bi qasî a havînê neba, ew ê du, sê kulekên piçûk di vê salonê de vekiribana.

Reqînî bi deriyê salonê ket, Heso bîst wereqe xistin destê xwe, serê xwe rakir û wek mêr li devê derî nerî. Di dadgeha ku wî berî niha ji xwe re danîbû, Xwedê neheq kiribû û berê xwe dabû Circîs.

Mehmetê esker bi zirt got:

»Bênamûsino hûn çi dipeyivîn!« û bi guhê Heso girt.

Guh bi zixur firkand û hey firkand.

»Begê min Mehmet, ha ji te pere pere pere...«

Wî guh berneda heta ku xwîn jê ne hat. Piştî ku vî eskerî pere berdan bêrîka xwe, îcar paşê xwe da wan û xwe daqûl kir. Devê qûna xwe xist devê Heso, xwe bi ser hev de zewirand û tirek berda. Hemo bêhemdî xwe dengekî keniya. Kenê wî li hesabê Mehmet ne hat. Mehmet bi şiqaman êrîşî ser kir. Piştî ku ew bi şiqaman gêj kir, »Tu ê bi min bikenî ha! Heta li min û te bibe êvar!« got û çû.

Heso bi ser Hemo de rabû:

»Bênamûs tu çima keniya? Te çi ji tira wî ye? Bila bin xwe jî tije bike, te çi jê ye? Tu çima dilê wan ji me dihêlî? Ma te ji bîr kiriye bê em ji bo çi hatine vir?..«

Hemo serê xwe berdabû ber xwe, mîna ku bêisûliyek mezin kiribe bêhis û pis guhdar dikir. Di dawiyê de xwe ne girt:

»Apo, bi rastî ma wî ji xwe fedî ne kir ew tişt kir? Ma ne qaşo zilam bû.«

»Kuro ehmeq, me heywan dibînin. Ma mirov ji kerê, çêlekê, ga û ma fedî dike ku li himber wan tirê neke, hi! Birako, bedilê ku te li xwe kiribû, dîsa jî rê li tira mêrik ne gir, te dît ne?..«

Dengê qelebalixa zarokan ji dûr dihat, te digot qey bi kaban dilîstin.

Yekî rê ne dida yekî, hemû bi hev re diaxivîn. Dengê yekî ji wan li ê hemiya ferq dikir. Mîna ku lawê şêxê gund be, pir bi ser hevalên xwe de hildibû. Çûkekî beytik her ji kêlîkekê xwe dadida ber deriyê salonê, bêhnçikyayî nikil li ser hev li erdê dixist difiriya û dîsa bi eynî meqamî dihat. Tiştekî çêrê jî li wir tune bû. Beton ditiktikand. Bala Heso kişandibû. Vizîniya mêşeke reş û girs bêdengiya salonê xerab dikir. Mîna ku hinera xwe şanî Heso bide, li dor xwe dizîvirî dizîvirî û ji nişkê ve xwe li bin guhê cama derî dixist. Ji camê dipengizî erdê, piştî ku çend saniyan nehişî dimeşiya dîsa dest bi fira xwe dikir. Deriyê ku li hewşê dinerî vekirîbû, wê xwe li bin guhê deriyê girtî dixist. Şûna şiqamên di ruyê Hemo de ji devê derî xuya dikirin. Xwîna bêvilê sekinîbû, bêvil nepişî bû. Cilên wî di xwînê de mabûn. Lê heta ku mirov tam ne çûba ber, xwînê xuya ne dikir.

»Qûnekino, xwe bidin ser hev komutan bang we dike!«

Navbera cihê wan û başçawîş ne ewqasî dûr bû. Bi tenê wê pênc, şeş derencan bi jor ketana. Heso ling nedan ber xwe. Dikarîbû ling bidana ber xwe, ya jî bi nikilkê û dîwar û dîwar xwe bigihanda derencan. Mirov nikarîbû xwe bida ser lingê fikyayî, lê mirov dikarîbû bi qeweta darekî xwe bida ser lingê tehenî û bimeşiya. Doh jî bi vî haweyî xwe berdabû ser bênderên gund û li himber komutanê hidûd li ser pêyan sekinîbû. Heso xwe bi erdê ve kir risas. Wî digot qey ez xwe çiqasî bêhal bixim, başçawîş jî wê ewqasî li min guhdar bike û li gor kêfa dilê min here. Belkî sed carî hatibû vê qereqolê. Di her cara ku tê rû nastîne, karekterê başçawîş û eskeran bi qasî ê xwe nas dike û dîsa jî xwe li himber wan dixe rewşeke wiha. Eger di vê bêhnikê de Circîs li vir ba, ji qayişa wî re miheqeq wê bi tena serê xwe heta meqamê başçawîş bimeşiya. Ji ber ku carekê dîsa wek her tim, komutanê hidûd darîçavê gundiyan, diranekî wî î pêşî û ê Circîs bi tayê naylon bi hev girêdide û serê herduyan hêdî hêdî paş ve dikişîne. Diranên wan ji qurm ve radibin û kipînî jî nakeve yekî ji wan. Li gor wan, gava yekî bigota »ay« ê din mêrxas û êdin jî tirsonek dibû. Bi qasî ku digotin, xwîna pezekî ji devê wan hatibû.

Hemo ew li pişta xwe kir û bi derencan ve hilkişiya. Deriyê odê vekirîbû û Yavuz jî di devê derî de sekinîbû.

Başçawîş bi zirt got:

»Wan berde hindur lawê min!«

Di hizûra wî de, Hemo bêhnekê li ser pêyan sekinî. Di cihê xwe de diqeliqî, bi zor xwe li tena digirt.

»Wî kevjalî deyne ser çementoyê û tu jî li ser lingan bisekine!«

Hemo:

»Ser serê min begê min!« got û yekser emirê wî anî cih.

Mustafa başçawîş yekî qut î qalind û esmer bû. Miroveki qûnsîrî û ji serxweçûyî bû. Araqvexwir jî bû. Ji mêşekê bi jahrî diket. Ji gotineke piçûk dikarîbû çewaleke gotin derxista û êrîşî mirov bikira. Heyvanê şexsiyetê bê çi bû li ba tune bû. Başçawîşên ku hatine vê qereqolê hemû jî zirçonên zilaman bûn. Heta piraniya eskerên vê qereqolê jî di tayê başçawîşan de wilo serxweçûyî bûn. Zilmeke bêsînor di serê xelkê herêmê de dikirin. Kesekî nikarîbû gilî li wan bikira. Her çiqasî çend carekî hin maqûl, şêx û axeyên herêmê giliyên wan li ba waliyê Mêrdînê kiribin jî, gilî bêbersiv maye û di dawiyê de van kesan him ji teref fermandarên Tûgayaa Mêrdînê û him jî ji teref yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê û başçawîşan ceze xwarine.

Berê xwe da Heso û li ser hev destê xwe li masê xist:

»Zirto, we dîsa çi gû xwariye! Hûn wek du dewletan bi sîlehên giran ketine nav hev û we hev birîndar kiriye. Ma we ji min destûra şer sitendibû? Ma ne qaşo ez qiral we bûm. Hûn çawa dikarin bêî min şer bikin! Hi, tifî, bênamûs, pîsên heram!..«

Qedeha ku ji şeraba sipî tije bû, hindik mabû biqulipiya. Jina wî hema di kêleka wî de li ser kursiyê rûniştîbû. Bi haweyê xatûnî rabû ser xwe tena tena meşiya, destê xwe li ser masê gerand, çend kaxetên belavbûyî dan ser hev, li Heso nerî û kaxet dirêjî ser masê kirin. Vê jinikê dîsa pantorekî reş li xwe kiribû û xwe nîvtazî girêdabû. Fanêreyekî pêş û paş vekirî, qulqulkî û zere li xwe kiribû. Laşê wê mîna penêrê koçeran sipî bû. Laş û fanêre li hev dixwar. Memikên wê ên mezin û girover wek du hinaran bi hêwana sêngê ve daliqandîbûn. Serikê memikan sitep û qeresî bûn. Şana di coka memikan de mîna ku gul vedabû, sipehiyeke din bi bergeha sêngê dixist, sêng dikir bax û bexçe û difûrand. Lê mixabin gava radibû ser xwe, ew memikên bêhnek berê, bi qama wê a qut ve mîna guhanê bizinan lewliqî bi ser zik de dihatin xwar. Çîmçitikî jî bû. Porê xwe ê reş û gijikî di boyaxa zer de guvaştibû; por kemêl kemêlî bûbû. Ji dûr ve wek tûmê tahliyê dixuya.

Sûretê Atatirk li pişt başçawîş bi dîwêr ve daliqandî û yek jî li ser masa wî çikilandî bû. Ji çarçova sûretê li ser masê ku ji zîv bû, xuya dikir bê başçawîş çendî ji Atatirk hez dikir. Axê bizgûriyan ev çarçove kiribû. Mirêkeke mezin di dîwarê pêşberî derî de bi hosteyî hatibû bi cih kirin. Herçar qiraxên wê bi qeseba sipî nixumî bûn. Di cihekî wek qereqolê û

meqamê komutên de, daliqandina mirêkeke wilo mezin bêisûl dihat. Kî dizane belkî ji bo jinikê bû; belkî jî ji bo ku di mirêkê re li rezalet û perîşaniya gundiyan temaşe bikira û hîn bêtir têketa çav xwe...

Heso bi dengekî lerzok got:

»Begê min, ez şêstî derbas dikim. Di xortaniya xwe de dibe ku min hin gundî êşandibin. Lê bi wî xwedayê mezin sund dixwim, ji sih saliya xwe vir ve hîç nayê bîra min ku min şiqamek bê çi ye, li ebdekî Xwedê xistibe. Em di mala xwe de rûniştî di ser şîvê de bûn û Circîs koma xwe anî ser me,«

Başçawîş dîsa bi şid destê xwe kulmikî li masê xist û çeng bû ser pêyan. Navika wî digiha qiraxa masê. Berê xwe da Hemo û bi zirt:

»Di derbarê bûyerê de tu çi dibêjî bêşeref!«

Hemo jî tam bi dengekî bilind:

»Ben bilmez emce bilir! Ez nizanim apê min dizane« û li Heso nerî.

Bi rastî Hemo mirovekî fêmkwîrî bû, dereng tê digiha. Nizanîbû zû tiştan ji hev bifesilîne; gotinan li gor cih û wext bi kar bîne. Ne zilamê siyasetê bû. Berberçî bû, lê her tim jî winda dikir. Sebeba herî mezin ku Heso ew kiribû cîgirê xwe, li girtîgeha Mêrdînê bi salan pê re raketîbû û bi vê girtinê di civatê de cihekî wî î taybetî çêbûbû. Civata eşîrî ew kesên ku li ser kuştina mêran dihatin girtin, mêr û mêrkuj qebûl dikirin û cihekî bilind dida wan. Digel vî haweyî Heso dîsa jî ne dixwest ku wî bike cîgirê xwe. Di eslê xwe de dilê wî ji Sadiq re dixwest. Lêbelê ji ber ku Sadiq jî ji aliyê exlaqî de li meseleyan dinerî û li gor wî berberî jî bi haweyê exlaqî ne dibû, Hemo kiribû cîgirê xwe.

»Bêşeref ez bi te re dipeyivim, te çi ji apê xwe ye, tu bibêjî!«

Di bersiva başçawîş de gerek dengê xwe hilnedaba. Denghildan bi tenê heqê Başçawîş û eskerên wî bû. Dîsa bi dengê berê:

»Ben bîlmez emce bilir« û di bin çavan re li Heso nerî.

Pirqînî bi jinikê ket.

»Of of bê çiqasî zana ye, tam wek fîlozofan te dibersivîne Mustafa.«

Heso nuh gotinek wilo dibihîst. Xwest ku jinik gotina »fîlozof« bi car bike, lê jinik ji ken nikarîbû bipeyiviya.

Başçawîş tengizî. Çiqasî got ewqasî hêrs bû, bi qasî ku hêrs bû ewqasî jî dengê xwe hilda. Dilê wî elem, mejiyê wî qetran nisiland û rih xwe di elem û qetiranê de guvaşt. Di qelsaya wî de mezinahiya xwe, di belengazî û perîşaniya wî de mêrxasiya xwe dît û xwe di ser masê re çeng kirê. Serikê potînê li masê ket, şêla xwe winda kir û devdevkî çû erdê. Qedeha şerabê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ber bi Heso de pengizî. Ji qiraxa masê dilopên şerabê li hewa mîna çipikên serûmê zelal dixuyan û hêdî hêdî dihatin xwar. Çend kaxet û qelema wî a hibrînî li ser çementoyê di şerabê de şil bûbûn. Nivîsê li kaxetan vedabûn, lê nivîs dihatin xwendin. Sûretê Atatirk pekiyabû wê navê. Sê derzên qalind ketibûn cama sûret. Derzeke jê di ser herdu lêvan re dirêjî guh bûbû; Atatirk lêvduhêlî pêşkêş dikir.

Başçawîş hîç jî pêwîst ne dikir ku xwe di ser masê re biqevizanda. Masê li şibakê dinerî û Hemo jî di nêzîkî derî de sekinîbû. Navbera wan vala bû. Baş bû ku devereke wî ne şikest, yana wê mehkûmê xwe bi lêdanê bikuşta. Hemo bi şiqaman li erdê zîz kir. Şiqaman di rû de dengê demaçê vedidan, pirûsk ji ber çavên wî diçûn. Dema ku başçawîş di meqamê xwe de rûniştibû, ew hîn jî li erdê diqeliqî û baş bi ser hişê xwe ne hatibû.

»Qeprax hevdu bikujin û werin qereqolê! Erê we çima hev ne kuşt!«

»Wilehî begim, emce bilir.«

Dîsa pirqînî bi jinikê ket. Kenê wê wek ê zilaman bû. Mirov zivêr dibû ku pîrek e. Şerabê di qedehê de dilîst û dibiriqand. Başçawîş bi lez gulpek lê xist, dilopek bi ser qutikê wî de niqutî. Di bin çavan re li jina xwe nerî, lê jinikê ne dît. Bidîta jî deng ne dikir. Ji ber ku cilên wî, qîza Zero Hedoyê dişûşt. Serê Hemo nîşan girt û çeqmaqê xwe ê zîpo tê firand. Çeqmaq li defa sêngê ket. Destê xwe bêhemdî xwe avêt cihê derbê. Çeqmaq hesinî û giran bû, sêng êşandibû.

»Lawê qahpikê ez bi te re, ne bi apê te re dipeyivim! Bersiva min bide kûçik!« û ber bi Heso de meşiya.

Şiqamek li patika serî xist. Dûv re lingê xwe ê rastê da bin çena wî. Serê Heso wek çûkê ku mirar here, bi paş de xiliya û çavên wî bel bûn.

»Gapîr, tu di ber xwe de çi dibêjî?«

Bêbextî lê dikir, tiştek ne gotibû. Zimanê xwe dirêjî şikeftika devê xwe kiribû, bi herikandina taximên diranan lêv lebitîbûn, ewqas.

Mejiyê Hemo dernixûm ketibû, berevajî kar dikir. Tirkezaniya wî hemû bûbû »Emce bilir.« Di rastiya xwe de bi desthilanîn û hinekî jî bi tirkî dizanîbû. Eger hişê xwe tam bidayê, wê bikarîba çend gotin bigotana. Gelek caran hatibû vê qereqolê, êşkence dîtibû û başçawîş di pirsên wî de bersivandibû. Bi tirkiya wî a îro helbet wê başçawîş tam hêrs bûba û ew pir biêşanda. Çimkî dê wî ev aliyê Hemo wek serhildanekê bidîta û serhildanê jî wê jîr û zanayî bi xwe re bianiya û textê zilm û zorê bihejanda.

»Bilir emce begim!«

Vê carê jinikê bi ken tam da nav. Pala xwe da kursî, sênga wê belbû. Bêî ku destê xwe deyne ser ruyê xwe, »Aman ya rebî, ev çi insan in!« got û kire tîqtîq.

Şeqên wê bi haweyê ku ji eyar bikevin ji hev vebûbûn. Fanêre bi zor memik hildigirtin. Devê navika di laşê gewr û boz de, mîna reşaya di berfê de tarî dixuya. Zikê wê ê piçûk wek cewdikekî tije av ku tu li ber zarokan deynî, bêwestan dihejhijî. Devê wê bihustekê ji ser hev çûbû, hêsir ji çavan diherikî. Çavan dilîst. Dengê tîqtîqa wê hewşa qereqolê derbas dikir.

Başçawîş piştî ku Hemo bi lêdanê nermijand, gazî berdestkê xwe kir:

»Vî qahpik lawê qahpikan biavêjin zindanê!«

Di hindurê vî wextê derbasbûyî de hîç kipînî ne ketibû Heso. Bi tenê guhdar kiribû. Bêhntengiya xwe ne bi gotinê û ne jî bi qîrkirinê dikarîbû bianiya zimên. Keft û lepta Hemo ew pir aciz kiribû. Dilê başçawîş jê hiştibû û bar li ser giran kiribû. Ma ne ji xwe, ew lepta wî dikarîbû bûba sebebê ku başçawîş xwe biavêta pişt Circîs û feleka herî mezin li serê wî bigeranda. Hemo ben xistibû destê Circîs, bi haweyekî divabû ew ben ji dest bigirta. Pala xwe dabû dîwêr û geft li Hemo dixwarin.

»Gapîr, ma te nizanîbû ku mirov bi bergîlê û çiftê nikare bê hewşa qereqolê? Tu dizanî bê te çi sûcekî mezin kirye, hi!«

»Begê min, wilehilezîm gava ez giham ber devê deriyê qereqolê, min pir zor da xwe ku ez bergîlê ragirim, lê mîratmayê bi a min ne kir û kişiya hewşê. Ez dizanim ku min li himber begê xwe sûc kiriye. Şefqeta te ji nan û avê bêtir ji min û temamê xelkê vê mentîqê re lazim e. Kêmanî ji piçûkan efû ji mezinan, min efû bike.«

Situyê xwe wek gunehkarê ku istixfara xwe dianî li himber tewandibû û xweliya binê zemanan bi serê xwe dadikir. Mirêk tam diket ruyê wî. Çavên wî bi mirêkê diket, xwe tê re didît û dîsa jî ji rewşa xwe tiştek fêm ne dikir. Lê eger başçawîş mirovekî maqûl ba, belkî Heso xwe ewqasî li himber piçûk ne xistiba.

»Vê carê wî efû bike mêrikê min, Mustefê min...«

Destê xwe ber bi Heso vekir û berê xwe da jinikê.

»Xanima min, tu van bêşerefan nas nakî; tu çiqasî rû bidî wan, ew jî ewqasî bêrû dibin. Ev insan in ku ji dola kerê nin. Tu çiqasî ji kerê re bibêjî li sikakê serkulan neke, ew ê dîsa jî bike. Ker ji gotinê fêm nake. Lê gava te di vê bêhnikê de dar lê xist, ew ê serkulên xwe nêvcî bihêle, bireve û tu carî jî nema li wê sikakê serkulan bike« û wek êgir ber bi Heso de herikî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bi rîha wî girt û kişand. Tiliyên xwe wek şûjinê bi kar anîn û di zikê wî de rakirin.

»Hev bikujin û werin vir kûçik. Fîşekê, laşê lawê te şîş kiriye û derbas bûye. Bila we jî lawê Circîs bikuşta û hûn dûv re bihatana vir, kerxanecî!..«

Heso bi van gotinan veciniqî, çavên wî wek du tasan vebûn. »Çawîş çi zû bi vê pevçûna me hisiya? Kê jê re got? Kî hat vir? Ma ji Circîs pê ve wê kî be?« di serê wî re derbas bû. Di dawiyê de xwe ne girt û tena tena axivî:

»Kê çi ji te re gotiye, çewt gotiye.

Circîs û hevalbendên xwe bi êvarkî re êrîşî mala min kirin. Demaçe berdan me, serê çend kesan jî şikenandin û çûn. Lawê min giran birîndar bûye...«

»We rakir doktor?«

»Na begê min.«

»Naxwe lawê te giran birîndar ne bûye tu derewan dikî, kafir! Qahpê Xwedê!..«

Xwest ku bibêje,»Tam teştek xwîn ji birîna wî hat«, başçawîş ne hişt û bi hinc şiqamek li ruyê wî xist. Heso gêj bû. Bi herdu destan bi ruyê xwe girt. Bêhnekê wilo sekinî. Navrana şerwêl di nav şeqan de wek balonekê nepixîbû. Şûna çend dilopên şerabê li ser xuya dikirin. Qotê serê wî ê keçel wek petêxê ku keroş bikevêjin û ro bidêyê, di mirêkê re dibiriqand. Jinikê berê xwe dabû mirêkê, bi devê xwe girtibû û dikeniya. Dengê kenê wê bi xîze xîz dihat. Porê wê ji paş ve wek boçika ordeka ku qarçikî bûbe, belawela û temisî dixuya.

»Begê min ez pir diêşim. Eger tu wilo li min bixîne ez ê ji hal bikevim û nema bikaribim biaxivim. Hinavên min ji qolincan di ser hev re diqulipin.«

Başçawîş mîna nêriyekî bi fal li wê navê diçû û dihat û her ji bêhnikekê şiqamek, pehînek di Heso werdikir. Reqe reqa nalên binê potîna wî di hindurê odê de belav dibû û di guhên Heso de digiha hev. Diricifî.

Bi nermî got:

»Ji benda Circîs bi fîşekê tu kes birîndar bûye?«

»Na begê min«, ew bersivand û ji kûraya kezebê hilmek kişand.

Başçawîş li ser lingekî zîvirî, berê wî ket jinikê. Bi haweyê ku bibêje, jinika min ma filîm xweş bû, tu têrzewq bû? serê xwe hejand û çav kirê. Rû bi rû bêhnekê li hev nerîn. Çavan pir vekirî jinik didan dest ku ji mêrê xwe hez nake û heta nefretê jî jê dike. Çavên wê di çavên wî de dilîstin,

mijankan dikutkutand; awiran hezaza mejiyê wî bizmar dikir, lêvên wê diricifîn. Fûrandina hinavan di memikên guh re dabû der, memik sor û mor bûbûn. Dil dikeland bêhn çikiyabû, bêhnê sêng kumişandibû û xwêzî di kortika qirikê de hiştibû. Eger başçawîş ev rewş neguherta û dîsa berê xwe nedaba Heso, xanima wî bi bazdan wê ji hindur derketa.

»Yanî niha ji malbata Circîs kesek birîndar ne bûye ha?«

»Na, begê min. Me bi wan re şer ne kir, heta ku hin ji wan birîndar bibin.«

Bêî ku lêvên wî ji ser hev herin di nava xwe de keniya. Dûv re ji nişkê ve ruyê wî reş û şîn veda, xwe bi ser de tewand û bi rîha wî girt.

»Tu ê sûnd bixwî ku we bi wan re şer ne kiriye, qahp?«

Ruyê Heso wek ê miriyekî vemirî. Ne li bendî ku wê başçawîş dîsa wilo bi zirt pê re biaxiviya. Him bi rastî herka gotinê jî ne ber bi wir de bû. Wî kêfa xwe anîbû ku ji beşê heqaret û lêdanê derbasî beşê lihevkirinê bûne. Vê siqêfa berî niha tesîreke mezin li ser kiribû. Lê her çiqasî başçawîş pê re bi nermî biaxiviya jî gerek wî pişta xwe jê re venekiriba û kêfa xwe bi gotinên wî neanîba. Her cara ku hatibû vê qereqolê, eynî tişt pê re bûbû. Li gor wî bertîlê kevir dinermijand. Û wî bi xwe jî ev yeka ha gelek caran ji Sarê re gotibû, »A ku çawîş ji me distîne navê wê ne bertîl, xerac e. Zilamê bertîlxwir serê xwe ji mirov re ditewîne. Û ê xeracxwir jî serê mirov dixe bin çengê xwe û bi kulman dadiwişînê. Him distîne û him jî li te dixîne. Sarê, keçê tu çima min fêm nakî! Ez bertîlê nadim lawê qahpê, xeracê ji min distîne, weh!..«

Heso gava di civata pizûriyan de rûdinişt, exlaqê başçawîş û eskerên wî baş tefsîr dikir. Lê mixabin li qereqolê jî hemû ji bîr dikir.

»Ma çawa ez sûnd naxwim begê min. Bi dîn û îman, bi Xwedê û pêxember, bi namûs û şeref û hersê telaqên jinberdanê, me bi Circîs û hevalbendên wî re şer ne kiriye. Circîs koma xwe aniye ser mala min û lawê min di hindur de bi demaçê birîndar kiriye. Circîs bûye afat û xezebê bi ser gund de dirijîne. Em ji destê wî nema dikarin li gundê xwe rûnin…«

»Bes e bes!« li meqamê xwe rûnişt û liblibî axivî:

»Ez dibînim ku tu nema wek berê emirê min bi cih tînî…«

»Haşa begê min.«

»Hiş, devê xwe bigire û guhdar bike bênamûsê heram!

Yek, di meha çûyî de gerek te elokek û perê kavirekî ji min re bianiya. Te neanî.

Dudu, gava eskerên min tên gund, hûn qedir û mahrîfetê nadin wan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Û heta hûn wan ji gund birçî bi rê dikin.

Sisê, hûn bi şev lempên xwe tarî nakin, qaçaxçî xwe li ronahiya lempan digirin û di ber gundê we re derbas dibin.

Çar, ji dêvla ku hûn ixbara qaçaxçiyan bikin û ji me re bibin alîkar, tew îcar hûn wan dihewînin malên xwe.

Pênc, we dilê komutanê hidûd Mehmet Bîçer hiştiye. Bîçer li ser bênderan li hêviya we tibabekî sekinî maye.

Şeş, sîlehên we hene û hûn li sîlehan didin mandelê, sîlehan teslîm nakin.

Heft, hûn bi hev re şer dikin û bi vî şerî hûn min agahdar nakin.

Heyşt, tu bi bergîlê û çiftê tê hindurê hewşa qereqolê û hwd. Ma ez hîn jî bibêjim gapîr, hi?

Neh, we doh şer derxistiye û tu îro tê qereqolê, gerek tu doh hatibûya.«

Başçawîş wê hîn jî bigota, lê Heso xwe di ber re rakir:

»Ez bi xulam begê min, em ji te rûreş in. Lê bawer bike begê min, heftek berê min xwe kar kiribû ku ez bi çend elok û perê kavirekî bi ser te de bihatama, îcar lingê min şikest.«

Piştî ku li jina xwe nerî û qelema xwe avêt nav çavên Heso, bi qahr peyivî:

»Qewad tu di hizûra min de jî derewan dikî! We doh şer bi hev re kiriye û tu îro tê xeberê dide min! Tu nikarîbû bihata lê te dikarîbû qasidek bişanda qereqolê, deyûz!«

Qelem di ser serê wî re xijiqî li dîwêr ket û şikest. Baş bû ku ne qelema hibrînî bû. Qelema hibrînî biha bû. Serikê wê hemû ji zêr bû. Şêxê Tinatê jê re kirîbû.

»Begê min, doh yekşem bû û di şemî û yekşeman de betlane ye. Tu pir kar dikî, me ne xwest ku em te ne rehet bikin.«

»Ulen Heso, bi rastî tu çavê diya xwe yî, te xweş bersiv da. Lê tu derewan dikî...«

Heso wê hîn bigota û bigota, lê başçawîş jî ne dixwest lê guhdar bike. Ji xwe pêwîst ne dikir ku lê guhdar bikira. Çimkî çawa bixwesta wek wî dibû.

Li gor dîtina Heso û eşîrê ji Xwedê mezintir bi tenê tiştek hebû, ew jî »namûs« bû. Pîrek kiribûn namûs, nahtorî lê dikirin û hîç jî qedir û qîmet ne didanê. Vê eşîrê li ser kufiriyên ku bi Xwedê re dikirin hev ne dikuştin, lê li ser ramûsanekê, carina jî li ser awirdaneke bi kirîn qira hev dianîn. Heso di vî warî de namûsperestekî mezin bû. Di kuştina lawê

Necîmê hûrî de gilî li Hemo hatibû kirin û Hemo jî xwe teslîm ne dikir. Başçawîşê berî vî Hasan Firtina, ji bo ku Hemo xwe teslîm bike jina wî girt û bire qereqolê. Hemo xwe teslîm ne kir. Başçawîş serê wê li gwîzên xist û wilo porkur li herêmê gerand. Hemo dîsa xwe teslîm ne kir. Vê carê jî jinik şilfîtazî li hewşa qereqolê bi darê ve daliqand. Hemo xwe teslîm kir. Wê ji fediya û tirsan digot, »Dest navêtine min.« Lêbelê piştî vê bûyerê bi sê mehekî, Sarê bi destê xwe zarok ji ber kiribû. Pir xwîn avêtibû û ew bi miritî rakiribûn nexweşxana Mêrdînê. Sadiq ev yeka ha bi xwe ne xweş anîbû û xwestibû ku başçawîş bikuje. Heso pê re dixeyide û dibêje, »Xem nake lawê min, ne eyb e, esker kiriye! Ji berê de halê pîrekê ev e. Ew ne jina min û te ye, jina şêx, axê û esker e. Hîn jî di civatan de tê gotin ku lêvên wê taştiya şêx, memikên wê firavîna axê û nav şeqên wê jî şîva esker bû. Lê îro şêx û axe ji mazatê ketine, hemû bûye malê esker. Li cihê xwe rûne, şikiriya xwe bîne ku tu zilam çêbûyî û hew!«

Destê Heso ê rastê li ser ruyê wî bû û bi destê xwe ê çepê enîşka destê xwe ê rastê zeft kiribû. Xwînê di ruyê wî de wek tirabêlka navtarên gund reng vedabû. Çavên xwe xistibûn ên başçawîş û li sûretê Atatirkê ku bi dîwêr ve daliqandîbû dinerî. Başçawîş jî digot qey bi rastî li min dinere. Mijankan şelêq girtibûn. Êş û cefa canê wî di çavan re dida der. Çavên wî wek du bizotên êgir sor bûbûn. Xwêhdaneke cemidî bi eniya wî a beş ketibû, dirici fî. Rîha wî mîna hejê kidasê meyl palda bû. Bişkoka êlekê qahweyî a jêr vebûbû. Qiraxa qutikê wî ê gewr ji hêla rastê ve li erdê kom bûbû. Gora di lingê tehenî de şemitîbû, lingê wî bêhn dida. Gora li ser birînê sipî û a di qunderê de jî sor bû. Ji qorziya odê wek dara ziyaretê rengareng xuya dikir.

Başçawîş çixare ji çixarê pêdixist. Dixana çixarê bi ser de kulor dibû û ber bi derî de diherikî. Xanimê Samsun, wî Yeni Harman dikişand. Wê her çiqasî kêm pêxistibe jî di kêşên wê de xuya dikir ku ew ji mêrik qalûnkêştir bû. Dimijand, situyê xwe li hev dizîvirand û bi helk berdida. Kêşên wê pir tesîr li ser Heso dikir, ji destê hilmekê dil diavêt. Ji bo ku xanim hema carekê devê xwe têxista devê wî û di dev de hilmek berda, dikarîbû bi Circîs re li hev bihata.

Heso li jinikê nerî û got:

»Begê min, ji ber vê hewala ku Circîs bi serê me de qewimand, em bi ser te de destvala hatin, bibexişîne. Bi xêr em ê çend rojekî din destdagirtî bi ser te de bên.«

Hesoyê ku pîrek tiştekî basît didît, ji xwe fedî dikir li ba rûniştа û lê

guhdar bikira, di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku vê pîrekê hema gotinek jê re bigota. Bi gotina wê re belkî bayê zilmê hinekî xwe ji ser bida alî û bikarîba bîstikekê serbest rûnişta. Li jinikê dinerî, Sara wî dihat bîrê. Îcar tam di vê kêlîka teng de ji bedêla ku Sarê pê şêrîn bûba, tew pê tahl bûbû. Cinsê pîrekê di şexsê wê de wek ava goleke genî didît. Avê di ku derê golê de çendî bibiriqanda, ew dîsa jî genî bû. Mîna ku di xewnê de bigere, bêserûber keft û lept dikir û xwe di kaş û newalan de werdikir. Ji aliyekî de can dide ku jinik pê re biaxive, çimkî hêviyeke alîgir tê de didît û ji aliyekî de jî bi vê jinikê re temamê cinsê wê dilewitîne. Kî dizane eger jinikê di vî deriyê teng de gotineke xweş pê re kiriba, belkî di şûna jahra ku bi ser pîrekê de dinisiland, bi temamî hingiv binisilanda.

Lê mixabin xanim bergîlî bû. Wê jî wek başçawîş û Heso heqaret li cinsê xwe dikir. Cinsê wê bi şefqet bû. Heta belkî şefqet bi cinsê wê hebû. Xanim ne didît ku zembereka tarîxê di nav duguliyên wê ên mermerî de, di devê deriyê lewh û mahfûz û di navbera herdu lêvên liqûmî de çikilandîbû. Kayinat li ser kelefên wê ên girover hatibû avakirin. Kelefek erş yek ezman bû. Di qelşa erş û ezmanê wê re melayiket, şeytan û xwedan diherikîn bihuştê. Sênga wê bûbû qada şerê Sikenderê Zilqerneyn. Siltanan di bin siha memikên wê de tarîx nivîsandibûn. Pêxember di nav çayira wê de, ew çayira ku misk û ember difûrand, bi pêlên qeymaxê heyvanê wê serxweş ketibûn û di koşka bihuşta wê de raketibûn. Diranên wê ên birincî aqda tarîxê, çermê wê kaxet, bêvila wê qelem, qetra lêvên wê hibir, zulfên wê ên perî tîp bûn. Di gevzeka wê û xwedanan, melayiket û şeytanan de Sokrates afirîbû. Îsa ji ser menbera di hindurê koşka bihuşta wê de pekiyabû. Di çavekî wê re ro di ê din re heyv dihilat. Av ji xwêhdana wê, ba hilma wê bû. Cîhan bi guliyên wê ve daliqandîbû. Mijankên wê bûbûn benê hêlana Emer Heyam. Pira selatê ew burhên wê bi xwe bûn. »Nûr»a ku digotin ji xwîna wê bû; îman di xeleka çaviya erş û ezmanê wê de kom bûbû. Ava kewserê ji memikên wê herikîbû. Lêbelê fêm ne dikir ku çerxa felekê di hindurê bihuşta wê de dizîvirî. Wê bi qîmetê xwe nizanîbû. Helbet di rojekê de ji wê bihuşta wê, dê dilopên xwîn û elemê rawestin û çemê jiyanê li circîs û hesoyan û temamê kayinatê bide der.

Başçawîş zêde êdî tiştekî ku jê re bigota nema bû. Li jina xwe nerî û bi haweyê ku em derbasî beşê pêkenînê bibin, çav dayê û serî hejand. Jina wî jî bi dengekî dilbijok »Erê erê xweş e« got û rabû ser xwe. Di mirêkê li nav şeqên xwe nerî û memikên xwe firkandin. Gava zendê xwe beştekî di

bin memikan re dirêj dikir, serê memikan wek dûvberanan bel dibûn, ku zend dikişand, sêng û zik û memik hemû dibûn yek.

Başçawîş mîna ku ji miftiyê Enqerê re binivîsîne, rahişt qelema xwe a hibrînî û kaxetek wek bilbizêqê paqij danî ber xwe. Destê xwe bilind kir, li Heso nerî keniya û kaxet hejand. Reqreqa qesebê ji kaxetê dihat.

»Heso axa!«

Ev dengekî xweş bû. Ji xwe ji sibehê de li bendî gotineke wilo bû. Mîna ku dinya keşif kiribe, kêfa wî hat û çeng bû. Serê wî li dîwêr ket. Pelqînî ji dîwêr hat. Lêbelê êşa serî hîç ne hat bîrê û bêî ku tiştekî bifikire devê xwe vekir:

»Kerem bike, begê min.«

»Ma tu dixawazî ez ji te re çawa binivîsînim Heso axa?«

»Ji sawcî û hakimê Mêrdînê re tiştekî wilo çivir binivîsîne ku Circîs û Bedran heta sax bin, di hepsê de bimînin. Circîs ji bo ku hizûra insên xerab bike, çêbûye.«

Temamê lebatên wî bi hev şiyar bûbûn. Ew kelax û mejiyê wî ê berî niha ku ji êş û merezê wek rêsiyekî li hev geriyabûn û di bin giraniya zilmê de bûbûn risas, mîna seetê digeriyan. Devê wî ê çatirî bihustekê vebûbû. Herdu lêvên wî wek qayişa êş veziliyabûn, taximên diranan di bin lêvan re mîna tifika miştaxê dixuyan. Gava diaxivî lêv ne digihan hev, taxim ji kontrola zimên derdiket, kufîniya marekî ji dev dihat.

»Hema wilo, ha?«

»Erê erê. Tu li ser wî abanosî çiqasî xerab binivîsînî di cihê xwe de ye, begê min. Ew ne ji xêra ometa Mihemed re hatiye vê dinyayê. Tecal e, Moskof e, Meqeryos e, Durzî ye..!«

»Yaho Heso axa, bi rastî jî îro tu bi min re, wek wan fîlozofên yûnanî ku bûbûn mamostayê Sikenderê Mezin, dipeyivî. Min nizanîbû ku tu miroveki ewqasî bi aqil î!«

Heso fêm kir ku fîlozofî çi tiştekî mezin e. Rîha xwe firkand, keniya û got:

»Ez dizanim ku tu ji qenciya xwe dibêjî, lê begê min, bi rastî jî vî mêrikî heq kiriye ha!«

Başçawîş henekê xwe pê dikir û wî jî di vê kêlîkê de henekpêkirin ji bîr kiribû. Wek serxweşan ji serxwe çûbû û dilê xwe tam jê re vekiribû. Bîr ne dibir ku di bêhneke din de bê ew ê çi bîne serê wî.

»Tiving û demaçên wan jî hene, begê min. Ji kerema xwe re wan jî binivîsîne.«



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ev gotin li hesabê başçawîş ne dihat. Wî û temamê komutanên herêmê dizanîbûn ku gundî xwedî tiving û demaçe ne. Di vî warî de li himber gundiyan devnerm bûn. Eger bixwestana, di bîst û çar seetan de dikarîbûn herêmê ji çekan paqij bikin.

Başçawîş piştî ku got:

»Baş e Heso axa, ez ê wê jî binivîsînim« û qurtek li şerabê xist.

Qurpînî ji qirikê hat, xwe bi ser masê de tewand. Du şûşe şeraba sêzdeh derece û yeklître vexwaribûn û hîn jî serxweş ne ketibû. Li gor Heso, ew her tim serxweş bû. Bi rastî jî tîpekî wilo muxbinî bû ku vexwara venexwara wek xwe bû. Li dîktatoran çûbû, hîç guhertin ne diketê.

»Ha begê min, têkiliya Circîs bi qaçaxçiyan re jî heye.«

Başçawîş bi vê gotinê hîn bêtir aciz bû. Wî him qaçaxçiyên herêmê û him jî ên derveyî herêmê yek bi yek nas dikirin. Ne dixwest ku zû lê biteqîne, lê Heso pir çû bi ser de.

Bi qîr got:

»Heso tu mirovekî tam bêşeref û bênamûs î!« û gazî esker kir.

Emirberiya wî bi giştî Fatîh dikir. Bi gotina wî re wek cin li wir hazir bû.

Dilê Heso mîna pêlên behrê rabû û daket û sêng hejhijand. Dinya careke din bi ser serê wî de xerab bûbû. Qîr û hewaran dê çi qîmet bikira. Xwîn lê vemirîbû. Rîha wî wek sîha pozê zinêr dirêj kişiyabû. Qirikê xuya ne dikir. Serê xwe berdabû ber xwe û bêkip sekinîbû.

»Lawê min esker, vî bêşerefî biavêje zindanê!«

Fatîh bi bazinê destê wî ê çepê girt û li ser hev çend serpozik li qorika piştê xistin. Heso serpiştkî veziliya û wî ew wek mirarekî bi dû xwe de kişkişand. Heso li ber xwe ne ketibû, tirsiyabû. Çimkî gava gewdê wî ê belewela di neqeban de werdibû û diherikî, ay û ûy jê dihat. Ji meqamê başçawîş heta bi zindanê bi haweyê ku mirov Heso bi rahiştin daxista, sê, çar deqîqe digirtin. Lê Fatîh ew bi hilm û pifekê gihandibû ber deriyê zindanê.

Yavuz li vir sekinîbû. Derî ji zû de vekiribû. Piştî ku pelxemek di ser ruyê Heso de werkir, bi herdu lingên wî girt, »Heydê Fatîh« got û cewdikî firandin hindurê zindanê. Barînî bi Heso ket. Derî xiliqandin û bi lez hilkişiyan. Fatîh di derenacan de terpilî, lê zû bi xwe ve giha, ne ket.

»Ê ne ez ê di jina te û hefsed bavê te ...im! Wê qahpika xweha te ez xapandim, yana ji zû de ez hatibûm vir! Ê ne ez ê di te û xweha te ...im! Esker esker were li me herduyan xîne!..«

Qîre qîra Heso digiha heta oda başçawîş.

Başçawîş ji ber ku hertişt bi plan dikir, dizanîbû bûyer jî wê çawa rû bida. Dizanîbû gava Heso û Circîs di zindanê de bîne ba hev, wê qiyamet rabe û ev herdu mirov dê peya bidin ser pira selatê. Di eslê xwe dê vê carê jina wî bûbû sebebê vê yeka ha. Di dorê de gelek gundî hebûn, wextê wî ji vî filîmê henekpêkirina îro re tune bû. Komutanî li ên wek Heso û Circîs dikir û ew wek »kerê « didîtin. Û qereqola wî jî tije »ker« bûbûn. Divabû deqîqeyekê berî deqîqeyekê ew kiribana insan. Lê çi fêde, jnikê xwestibû wan bîne ba hev, da ku careke din di zewqê de bifetise. Başçawîş mecbûr mabû. Nikarîbû dilê xanima xwe li ser gundiyan ji xwe bihişta.

Şensê Heso xerab geriyabû. Jinik kêm kêm dihat gund. Doh bi êvarkî re Farisê nisêbînî ku xwediyê dikana pertel bû, ew bi texsiyê anîbû û îro jî wê Celoyê torî ji Nisêbînê bi texsiya xwe bihata ew bibira.

Jinikê wek ku xwestibû bûbû. Başçawîş Heso û Circîs anîbûn meqamê xwe. Heso li cihê xwe ê nîv seet berê çarmêrkî û Circîs jî hema li kêleka wî a rastê li ser çongan rûniştibû.

Circîs mirovekî hema hema wek başçawîş kwidikî bû. Bi simbêl û bêrîh bû. Çavhûrik û bêvilqulingî bû. Di temenê Heso de bû, lê li ser xwe bû. Berberiya herî bi qirêj dikir û çixare jî ne dikişand. Car caran bêhn dikir û dixist qulên bêvila xwe. Porê wî ne weşiya bû. Heso ji zikê wî ê piş re digot, »Ew kurfê zikê wî hemû ji bênamûsiyê nepixiye.« Bêhnfireh bû, ya jî wilo xuya dikir. Difikirî û digot. Ev aliyê xwe di hizûra komutan û karmendan de xweş bi kar dianî. Lê Heso ne wilo bû, gava zivêr bûba hertişt li binguhê hev dixist. Ji bilî vê jî, mirovekî xwenegirtî bû. Tişt di dilê xwe de ne dihiştin. Gava ne cihê wê ba jî, bêhemdî xwe diteriqand. Heta carekê li Nisêbînê li qahwa omeriyan bi dengê bilind gotibû;

»Berekatê bamidî, danê vê sibehê di qelaçê gundê me de qaçaxa xwe veşart, lo. Îcar yabo, dema ku esker pê bihisin û bibînin, wê me bi muxbirçitiyê bi nav bike. Ma niha hûn bi qedirê Xwedê û pêxember kin, çi gunehê me di vê de heye!..«

Aliyekî Heso î din î ku li gor civakê pîs bû hebû: Sînorê erdên xwe bi ser sînorê erdê gundiyan de diqulipand. Circîs jî ev yeka ha dikir. Heso pir xesîs bû. Qulupandina sînoran belkî jî ji vê xesîsiyê dihat. Dizî ne dikir, lê gava ji malê yekî bikira, wî ne digot nekin. Circîs dizek bû. Zaroyên wî jî lê çûbûn. Di rastiya xwe de hema hema gundiyan hemiyan sînorê hev diqulipandin. Ev yeka ha di civaka wan de tiştekî pir şerm bû. Him şerm didîtin û him jî gava firset lê dianîn, texsîr ne dikirin. Circîs


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

her tim selewat didan, istixfar dianî û rojê carekê jî ya limêj dikir ya ne dikir. Kêfa wî pir ji raketina nav livîna jinê re dihat. Belkî jî ev yeka ha ji misilmaniya wî dihat. Belkî jî ji ber ku jina wî xweha Heso bû, bi axetî difikirî û li jinikê har dibû. Dibe ku ev rastir be. Çimkî jina wî dixwest ku mêrê wê jinekê din ji xwe re bîne, bang dikir û digot, »Haho, vî Circîskî ez şewliqandim! Ji bo Xwedê û resûlê ekrem, ma li vê birekê jin qeliyan e ku yek ji wan nayê nabe jina vî kafirî, yasitar!..« Lêbelê Circîs jî ji bilî wê jin qebûl ne dikirin. Pir dixwar û hindik vedixwar. Heso jî tam berevajî wî bû. Gava li qelêç an li xewleciheкî ba, destava xwe a mezin li ser pêyan dikir û lê dinerî. Xelkê herêmê hemiyan pê dizanîbûn. Lê tiştekî wilo li dor Heso tune bû. Ev mirov di civatan de tu carî ji dil ne dikeniya. Kenekî xayinane dikir. Lêv ji ser hev dibirin û diran diqiriçandin. Diranan di dev de wek ên qoqekî rizyayî pir qîç xuya dikirin. Kêm kêm radiza. Gava radiza jî Heso dixist xewna xwe û bi dengê bilind siqêf pê re dikirin. Di havîna sala çûyî de şevekê xwestibû li ser qesirê razê. Di xewa xwe de dîsa dipeyive û siqêfên kotî bi Heso re dike. Baş bû ku jina wî zû pê re digihê, Heso nabihîze. Ji ber vê kêmaniya xwe, havînan di hindur de radiza.

Başçawîş li ber wan çik sekinî û awir di wan de veda. Xwe daqûl kir. Dûv re serê xwe sê, çar caran hilda û danî û ji nişkê ve bi çenên herduyan girt. Serê wan li bin guhê hev xist. Xuya bû ku zimanê Circîs ketibû ber diranên wî, lêva jêr bi carekê ve kişandibû devê xwe. Ji devê wî xwîn diherikî. Lêbelê qet jî deng jê dernediket.

»Qepraxino, ma vir mala bavê we ye ku hûn pevdiçinin, hi!«

Heso devê xwe tije kir, lê Circîs rê nedayê. Destê xwe ê rastê hilda, mîna parsekan vekir û bi dengekî melûl û melûl peyivî:

»Haşa begê min, ez belengazê Xwedê kî me ku ez ê bikaribim di vî meqamê bilind de, hema gotineke ne maqûl bibêjim. Ez ê çawa bikaribim bêterbiyeke wilo mezin bikim!..«

Eger Heso bi hêrs negota »Başçawîş, ez dixwazim tu li me herduyan xîne«, wê Circîs xwe di bin lingê wî de bikira pûş û pelax.

Başçawîş dixwest ku ne ew li wan, ew xwe bi xwe li hev xînin. Ji xwe ji serî de wî ew xwestibû.

»Çima tu dixwazî ez li we xînim?« got û zikê xwe firkand.

Jinik bi vê gotinê aciz bû. Bi qahr rabû ser xwe û çû ber şibakê. Bêsebir bûbû. Dixwest ku bêhneke berî bêhnekê ev herdu mirov asaqan di hev de bikin û ew jî ji van asaqan zewqê bistîne.

Başçawîş zivêriya wê ji ber çibû zû fêm kir. Rabû ser xwe tif wan kir û qêriya:

»Qahpino, xwe ji lêdanê re hazir bikin! Circîs li pêşiya wî çongan berde erdê!«

Circîs wilo kir. Jinik bi bazdan hat li ser kursî rûnişt û bi çavekî birçî li wan temaşe kir.

»Ez ji we herduyan re dibêjim, min çi got hûn ê wek min bikin temam qûnekino!«

Circîs bi dengekî ji xwe razî:

»Temam begê min, eynî wek ku tu dibêjî ez ê bikim.«

Heso ne li bendî lêdaneke wilo bû. Erêkirina xwe bi hejandina serî nîşan da.

»Yek, dudu Circîs rîhê ji qurm de bigire!« Wî pê girt.

»Bikişîne! Ber bi xwe de bibe û bîne û tif ruyê wî bike û tif ruyê wî bike û tif ruyê wî bike û...«

Circîs ser û ruyê wî mîna ku mar pê de verşe, bi tif û girêz û pelxeman seyand. Jinik jî wek bergîla ku hatibe fal, çaralî xwe dikiland û hîre hîra wê bû. Di vê navê re Fatîh bêhnçikyayî ket hindur:

»Komutanê min, herbî û hebîsî bi tivingan ketine nav hev, du sê kes ji hev kuştine û gelek birîndar hene. Ma em mefrezê derxînin?«

Başçawîş piştî ku bi kêf û ken got »Niha pêwîst nake, lawê min hîn zû ye« û dîsa berê xwe da Heso.

»Bi simbêlê wî bigire, ber bi xwe de bibe û bîne û tif ruyê wî bike...«

Wî jî wilo kir. Lê a wî ne tif, ba bû. Ne xwaribû û ne jî vexwaribû. Ziwa bûbû.

»Circîs çep û rast du şiqaman li ruyê wî xîne!«

Wî pir bi şida sê şiqam pê ve zeliqandin.

»Heso dora te ye îcar!«

Wî du şiqam avêtênê, lê herdu jî hema hema wek ê dijminê wî bi şida bûn.

Xanim ricifî:

»Aman allahim, bê çiqasî xweşik e!« û sivik sivik şiqam li kabên xwe xistin.

Di dawiyê de xwe ne girt rabû ser xwe û ber bi qirdikên xwe de meşiya.

»Hesocigim, bêvilê bi jor û simbêlan bi jêr de bikişîne! Hadî hadî!«

Heso wilo kir. Xanim ji kenan lal bû. Li dor xwe zîvirî, zîvirî û li erdê rûnişt. Herdu destên xwe ji pişta xwe re kirin sitûn. Serê wê paş de xiliya

gazekê şeqên wê vebûn û zincîra pantor xwe berda. Derpiyekî kitanî û sipî lêbû. Patîka wê bi zor dinixumand. Lê dîsa jî hemû xuya dikir. Firêza patîkê mîna ku şevê din eşêf kiribû, tam beyar bû. Ji ken ziwa bûbû, îske îsk dihatênê. Zikê wê ê tazî di helke helk û îske îskan de wek qirika mêsî difisiya û dinepixî. Ji zewqê, laşê wê mîna dara li ber bayê seherê ji xwe re û me re dihejiya. Di deşta sêngê de, cotê memikan xwe dabûn ser hev bûbûn zozan û serê memikên wê ên helezî wek du darên guhîjan di zozên de rabûbûn ezmên. Delava duguliyan di ronahiya royê de dibiriqand. Dil ji ber dikir lavlavk, terbiya mirov xerab dikir. Li ser tewafa hisn û cemala ku di navenda daristana wê de gihabû hev, dîndarê herî mezin jî dikarîbû bûba kafir. Bala Heso kişandibû, ji Circîs bêtir li guhera wê dinerî.

Jinik di zewqê de ji hal ketibû, êdî divabû ev beşê pêkenînê biqediya û dest bi beşê din bûba.

»Circîs rabe ser xwe!«

Rabû ser xwe, di temenê de sekinî û bi hêvî lê nerî.

»Heso dibêje ku Circîs derewan dike. Wî êrîş aniye ser mala min û lawê min bi demaçê birîndar kiriye. Circîs mirovekî fesad, teşqelker û derewker e. Berberiya di gund de hemû ew dike. Ma rast e?«

Circîs bi tirkiyeke têkil kurdî xwe sor û mor kir, destê xwe hejand û bi wahc got:

»Ê hema begim, benden û Heso den derewçîdir, sen de qarisî kerxanede. Temam begim!«

Bi gotina wî re dîsa pirqînî bi jinikê ket.

»Aman allahim, bê çiqasî şêrîn e! Bê çi xweş dibêje of of! De ka dîsa bibêje, bibêje bibêje...« û li wê navê xwe gevizand.

Ji ken çikiya bû. Îcar li sênga xwe dixist û wek serşîrekî bêwestan lingên xwe hildidan û datanîn. Heso lê dinerî û di dilê xwe de digot û dibiland:

»Mala Xwedê ava ku tu di wextê împeretoriya osmaniyan de tune bû. Nebûna te, nahmeteke mezin bû ji bo jar û hejaran. Te yê insan qir kiriba. Na na hema bila heba, wê kîjan siltanî bazda ser vê rûqiraga ha û bi a wê bikira! Tew bi ser de jî navê qîza pêxember Fatimê li xipşê kirine. Ê ne bê çi pêxemberî jê dirije...«

Başçawîş fêm kiribû ku ew dibêje, ji min û wî de heçê ku derewan dike, bila jina wî li kerxanê be. Tiştek li xwe çênekir. Erza wî ne şikenand. Ne ku ne dixwest. Jina wî ji wê gotinê zewq sitendibû ji ber hindê. Gava erza Circîs bişikenanda, dibû ku zewq û sefa jinikê di ber de bima û heta belkî

hizûra wê jî xerab bûba.

Başçawîş piştî ku bi dengekî têr û dagirtî bang kir:

»Lawê min Fatîh, Circîs axa rake salonê« û qurtek li qedehê xist.

Lêvên wî ên qalind wek asfincê şerab dimijand, lêv şil ne dibûn. Bêsimbêl û bêvilşerbikî bû. Birhûyên wî ên qalind, çavên wî ên pisîkî û eniya wî a bel, rû ji bergeh kiribûn. Eger simbêl berdana belkî simbêlan ew qisûr hemû di xwe de veşartana. Lê wî çaxî jî dikarîbû yextiyar xuya bikira.

Fatîh dîsa hat. Bêî ku çawîş ferq bike, awireke bi dilpijokî di jinikê de firand û di cih de çav ji ser guhertin.

»Komutanê min, muxtarê Talatê sersala te pîroz dike. Muxtar du kavir û sê elok anîne, ma ez qebûl bikim û wî berdim?«

Xwe aciz kir.

»Qebûl bike û wî berde! Û heta ku ez meseleya van deyûzan safî nekim, kî hat bila li salonê be, ji min nepirse temam!«

Heso wek evdalekî serê xwe berdabû ber xwe û diponijî. Êşa kelax û qolincên hinavên xwe ji bîr kiribû. Terbiye û exlaq ji xwe hîç erê hîç ne dihat bîrê. Circîs bi emirê başçawîş lê xistibû û tif kiribûyê. Ew ji bo wî ne şerm bû. Başçawîş misilman û dewleta wî jî misilman bû. Û bi dû Xwedê de jî dewlet mezin dihat. Reyisê dînê vê dewletê li Enqerê rûdinişt û mezinahiya wê dipesinand û digot: »Serokhêzê dewletê pêxember û eshabên wî jî esker bûn...« Destê ku pêxember jê kira xwîn jê ne dihat, eshabên ku jar û hejar talan bikirana, xêr û bereket li dinyayê dibarandin. Eskeran qîza wî li hewşa qereqolê şilfitazî kiribû û dest avêtibûnê. Li gundê wî, heta li temamê herêmê, gelek caran qûna pîrekan di feleqan de belot kiribûn û bi »namûs»a wan lîstibûn. Ev hemû ji bo wî ne şerm bû. Ew ji malên wan derdixistin, dikuştin û termên wan diavêtin nav mayinan. Wawîkan termê kekê wî Cibran xwaribû û wî jî lê temaşe kiribû. Ew ji bo wî ne şerm bû. Dewleta wî a misilman wilo xwestibû. Jop radabûn hinavên wî û di devê wî de mîztibûn. Eskerên dewleta wî wilo emir kiribûn. Pîsî dabûnê û wî jî li pêş temamê gundiyan ew pîsî xwaribû. Rihê wî di bin nalên hespên emewî û ebasiyan de perçiqîbû û vê perçiqandinê tesîr l ser ne kiribû. Ketibû taya ku gelo wê başçawîş li pişt wî an li pişt dijminê wî bisekiniya. Ev ji bo wî girîng bû. Başçawîş Circîs rakiribû salonê, ev ji bo wî elameteke ne xêrê bû, gerek ew rêyî zindanê kiriba. Ji aş û baş digot û ditewirand:

»Gelo Circîs çiqas pere dane başçawîş? Çi jê re gotiye heta ku bûye

hevalê wî? Min li himber wî çi qisûr kir gelo? Min hinekî li jina wî nerî, nebe ku ji vê zivêr bûbe? Belkî jî ji ber ku ez di eynî rojê de ne hatime gilî, ji min zivêr bûye. Gerek min bi a wê qahpika jina xwe ne kiriba û ez di cih de bihatama vir. Ha, dibe ku Hemo ew zivêr kiribe; kûçik lawê kûçikan zimanê xwe daqurtandibû. Na lo, ew jî dizane ku Hemo ne tu gû ye. Wey erê bi Xwedê, min fêm kir bê çima başçawîş ji min zivêr bûye! Ez doh di hizûra Bîçer de ne maqûl peyivîbûm. Him ma ne wî jî gotibû ku me dilê Bîçer hiştiye. De na lo, Nisêbînê li ku û qereqola Stilîlê li ku; ma bû cin ku hema wilo zû ew gotin pê re gihand. Min di derekê de miheqeq çewtî kiriye, çi ye ew çewtî? Ji ber wê çewtiyê ye ku başçawîş, Circîs nêzîkî xwe digire. Ez gunehkar im, gunehkar im!..«

»Heso axa!«

Heso veciniqî û serê xwe wek ê dîkan rakir. Ji kêfan re dikir bifiriya. Eger baskên wî hebûna ew ê miheqeq bifiriya.

»Kerem bike, begê min.«

»Berî ku tu bersiva min bidî, dev û ruyê xwe paqij bike.«

»Ser herdu çavên min« got û bi herdu destan çakêt bi ser serê xwe de bilind kir. Çakêt reş bû. Mêrdînkî hatibû dirûtin. Serpişt di pembo de nepixî bû û berstik jî bi qasî qûşa hespê pan bû.

»Îşev tu ê li zindanê mêvanê min bî, ez wilo dixwazim temam!«

Di ruyê wî de guhertin ne bû. Ew ruyê wî ê çaroxî, kêfa dilê wî ê reş dida dest. Şevekê, du şevan, sê, çar, pênc şevan, mehekê, du mehan di zindanê de maba wê çi biba. Başçawîş jê re gotibû »Axe, tu mêvanê min î.« Ew bes û heta zêde bû jî. Eger komutên ji serî de wilo jê re gotiba, ji dil û can û bi rojan wê qîma xwe bi wê qeşmeriya berî niha bianiya.

»Gotin a te ye, tu çawa rê lê bibînî, helbet wê wilo bibe begê min. Tu serê me yî û em jî lingên te ne, em bi mezinahiya te hene. Îcar begê min, eger min di hizûra te û xatûna xwe de qisûrek filan kiribe, min bibexişîne.«

Heso ji Circîs jîrtir û zanatir bû. Gava difikirî û digot, dizanîbû bibêje. Eger hema hinekî bi insaniyeta xwe werqiliya, ew ê serê xwe di ilim de biêşanda, belkî bûba fîlozof û Circîs hedayet bikira. Bi aqil bû, îcar ji ber ku aqilê xwe hemû di xerabiyê de bi kar dianî, bûbû bêaqilê herî mezin.

»Fatîh Heso axa bibe zindanê.«

Zindan bi qasî oda başçawîş mezin dihat. Çarçikî bû. Firehî û dirêjaya wê tam pênc metro bûn. Di şûna pencerê de, bi tenê kulekeke caxkirî di dîwarê bakur de hebû. Kulek li erdê rûniştibû, ya jî li erdê dinerî.

Hindurê wê tarî û ewqasî jî sar bû. Mişkan di asasê dîwêr de seranser qul çêkiribûn. Di bin reşaya zindanê de devê qulan wek devê top û metralyozan vebûbûn û xof didan! Hindurê wê tije pîsî û cendekên mişkan bû. Bêhna pîsiyê, mişk û mar û miriyan di bin zikê zindanê de doran girtibû. Gava ba xurt dihat, bi lez bin zikê zindanê dialast, wek mijê xwe berdida jêr û di hindur de digeriya. Binê zindanê ne betonkirî bû. Ji ber wê bêhna zinix, mirov nikarîbû serî rakira. Nikar kewşikî bi ser axê dakiribûn.

Havînên vê zindanê bi qasî xeta mayinên ku dilê welêt felqe felqe kiribûn, tehlûke dida. Dûpişk hebûn. Maran di kulekê re xwe berdidan hindur û mişk dixwarin. Di vê zindanê de ji sala 1926an û heta niha, sêzdeh gundî miribûn. Ji bilî sê kesan, bi ên din hemiyan jî mar vedabû. Başçawîş û komutanan gava qesda kuştina gundiyekî dikirin, ew havînan diavêtin vê zindanê û heta ku mar pê venedaba, dernedixistin. Gelek haweyên wan ên kuştinê hebûn. Bi darên hindurê newalê û hewşa qereqolê ve bi roj û şevan insan daliqandî hiştine heta ku can dane. Di sala 1932an de gava »Eskerê Lîwa« serê axê omeriyên mahmûtkî Eliyê Ehmed û malbata wî jê dikin, tînin vê qereqolê. Çewalê ku ji seriyan dagirtibûn, pênc seetan dixin devê kaniya Elî Mercê. Avê di xwînê de sor vedabû û çem dabû ber xwe.

Mezinahiya zindanê dibe ku bi we hinkî balkêş bê. Di pevçûnên gundan de, carina temamê gundiyan digirtin û garankî dixistin vir.

»Lawê min Hemo, li xwe hayî be, marin bi te venedin, ha!«

Heso di nîvê zindanê de rûniştibû. Heyecan ji ser çûbû. Lebatên wî hêdî hêdî bi xwe şiyar dibûn û di tayê de dixewirîn. Canê wî diêşiya, diricifî.

»Apo ez şipya me, tişt bi min nayê, ez ji te ditirsim. Ranezê, haş xwe bike.«

»Xwezî xewa min bihata lawo, lê wê çawa di nav hêsîriya vê kûçkaniyê de bê! Na lo, hewcenake ku mirov xwe ewqasî bitirsîne. Zivistanan mar ji qulên xwe dernakevin.« Xwest ku bibêje, ma ji xwe mar di kulekê re tên û di vê qefaliyê de wê mar nikaribe bê«, ji nişkê ve veciniqî, lingê xwe ê birîndar bi hinc li erdê xist, »Kuro hat hat!»û tevxircilî.

Wî digot qey mar e, lê cerbohek bû, xwe li bêhna mûyê dohnkirî û gora hirî girtibû. Devê xwe avêtibû serê tiliyan. Bêhnekê wilo bêdeng sekinîn. Dûv re têgihan ku êrîşbaz ne mar e, mişk bûye.

»Hemo ma tu dibê, wê lawê qûnekê jî bînin vir? Gava min anîn vir, ew jî biribûn salonê.«

»Wilehî çi zanim, dibe ku wî bînin û dibe ku wî neyînin jî. Mirov tiştekî ji van bêbavan fêm nake. Geh dost in geh dijmin in, geh dikenin geh digirîn...«

»Ka bise bise! Ma tu dibê, wê çawîş destê wî bigire?«

»Bi qasî ku min ji rewşê fêm kiriye, çawîş xwe daye pişt wî.«

Bi zirt got:

»Bes e bes!« û ponijî.

Li gor wî Hemo ne tu dûnde bû. Karê vî mirovî her tim gotina dawî di pêşî de û a pêşî jî di dawî de digot. Lê Heso jî dizanîbû ku ev ne zilamekî hofkgerîn e. Çiqasî ponijî ewqasî ricifî, kete tayê û laş lê giran bû. Xwedî tecrûbe bû. Di cihê teng de mirov çawa dikarîbû bi nezanan bişêwiriya! Wens tiştek bû û şêwir tiştek bû. Ev hemû li aliyekî, tew îcar canê wî bi carekê ve diare, hindur wek qeşê sar e û ew ê jî biponije. Moral jê re lazim bû û bi hêsanî jî dikarîbû ew moral çêkira. Di civatê de henekçiyekî temam bû, herkesî bi heyran li devê wî dinerî. Bi rê de bûbû mitirb, devê wî ne diket hev. Li hindurê qereqolê bi textê Xwedê digirt û dihejand. Di cihekî wilo talûke de bêdengî mirin bû.

»Apo apo, çima deng ji te biliya?«

Apo deng ne kir. Ew bi bazdan hat ba wî û li ber çong berdan erdê.

»Apo ma tu pir diêşî?«

»Ha, te got çi?«

»Min got tu çawa yî? Ma tu dixwazî ez laşê te bifirkînim hi?«

Xwe veparimand û keser veda. Bêhna wî bi zorê derdiket.

»Na na, ez wek bivir im. Erê kuro, ne te dît bê wê qahpikê çi dikir. Ê hema bi telaq ew rojê tabûreke esker berdide ser xwe.«

Hemo ne ji dil keniya. Kenê wî ne xweş bû. Dengê zîxanan dida.

»Miheqeq.«

»Na na, miheqeq çi ye îcar! Bi şêxê erdê li Bexdayê, tam wilo ye. Ez ji pîrekê fêm dikim. Erê, ne te ne dît, bi dû te de hertiştê xwe berda meydanê! Ew bû lo, hindik mabû ku bibêje, de werin. Tobe estexfîrulah, ya rebî me dîsa devê xwe herimand.«

Hemo rabû ser xwe û li dor xwe nerî. Mîza wî dihat. Li hindur piçûk, mezin destav qedexe bû. Lê çûna qedemgehê jî qedexe bû. Ji bo vê yekê derî vedikirin.

»Min dixwest ez avekê birjînim. Ma ez li derî xim, tu çi dibêjî?«

»Bêfêde ye lê ka dîsa te divê xwe biceribîne.«

Hemo tibabekî li derî xist. Fatîh hat. Zeraqa deriyê hesinî vekir û bi

hêrs got:

»Çi ye, qûnek?«

»Min bibe qedemgehê.«

»Serê xwe bi vir de bîne pûşt!«

Wî serê xwe ber bi zeraqê de bir. Fatîh pêşî tif kirê, dûv re şiqamek di nav çavên wî de şelpand, bi hinc zeraqe girt û çû.

»Aha te ev divîbû ne wilo. Hizra te ji qebheta te mezintir bû.«

»Îcar ez ê çawa bikim?«

»Çawa tu ê çawa bikî, her derê vê zindanê qedemgeh e, bike bila here. Bersiva lawê qahpikê yanî dibêje te, bi xwe de berde, tu çima fêm nakî, weh!«

Hemo di qorziya aliyê başûr de bi ser qula mişk de berda. Sê, çar mişk bi hev re ji qulê bazdan û xwe li nav lingê wi qelibandin. Hemo bêserî, çep û rast û paş û pêş bilindbû û li wê navê çû û hat.

»Te bi ser lawên ca

mêran de kir, ne wilo? Ma lawo te nizanîbû ku vir dergahê wan e, tu bi ser dergah de bimîze, wê ew jî li xwe biqewimînin. De xwe tam biherimîne«, dikeniya û digot.

Bi rastî ev zilam ji weqehetan pê ve bi kêrî tiştekî ne dihat. Qulên mişkan xuya dikirin, li qulan dinerî û li xwe hayî ne dibû ku bi ku de berdide.

»Erê, ew te çima li ba yarê gonê digot ‘Ben bilmez emce bilir hi?’ Kuro ma min wilo ji te re gotibû allahummessabirîn! Tu dizanî bê ev a te, bû wek a kê? Bû wek a Gepoyê Qadê. Mêrik gava li civatê rûdinişt wek ku kevirek rûne bêhis û pis disekinî. Yanî tiro xwe giran û kemlan dikir, hi. Wî digot qey gava mirov ne kene û ne peyive camêrî ye. Min ew hînî ken kir. Lê xwezîka min ne kiriba, diziriya kuro! Me ew hînî ken kir, lê me ne got bizire bavê mino! Îcar a ku te îro kir, eynî bû wek a wî zir kerî...«

Herdu jî dikeniyan. Hemo ji dil, Heso ne ji dil dikeniya.

»Apo, ê hema bi Xwedê ez ji desthilanîn ne ketibûm, lo.«

»Ehmeq ku dibêje ez ji desthilanîn ne ketibûm, wilehilezîm ji tirsan qûn li te qetiyabû. Devê te ketibo hev, bavikê mino. Te hertişt bermeqlûb fêm dikir. Te tam wek Ehmed kir, ma bi tirtirê ye, qey. Ehmed jî li mehkemê mîna te kiribû. Golikê ji dizan dikire û gava xwedî derdikeve jî lê asê dibe, bê çi xweş e. Îcar gava ku hakim pê re dipeyive, devê wî wek ê te dikeve hev û ji hertiştî re ‘inek ogli’ dibêje. De were û nekene. Tiro him nizane ku bi tirkî navê golikê çi ye û him jî xelkê radike mehkemê.

Lo hema ez çavê wî bixwim, eferim jê re, mehkeme tije 'inek ogli inek' kir û dev jê berda.«

Xwe aciz kir, destê xwe hejand û bi hêrs dîsa got:

»Erê, te çima ji yarê diya me re tiştekî wilo wek a Ehmed ne got! Hema te jî bigota ben bîlmez bergîl bilir. Ma ne qaşo em bi bergîlê hatibûn qereqolê. Çima te hertişt diqulipand situyê min, hi? Hakim jî mîna başçawîş ji Ehmed re gotibû 'navê te çi ye' û wî jî di bersiva wî de 'inek oglî' gotibû. Erê Xwdê ji te razî be, te çima ne got, navê min bergil ogli ye ku Circîs li te siwar bihata. Tobe ya rebî estexfîrulah!..«

Hemo wek pûtekî sekinîb

û. Li ber xwe diket. Ji xwe kezeba wî kul bûbû û Heso jî ha ha xwê bi ser kezaba kulkirî dadikir. Berî hertiştî vir ne cihê hesabsitendinê bû. Carina tam wextê gotinêye, lê cih ne cihê wê ye û carina jî cihê gotinê ye lê wext ne wextê wê ye. Vî zilamî digel wêqas berberiya ku kiribû hîn jî nizanîbû serê van herdu benan pev girêda. Piştî gotinê bi xwe dihisiya ku ne baş kiriye. Qenc xerab tiştekî xwe pê re ne digirt. Dewlemend gava miriyekî dibînin bi xwe dihesin ku mirin heye û ew ê jî rojekê bimirin. Îcar di wê bêhnikê de istixfarê bi Xwedê tînin û çend xêratan dikin. Heso jî gava gotina ku ne a gotinê ba û digot, dûv re bi xwe dihisiya û istixfar dianî. Wek dîkê ku hêkan vexwe, gotin li ser gotinê diherikand. Dilê wî li hûrê wî çûbû. Du, sê seetan gotinê xwe pê re ne digirt. Li ser vê yekê ew û Sarê gelek caran ketibûn qirika hev. Sarê jina wî bû, helbet wê xwe jê re tazî bikira, xwe bi dest ve berda û heta serê wî jî bişûşta. Di nav livînan de çi bikira bi ro li civatê digot. Li gundê wî û heta li temamê herêmê herkesî dizanîbû ku sê şanên niçikî di zikê Sarê de hene. Hûto wek mirovekî devvekirî didît û henekê xwe pê dikir. Lê di rastiya xwe de Hûtoyê mezin ew bi xwe bû. Ji aliyekî de ewqasî dilvekirî û ji aliyekî de jî ewqasî zikreş bû. Du tiştên ku hîç wê nikaribana li hev bikira tê de gihabûn hev. Derewê bi xwe rih piçûk dikir û rê li teşqelê, teşqelê rê li diziyê, diziyê rê li bêbextiyê, bêbextiyê jî rê li temamê xerabiyan vedikir. Mirovekî gava derewîn ba, bi rehetî dikarîbû bûba maka xerabiyê...

Seet li dor çaran bû. Gavên berê dewaran dabû gund. Ji weşa garanê xuya dikir ku di nav vê garanê de ne hesp û ne jî bergîl hebûn. Gavên garan ragirtibû û ji kêş dewaran bêçêre xwe berdidan. Dengê reqe reqa kevirên ku ji ber lingên wan dipekiyan, di hêtên zindanê de disekinî. Çêlek dioriyan. Ba xurt dihat, xwişînî bi daran ketibû. Ew çûkê ku çend seet berê li ber derî, beton ditiktikand qet ne hat ber vê kulekê. Dengê

zarokan ji xwe hîç ne dihat. Mêşek, heta pêşiyek bê çibû, li vê zindana ku di pîsiya zilmê de hatibû seyandin, tune bû. Mar û dûpişk hebûn. Lê li dojehê jî eynî ev mexlûq hebûn. Dojeh di bin heft tebaqên erdê de bû û bihuşta ku navê wê »Cenetil mawa« bû, di xwezaya erş û ezmên de sekinîbû. Li dojehê maran jar û hejar dixwarin û li bihuştê jî amirhêzan di mêrga horiyan, yanî dîlberan de borana şehwetê radikirin. Heso jî istixfar dianî û selewat didan. Bîr ne dibir ku li dojehê limêj, selewat û tekbîr û xêr û xêrat wê derbas nebin. Ew di dojehê de ye, bihuşt jî hema li ser wî ye û dîsa jî nabîne. Bihuşt bi dengê hoqeboq û kêf û seyrana dîlberê dihejiya. Û Heso jî zorî dabû tekbîr û selewatan. Li mala xwe tu carî ewqasî xwedayî ne bûbû. Li vê herêmê ji wî bêtir kesek bi islamê û xwedayê wê danediket. Û li vir jî dibû misilmanê herî mezin.

»Apo çima dîsa deng ji te nayê?«

»Ez limêja ku îro li min çûbû qeza dikim.«

»Xwedê qebûl bike.«

»Amîn.«

Di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku çayidanekî çayê vexwara û bi ser de tam qutiyeke tûtina Xursê bikişanda. Ji malê bi hesabê ku wê di zindanê de çixare bikişanda, kîsikek tûtin û çend defter pel anîbûn. Dizanîbû ku li zindanê çixarekişandin qedexe ye, lê wî digot ez ê bi pereyan vê yekê safî bikim. Wek wî ne bûbû. Di eslê xwe de ku ev, ew ê gund ba, dikarîbû gelek tişt safî kiribana. Heyvanê mêranî û jîr û zanatiya ê gund li dor nema bû. Wî bi xwe di civatê de her roj digot ku bêpevçûn ne tarîx meşiyaye û ne jî tu kesî tiştekî herî basît safî kiriye, heta ku em dev ji berberiyê berdin û nav xwe û Circîs safî bikin. Dîsa wî digot, »Jin bi exlaqê xwe ê xweş dibe xatûn û mêr jî bi mêrxasî û ciwamêriya xwe dibe axe.« Lê mixabin li vê derê jî bûbû pûş û pelax, di nav qirêj û gemara binê zemên de dişewitî û bi avdohnka wî laşê xwe ê genî, rûpelê tarîxa xwe dilewitand.

Şingînî bi deriyê zindanê ket. Mirovek kişiya hindur. Circîs bû ev. Çawa ku hat, bêmefer kîsikekî cawînî ji bêrîka xwe derxist, li ber dîwêr xwe daqûl kir û kîsik da ber qûna xwe. Bîstikekê di vî halî de ma. Piştî ku bi devê kîsik xwe paqij kir, kîsik li hev pêça û ber bi kulekê de meşiya. Cebila ku kiribû di kulekê de danî û ji dijminên xwe dûr, pala xwe da dîwêr.

Cebila ku kiribû, bêhneke pir genî berda hindurê zindanê. Bayê ku distendin hemû di vê kulekê re dihat. Heso xwe zêde zêde zivêr kir!

»Bêşeref, ma em mirîşk in ku em guyê te bêhn bikin hi! Zû here wî gûyî

ji wir rake!«

Circîs ber pê de meşiya û got:

»Bêşeref lawê bêşerefan tu yî!..«

Hemo fikirî û da ber hev. Li gor adetên eşîrî, li mirovekî wek Circîs yextiyar xista, şerm bû. Îcar di cihekî wilo teng de ji xwe hîç çênedibû. Pir şerm dibû! Xwe mecbûr dît ku têkeve navbera wan. Heso nexweş û rûniştîbû û siqêf pê re dikirin. Ê din jî wek keftarekî li ser xwe bû û wî jî habela siqêf pê re dikirin. Rû bi rû bûn. Lê di bin reşaya zindanê de ruyê hev ne ditefsilandin. Eger di şûna vê reşayê de ronahî ba, belkî ji hev fedî kiribana û ew gotinên kotî bi hev re ne kiribana. Helbet Hemo wê ew zeft bikira, êrîşî ser Heso dikir.

»Kûçik lawê kûçik min zeft neke!..« û şiqamek avêt Hemo.

Dîsa li gor adetên wan ên eşîrî, Circîs jî gerek siqêf bi bavê Hemo re ne kiribana. Bavê wî miribû. Ew kesê mirî çendî dijmin bûba bila bûba, kesî nikarîbû siqêf pê re bikirana. Pir şerm bû! Cezê wê kuştin bû.

Hemo:

»Ji bavê min re xeberan nede!« got û dahf dayê.

Bi dahfa wî re serê Circîs li dîwêr ket, serî piçekî zelhitî. Xwînê cihê zelhitî hema hema şil kiribû.

»Esker, begê min! Esker, esker min dikujin haho haho!..«

Fatîh û Yavuz zû bi wan ve gihan. Ji xwe dizanîbûn ku wê tiştek biqewimiya. Li ser mêrdewanên jor rûniştibûn û li wan guhdarî dikirin. Bi lez û bez hatin û zeraqe vekirin. Circîs li ber zeraqê bû. Bi vekirina zeraqê re peyivî:

»Begên min, van herdu eşqiyan li min xistin û serê min şikenandin. Eger hûn min ji vir dernexînin wê min bikujin. Ez di bextê we de min zû ji nav lepên van cenewaran derxînin...«

Eskeran derî vekirin. Derî bi zor vedibû. Ji zîqîniya zîlanê xuya dikir ku derî bi qasî temenê qereqolê kevin bû. Fatîh bi çepilê Circîs girt û di nav xwe re hilkişandin jor. Hemo jî ji qorziya zindanê li wan dinerî. Di vê navê re jî du cerbohan mîna ku li ser xwarina kurkê Heso nakokiyek ketibe nav wan, bi şîqe şîq di hev re difiriyan. Bêhnçikyayî yek dihat vî alî û ê din diçû wî alî, li hindama Heso xwe çeng dikirin hev, bilind dibûn û dergûşkî li erdê diketin. Ji ber lingên wan zixurên nikarê mîna saçmeyên çiftan kulmikî dipekiyan û xurt bi hêtên zindanê ve dihatin xwar. Heso hema hilmekê be jî, bi pevçûna van cerbohan Circîs ji bîra kiribû û rihê wî ê perîşan azat jiya bû.

»Lawê min Hemo, ez baş tê ne giham ku wî teresî ji wan teresan re çi got. De hema hewce nake tu ji min re bibêjî, insanê ku şipya bi xwe de berde, ma tu ê hêviya çi jê bikî. Ha lawo Hemo, li xwe hayî be, dikarin te bibin. Ma tu ê çawa li xwe hayî be. Ez jî bi rastî carina wek zarokan dipeyivim. Em di destê wan de ne, em malên wan in, em ji bo wan hene, em kolên wan in, em xulamên jinên wan in, em mehkûm û xwîniyê Circîs in! Ê ne Circîs, ê ne Circîsko ne bi xêr eger ez ji vir derketim, bila Xwedê ji min û te re kerîm be û hew!«

Panzdeh, bîst deqîqe ne ketin wê navê, dîsa deng bi derî ket. Heso veciniqî. Hemo di cihê xwe de sar bû û xwe bi ser hev de guvaşt.

»Lawê qahpikê Hemo were!«

Heso devê xwe tije kir ku bibêje, »Min jî pê re bibin û asaqên ku hûn ê di wî de bikin di min de jî bikin!« Lê başçawîş hat bîrê, gotin daqurtand. Tiştekî din got:

»Lawo Hemo mêr be, xwe li ber lêdanê bigire, ay ûy nebêje da ew bênamûs bi te nekene« û di cihê xwe de wek hêlanê hejiya.

Eger bi Hemo re derketa û sênga xwe ji lêdanê re vekiriba, başçawîş wê bi vê yeka ha paş de gav biavêta û xwe nedaba pişt Circîs. Ji ber ku wî a ku xwestibû kiribû û dor zîvirîbû ser sitendina pereyan. Wî bi xwe digot, »Herçi komutanên hidûd, başçawîş û eskerên wan hevalên pereyan in.« Û pir jî pere pê re hebûn. Digel wêqas xesîsiya xwe jî ji Circîs çavfirehtir bû. Li qereqolê başçawîş her gav ew anîbûn ba hev û bi haweyê ku li hev zêde bikin pere ji wan sitendibû. Di vê li hevzêdekirinê de Heso jî her tim li Circîs zêde kiribû. Bi qeweta pereyan dikarîbû li xwe biqewimanda û bi Hemo re derketa meydana êşkencê. Ji bo ku lêdan hinekî ji ser Hemo kêm bikira, dikarîbû ji eskeran re bigota Circîs hûn anîne lîstika xwe û ew derewîn derxista. Di tûrikê wî de gelek bersiv hebûn û bersivekê jî nade. Başçawîş ne gazî wî, gazî Hemo kiribû ku êşkencê lê bike. Di vî warî de rabestineke wî a piçûk, dikarîbû bûba sebebê ku başçawîş li ba Circîs sef bigirta. Wilo difikirî.

Fatîh û Yavuz, Hemo bi dû xwe de kişkişandin û avêtin hindurê zindanê. Li dor nîv seetê lê xistibûn. Bi zor xwe li ser lingan digirt. Ditewtihî, xwe bi dîwêr digirt û dimeşiya. Xwîn ji devê wî dihat. Kulm li çenê xistibûn argûşkên wî diariyan. Dilê mirov bi halê wî dişewitî. Pêşî di hindurê salonê de baş lê siwar tên, dûv re meydangirî ketûber wî didin ber hev û dûv re jî wî dixin felaqê. Digel ku bi daran binê lingên wî teqandibûn, dîsa jî kirpînî ne ketibûyê. Ev ne ji ber mêraniyekê û filan û



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bêvan bû, Circîs li himber wî sekinandibûn ji ber hindê. Felaqe zor bû. Lê ne bi qasî xwepiçûkkirina li himber Circîs zor bû. Bi dû lêdana çend daran de, binê lingan wek pelê sîrê tenik dibûn û kezeb dikişiya. Gava ku ling di xwînê de dixiliyan û hîn jî lê dixistin, te digot qey ling û kezebê cih bi hev guhertibûn êşek dijwar dida! Bikira hewar hewar belkî ewqas lêdan ne xwariba. Belkî jî hîn bêtir bixwara, çimkî ên ku lê dixistin, mirovin çavsor bûn. Ev çavsor bi dengê qîr û hewarên wî dikarîbûn serxweş bûbana û ew jî wek Qadirê talatî bi êşkencên ecêbnedîtî bikuştana. Gava naziyan bi yek tûşê re deh hezar deh hezar cihû diavêtin firinan, qey wan insanan ne kiribûn hewar hewar! Zarok ne giriyabûn! Îcar yextiyar ne dinaliyan! Çavên dayikan xwîn ne dibarand! Jinên ducan hîç ne zûriyabûn, ha!..

»Hemo tu pir êşandin, ne wilo?«

»Berberî ye ev apo, divê em qîma xwe pê bînin.«

»Rast e divê mirov mêrxas be. Li himberî dijminê xwe bi qasî pola qewîn û ewqasî jî zalim be. Çîçika dijmin bê çi ye, gerek mirov sax bernede. Bi sîlehê herî mezin gerek mirov Circîs û zarokên wî bikuje. Gerek kinêsa vî zilamî bi carekê ve bitefe!..«

Ji kîn û nefretê hinavên wî di ser hev re diqulipîn. Kefa destê xwe ê rastê tije nikar kiribû û diherifand. Rîha wî di bin reşaya zindanê de qîr vedabû. Cerboh ketibûn bin kurk, kurk dikelpitandin û wî jî serê Circîs dikevajd.

»Ma tu çi dibêjî, em hinekan ji wan bikujin? Ha tewra, eskeran digot ku doh Bedran jî li vir bû.«

»Na lo, ew jî li vir bû ha!«

Bêhnekê ponijî û ji nişkê ve got:

»Rast e rast, derengî şevê bû kûçik li tara jêr direyan. Doguj bi haweyê ku wan bidire diajot ser. Ez bi xuşûş ketibûm ku hin ji wan ji Sitilîlê dihatin. Doguj bi derewan ne direya. Zeriya jina min yanî xweha Circîsko dîsa ez xapandim û me ew reyandin ne kir tiştek. Ha, te got em hinekan ji wan bikujin?«

»Erê.«

»Ne bi tenê hinekan, hemiyan hemiyan! Û ez ê derkevim mehkemê, hertiştî têxim situyê xwe. ku ne wilo be, em ê tu carî ji wan kûçikbavan xelas nebin. Lawê kûçik hindur tije Circîs kirine, yekî ku bi kêrî ometa Mihemed bê di wan de tune ye. Ha, lingên xwe germ bigire ku zêde ne werimin û jan nede. Bimeşe, sekin pîs e. Ma wekî din çi ji te kirin?«

Ew ditirsiya ku jop xistibin destava wî.

»Pêşî çend kulm û şiqam û pehîn û dûv re jî felaqe.«

»Yanî bi tenê ev, tiştekî din ne bû, ha?«

»Na, bi tenê ev asaq di min de kirin.«

»Xem nake lawo xem nake, em ê vê tirê jê re nehêlin...«

Dê hîn gelekî bigota, lêbelê ji nişkê ve qêriya:

»Eeehew kuro mêrikan min dixwin, were bi min ve!« û kurk firand ber dîwêr.

Hemo bi lez hat pê ve.

»Ka li ku ne?« got û li dor zîvirî.

Heso keniya:

»Kuro lawo çi li ku ne, mişk bûn reviyan û çûn, weh!..«

Hemo rahişt kurk, Heso pê re xeyidî:

»Bihêle bihêle! Bi telaq eger îşev ew kurk li ser min be, çi mexlûqên ku di vê zindanê de hene, wê ji qulên xwe derkevin û bi tifaq êrîşî ser min bikin. Howeh li vê ecêbê, heta bi teban jî bûne dijminê min! Îcar lawo ewêtullah, bihêle bila ji wan re be. Ew jî zekata qu... jina Circîs. Bihêle!..«

Ji xwe gerek ji pêşî de ew kiriba, kurk biavêta ji cerbohan re ku canê xwe ji dest wan xelas kiriba. Cerbohên vir gornebaş bûn. Û ev herdu jî birîndar bûn. Ji Hemo bêhna xwînê û ji lingê Heso jî bêhna mirinê difûriya. Bêhnê cerboh har kiribûn. Eger ne wilo ba, cerboh mîna mirîşkan ewqasî bêrû ne dibûn.

Heso vê carê jî herdu destên xwe bilind kirin, li bin zikê zindanê nerî û nerî û bû tîqtîqa kenê wî.

»Xwedê xêr bike apo, ka bibêje miheqeq xweş e.«

»Erê niha tu bi qedirê Melekê Tawis kî, ew çibû a ku îro me kir!«

Hemo guh bel kirin:

»Kîjana ku me kir?«

»Erê ew çi aqil bû!«

Vê carê jî mîna ku wî bêisûliyek kiribe ji xwe tirsiya, guhê belkirî hîn bêtir bel kirin û situyê xwe ber pê de dirêj kir:

»Çima qey dîsa min tiştekî ne li rê kiriye?«

»Erê, hela me ew kund kuşt lo, îcar çima me ew çirand û ji pirtik kir! Ka qaşo wê oxira me hilata, kulîmekên me wê di doşekê de bisinciriyana û sitû bi ser zemberîşan de bixiliya. Ka qaşo wê çawîş di dest me de bûba hevîr. Aqilê me li ê pîrekê çûye. Me ê îmana xwe bi kuştina teyrikekî kamil bikira, hi! De di nav îmana mişk û mar û dûpişkan de bigevize! Te


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ew reben çirandibû, birako. Ma wê çima ne çiranda yabo, ji bo ku tam oxira wî hilata divabû ew çilvirî bikira...«

Heso lê germ bûbû û zebaniyan jî li wan guhdar dikirin.

»Erê kuro, lawo ewqasî jî bêbavî nabe, ha! Lawê tirê, doza qaçaxçiyan li min dikir. Eger gava ew bixwazin, di bîst û çar seetan de dikarin qaçaxçiyên vê dinyayê hemî bigirin. Qaçaxçiyên mezin ew bi xwe ne. Qaçaxçî bi wan qaçaxê dikin. Qaşo eskerên wan bi şev û ro di tabiyan de ne û nobetê li hidûd digirin. Di destê wan de sîlehên herî mezin hene. Ji bilî vê jî cêbên wan, doc, panzêr û helîkopterên wan hene. Û di destê mêrê qaçaxçî de jî, ya çiftek ya jî tivingek heye. Qomandar û general bi rêya qaçaxçiyan tev bûn lord...«

»Heso Kaplan, komutan te dixwaze meqamê xwe!«

Heso di bin germa rivîna gotinan de bêî ku Circîs bê bîra wî, bi hinc destê xwe li erdê xist û got:

»Dixwaze dixwaze yanî çi! Ez têm! Temam! Heydê!«

Bi qahr rabû ser xwe. Lingê tehenî pê re hilnanî, kumişî û li ser çarlepikan ber bi derî de herikî. Hemo xwest ku têkeve ber pala wî, lê ne hişt. Fikir dikir ku dora êşkencê hatiye wî û gava Hemo pê re derketa jorê, dê careke din êşkence bidîta. Bi ser de rabû:

»Tu li cihê xwe rûne û mitala min neke!..«

Esker ketin çep û rastê wî û hêdî bi hêdî hilkişiyan. Heso heta ku negiha meqamê başçawîş jî, hîn tê ne gihabû ku wê êşkencê lê nekin. Circîs li cihê ku berî seet û nîvekê hev pîs kiribûn, li ser pêyan sekinîbû. Heso hinekî ji wî dûr ber bi şibakê de dan rûniştandin. Dûv re jî li ser emirê başçawîş Circîs rûnişt. Xanim çûbû qedemgehê, bêhna parfûmê ewqasî ji odê ne dihat.

»Heso axa, pêwîst nake ku ez mezbeta gilîkirinê ji we re binivîsînim û we rêyî mehkemê bikim. Li meydanê ne kuştî ne jî birîndar hene. Eger birîna lawê te giran ba, dibû ku min tiştek kiriba, lê tiştekî wilo cidî ne qewimiye. Îcar vê carê, ez we efû dikim û hema niha jî we dişînim gund. Ma gotineke ku tu bibêjî heye?«

Heso bêhnekê poniji. Axavtina wî li hesabê wî ne hatibû. Ma ne ji xwe, di vir de Circîs qezenc kiribû. Him lawê wî birîndar kiribû, him berî wî hatibû qereqolê û him jî li qereqolê li wan xistibû. Gotinên başçawîş ji bo Circîs şîr û şekir û ji bo wî jehra silêmanî bû. Qebûl neke, wê komutan êşkencê lê bike û bi mezbeteke xerab wî bi ser hakiman de bişîne. Dikarîbû xwe li ber êşkencê bigirta, lê dîsa jî wê tiştek bi dest nexista. Ji

ber ku hakiman bi tenê li îfada ku başçawîş dinivîsand temaşe dikirin û biryar didan. Îcar a herî xerab, başçawîş wê çavreşî biavêtayê û heta ku li vê qereqolê ba jî li ba dijminê wî cih bigirta. Qebûl bike, di bin Circîs de dimîne û wê Circîs bêtir lê har bibe. Aliyek tahl, aliyek no ye. Ji no û tahl divabû yek bixwara. Wî a tahl hilbijart. Herdu destên xwe ber bi başçawîş de bilind kirin, lê bêî ku li xwe hayî bibe, destên wî ber bi Circîs de dirêj bûn, destan tam ew işaret kir û wî got:

»Qomandarê me û ê mentîqê tu yî, helbet em ê ji gotina te dernekevin, tu çawa bixwazî, bila wek te be...«

Başçawîş ji destên wî kuribî.

»Helbet ez çawa bixwazim wê wek min bibe, yanî tu dixwazî çi bibêjî!«

»Bibexişîne begê min, dibe ku min xweşik ne gotibe û te jî çewt fêm kiribe. Ez jî eynî wek te dibêjim. Temam temam, yanî tu çawa bixwazî, wê wilo bibe.«

Heso tam ji moral ketibû, di vê bêhnikê de ne dixwest bipeyive. Gava ku xanim ji qedemgehê hatibû, li wan nerîbû û beşişî bû, wî ji xwe hîç lê jî ne nerîbû. Heso fêm kir ku gihane dawiya meseleyê. Circîs pereyekî mezin daye başçawîş û ew qanih kiriye. Êdî divabû wî jî xeraca xwe bida û deqîqeyekê berî deqîqeyekê ji vir bireviya. Destê xwe dirêjî bêrîkê kir, bi hemd du kaxetên pênc sed pênc sed kişandin.

»Begê min ev jî xelata te« got û li xanimê nerî ku xanim ji dest bigire. Porê xanim şil bû, şeh jî ne kiribû. Di rûhinarkê wê ê çepê de mîna ku hinekan ew gez kiribe, keweke niqir niqirî xuya dikir. Sênga wê sor û mor bûbû. Cilên wê dîsa ên berê bûn.

Başçawîş jî nema dixwest ku bi dû meseleyê bikeve. Circîs du hezar û Heso jî hezar wereqe dabûyê. Pereyekî gelek bû. Motorsîkletekî jawa bi sê, çar hezarî bû. Heqê motorekî bi yek tûşê re rakiribû. Di dorê de herbî û hebîsî hebûn û hev kuştibûn. Ji wan jî bi kêmanî wê heqê texsiyeke reno bistenda; piştî du rojên din wê ji Zorava sê, çar elok, du beran û çar berx wek diyarî jê re bihatana. Ji temamê herêmê gundî dihatin sersala wî pîroz dikirin û elok û pez jê re dianîn. Wî jî bêî ku wan bibîne û xêrhatinê di wan bide, li salona qereqolê heta ku navê wan li ba xwe qeyd dikir, di temenê de dihiştin. Navê ên ku mal ne qulipandibûn pereyan, bi qelema sor lêdikir. Ew jî ji bo ku di cara din de bike pere û bîne.

Xanim mîna ku başçawîş ne li vir be, xatûnkî rabû ser xwe û tena tena meşiya. Tiliya xwe a dirêj û nîşanê lebitandin, meqeskî kir û bi hêdî dahişt pereyan. Heso jî mîna ku bi siltanan re mezin bûbe, xwe nepixand

û bi haweyekî kubar ew destê xwe ê qilêrî, dirêjî nav tiliyên wê ên zer û maşikî kir.

»Kerem bike xatûna min« û awir li memikan veda.

Xatûna wî jî bi haweyê dildaran laşê xwe ricifand, »Teşekkurler Hasocigim« got û heta ku li ser kursiyê rûnişt bi wî haweyî meşiya.

Heso çavên xwe ji ser danegerandin. Dil ketibû memikan. Di rewşeke azad de, hema deqîqeyekê, li mêrga memikan temaşe bikira, ji sedî sed wê pê xweş bihata. Ji şewlaqê devê wî girêz diherikî.

»Heso axa êdî tu serbest î, xwe bide ser hev û bi rê bikeve. Fatîh, Hemo ji zindanê derxîne û wî û Heso bişîne malê.«

Heso û Hemo wek du pîrên nod salî dan ber hev û ji qereqolê derketin.

Ro ketibû zerikê, ji çiyê xuya ne dikir. Li jor ewr li hev diciviyan û bi ser Sitilîlê de diherikîn. Ewrekî reş mîna konekî xwe li ser gund vedabû û ji cihê xwe ne diqeliqî. Çûk lûsiyabûn, kûçikan ne direya, dewar ne dihoriyan, ji gasînan pêjina insên ne dihat. Sipîndarên ku ji dûr ve newal û çiya kiribûn yek, bi bê re direqisîn. Xuşîniya çem di reşaya newalê de li jêr dengê bilûrê dida û wilo diçû û diçû.

Hewşa qereqolê derbas kiribûn û gihabûn qorziya kolanê.

»De ka bisekine« Heso got û ji dûr ve li qereqolê nerî. Devê xwe vekir, ji kûraya kezebê keserek kişand û kezeb bi bayê azadiyê nepixand. Canê wî bi qasî ku derman fêdê lê neke li hev geriyabû. Di nav reşaya zindanê de bi qîmetê azadiyê baş dizanîbû, lê gava xwe azad didît îcar qîmetê azadiyê bi qasî qirşikekî jî li ba ne dima. Di tengayê de bi qasî ku Xwedê dihat bîra wî, di fireyê de ewqasî ne dihat bîrê. Di demên tengayê de ku xwe bêçare didît, bi qasî ku êrîşî Xwedê dikir, ewqasî jî medet jê dixwest. Çiqasî di xwest ku bi rastî Xwedê heba û li halê wî bipirsiya...

Qereqol di roavayî gund û di berpala çiyê de ava bûbû. Li hewşa qereqolê ji zixurên bestan kilskirî bi tîpên mezin hatibû nivîsîn ku tirkek himberî dinyayê ye! Tirk esker çêdibe! Tirk bahoz e! Dîsa ji zixurên rengareng boyaxkirî sûretê eskerekî bi tiving hebû. Sûret bi qasî dêwekî mezin dihat. Qezetore li serê tivingê xistibûn û ji serê qezetorê jî xwîn dinisilî. Di bin dara tuyê de ku ji vê darê re digotin »Dara Şenaqê«, heykelê Atatirk li ser pêyan çikandîbû. Heykel mezin û reş boyaxkirîbû. Di bin reşaya ewran de wek xeyaletekê bi xof xuya dikir. Atatirk destê xwe ê çepê danîbû ser kêleka xwe û destê xwe ê rastê bilind kiribû. Tiliya xwe a girdikê û qilîqîçanê girtibû û bi sê tiliyên xwe ên vekirî mîna ku tiştek rave dikir, sekinîbû.

»Lawo tu dizanî bê ew bênamûsê Atatirk bi wan hersê mîxên tilêyên xwe ên vekirî, dibê çi?«

»Na.«

»Guhdar bike. Ew teres dibêje ku li vê qereqolê yek namûs, dudu şeref, sisê ûjdan tune ye. Min ev hersê tişt li vê qereqolê qedexe kirine.«

Wê hîn bigota û bibilanda, lê Hedo wek gule di ber wan re derket û rast xwe li qereqolê girt. Wî berê xwe da Hedo.

»Ha ha zeriyê! Xwedê xêr neke, bi ku de! Keçê xatûnê çawîş, qomandar, esker ha ha qaçtî, qoydî, çiqtî!..«

Hedo tibabê neh, deh metroyan ji wan dûr sekinî, bi haweyê xwe Heso bersivand û bi lez ket hewşê.

* * *

Berberiya xwe bi xwe zimanê mirov kin û ê dijmin jî dirêj dike; mirov piçûk û dijmin jî mezin dike; ew pê xurt mirov jî pê qels dibe. Wilo li Heso û Circîs hatibû.

Heso û Hemo şeva xwe li mala dostê xwe Şaqûlo derbas kirin. Bi danê sibehê re Heso bi terempêla Qurmo ku rojê carekê diçû Nisêbînê û Hemo jî bi bergîlê, hatin malê. Circîs jî peya dabû ser rê û berî herduyan gihabû gund. Rêya terempêlê di navbera Sirêçkê û Zorava re dirêjî ser rêya Îpekê dibû û şifêr jî Heso li hindama gund di duryana rê de peya kiribû. Besta gund bêpir bû û çem jî diherikî. Terempêl nikarîbû dageriya gund. Navbera cihê Heso û gund pênc sed metroyek hebû. Hewa niha wek a ku doh ji malê bi rê ketibûn. Hinekî sura bê zêde bû ewqas.

»Ya rebî de ka îcar safî bike, ez ê bi vî halî çawa xwe bigihînim gund! Ji bo hin bên bi min ve, ez bang bikim wê hûrî qeşmeriyên xwe bi min bikin, ez bang ne kim û li ser çarlepikan herim, wî çaxî jî ez ê bibim qirdikên wan. Ez bang bikim nabe ez bang nekim dîsa nabe, baş e ez çi bikim, hi?«

Li dor xwe nerî ku cihekî bi talde bibîne û lê rûne. Çep û rastê rê bi nihîtên mezin rapêçayîbûn. Pala xwe da nihîtekî, berê xwe da gund û bêhnekê li ser lingan sekinî. Dûv re kurkê xwe ê ku cerhoban bi carekê ve wek seradê qulqulkî kiribûn, li xwe pêça û rûnişt. Erd avî bû, bin wî şil bû. »Wey Xwedê ji min ne razî be!« çeng bû û bêhna xwe teng kir. Çend kevirên yeklepî ji derdora xwe dan hev, di bin xwe de rast kirin, li ser wan



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rûnişt û vê carê jî bi xwe keniya:

»Min mejiyê xwe xwariye, bi telaq terî ji min kêm e. Ma ne ji xwe, çaraliyê min tije kevir in û ez jî di nav heriyê de rûdinim. Piştî ku heta bi mûyên qûna min şil dibin, ez ji nuh ve bi xwe dihisim û li keviran hayî dibim.

Min dizanîbû wê wilo bûba, gerek ez berî Circîsko biçûma qereqolê. Min bi a jina xwe kir, wey xwelî li serê min be ku ez jî zilam im. Ma mirov bi a pîrekê dike! Circîs bi wê qamka xwe em hemû xapandin. Yanî niha min çi ji vê çûna xwe a qereqolê fêm kir ez nizanim! Circîs him demaçê berda me em birîn kirin, him çawîş kire hevalê xwe li wir jî li me xist û him jî ji me ne hat ku em giliyekî bikin. Na na, ez ê nikaribim vê bênamûsiyê daqurtînim. Wî ne derbek, du, sê derb pev re li me xistin. Ez nikarim vê tirê jê re bihêlim...«

Heso ji dûr ve bi nihît re bûbû yek. Gava xwe dilebitand ji gund dixuya ku mirovek di talda nihît de rûniştiye. Eger li ser nihît rûnişta, wê ji gund ferq bûba û heta belkî ên wek Zibêr û Miho ew nas jî kiribana. Sarê ji doh êvarî de çavrêyî lê kiribû. Car caran derketibû ser xênî û ji hêla çiyê de li Sitilîlê nerîbû. Sitilîlê diket bakurê gund. Di gava ku Heso li duryanê peya bûbû, ew sê caran hilkişiya bû ser xênî. Eger hema serê xwe piçekî ber bi roava de vekiriba, wê Heso bidîta.

»Wey bi Xwedê ew dengê Sarê ye, dîsa êrîşî ser kê dike gelo? Ez bawer nakim ku tu esker filan hatibin gund. Ma bû çi, hema her roj bigirin ser gund! Em ne Eliyê Betê û ne jî Eliyê Ehmed in ku em mala xwe û wan li topekê xînin. Ha dibe ku qançorçî bin, dîsa pere pir xwestibin û Sarê bi wan de pijiqî be. Qançorçiyên çi kuro! Çar, pênc sal in ku dewra wan rabûye. Ha temam, ev qolçî ne. Qey dîsa wek wê salê Xelefê me yê kasûlî, qutî dirêjî destê wan kiriye û xwe bi girtin daye. Û Sarê jî li xwe qewimandî ye. Bi rastî min aqilê xwe xwariye, qolçiyên çi! Qolçitî ji zû de zû de rabûye, bavoo. Ê erê naxwe ev jinik, bi kê re pevdiçine?..«

Serê xwe rakira û li gund bineriya, hewce ne dikir ku dîsa peya bida nav sitiriyan. Circîs best û best ji Stilîlê dihat û gihabû ber gund, Sarê jî xwe ji gund berdabû pêşiya wî û gotin pê re dikirin. Piştî ku gundî derdikevin ferca Sarê û Circîs û koma pîrekan li ba darên tuyan dicivin, Heso nuh di meseleyê de digihê.

»Eferim Sarê, lêlê pîrê tivingê berdêyê! Wî bikuje bikuje!..« Kurkê xwe li ba dikir û diqêriya.

Pevçûn bi kêrî wî hatibû. Gundiyan ew dît û bi xar pê ve çûn. Temo û

Miho berî Zibêr û Xelef gihan ba. Zibêr ji hemiyan bi aqiltir derketibû. Wî ker bi xwe re biribû.

»Ehmeq, hey te ker anîbû, îcar te çima kurtan lê ne kiriye. Ez ê çawa li vê kera tazî siwarêm, hi!«

Zibêr:

»Ji şelûpela ku li gund rabû, min xwe ji bîr kir...«

Heso xwe zivêr kir, bêî ku bizanibe çi dike, bi hêrs gopal di zikê kerê rakir, ker tengijî û çep û rast da lotikan. Qêrînî bi Temo ket, bi sênga xwe girt û di cih de rûnişt. Kerê lotikek li ser çiçika wî a rastê xistibû. Baş bû ku ker bênal bû. Zibêr hişk bi benê ku di situyê wê re derbas kiribû girt, pê re xeyidî ker sekinî.

»Zibêr, ma ker şemûs e?«

»Wilehilezîm min rojekê ne dîtiye ku vê kerê bi vê ecêba niha, wilo lotik avêtine!«

»Yanî tu dibêjî ez siwarêm?«

Miho:

»Erê apo erê, siwarê tişt nabe...«

Ker, hûrik û şînbozî bû. Hîç ne li gor Heso bû. Heso li kera tazî siwar kirin. Lê bîr ne birin ku kurkê wî têxin bin; di kurk de pêçan. Zibêr bi serê kerê girt, Xelef xwe da pişt kerê, Temo û Miho di kêlekan de dan ber hev û ziqitandin kerê. Lingên Heso hema hema ji erdê bilind bûbûn. Ji dûr ve dişibiya derwêşên ku bêerbane li genim digeriyan. Ji nêzîk de jî dişibiya bûka baranê. Lê ji ber ku xêliyan li tenekê ne dixistin, îcar dibû wek potikê nav bîstên.

Zibêr bi haweyekî cidî:

»Ma çawa çû apo?«

Ne wextê pirseke wilo bû. Divabû bigiha malê bêhna xwe berda, bixwara, vexwara, bi Sarê re rûnişta û dûv re ev dabaş vebûya. Di vê bêhnikê de Sarê difikirî. Bêriya wê kiribû...

»Wek quzelqurtê çû!« ew bersivand û lingên xwe li kerê hejandin.

Zû gihan besta gund. Çem bi hêdî diherikî. Heso cesaret ne kir ku bi kerê li çem xîne.

»Temo rahije min û min ji çem derbas bike...«

Temo ew li pişta xwe kir. Di nîvê çem de sekinî. Guhikê çefiya Heso gihabû avê. Zibêr tev li şekalê bi lez da nav çem, guhikê çefiyê hilda û guvaşt. Destekî xwe da pişta Heso jê re kire senede û bi destê din jî bi zendê Temo girt. Ji ber ku ev çem seraqet ne diherikî kevir ne şahîk û ne jî kefz


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

girtibûn. Bêî ku bişemitin bi rehetî çem derbas kirin. Pizûriyan mîna ku bûk dihat gund piçûk- mezin herkes ji malên xwe derketibûn û li wan temaşe dikirin. Sarê haziriya Heso dikir; jê re goştê kavirê ku du roj berê ser jê kiribûn dibiraşt. Şîva wan a îro serûpê, hûr û rovî bûn. Şîv li gor dilê Heso bû. Eger Sarê bizanîbûya ku wê Heso bi sibehkî re bihata, ew ê şîv bi sihorê re li êgir kiriba.

Heso wek generalê ku di şer de winda kiribe, di nav koma pizûriyan re bêî ku xêrhatinan bibersivîne, serê xwe berda ber xwe û derbas bû.

»Temo bizixitîne kerê!«

Temo bi a xwe kir, ne zixitandê. Gerek Heso li devê deriyê hewşê paya bûba, peya ne bû. Ji kerê daneket heta ku ne çû ber dika odê.

»Kuro pîro, ji wê kerê dakeve, ma qey tu ê wê biajo odê, weh! Bê çi pê nakeve, ew zir qelafetê ha û ev kerka hûrik. Hema te xwe hinekî ragirta, sê, çar bergîl di gund de hebûn me ê yek bi te ve bgihanda...« Sarê li bin beragirkê li ser lingan sekinîbû, pê dikeniya û diaxivî.

Heso bêî ku ji kerê dakeve û tiştekî jê re bibêje, wek ku gur li mîhê binere bêhnekê lê nerî û bi hêrs destê xwe bilind kir:

»Temo zû min biavêje odê!«

Ker cefilî, hindik mabû bikeve, Temo ew zeft kir:

»Xwedê ji te razî be yabo, hêdî hêdî, te xwe kirî dîsa têwerkira« û bi lez rahişt bavê xwe.

Zibêr û Miho bi dû wan de bêhnçikyayî xwe avêtin hindur. Lê di wê navê re jina Miho hat, ew xewle kir. Bêhnekê kirin piste pist û dûv re jî çûn malê.

Heso rêwîtiyeke ne xweş kiribû û li qereqolê zilm lê bûbû. Sarê jî piştî ku Circîs dîtibû, rewşa ku Heso li qereqolê ketibûyê texmîn kiribû. Destek cilên bin çekan, qutik û kirasek danîbûn ser milê xwe û li ber Heso sekinî. Heso xwe li ser doşekê serpiştkî palda bû. Bîr ne biribû ku şekala xwe derxîne. Temo ji xwe hîç tiştekî wilo ne hatibû bîra wî. Heso qundera xwe di doşekê de dibir û dianî, doşek di heriyê de mabû û Temo jî lê temaşe dikir. Piştî ku Sarê bang kir, »Qîza min Meyro, misînek ava germ, sabûnê û leganekê bîne«, berê xwe da Temo:

»Kuro lawê kerê, tu çi wilo wek bertelaşekî li wir sekiniyî, zû were qundera bavê xwe ji lingan bike! Heso ka rûne ku ez cilên te biguherim...«

Heso dîsa lingê xwe ê seqet û saxlem têkil hev kirin, lingê seqet hilda û bi şid li erdê xist.

»Off yabo!« bi pêxêla Sarê girt, »Bela xwe ji min veke!»got û dahf dayê.

Sarê serqûnkî ket, şahra wê a rawanî ji serê wê pekiya û biskan wek dahfikên kewan xwe bi ser rû de berdan. Porê xwe ê belek şeh kiribû. Li ber xwe ket, lê tişt li xwe çênekir. Bi hemd şahr danî ser doşekê. Kitana xwe da ser hev û por bi kitanê nixumand.

»Heyran ez dizanim ku tahde li te hatiye, lê divê tu bêhna xwe fireh bikî. Dinya fireh e, Xwedê mezin e. Çerxa felekê geh li jor geh li jêr e. Îro ji wî re xweş ket, sibe jî wê ji te re xweş bikeve. Bêhna xwe fireh bike ez qurban...«

Sarê pîrekeke têgihiştî bû. Baş dizanîbû ku eger ew Heso qanih neke, wê Heso ji niha û bêhneke din li gund şer derxîne. Îcar di destê wê de sîlehê wê ê herî mezin ku temamê aliyên xwe ên pîrekî li himber wî bi kar bianiya. Di vê gavê de ji Heso re aliyê wê ê mêranî pêwîst ne dikir. Û wê jî dizanîbû. Kul û derd û êşa ku Heso wê di sê, çar mehan de bikişanda, di sê rojan de lê gihabû hev. Mejî û hinavên wî helhilî bûn û wek hêtûnê rivîn didan. Sarê melhema canê wî bû. Bi karanîna aliyê xwe ê pîrekî, bi kêmanî hema dikarîbû, rivînan ji êgir bike û şewta gund bitexirîne. Jin gava zana be dikare tesîreke mezin li ser mêr bike. Heso ji Sarê re her tim digot, »Jin şeytanê mêr e. Jin dikare mêr bike balon, dikare dapiçîne, dikare bike wezîr û dikare bike rezîl jî. Keçê Sarê, zû min bike wezîr ku ez fermana vî Circîsî rakim...« Eger di vê civata heso û circîsan de cihê pîrekê bi qasî ê zilêm hebûya, civata wan ewqasî serxweçûyî ne dibû. Ji ber ku li vî gundî hema hema temamê pîrekan xêrxwazî dixwestin. Gelek jinên ku wek Sarê ji mêrê xwe hez dikirin hebûn. Agirê xizaniya ku li canê wan dilîst û can dişewitand, ji mêran bêtir didîtin. Zarokên ku ji destê feqîriyê nexweş diketin û bêdoktor û bêderman li wê navê can didan, dilê dê ji ê bavê bêtir xencer dikir. Jin di navbera mêran de dara ziyaretê bûn. Bi qeweta jinan, di nav zilaman de dikarîbû pevgirêdaneke bi dostanî çêbûba. Lê mixabin dînê wan, bi carekê ve rê li pîrekê girtibû. Hertişt erê hertişt xistibû destê zilêm. Te digot qey ew dînekî ku ji bo zilaman çebûbû.

»Weh çawa Xwedê ne mezin e, me mezinahiya wî li qereqolê dît, hi! Bi telaq ew ji bo ku feqîran pîs bike heye!«

»Pepû pepû, de were û îcar safî bike! Heso jî ji min re bûye feqîr! Hey agir bi malê keto, ku tu feqîr bî li vê dinyayê feqîr namînin...«

Sarê cilên wî jê dikirin. Di ber re jî laşê wî difirkand. Destê xwe di ser serê wî re dibir û bi rîha wî dilîst.

»Ê ne kalo tu bi xwe nizanî gava tu van kufiriyan dikî, bê tu çiqasî şêrîn

dibî lo. Henekê xwe bi Xwedê û tiştê miqedes neke. Hinekî bêhna xwe berde«, destê xwe danî ser zikê wî dewisand û dîsa bi haweyekî devliken axivî, »Hinavên te reş bûne, dew vexwe, mast û nîvişk bixwe. Keçê Meyro, ji kalo re zû qêtix werîne!«

Sarê çi tiştê ku ji dest dihat dikir, lê Heso hîn jî haş ne dibû.

»Ka qaşo birayê te ne çûbû Sitilîlê gilî, zikê min ji kîn û bixzê reş û ê Circîskê te jî sipî bû ha!..«

»Tu dizanî kalo ez dibêm çi, kuro ne be ku ev Circîsê me ewliya be! Me hemiyan çavdêrî li ser rê û mêyên gund dikir, herkes lê bûbû nahtor û kesî jî ew ne dît ku ji gund derket. Baş e ne ewliya be çi ye naxwe, hi?«

Heso di nava xwe de keniya, lê wek a di nava xwe de ne got:

»Erê erê ewliyatî jê dirije, qamboncîkê heram. Ew ewliya be, ez jî pêxember im. Ma min ji te re ne gotibû ku mêrik niha li Sitilîlê li ba çawîş rûniştiye?..«

Sarê ew ji guherê hildikişand sirtê û wî jî hîç ne dixwest ku ji guherê derkeve. Lêvên wî ji lêdanê terişî û werimî bûn. Nêm girtibûn. Peşkên xwînê li ser qutikê wî vedabûn.

»Kalo ev çi xwîn e? Lêvên te terişî ne, ne be ku wî teresbavê çawîş li te xistibe, hi!«

»Na, ez bi zarêşê ketime. Hîn ez li malê bûm devê min kul bûbû...«

Dev û lêvên wî ji ê Hûto jî saxlemtir bûn. Li xwedanetanî lêdana ku ji başçawîş xwaribû ji Sarê re bibêje.

Di şevên zivistanê ên reş û tarî de ji bo ku xwe wek nihîtekî mêran bi Sarê bida qebûlkirin, radihişt tivinga xwe û xwe berdida berqefên binya gund. Bi seetan li ber baranê û wê serma dijwar rûdinişt. Di bêhnika ku wê bihata malê, îcar xwe di heriyê de dida û dida û xwe şil û şepa dikir. Dûv re jî ji Sarê re digot:

»Bi qelaç û qelaç ez çûm heta Atxê, ji wir hilkişiyam şikeftên Zivingê, ji wir jî dageriyam besta Bamidê û best û best ez hatim heta duryana Dêrê û Cibiltînê. Howeh li vê ecêbê, ez ewqasî îşev geriyam û geriyam, min ne pêjina insanekî û ne jî a tebayekî kir!..«

Sarê jî jê re sobe dadida, cilên wî diguhert, wek zarokekî li ber destê wî diçû û dihat, ew difirkand û dûv re jî xwe şilfitazî dikir û laşê xwe bi carekê ve jê re serbest berdida. Ma ne ji xwe, ji xezwê hatibû. Heso bi wan kiryarên xwe, Sarê bi mêraniya xwe serxweş dixist, û ew jî bi kelaxê Sarê re serxweş dibû. Di vê kêlîkê de xwe li ser perên ewran hîs dikirin. Ji Sarê re digot, »Keçê di vê bêhnikê de gerek em perda dînê Mûsa û Îsa û

Mihemed biqetînin û bibin wek Adem û Hawa. Heyat ev bîstike, bîstika ku çû nema tê. Ez û tu divê ku em ji hev têr têr bibin...« û di her der wê radikir.

Meyro misîn, legan û qalibekî sabûna benkan li ber doşekê li ser çementoyê danîn. Misîn mezin û sifrînî bû. Bilbilîneka wî li gor ên bafûnî hinekî bi jor de bû. Qalibê sabûna ku anîbû hîn bi kar ne hatibû. Destmaleke sor li ser milê wê ê rastê bû. Fîstanekî şîn li xwe kiribû. Porê xwe bi lefahiyeke belek nixumandibû. Devdelingên wê ên kurmanckî li jora bazinên lingan sekinîbûn. Gwîzekan di reşaya odê de wek du loq nîvişk sipî diyar dikirin. Bejna wê a çinarî di bin fîstanê şîfonî de mîna dara guhîjê bêpêjin dihejhijî. Te digot qey Temo hisn û cemala jina xwe nuh keşif kiribû, bi haweyê nerînên şêxên diltenik li jina xwe dinerî. Av bi devê wî ketibû. Sarê destmal ji dest girt, »Qîza min here« got û lingê Heso ê tehenî xist leganê. Heso dengê xwe ne kir. Sarê hûçikên xwe hildan û dest bi firkandinê kir. Ava şîrgermî û destê Sarê ê gij bi ling xweş hat, mêraniya Heso tevgeriya û di nav şeqan de giha hev. Qereqopkê wî rep bû. Ceriband ku bi kabokan sitarê lê bike. Kabok gihandin hev û navrana şerwalê xwe li ser gilokî kir. Lê fêde ne kir. Qereqopkê wî mîna zirnazîqê gilok hilda û danî. Vê carê jî bi lihêfê nixumand. Devê wî sist bûbû. Eger di vê bêhnikê de peyivîba, miheqeq wê taximên diranan ji devê wî bihatana xwar.

Meyro dîsa hat. Tasek di destê wê de bû.

»Apo kerem bike.«

Heso bêdilî xwe tas ji dest girt. Destê xwe ê çepê danî ser serê xwe û nehişî qurt li ser qurtê li dew xist heta ku tas çikand. Rîha wî hinekî şil bû, bi herdu destan rîh paqij kir û destên xwe jî di doşekê de ziwa kirin. Balîf kişand ber pala xwe û cihê xwe xweş kir. Berê wî tam ket Zibêr. Zibêr guhên xwe bel kirin û ziq li devê wî nerî.

»Erê ma tu dizanî bê li qereqolê Circîsko çi kir, xanim!«

Zibêr ji mereqa bê ka ku Circîs çi kiriye, bêî ku bi xwe agahdar bibe ji ser kulêv herikî ser çementoyê. Bi qasî ku hindik mabû çena xwe bigihîne erdê, sêng xwûz kir, herdu dest çep û rast danîn ser ruyê xwe û çavên xwe beloq kirin.

Temo ji aliyê malê de hat:

»Yabo ma tu ne birçî yî, xwarin hazir e?« got û li wê navê sekinî.

Di rewşa Zibêr de guhertin çênebû. Sarê jî habela lingê Heso difirkand. Firkandina bi destê wê ji bo Heso xwarina herî bi qewet bû. Lêbelê Temo


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

fêm ne dikir.

»Yabo ma tu çi dibêjî?«

Heso kulma xwe li doşekê xist û bi zirt got:

»Yabo dibêje ku keliz be jî ez niha naxwim!«

»Heso tu pir betilî xuya dikî. Ma tu şevê din jî raneza qey?«

»Razana çi Sarê!«

Bi vê gotina wî re teqil li Zibêr ket, hinekî din ber pê de herikî. Sadiq hat. Wî guh neda wî.

»Apo tu bi xêrê hatiyî.«

»Wey tu di nav xêrê de bî. Ma tu li ku derê bû heta niha, lawo? Min tu di nav koma zilaman de jî ne dît...«

»Min bi Hûto re dewar rast dikirin.«

Heso pir jê hez dikir. Ax ne ji vî aqilê wî ê rastgo ba, Heso wê ew li ser serê xwe kiriba û hata belkî mezinahiya pizûriyan jî bida dest. Bi tenê tiştek jê dixwest, »Xwe hînî derewan bike!« Çawa ku berberî bêpere ne dibû; berberî bêderew, teşqele û bêbextî û filan û bêvan ji xwe hîç ne dibû. Berberî û pêxemberî pev ne diket. Heta Heso jê re gotibû, »Berberçiyên herî mezin pêxember bi xwe bûn. Nebe Îsa, bibe Mûsa û agir bi ser serê vî Fîrawinê me de bibarîne...« Lê Sadiq jî ne şîretên wî dixistin serê xwe û ne jî dev ji berberiyê berdida. Exlaq derdixist pêş. Tê ne digiha ku derew, bêbextî û telaqreşî esasên berberiyê bûn.

Zibêr ji Sadiq pirsî:

»Ma îro dora Hûto bû?«

»Ma kîjan rojê ne dora wî ye, wê bibêje? Em tahdê li Hûto dikin. Gavantiya pizûriyan Hûto dike û em mahmela gavanekî jî pê re nakin.«

Sarê bi haweyê ku melhemê li ser lingê Heso şahîk bike, sabûn li ser birînê bir û anî. Heso çavên xwe girtin. Zibêr jî sênga xwe rakiribû, lê hîn jî li ser çementoyê bû.

Sarê:

»Sadiq rast dibêje, em tu alîkariyê bi Hûto re nakin.«

Heso beşişî, kêfa Sarê hat û di cih de gotin sipart wî.

»Bavo hûn ne rast dibêjin, me alîkariya herî mezin pê re kiriye. Me garaneke ker û dahşik teslîmî wî kiriye...«

Zibêr bi haweyê ku wî destek bike, keniya:

»Apê Heso rast dibêje, pêşiyên me bi derewan ne gotine ku fêda gavên nîhandina keran e.«

Heso dizanîbû bibêje, dinermijand û digot.

Sadiq:

»Zibêr tu li ser çementoyê rûniştiyî, çemento xwîna mirov dikişîne, binere dûv re tu ê qarçikî bibî ha. Cihê xwe xweş bike.«

»Zibêr ma ne tu jî carina gavantiyê dikî.«

Temo ne hişt ku Sarê a bi dû vê de jî bibêje.

»Yabo, Meyro xwarin ji te re anî.«

Heso ji nişkê ve çeng bû, kulma xwe li balîfê xist toz ji balîfê bilind bû.Tozê xwe dada qirika wî, kuxuya.

»Lawê kerê, ev hûn çima fêm nakin, ma niha hewara xwarinê ye! Ma min ne gotibû ku ez ê niha nexwim!..«

Sadiq devlikenî got:

»Xebera apê min ne. Temo tu çima fêm nakî? Ma tu nabînî ku siltana wî di berdeye û lingê wî difirkîne.«

Hemû keniyan. Lê Sarê ji hemiyan bêtir keniya.

»Ax Sadiq ax, hema Xwedê emirê te dirêj bike û hew. Kalo ciwan bûye û min jî keçikeke çardeh salî dibîne. Ev keçika çardeh salî ketiye ber û hûn jî wî bi tenê bernadin. Ma wek we ye, Xwedê ji we razî be...«

Sarê tam tiştê ku wî xwestibû got. Heso ji mecbûrî lingê xwe ji leganê derxist. Balîf rast kirin û devdevkî dirêj bû. Sarê vê carê jî pişta wî firkand. Firkandin pir li hesabê wî dihat. Ruyê xwe xist dîwêr, xwe di nav destê wê de xiloxavî kir û bi wê re xwe berda nav salên xortaniyê. Lê Şewqedîn bi bazdan di devê deriyê odê de sekinî, ew gotinên ku Heso pê diloriya, bi dengê tenekê birî.

»Kalo kalo! Kera mala xalê Miho za û dahşikek mê anî...« bêhnçikyayî sê, çar caran li ser hev got.

Heso li qûn rûnişt û bi wahc destê xwe hejand:

»Erê Xwedê emir qesifando, ma ez pîrika kerê me ku tu vê mizgîniyê didî min, hi! Zû ji ber çavên min winda bibe ker lawê kerê! Zilam e ha, hivdeh, hîjdeh salî ye û ji xwe re li aqilê wî binerin! Min navê wî kir Şewqadîn, qaşo wê şewqa wî bida Mekê û Medînê, lê mêrik ji me re bû şewqa gû!..«

Sarê bi ken got:

»Tuxmê te ye Heso, tu gazinan ji kê dikî?« û rabû ser xwe.

Li hewşê qelebalixa zilaman dihat. Seetek derbas ne bûbû ku Heso gihabû malê. Di eslê xwe de li gor carên ku Heso ji qereqolê an ji bajêr dihat malê, di vê carê de pizûriyan hinekî bi derengî girtibûn ser. Dudu dudu di derî re derbas bûn û xêrhatin di Heso dan. Qasoyê girs û Xelefê

hûrik di derî re dan ber hev, Xelef kumişî û wek çûkekî firiya hindur.

»Lawo çi qewimiye, hêdî hêdî, ez li vir im, ez ne pisîk im ku di şibakê re birevim, weh! Bêhna xwe fireh bikin, em ê deng û behsên qereqolê ji we re bibêjin...«

Zibêr:

»Bêlome be, bê çiqasî birçiyê gotinê ne! Ji mereqan hindik mabû ku dest û lingên xwe bişikenandana...«

Hindurê odê mîna şevê din na şeva din ji pizûriyan tije bû. Vê carê hin xort û zarok jî hatibûn. Di hikmê pênc, şeş deqîqeyan de rê û rêwanî di odê de nema. Zarok di nav şekalan de rûniştin. Hin xortan li ser qerevîzkan çong berdan erdê, hin li ser lingan sekinîn. Herkesî wek çêlîkên çûkan bêsebir li devê Heso nerî û di cihê xwe de qeliqîn. Heso xwe giran kir, wan jî çixare ji çixarê pêxistin. Dixan ber bi zikê xênî de bilind bû, li hev geriya, bû wek ewrekî qalind û hêdî hêdî xwe berda.

Sadiq:

»Bavo we em fetisandin, şibakan vekin, bila ev dixan derkeve!« got û bilez şibake vekirin. Nûrî jî alî wî kir.

»Heso, ma çawa derbas bû?«

Zibêr berî Heso:

»Xelef hinekî xwe ragire, bila apê Heso bêhna xwe veke. Bi wê nexweşiya xwe û di wê serma dijwar de bi rê ketibû. Ji şevê din ve, di qereqolê de ha ha peyiviye. Hinekî bêhnê bidênê.«

Heso ziq lê nerî û bi hêdî jê re got:

»Tu çawa dizanî ku ez ji şevê din ve di qereqolê de bûm Ebû Sufyan?«

Zibêr xwe ji gotinê xazî kir, bi zorê xwe kenand û di ber xwe de got:

»Ma min wilo got qey apo? Li qisûrê nenere min xwe şaş kiriye.«

Kenêr xwest ku Circîs di bîra Heso de bîne, ji bo ku ew jî mijarê rave bike.

»Gava Sarê gotin bi Circîs re dikirin, Circîs wek bênamûsan serê xwe berdabû ber xwe û bi lez diçû malê. Min xwe ji lêdana wî re hazir kiribû, lê li himber Sarê hîç kipînî ne ketê...«

Dengê girîniyekê bi ezmên ket, hêviya Kenêr bi avê de çû. Du jet bûn. Bi haweyê ku ezman diqelaştin pir bi hêrs ber bi başûrê welêt de diçûn. Dixana ku bi dû xwe de berdidan mîna marên dojehê di sahiya ezmên de li hev digeriya û ji nişkê vê winda dibû. Yek ji wan gava giha texma gund xwe bi telekî kir, şewqa royê ket ser baskan, ezmên çirûsk veda; bilind bû û daket û hema pê re rêz girt. Digel ku hemiyan dizanîbû ev dengê bal-

afirê ye, ji bilî Heso, hemû bazdan hewşê û bêhnçikyayî hilkişiyan ser xênî. Ên benda din jî wek van kirin. Çakêt û çefiyên xwe ji balafiran re li ba kirin, fîkandin û qêriyan û hey qêriyan. Lê li gor salên rabihurî eva ku niha kirin dîsa jî ne tiştek bû. Di dema ku hîç nizanîbûn bê balafir çi ye, bi dengê wê re piçûk-mezin herkesî xwe diavêt gasînê û digotin, »Ha wilo şêxê min lêxe! Em kûçikê te ne kafiran bikuje! Tenterûs ji kêfir sax bernede! Allah, Mihemed, Allah, medet ya şahê li Xiznayê!..« û li sênga xwe dixistin. Ên ku şûr û rimê wan hebûn bi şûr û rim, ên ku debûzên wan tune bûn bi hejan derdiketin qada şer û çekên xwe diavêtin ezmên. Zarokan jî li tenekan dixist. Îcar tew li gundên çiyê, sofî bi sur diketin û xwe di xaniyan de werdikirin. Sofî Dahboyê xerêbanî bi vî haweyî situyê wî şikestibû û miribû. Di wan salan de sofiyan xwe talan kiribûn. Her ku balafirek derbas ba, hemû li hev kom dibûn, kerîyek pez bi xwe re radikirin û diçûn mala Şêx Ehmedê xiznî. Şêx Ehmed jî ji dêvla ku bigota:

»Ey sofîno, navê wî tiştê ku we li ezmên dîtibû balafir e; ew ne ez bûm. Ma insanek çawa dikare wêqas tiriniyê ji xwe bîne! Ew tiştê reş ku jê diçû dixana wê bû. Rîha insên çawa dikare ewqasî dirêj bibe!.. « Wilo nabêje, vê dibêje:

»Hûn çima min keşif dikin! Qey hûn dixwazin kafir kinêsa we û ometa Mihemed vemirîne!..«

Heso:

»Xelef ma te ji xwe fedî ne kir ku te jî da dû van ehmeqan û tu çû ser xênî! Tu di temenê min de yî. Ma min çend caran tu bir Diyarbekirê ji bo ku tu li teyare û meyaran binerî, hi!«

»Ê ne Heso, te ne dît bê ferca wan çiqasî xweş bû!..«

»Circîs jî derketibû ser qesira xwe û çakêtê xwe ji teyaran re li ba dikir«, Kenêr got û li Heso nerî.

Qaso keniya û dengê xwe hilda:

»Apê Heso, Xelef dîsa ket ha. Bi telaq ku Luqman ew ne girtiba, wê ji derencê bihata xwar û perçe perçe bûbaya...«

Zibêr:

»Pêşiyên me bi derewan ne gotine, ‘aşê dînan bêav digere»got û kenekî qebîh kir.

Ji gotinên wî bêtir, kenê wî bala civatê kişand ser Xelef. Xelef bi awirên civatê şiyar bû ku Zibêr ji bo wî pîs gotiye.

Pêşî xwe bi ser hev de guvaşt û dev lêva xwe kir. Dûv re jî lerizî:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Çi ye Zibêr? Yanî tu dibêjî ez dîn û tirsonek im, ha!« got û bi bazdan ji odê derket.

Çûn û hatina wî du deqîqe ne girtin. Hejekî bi dirî xistibû destê xwe û li ber Zibêr sekinî.

»Heçê ji min û te van diriyan nexwe diya wî jina wî be! De were, bê ji min û te de kî mêr e, hi!«

Hejê wî dirîreşk bû. Her diriyek wek bizmarê sêpiyan qalind û dirêj bûn. Xelef tam wek dînan devê xwe xist nav çavê hej û gez li ser gezê li diriyan xist. Xwîn bi wê navê de pijiqî û bi ser hej de likumî. Civat pê ve rabû. Selîm bi serê wî girt, hej bi serî re rabû. Gava ku dilikume, diriyek li kerînoka bêvilê rast tê, kerînokê qul dike û di argûşkan de disekine. Ji vir gelek xwîn dihat. Xelef xiliya bû, lê ji ser hiş ne ketibû. Nikarîbû bipeyiviya jî.

»Lewentoyê bînin bidin ber bêvilê...«

»Yabo, Şewqedîn îro meheke ku lewento qedandiye.«

»Kuro lawê kerê, tivingekê di zikê wî de berde. Him em ê jê xelas bibin û him jî em ê bi kuştina wî malikê li Circîs biviritînin...«

Kenêr bi qerf got:

»Dohnê gazê bidin ber bêvilê, dohn ji lewentoyê dijwartir e...«

Miho:

»Ma sîr jî çênabe gelo?«

Sadiq:

»Na lo pîvaz baştir e...«

Simo:

»Ka em ê fitîla deremêtê têxin bivila wî û agir berdênê. Bi Xwedê û pêxember wê zû bi xwe şiyar bibe, kuro...«

Kazim û Selîm di nav xwe re ew birin ber serşokê. Av li serê wî kirin, bi xwe şiyar bû. »Min berdin!« got û bi qapûtê xwe serê xwe ziwa kir. Xwîn ne sekinî. Wî av di dev û bêvila xwe de werda. Bêî ku serî ji qêlik derxîne devê xwe vekir, av hemû bi ser sêngê de herikî.

Heso:

»Xelef here malê û xwe pal bide. Û eger tu di xwe re bibînî êvarî were şevbihêrkê.« Xelef deng ne kir û çû.

»Weh weh ev çi zarok in, zû derkevin! Ji niha de ha! Herin ji xwe re bilîzin û tu carî neyên civatan!« Sarê got û di nav koma zilaman de rûnişt.

Herkesî cih dayê, lê ew li ba Sadiq rûnişt. Ew ê hîn cihê xwe xweş ne kiribû, Hemo hat. Civat ji ber rabû û yek bi yek rahiştin destê wî. Hemo

cilên xwe guhertibûn. Qazaxekî kevin î hirî û pantorekî bi pîne li xwe kiribû. Pantor dirgal û sor bû. Bi giştî bêgore dihat civatê. Vê carê bi gore bû. Bi ser gorên hirînî de coteke gorên naylonî kişandibû. Paniyên herdu goran jî qetiyabûn.

»Çima ev der şilo pilo ye?«

»Ma tu pê ne hisiyayî xanim?«

»Pîro ev dîsa tu çi dibêjî ez fêm nakim?«

»Tew, keçê ma ne Eliyê me ê Betê berî niha girt ser qereqola hidûd, pêncî esker kuştin û sed û nod jî birîndar kirin. Ev cihê şilo pilo hemû xwêhdana wî ye?«

Mahmût:

»Yada Sarê, yekî ji me dirî xwarin.«

»Çima lawo qey ew yek ji we dewar bû ku dirî xwarin; hûn kulibî ne!«

Heso:

»De ka tê derxe, bê ev dewarê kulibî kî ye?«

Sarê fêm kir. Keniya û berê xwe da Sêdiq. Berî ku ew tiştekî jê re bibêje, Sadiq peyivî:

»Vê carê sebeb ne ez im, bi min nekeve. Berê xwe bide Zibêr.«

»Feqîrê Xwedê Xelef, hûn dîsa ketine kirê wî ha...«

Xelef bahlûlekî bû. Vî jî demekê xwest ku taciriya pez bike. Di dema taciriya wî de mîha herî qelew bi sih û pênc lîrên Tirkî bû. Wî mîha çermolaqî bi çil wereqî dikirî û bi panzdeh wereqeyan jî difirot. Gava jê re digotin »Xelef tu çima wilo dikî?« Wî jî digot »Ma ne bazar e, weh!« Berî taciriyê hinekî halxweş bû. Bi taciriyê top avêt û tu carî ne hat ser xwe. Herî feqîrê gund yek jê ew bû. Li şîvê dima heyirî.

Çavên Sarê dîsa dageriyan ser Heso û got:

»Lawo Temo zû xwarina bavê xwe bîne!..«

»Keçê ma tu nafikirî, ez ê di vê hingamê de çawa bikaribim bixwim!..«

»Bavê Temo, ji xwe di hingamê de xwarin xweş e. Ji xweşiya xwarinê gotinên xweş tên bîra mirov. Xweş bixwe ku gotinên te jî xweş bin. Ma ne te digot ku mirovê birçî bêhnteng dibe û hertiştî li binguhê hev dixe. Ev şîretên te bûn. De îcar têr bixwe ku tu me li binguhê hev nexînî...«

Civat hemû bi gotinên wê dikeniya. Ew hîn wilo dipeyivî, Temo xwarin li ber bavê xwe danî. Heso bêî ku civatê dawetî ser xwarinê bike, rahişt perçekî goşt, cûmek jê kir û bi xar avêt devê xwe. Sarê goşt li ser agirê hejikan biraştibû. Goşt hişk û kizîrî çêbûbû. Ji bo ku goşt ji kizîrê bike di rûn de sor kiribû. Heso bi lezet dixwar.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li gor Mîrzoyê mitirb, Sarê şahê civatê bû. Bi qerf û henek û mêraniya xwe civat dihejand. Merd bû. Xêrxwaz û dilbirehm bû. Û eger jinek geryayî ba, belkî bi qasî cesareta xwe ewqasî jî zana ba.

Dengê Meyro ji aliyê malê hat:

»Temo çayê hazir e were bibe!«

Çayê di ber lîstika qumara bi qeremaçan re xweş diçû. Di ber wensa fesadiyê re hîn xweştir diçû. Te digot qey heryek ji van gundiyan ji bo ku li ê din siwarê hatiye dinyayê. Heso di derbarê rewşa xwe a qereqolê de, hîn tiştek ji wan re ne gotibû. Lêbelê wan, xwe bi xwe erd dikirin beyar, şûv, pirêze û gîsîn li ser gîsin lê dixistin. Di guhê hev de dikirin piste pist.

»Ez dibêjim ku apê Heso Circîs rezîl kiriye, tu çi dibêjî?«

»Na Şêxo, ez bawer nakim. Bêhna wî teng e. Eger çiqek di Circîs de kiribûya, wê ji zû de ji me re gotiba...«

»Zibêr, bi rastî jî tu Ebû Sufyan î. Ev gotina te tam ket serê min.«

»Min Hemo tu carî bi du cot gore, heta bi cotek gore ne dîtiye. Kenêr tu ji vê re çi dibêjî?«

»Mahmût, ez dibêjim ku lingên wî di felaqê de nepixandine.«

»Baş e, ez ê tiştekî din jî ji te bipirsim. Ma wê dîsa şer derkeve?«

»Ji niha û hema çend seetên din. Lê ihtimaleke pir piçûk heye, dibe ku şerê îro serguherî sibehê jî bibe yanî. Ax Sarê ax! Hema here malê rahije çifta xwe û bisekine.«

Piştî ku Kenêr wilo got, bêhnikekê li Heso nerî. Dûv re çavên xwe li ser civatê gerandin, serê xwe xist ber xwe û di aqilê insên de fikirî:

»Bêguman di qumarê de mirov her tim qezenc nake. Heta mirov ji qezencê bêtir, winda dike. Gelo mirovê qumarbaz berî ku diket qumarê, bifikiriya ku ji sedî sed wê di vê lîstikê de winda bikira, wê vî mirovî bi qumarê bilîsta? Gava bilîze kêmaqil e. Lêbelê berberiya Heso û Circîs û a ku insên bi hev re dikir, ne wek qumarê ye jî, bêqezenc e. Heso bi vê berberiyê çi qezenç dike? Hîç. Circîs çi qezenc dike? Ne tu tiştî. Mala xwe şewitandine ewqas. Insan bi berberiyê çi qezenc dike? Kesek li xêrê tiştekî qezenc nake. Ji dêvla ku ewqasî qeweta xwe di malxerabkirina hev de bi kar tînîn, bila vê qewetê di hedayetkirinê de bi kar bînin. Xurt, dikarin vê yekê pêk bînin. Insan çi ehmeq e. Heso gundiyekî nezan e, lê ev ên xwedî dewlet ku êgir li ser serê dinyayê dibarînin, çiqasî bi aqil û tê gihiştîne gelo? Hertişt li ber çavên Heso pêdikeve û vedimire, dibîne bê çi diqewime. Û dîsa jî di xwe de guhertinê nake. Ba xuya nake, lê mirov hîs dike. Îcar mirin ne wek bê ye ku bi haweyê hîskirinê mirov tê bigihê û hebûna wê

qebûl bike. Ew tiştekî wilo ye ku heta bi zarokan jî dibînin û jê fêm dikin bê çi ye. Heso digel ku tu qezencê di berberiya gund de nabîne, dîsa jî berberiyê dike. Heso bêaqil e. Lê çima ji ew ên ku bi bombeyekê re sed, du sed hezar insanî di hindurê çend saniyan de dikin qirik, bêaqilên herî mezin nayê gotin? Ma ne ew ê jî bimirana, mirin hebû, dibînin û dîsa jî zilma xwe didomînin. Yanî dibînin ku piştî demekê wê ew kelaxê wan ê nazik û kubar bibe zibil û dîsa jî hev dixwin! Insan bûye insan gelo? Ez bi xwe ne bûme insan. Îcar eger bi rastî Xwedê ev insan çêkiribe, Xwedê doza çi li insên dike? Tiştek ji mirinê pîstir û ji heyatê xweştir tune ye. Mirin qebheta herî mezin e ji bo insên! Xwedê dikarîbû dinya bi qasî kayinatê mezin çêkiriba. Wî çaxî jî bi qaterilyonan insan çêbûba wê dinyayê têra wan bikira. Henekpêkirinek di vir de heye û ji vê henekpêkirinê hin zewqê distînin. Ez jî divê ku henekê xwe bi van insanan bikim û zewqê ji pevçûna wan bistînim...«

Sadiq peyivî:

»Lawo Miho eger bira tu Tecal bî, de ka hema niha tecaliya xwe şanî min bide. Wê Hûto kengî ji ber dewaran bê gund?«

»Sadiq tiştê zor ji min bipirse, ma kî vê yekê nizane. Hûto wê bi êvarkî re bê.«

»Hûto hatiye malê û Hitê şandiye ber dewaran. Îcar ji bo çi hatiye?«

»Qey bêriya kûçikan kiriye.«

»Na. Bêhna goşt kiriye. Wî dît ku Apê Heso hat malê. Û dizane ku wê pîra Sarê goşt li ber deyne...«

»Casim tu dibê qey apê Heso û Circîs bi dizî li hev hatine kuro; bi lezet xwarinê dixwe û car caran jî dikene.«

»Qaso ez jî wek te difikirim. Ev çar seet in ku em rûniştîne û ji aliyê Circîs de gotinek bê çi ye, ji devê wî dernakeve!«

Luqmên bi dengekî bilind:

»Yabo, de ka bibêje bê tu ê çi bibêjî. Wilehî te cemaet avis kir, bavo!«

Devê derî hat girtin, nîvê odê reş bû. Ev dêwê ha Hûto bû.

»Te çi kir ji dewaran, karê te li vir çi ye lawê berêz!«

»Xalê Heso, ez bi mahna ku xêrhatinê di te bidim hatim. Hitê li ber dewaran e« got û li nav şekalan rûnişt.

»Bila wek te be. Ma Luqman efendî tu û civata xwe dixwaze ez ji we re çi bibêjim? Em li qereqolê bi Circîs re dergûşkî jî ne ketin. Mêrik em xistin û li ser zikê me siwar hat...«

Ev hîn wilo diaxivî Zibêr rabû ser kaban:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Min çiqasî got, kesî li min guhdar ne kir; kesî tiştek ji min fêm ne kir. Eger bi a min bûba em ê berî Circîs li qereqolê bana û ...«

»Kuro tu fîlozofekî yûnanî ye, tu ne ê vî zemanî yî, ji ber vê yekê kesek tiştekî ji te fêm nake. Gerek piştî pênc sed salên din tu bihata dinyayê. Aqilê te pola dibire û ê me jî nikare qûşa kerê bibire.«

Civatê gotineke wilo nuh dibihîst. Heso gava ku hînî gotinên wilo xerîb dibû, bi haweyê ku xwe zana şanî hevalbendên xwe bide, di civatê de digot. Ev yeka ha ji xwe re kiribû tebîhet. Carekê dîsa wilo li ba komutanê hidûd peyveke wek eva niha dike. Komutan jî jê re dibêje »Întel Heso« Heso jî vê gotinê li himber Kenêr bi kar tîne. Lê Kenêr jî bêî ku civat tê bigihê, bi haweyekî kubar erza wî dişikîne. Heso Li ber xwe ketibû û ev tişt terikandibû.

Zibêr bêdeng lê nerî. Sadiq keniya. Miho şaşomaşî bû. Xwêzî di ber Qaso û Casim de ma. Kenêr tevxircilî û devê xwe dagirt. Lê Sarê berî wî rahişt bêr:

»Kalo ez dibînim ku ji doh vir de, tu hînî gelek tiştan bûyî haa. Li min qirikê îcar ev fîlozof çi ye!« Mahdê xwe tirş kir û di nava xwe de keniya. Civat jî hemû keniya.

»Erê lê, ji pêxemberê kafiran re fîlozof tê gotin. Û Zibêr jî pêxemberekî kafirî ye. Ma ne wilo ye?«

Kenêr:

»Apê Heso helbet niha şeytanê wî pêxemberî jî hebû ma ne ji xwe. Gelo şeytanê wî ne Sikenderê Zilqerneyn be?« û kemlan sekinî.

Civat di destê Kenêr de wek hevîr bû; çawa dixwest wilo şikil didayê. Gava ku canê wî dixwest, di cih de bala hemiyan dikişand ser xwe. Xwedî heq neheq û neheq jî xwedî heq derdixist. Ji ber ku li vî gundî cîran bû, zêde ne diajot ser xwedîcihan. Heso hoxeke erd dabûyê. Wekî din jî çend heywanên wî hebûn.

Heso veciniqî. Li himber koma xwe ket rewşeke xerab. Kenêr ew fêm kir. Bi haweyê ku wî xelas bike û jê re bibêje, careke din quretiyên ku tu xwe pê piçûk bixîne neke û di vê navê re jî heyfa Xelef ji Zibêr hilîne, axivî:

»Apê Heso rast dibêje, dema ku li Erebistanê pêxember çêdibûn li Yûnanê jî alimên mezin derdiketin. Ji wan aliman re fîlozof dihat gotin û xelkê jî ew wek pêxember ji xwe re qebûl dikirin. Fîlozofên wan ji xwe hez dikirin û wek parsekan goşt û brinc ne di bêrîka qapût û paşila xwe de, di sêniyê de dixwarin.«

Xwîn li Zibêr vemirî. Goşt û birinca ku du roj berê dizîbû hat bîra wî. Pala xwe da dîwêr û çavên xwe kutkutandin. Dixwest civatê biterikîne. Kenêr ajot ser:

»Fîlozofan goştê pez ne dixwarin, masî dixwarin. Birinca xîç ji xwe hîç ne dixwarin. Dilbirehm bûn. Ne wek min û Zibêr fesad bûn...«

»Eferim Kenêr, ez çavê te bixwim, ha wilo! Birayê min, wextê derewan û fesadiyê derbas bûye...« Sarê destê xwe bi teqil dihejand û digot.

Kenêr guh lê ne kir. Ji bilî sê xortên ku di qorziya derî de li ser pêyan sekinîbûn û li ser kaban dipeyivîn, çavên herkesî li ser wî bû. Hûto jî car carê bi ê tenişt xwe re diniqirand. Miheqeq ew niqirandina wî jî wê li ser pariyê goştê ku di sêniya Heso de mabû...

»Zibêr fîlozofekî wilo ye nizane ku ji birincê kaxet çêdibe...«

Zibêr li ser çarlepikan meşiya û bi herdu destên wî girt:

»Kenêr, ez di bextê te û bavê te de bes e! Ez dizanim ku tu li ser Xelef ji min zivêr bûyî. Lê me tiştekî ewqasî xerab jê re ne gotibû...«

Hemo:

»Temam temam Zibêr, ew mesele qediyaye. Bila dirî ne xwaribana. Zarok jî wek wî nakin...«

Kenêr sekinî. Selîm çixare avêt ber. Rahiştê, piştî ku serikê wê di nenûka tilaya xwe a girdikê de tiktikand, pêxist. Sarê jî bi dilovanî lê temaşe dikir. Nizanîbû ku di dilê vî fesadî de çi zîhayên maran raketî ne; li bendî wê ye ku ji odê derkeve û ew jî zîhayên xwe berde wê navê.

Di bin sefirna axo de, xortan bi xar û pereyan dilîstin. Komeke xortên din jî li bendî ku ev lîstika xwe biqedînin û ew jî bi qotikê bilîzin, bêsebir li ser pêyan sekinîbûn û dikirin pite pit. Şewqedîn bi xaran xweş dizanîbû bilîsta. Lê ne bi qasî Hûto, Sadiq û Zibêr. Bi giştî qana pêşî a wî dibû, bi wî lîstik radibû. Gindorkî xar bi kar ne dianî, her tim bi şel lê dixist. Yek jê fenek bû. Gava pişta wan diket wî, xara xwe nêzîk digindirand. Lê hemiyan jî ew nas dikir bê çi mal bû. Her roj dilîst û dîsa jî hînî lîstikê ne dibû. Di lîstika kaban de jêhatî bû. Fen jî ne dikirin. Pere rib rib çikilandibûn. Pirê riban zer bûn. Binê sefirnê hinekî tirmalî bû; bi tenê riba dawî diket tirmêl. Mirîşkan carina li nav lîstika wan dixist, hertişt tev li hev dibû. Di van kêlîkan de moralê wan xerab dibû û bi hêrs êrîşî ser mirîşkê dikirin. Di lîstikên xar û pere û kaban de, pişta gelek mirîşkan hatibû şikenandin.

Du xortan ji du milan ve çayê digerandin. Ji bilî qedeha Heso ên din hemû jî wek ên qahwexana Ebû Kermoyê mêrdînî, piçûk bûn. Tepsiya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

qedahan yek jê legan bû. Çaygerê ku bi legan lawê Selîm, li ba Bedirxan awiqî. Bedirxan çavê xwe li qedaha herî tarî digerand, lê Meyro jî hemû bi qiyas û tenik dagirtibûn. Bi qahr rahişt qedehekê, dilopek çayê bi ser çîmê wî de niqutî. Çeng bû, qedeha di dest de bi ser sêngê de hat xwar tam çeng bû û hertişt qewimî. Deh, panzdeh qedehên ku di leganê de bûn bi ser wî, Miho û Nûrî de belav bûn.

Heso bi ax û wax:

»Qedeh bûn, we ew jî şikenandin. Min ew qedeh ji Mêrdînê bi qiyameteke pere kirîbûn. Bê çi qedehên delal bûn. Çiftî ji ber we tê çiftî! Erê ma wê çima neşikînin yabo, ne ji bêrîka wan derdikeve... «

Sarê:

»Bi cehnema qedehan kirî! Laşê wan şewitiye û tu jî bi dû pereyên qedehên xwe ketiye...«

Zibêr di ber xwe de got:

»Pêşiyên me bi derewan ne gotine, 'hin li mirinê û hin jî li kirinê ne', hema şikestin wê çi bibe qey! « Lê hema hema hemiyan dengê wî bihîst.

Heso birûhên xwe hildan û awir tê firandin. Zibêr xwe li ber ne girt, berê xwe jê guhert û pişta situyê xwe xurand.

»Gotinên te ê pişiyan carina wek nanê garisî ne, hevdu nagirin...«

Sê xortên ku di devê derî de sekinîbûn, mîna ku wê bi kaban bilîztana keniyan û ji odê derketin. Bi çûna wan hindur hinekî din rohnî bû. Hûto ji berî niha vekirîtir xuya kir. Bêhna mîza serşokê û şekalên wan hîç tesîr li kesî ne dikir. Sobe ji êzingan dagirtî bû, guvguva agirê sobê bû. Civata wan a niha ne mîna a wê şevê bi hingame bû. Herkesî dixwest ku Heso û Hemo bipeyivin. Bi mereq li devê herduyan temaşe dikirin.

»Dema ku me li vê derê li ser gilî û negilîkirinê qirika hev diqelaşt, Circîs gihabû qereqolê û kar qedandibû jî. Lê dîsa jî pir baş bû ku em jî çûn. Eger em ne çûbana nig wî teresî, wê cendermên wî ji doh de li vir bana û wê em hemû garankî heta bi Sitilîlê bidana ber xwe. Çawîş ji me û wî destê wî girt. Tew bi ser halan de hindik mabû ku me bişîne mehkema Nisêbînê û dûv re jî hepsê...«

Kenêr got:

»Apê Heso ev ne bû, hizira me ji qebheta me mezintir bû. Îcar gava ku hizir ji qebhetê mezintir bû, wî çaxî jî berî we divê ku ez ji vî gundî bar bikim« û rabû ser xwe ku here.

Dualî lê xist. Tahn da Heso. Bi rabûna xwe re jî xwst ku wî piçûk bixîne. Lê Heso jî ne hindik bû. Piştî ku jê re got »Li cihê xwe rûne!« û ew

jî rûnişt, dest pê kir:

»Circîs ne ji me camêrtir û ne jî mêrxastir e. Em dikarin devê wî û sed bavê wî biçirînin. Lê lawo me hîç ne xwest û em naxwazin ku mesele bigihê wê derê. Kûçik hestiyan dixwe, hesabê qûna xwe dike. Ew kûçik e wilo difikire û em insan in!.. Eger min bizanîbûya wê bi kuştina wî gund xweş bûba, min ê ew bikuşta û ez ê di hepsê de raketama. Lê êz ê kê bikujim û kê nekujim; her lawekî wî bi xwe Circîsek e! Em êlek hene, bi kuştina çend kesan ji wan em ê vê êlê di nav lingên teresan de bihelikînin. Erê ew bêşeref çima wek min nafikire û dev ji gilî û milî bernade! Em ê bi hev re berberiyê bikin ser çavan, lê em ê li hev gilî nekin...«

Sarê ji kêfa re hindik mabû bifire. Di dawiyê de xwe ne girt, li ser doşeka wî rûnişt û destê xwe li kaba wî xist:

»Eferim bavê Temo û Bedirxan! Kuro bi rastî ji doh û vir ve tu gelekî bi aqil bûyî, tu min ditirsînî Heso. Ev ne be ku mirina te nêzîk bûbe! Tu wek wan ên ku li ber mirinê ne, gotinên xweş û maqûl dikî...«

Lepta Sarê ûjdanê Kenêr ne rehet kir. Çîmên xwe ber bi zikê xwe de kişandin, herdu destên xwe danîn ser kabokan, ziq li wê û Heso nerî û di şexsiyeta wê de êrîşî ûjdanê zilêm kir:

»Sarê pîrek e. Û ev pîrek bi her haweyê xwe ji me û bavê me çêtir e. Sarê mê ye. Yanî dê, xweh, keç, xaltîk û metik e. Ji dê şêrîntir çi heye gelo? Ji qîza mirov çi xweşiktir heye? Û ya xweha mirov? Baş e, îcar ew çi ûjdan bû ku rê ne dida pîrekê û ne dihişt ku pîrek beşdarî nav kar û barê civakê bûba! Wî xwedayê wan çima ew zilm qebûl dikir? Sarê mê û Heso jî nêr e. Yanî çi! Lê Heso jî dikarîbû mê bihata vê dinyayê. Pêxember dikarîbûn mê çêbûbana. Îcar mêçêbûn çima sûc bû qey? Lê wê nebana pêxember ew tiştekî din e. Aha tam di vir de, bi nêrbûyina xwe qada pêxemberiyê bi dest dixînîn û hîç jî fikir ne kirin, ne dixwestin bifikirin, ku mê çêbûbana wê ew meqamê bilind bi dest ne xistibana. Çima saniyekê mê ne dihizirîn? Insan çi ye? Nêr çi ye bibêje? Mê jî dikarîbû wilo bûba. Mê bi nêr û nêr jî bi mê hebû qaşo. Ji bo insên nahmeta herî mezin ew kêlîk bûn. Xwîn di xwînê de wek pêlên behrê radibû û di dawiyê de jî sirûşt xelat dibû. Yek diteqîne yek jî digire. Eger mezinahî di teqîn û girtinê de be, girtin mezintir e ezbenî. Bi rastî ez jî carina çi ehmeq dibim. Min çi jê ye! Ma tu ji Xwedê û pêxemberan mezintirî ku tu jî pê li Sarê û cinsê wê nakî, hi!« û çeng bû. Lêbelê kesî ferq ne kir.

Bedirxan got:

»Yabo, ev ji me re ne kêmanî ye ku tu wilo dipeyivî, ev tu li ser hişê xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

yî? Eger Circîs van gotinên te bibihîze, wê esker her roj di ser zikê me xe...«

»Kûçik lawê kûçik, tu çawa dikarî wilo ji bavê xwe re bibêjî! Ev kengî wilo tu ji bavê xwe fêhmantir bûyî! Fesad lawê fesadan, de here tivingê di serê xwe de berde ku em bi wî termê te ê pîs hemiyan têxin hepsan û malê wan ji xwe re talan bikin! Hûn ê bikujin, ji xwe re di hepsan de rûnin û em ê jî di nav lingan de biperçiqin, ha! Em qebûl nakin! Di wê kuştina we de, xelk hatin ser cihê diya te bênamûs!«

Bedirxan serê xwe berda ber xwe û di bin çavan re li Selîm nerî. Luqman, Selîm, Temo, Hemo û Zibêr bi hev re peyivîn. Lê dengê Luqmên ê qalind dengê wan fetisand û wî domand:

»Circîs wek mirîşkê ye, tu ji mirîşkê re çiqasî dibêjî 'kişe mîratmayê', dîsa jî fêde nake. Ew wek xwe dike. Ma me gilî lê kiribû ku çû ba çawîş diya min ê, hi?..«

Hemo xwe di ber re rakir, wî jî rê dayê. Dizanîbû ku wê ji wî hîn xweştir bibêje.

»Circîs yek ji me birîndar kir, heydê em ê bibêjin şer bû xem nake; lê ma li qereqolê jî şer bû ku bi cendirman ez kirim felaqê û binê lingên min hemû teqandin! Circîs xwe ji ser me venakişîne heta ku em jî xwe ji ser wî vekişînin...«

Selîm bi xirecirê gotin ji dest wî girt:

»Axe ketin nav me, em bi wan re li hev hatin. Circîs ev lihevhatin di deh rojan de têk bir. Şêx ketin nav me, em dîsa pê re li hev hatin. Lê mêrik jî di bîst rojan de li me qulipî. Seyid ketin navbera me, em pê re rûniştin. Lê wî çikir, seyid hîn ne gihabûn Zêwikê, bizina xwe berda nav nîskên me û dijminaya xwe dîsa serast kir. Em li ser destê melê li hev hatin. Îcar hîn du rojên me ne qediya bûn, bi golik êrîşî ser me kir. Ma mirov golik berdide nav genimê şîn, hûn bi qedirê Xwedê kin, hi!..«

Heso guhdar dikir û Sarê jî di nav re yekliban siqêf bi wan re dikir.

Sadiq rabû, keniya û bi haweyekî devliken peyivî:

»Selîm, te pevçûna zarokan ne got, şerê li ser elokê te ji bîra kir; di wî şerî de Nûrî ji mirinê filitîbû, ma qey nayê bîra te? Me li ser dora avê sê seetan li hev xistibû û di wî şerî de serê te şikestibû. Ma ez hîn jî bibêjim?«

»Oh Sadiq tu jî lo, a te jî hema henekpêkirine.«

»Çima henekpêkirine bavê min? ku ne wilo be, bibêje ne wilo ye...«

Zibêr xwe reş û şîn kir. Dixwest ku mijara li ser dipeyivîn ji cidiyeta xwe nekeve.

»Pêşiyên me bi derewan ne gotine 'Tebhê şîrî heta bi pîrî'; ew fesad çêbûye û heta ku ew hebe wê wilo fesad jî bimîne. Ew ji bav û kalan de dijminê malbata me bûye û heta ku zuryeta wî hebe jî, wê vê dijminayê bidomînin. Wî xwîna me rijandiye û qesasê serê me ye...«

Niyeta wî û sekinê hîç tune bû. Eger Seyidxanê cîran xwe neavêta wê navê, ew ê hîn gelek tiştên din bigotana.

»Zibêr tu bi haweyê mîna ku me hemiyan cilika bênamûsiyê kişandiye serê xwe, dipeyivî. Dijminê me mirovin çawa ne, em bi hemî dizanin, hinekî bêhna xwe fireh bike ezbenî...«

Hûto serê xwe berdabû ber xwe, kûr difikirî û hûr didirût.

Kenêr:

»Tu çi difikirî Hûto?«

Hûto li Sêdiq nerî.

»Tu çima li min dinere, li xalê xwe Şeytan binere. De ka bibêje, xalê te Şeytan mereq dike. De bibêje bê tu çi difikirî? Destê xalê te dirêj e, digihên heta bi çiyayê Qahf.«

Hûto berê xwe tam da Sêdiq û bi Kenêr re peyivî:

»Xalo, ez di insanên berî hezar milyon salî de difikirîm.«

»Eeehew, ez ev zir şeytan nikarim ewqasî bifikirim malneketiyo! Qey çavê te lêye tu meqamê min ji min bîstînî, hi?«

»Haşa xalê min ê Şeytan, ez kî me ku şûna te bigirim. Yekî wek xalê min ê Heso û apê Circîs nikarin şûna te bigirin, îcar ez ev rebenê ha ez ê çawa bikaribim! Erê xalo, dilê min bi wan insanan dişewite.«

Hûto gotina »apo»wek heqaret didît. Heqaret li Circîs dikir.

»Çima?«

»Ma çi ne çima, di vê dema me de hezar şiklê xwarinê hene, wan ev xwarina wilo milyonşiklî nexwar û hemû mirin, howeh kuro!« û li Heso nerî.

Civat bi ken li piştê sekinî. Heso ne dikeniya.

»Lawo Temo wê sêniyê ji teniştа wî rake. Di sêniyê de goşt dibîne û tiştên xerab tên bîra wî, Xwedê me jê bisitirîne haho ev çi teba ye!..«

Sarê rahişt sêniyê û li ber danî. Çênîkek goşt tê mabû. Heso nan ne şikenandibû. Hûto ew piçika goşt xist nav nên û kişiya ser.

»Meyro Meyro, qîza min goştê ku min ji Temo re biraştibû û du nanan zû werîne odê...«

Ji bin sefirna axo bi haweyê ku xortan êrîşî hev kirin, dengê qelebalixê hat û di cih de jî sekinî. Xuya bû wan ên ku bi xar û pereyan dilîstin, cih

ji ên ku wê bi kaban bilîstana re berdabûn.

Li tara jêr kûçik berdidan hev. Xort, zarok û zilam derketibûn temaşê. Keft û lept û dengê qîre qîr û qîje qîja wan, sohbetên ereban di bîra mirov de dianîn. Sê kûçik berdabûn kûçikekî. Herçar jî di xwînê de bûbûn kulîlk. Ji hersê kûçikên hevgirt, yek jê ji lingekî xwe î paşî dikuliya. Xwe nikarîbû bida ser lingê xwe. Mirov dizanîbû ku dev lingê wî bûye. Devlêkirina lingan pîs bû, zû rehet ne dibû, carina jî hîç rehet ne dibû, seqet dima. Ji ber vê yekê jî xwediyê wî ew dikuşt.

Simo:

»Apo, em nikarin vê bênamûsiya ji sê rojan û vir ve daqurtînin. Circîs sê, çar derb pev re li me xistine. Wî a xwe ne carekê, pêncî carî, heta belkî sed carî di me de kir! Û tu hîn jî dixwazî ber bigirî; xwîn di birînan de nema disekine...«

»Êh, bê çi xweşik e lawê tirê. Yanî tu dibêjî em ji hev re derkevin ha? Bêhna xwe fireh bike, wê ew jî bibe.«

»Mêrik li me teng dike, apo.«

»Rast e, mêrik li me teng dike. Di berberiyê de gava aliyekî karê xwe ji alî eskeran ve saxlem kir, dibe ku wî çaxî rev jî bi dest mirov nekeve. Ev pêleyeke ku Circîs daye dû vê yekê...«

Kenêr bi lez destê xwe hilda:

»Aha apê Heso, tam di vir de ez ê tiştekî bibêjim!« Wî rê dayê.

»Îcar şîrê di mexmelê de, heyvankirî be ne heyvankirî be, ku te kil kir, wê qeymax negire.«

Heso tam fêm kir. Gotina wî bi Sarê ne xweş hat, lê fêm jî ne kir. Bêhna xwe teng kir û rabû ser xwe:

»Kesî ji bo Xwedê li vî gundî nemaye. Herkes bûye korfesend û li xerabkirina mala ê din digere. Hûn li himber hev dîk û li himber eskeran jî mirîşk in. Esker dest diavêjin jinên we, malê we dixwin û we talan dikin û hûn jî li malwêrankirina hev digerin. Heyvanê namûsê bi we yekî jî re tune ye yanî. Eger namûsa we hebûya, we ê qûnên xwe ji eskeran re belbelot ne kiribana« got û meşiya.

Zibêr peyivî, ew sekinî û lê guhdar kir.

»Jinapê, esker dewlet e; mêraniya li himber dewletê ehmeqî ye. Dewlet çi bike ji mirov, ne eyb e.«

Sarê xwe aciztir kir, xwe hinekî tewand û bi herdu destan:

»Ê ne tu ji xwe fedî nakî, tu jî zilam î hi! Gerek ê min bi te û ê te jî bi min ve ba...«

Heso xwe aciz kir û bi hêrs got:

»Erê keçê pîrê, me fêm kir, de here bi rêya xwe de! Temam, ê te bi ê me hemiyan û ê me hemiyan jî bi ê te ve, em bênamûs, weh!«

Sarê berê xwe da Heso, Sadiq pê ve rabû û xwe xist bin çengê wê.

»Pîra delal, baştir e ku ê te bi te ve û ê me jî bi me ve be. Bi telaq gava me bi hev guherd, wê heyvanê namûsê bi te re jî nemîne« û bi hev re ji odê derketin.

Dengê qemyonekê ji ser rêya Îpekê dihat. Mîna ku bi bar bû û barê wê jî zêdî qeweta wê bû, tiriniyeke bi hêl derdixist. Deng ji pevçûna kûçikan biliya bû. Herçar kûçik jî heta ku hal di wan de nema bû li hev xistibûn û birîndar bûbûn. Meyro bi bêrê pirika hewşê diavêt ber dîwarên sênca hewşê. Ev karê Temo bû, lê destê wî ji civatê ne dibû ku here alî jinikê bike. Fesadî hebû. Temo ne mirovekî fesad bû, lê ne ku kêfa wî ji fesadiyê re jî ne dihat. Di vî warî de bi zewq li hevalbendên xwe guhdar dikir. Ne şerxwaz jî bû. Lê gava diqewimî jî dida pêşiya herkesî. Di bin tesîra diya xwe de bû û bi a bavê xwe dikir. Bavê jê re çi bigota ew bû. Di rastiya xwe de Temo insanekî saf bû. Eger ne ji Heso ba belkî tu carî jî berberî ne kiriba. Heso carina qerfê xwe pê dikir û digot:

»Ev Temoyê me li jina xwe hatiye; kî jê re çi bibêje dikeve serê wî. Eger ev lawê yekî wek Circîs ba, niha ji zû de kuştî ba. Îcar qirdê wî heye ku ez bavê wî me...«

Zoravî bêkêr û zexel bûn. Derdora gund tije kevir bûn, besta gund bi zixur û qûm bû û di xwe re ne didîtin ku hewşên xwe zixur û qûm bikin. Di hewşê re heta ku derbasî hinduran dibûn, şekalên wan di pirikê de diman û hindur bi pirika şekalan genî dikirin. Ji xwe genî bûn, îcar bi wê pirika pez û dewaran xwe hîn genîtir dikirin. Pir tahde li zarokan dihat. Zarok bi giştî xwas digeriyan. Û êvaran jî ling neşûştî radizan. Ev gundî ewqasî zexel bûn, di xwe re ne didîtîn ku mirarên xwe dûrî gund biavêjin. Havînan li ser xaniyan radiketin û heywanên xwe ên mirar, diavêtin pişt xaniyan. Li ber wê bêhna genî şevbihêrk digerandin û fesadiya hev dikirin. Ji destê fesadiyê qulên bêvila wan xitimî bûn; mirêr di bêvila wan de wek lewentoyê bêhn dida. Dîsa tahde li zarokan dihat. Giriyên zarokên vî gundî ên ku hîn bi ser lingan ne ketibûn, di şevên havînî de ji bêhna miraran heta ku dibû sibeh, ji hev qut ne dibû. Razana zarokan bi haweyê xilmaşê bû.

Mele Salar hema hema berî niha beşdarî civatê bûbû. Li hewşê pêrgî Sarê tê û tev de têne odê. Ji bilî Heso herkes ji ber wî rabûbû û cih jê re


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xweş kiribûn. Bi hatina wî kêfa Sarê hatibû. Lê teng bûbû, ji mamoste û mele divabû yek bi hewara wê ve bigiha. Mîrzo jî ne xerab bû. Ew û civat bi hev dikeniyan; civatê bi henekên wî dikarîbû xwe ji bîr bikira û îro şer neba. Mîrzo heta dikarîbû govend jî bigeranda. Hûto û temamê xortan li vir gihabûn hev. Lê îcar ku Mîrzo bixwesta, di hikmê deh deqîqeyan de dikarîbû şerekî mezin jî li dar xista. Di vê dema ku pizûriyan ava serê hûran disincirandin, şerê Eliyê Betê û Hemê Gozê ji bo yekî wek Luqmên ku êrîş bibira ser malên hûran, bes û heta gelek jî bû.

Mele Salar:

»Înşelleh baş derbas bû, Heso.«

»Weh çawa baş derbas ne bû seyda, me dendik jê berda bi telaq. Circîs berî me gihabû ser mûlidê; goştê ser girarê hemû xwaribû. Eh, me jî çend kevçî girar xwar yanîka. Na na, bi şêxê li erdê Bexdê, me girar jî ne xwar, îcar çima em derewan li xwe dikin.«

»Bêhna xwe fireh bike, tiştekî baş ji xerabiyê dernakeve Heso. Dawiya xerabiyê dîsa xerabî ye. Em ê di rojekê de hemû bimirin û ev dinya wê ji kesekî ji me re nemîne. Mirinê di bîra xwe de bînin ku hinekî bêhna we fireh bibe. Zarokên we hûr in, dewlet zalim e, li jin û zarokên xwe bifikirin. Di berberiyê de têrî tune ye, şexsiyet li ber lingan diçe, mirov li ba Xwedê û pêxember rûreş dibe...«

»Seyda mîna ku hayê te ji tiştekî tune be, tu wek wan melên ku nuh tên gund û gotinên xweş dikin, dipeyivî. Bila mirin, Xwedê û pêxember hinekî bê bîra Circîsko jî. Ma Xwedê û pêxember qîma xwe tînin ku hin êrîşî te bikin, ber te bikolin û te di koncalan de werkin û tu jî deng nekî hi? Navê bêdengiyeke wilo, ne bênamûsî be, çi ye naxwe!«

»Ezbenî çima tu hinekî ji aliyê wan de jî li meseleyê nanerî? Ew xerab hûn baş bin. Bi başiya xwe wan hedayet bikin. Heywana çiqasî berî be ku te nermî şanî da, wê xwe nêzîkî te bike. Ew heywan e fêm nake, bi gotina xweş û nerm kedî dibe, em insan in û fêm dikin çima em ê hedayet nebin. Bi gotina xweş keftar ji qulê derdikeve. Îcar ku te xwarin dayê, wê ew ê jî mîna kûçik kedî bibe. Heşî Circîs, ez van teşbîhan ne ji bo xwe, te û wî dikim, ji bo temamê insanan dibêjim. Ji bav û kalan de hûn bûne dijminên hev û we hevdu kuştiye. Erê hûn bi qedirê Xwedê kin, ka we çi ji wê kuştinê fêm kir. We ji belengazî û feqîrtiyê pê ve çi bi dest xist?«

Kenêr bi ruyekî sar û qermiçî:

»Seyda di her mexlûqî de hinek xerabî heye. Tu bixwazî nexwazî, ew xerabî wê her hebe. Ulemayên wek Îmamê Xezalî vê yeka ha dibêjin.

Çavnebarî di insên bi xwe de heye.«

»Rast e, lêbelê ezbenî vê jî dibêjin, mirov dikare rê li ber bigire ku ew xerabî har û mezintir nebe. Mirov bi xerabiyê najo ser xerabiyê; xerabî bi xerabiyê hedayet nabe.

Kenêr:

»Seyda lêdan jî xerabî ye, ma ne ji xwe.«

»Helbet lêdan ne tiştekî baş e, ew jî xerabî ye.«

»Li nexweşxana Xerpêtê, textor li dînan dixînin û hin dîn jî bi vê lêdanê terbiye dibin. Ma tu ji textoran çêtir dizanî seyda?«

Berî melê Zibêr xwe lê qewimand:

»Kenêr rast dibêje. Bav û kalên me jî dibêjin ku dîn ji dînan ditirse; dîn dînan dibîne debûzê xwe di bin qêpût de vedişêr e.«

Simo rabû ser kaban:

»Deremêt deremêt, em ê deremêtekê di bin xaniyê wî segbavî xînin; ku ne bi deremêtên min ê atomî bin hûn ê tu carî nikaribin pê...«

Luqman rabû ser pêyan, şifqa xwe li erdê xist berê xwe da melê û destê xwe ê rastê hejand:

»Circîs û zaroyên xwe jî zilam in yanî! Bila bên em ê ji hev re derkevin çiyê. Li çiyê wê qûna gewr û reş ji hev xuya bike. Wilehî ez ê wilo bi bazdan êrîşê bibim ser kozikên wan ku...«

Melê ne hişt ku gotina xwe biqedîne, mîna wî rabû û destê xwe hejand:

»Kuro a te jî mêranî ye, hi! Li cihê xwe rûne, ya jî here bazde ser jina xwe! Hema aniha rabe ser xwe û ez û te em ê ji hev re derkevin çiyê!« û xwe rakişandê.

Sarê ket navbera wan:

»Seyda ez bi gorî here mala xwe, wê te jî xir bikin. Melayiketan nikarîbûn bi şeytên, îcar tu ê çawa bi van şeytanan serî derxî! Hemû çûne ser kufrê bê bêlome be! Xwedê bike yek bibe taştê ê din jî bibe fîravîn, dev ji wan berde û here kitêbên xwe bixîne« got û civat terikand.

Mele, her gava ku di civata pizûrî û hûran de rûdinişt, pêşî hinekî dînî dipeyivî; ku lê germ dibû, îcar wî jî tam wek wan lê dixist. Her melê ku dihat vî gundî, gundiyan ew di hikmê pênc, şeş mehan de dikirin wek xwe. Mele wek yekî mumin dihat gund û fasiq ji gund diçû. Hinekan ji wan azan jî nema dixwendin; bêdestlimêj mêj dikirin. Mele Ehmedê kinikî bîst û pênc salî bû, li vî gundî meletî dikir. Wî jî mîna ku bavê wî li kinikiyan dikir, xwest ku li gund xutbê li dar bixîne. Wazên mezin dikirin, Xwedê û pêxember ji ser zimanê wî ne diket. Doza ku gundî çi-

ma nayên mizgeftê li gundiyan dikir. Yanî bi kurtî li gor gundiyan, ev mirov bûbû bele. Kenêr li ser daxawaziya Heso, bi dorê ket ku wî bixirîne ya jî hedayet bike. Kenêr, Mele Ehmed hînî diziyê kir. Mele kirin dizekî wilo ku bê yasitar! Ji roviyan bêtir mirîşk û elok ji ser hewşan direvandin. Di dûmahîkê de têra wî lê xistin û ji gund berdanê. Lêbelê Mele Salar mirovekî bi aqil û endamê PDKTyê bû. Welatperwerekî temam bû. Di eslê xwe de dostaya wî û Sarê, ji ber vê welatperweriya wî dihat. Herdu bendan jî jê hez dikirin; qîmet didanê û lê guhdar dikirin. Lêbelê gundiyan dîsa jî wek xwe dikirin.

Sadiq:

»Hûto de ka tu tiştekî bibêje!«

Hûto keniya û li Zibêr û Miho nerî.

Kenêr:

»Bibêje bibêje, Zibêr û Miho miheqeq tiştin kirine.

Hûto hîn bêtir keniya.

»Temam ez ê bibêjim. Xalê Şeytan, wê şeva ku we hofk li odê gerandibû, apê Sufyan û apê Miho piştî ku hofk belav bû çûn nav rez nêçîra reşêlan. Du çewal ji goştê teyrikan dagirtibûn û yek jî nedan min.«

Hûto, zarok ba zilam ba, dema ku jê aciz bûba, jê re »apo« digot. Siqêfên wî hemû »apo« bûn. Di pevçûnên gund de bang Circîs û Bedran dikir, »apo« digot û kevir di wan werdikir.

Civatê awir di Zibêr û Miho de vedan. Tiştekî ne baş kiribûn. Gerek civat bi nêçîra xwe agahdar kiribana. Çimkî nêçîra nav rez ji bo herkesî bû. Bi civatê re bêbextî kiribûn. Divabû cirm bûbana.

Herduyan bi hev re:

»Ê hema bi Qurana ser çonga seyda, Hûto derewan li me dike!«

»Qurana min bi we vede hûn derewan dikin. Hûto ahlê Xwedê ye û insanekî mezin e, nizane derewan bike. Ma ew rast dibêjin, tu derewan li wan dikî, Hûto?«

»Xalê mele, ê hema bi Qurana te ez rast dibêjim. Bêhna goştê reşêlan di bîra xwe de bînin û wan bêhn bikin. Ma ne wilo ye xalê min ê Şeytan? «

»Kuro bi Qurana min, tu rast dibêjî lo; ên derewîn ew in. Kenêr wan bêhn bike!«

»Seyda ji xwe pêwîst na

ke ez wan bêhn bikim, ez reşêlan di çavên wan de dibînim. Ma qey dengê wîze wîza wan nayê we?«

Heso:

»Hey topek li mala we keto, Hûto kengî derew kirine, heta ku li we derewan bike. Berî hertiştî ji xwe mêrik hîç nizane derewan bike. We du çewal teyrik kuştine, îcar hûn ê perê çar çewal goştê teyrikan bidin.«

Heso di cih de ew cirm kirin. Di hesabên wan de pevçûn hebû, lê li tiştekî din qelibîn.

Sadiq:

»Pêşiyên me dibêjin ku 'te nanek xwar, perçekî jî bide hevalê xwe.' Îcar we ne nanek, du tenûr nan xwariye. Ji wan teyrikan tiştê ku wê pişka min biketa, ez hemî didim Hûto.«

Mele jî keniya:

»Pêşiyên me dibêjin ku, 'diya dizan du tiran dikin, yek ji kêfa û yek jî ji tirsan.' Gava we goşt xwar xweş bû, ne wilo? Dawiya fesadiyê ev e. Xwedê ecêban pêş we dike û hîn jî hûn tiştekî ji xwe fêm nakin. De îcar bixwin!«

Zibêr destên xwe bi hev difirkandin û mîna ku ji xwe fedî kiribe serê xwe berdabû ber xwe. Hîlekarî dikir. Çimkî çavên wî wek du xarên zindoqî dilîstin. Cirmê ew bi zincîrê rapêçabû. Ketibû taya ku wê çawa sed wereqe bida heqê cirma xwe. Miho jî tiliya xwe a girdikê û nîşanê bi hev re xistibûn devê xwe û nenûk dikoja. Vî nizanîbû wek ev ê din fen bikira.

Zibêr bi dengekî lerzok got:

»Baş e ser çavan, ez ê cirma xwe bidim,«

Hemo ji Miho re, »Ma tu?«

»Hûn kengî bixwazin ez ê cirma xwe bidim...«

Hûto ji nişkê ve keniya û pêrgî wî rabû. Mirzo bû ev.

Heso:

»Wey ser herdu çavan teyrê xerîb, şahê mitirban, gula xortan; kuro bi Xwedê min bêriya te kiribû lo. Eger tu niha ne hataiba, min ê qasidek bişanda dû te...«

Ji bilî Heso, heta bi Mele Salar jî ji ber Mîrzoyê mitirb rabû. Mîrzo di sênga odê de rûnişt. Ribaba xwe a wek şûrekî danî ber xwe û peyivî:

»Niha berî temamê xêr û gunehan, pêşî tu bi xêrhatî, axayê min.« Keniya û çavên xwe li ser civatê gerandin. »Oooh em dereng mane bavo, temamê şeytan, pêxember, melayiket û horiyên nêr li vir civiyane û hayê min jê çênebûye! Ma ka horiya mê çima ne li vir e?«

Heso ji qazî ve:

»Kuro, kîjan horiya mê?«

»Erê lo pîra Sarê ka li ku ye? Bihuşt di bin lingên wê de ye, çênabe ku


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

em lingên wê tewaf nekin. Îsrafîlê sûra haşer û mahşerê Hûto, here bang pîrê bike!«

Hûto bi haweyê ku ma tu çi dibêjî? li Sêdiq nerî.

Mîrzo:

»Kuro hewcenake tu destûrê ji Sêdiq bixwazî, ez û tu û wî û xalê te ê mele em dizê qulekê ne, kuro de zû here ku pîrê goşt bide te, weh!« Hûto çû.

»Apê Heso rewşa zindanê çawa bû? Mar û mişk û dûpişk û mexlûq di çi rewşê de bûn? Êrîşî te ne kirin gelo?«

»Çawa ne kirin, lo! Kurkê min kirin serad û dev jê berdan. Îcar baş bû ku me şeva xwe li mala Şaqûlo derbas kir, yana bi telaq wê wan ez bixwarama.«

»Ê mala Xwedayê te ê mezin ava ku tu bi saxî bi ser me de şand!«

Hûto ji aliyekî de him ruyê xwe tirş dikir û him jî dikeniya.

»Xalê mitirb, pîrê silavan li te dike, lê nayê civatê.«

»Bihata jê re baş bû, me ê li ribabê xista belkî îmana wê hinekî kamil bûba. Di ber ribabê re selewat hîn xweştir dihatin kişandin. Ma ne wilo ye xalê mele?«

»Ma çawa ne wilo ye, li bihuştê jî ribab heye.«

Mîrzo:

»Ha apê Heso berî ku ez ji bîr bikim, lawê min ê piçûk du, sê roj e nexweş e. Ma tu ji dêvla wî jî naçî ser textor?«

Civat keniya. Kenê Selîm dîsa bala Heso kişand.

»Kuro Selîm, hinekî bi hêdî hêdî, tu wek çêlekê diorî!..«

Dema ku zarokên Temo nexweş diketin, Heso bi haweyê doktorkî zarok vedinirxandin û ji dêvila wan ve ew diçû ser doktor. Ji doktor re mîna ku zarokan jê re gotibû, digot. Doktor jî ew bi haweyê ku wî digot vedinirxand û li gora wê derman jê re dinivîsand. Carekê kwînêrek di çîmê Sarê de tê û Heso jî ji dêvila wê ve diçe Mêrdînê nig doktor. Doktor dixwaze wî venirxîne. Ew qebûl nake û dibêje, »Textor beg, kwînêr tam di hindurê xeleka qûna min de hatiye, ez nahêlim ku tu lê binerî, şerm e weh!« Doktor ji ser a xwe danakeve û Heso bêderman ji Mêrdînê vedigere gund. Sarê di civatê de henekê xwe pê dikir û digot, »Hema bila textor li qûna te bineriya, qûna te ne ji wê qûna ku mirov ji ber fedî bikira; ma tu her tim li a min nanere pîro!«

»Keçê ne ku min ji ber fedî kiribû, gava mêrik lê bineriya wê derewa me derketa. Ma kwînêr di min de hebû weh! ... îcar em ji ser a xwe ne hatin

xwar û derewa me ji me re ma...«

Mîrzo mirovekî aştîxwaz û welatperwer, şahirekî gundî û bi qasî xwe jî zana bû. Gelek şihrên Melayê Cizîrî û Feqê Teyran ezber kiribûn. Bi xwendin û nivîsandinê jî dizanîbû. Li vî gundî çêbûbû û mezin bûbû. Bavê wî jî dengbêjekî hêja bû, lê ne bi qasî lawê xwe. Herdu bendan, heta temamê herêmê jî jê hez dikir. Temenê wî li dor çilî bû. Mirovekî bi qasî tayikekî dirêj û esmerekî xwînşêrînî bû.

Mîrzo bi wê rewşa Heso û Circîs a ku li Sitilîlê ketibûnê, agahdar bûbû. Dizanîbû ku wê Heso pevçûnê derxîne. Ji bo ku wî hinekî bi wî dengê xwe ê xweş bisuhurîne, hemû xwe ji bîr bikin û şer dernekeve, bi ribaba xwe hatibû odê. Ji ber vê yekê, Mîrzo bêî ku têkeve sohbetê û destûrê ji Heso bixwaze, rahişt ribaba xwe, ji xwe herkes heyranê wî bû, û govendkî daniyê:

»Gulçînê ha Gulçînê, wan memkan bi vir de bînê
Kezeb ji agirê hêtûnê, te dil kir gola xwînê
Nazikê nazenînê, te ez xistim nav livînê
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê

Ha ha ha... rabin rabin...«

Barînî bi Hûto ket, melê da ber û bi milan rahiştin hev. Kenêr rabû, Selîm ket destê wî. Zibêr qîr da, Miho hilda xwe; Temo bi Sadiq re rabû û hev girtin. Bi sêngê çûnê û kişiyan hewşê.

»Rû helawa Mêrdînê, lêv liqûm hingivînê
Meşiya, hejiya xwe berda, dil di xwînê de werda
Gulçînê awir veda, dîn bûm min aqil berda
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê

Were were were... bi milan bi milan...«

Hemo ji ber lingên xwe ên ku di felaqê de teqiyabûn, nikarîbû têketa govendê. Li ser dika hewşê li ser kursî rûnişt û bi kêf li wan temaşe kir.

Heso qîr da:

»Lawo ma qey ez kafir im ku hûn kursiyekî ji min re jî nayînin!«

Gava wî bang kir, Meyro bi rê de bû. Heso di devê deriyê odê de li ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kursî rûnişt û melûl melûl li wan nerî.

»Çavên wê ên xezalan, diran mîna mircanan
Memik ji rengê hinaran, sêng wek berfa zozanan
Gulçîn ava zinaran, fincana dest siltanan
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê

Ooof of!.. agir pê deyne agir agir!..«

Hûto:
»Meyro zû gazî Hitê bike! Of of!..«
Sarê:
»Kuro min xwelî li serê te kiro, jinik li ber dewêr e, ma te xwe ji bîr kir, hi!«
Sadiq:
»Meyro têkeve destê Hûto!«
»Erê keko, erê.«
Sarê:
»Keçê çawa erê! Zaroka te di dergûşê de digirî!«
Meyro dergûş li ber devê deriyê malê danî û bi bazdan ket destê Hûto.«
Sadiq:
»Hûto, Meyro ji hertiştî re 'erê' dibêje. Binere tu tiştekî ku wê destlimêja mirov xerab bike, ji xweha min re nebêjî, ha! Tu fêm dikî, bê ez çi dibêjim?«
»Oh tu jî xalo, ew dikeve destê min, îcar a min çi ye! Ez tiştekî ji destlimêjê fêm nakim...«

»Kuro yanî tu qurîncekan filan jê nedî, dibêjim...«
»Xalo ji wê re bibêje, bila ew ji min qurîncekan nede.«
»Ma qey qurîncekan ji te dide, hi?«
»Heta niha nedaye.«

»Zulf kişiyane ser rû, mîna kevanan ebrû
Li ber bayê seherê, bêhn dide wek emberê
Gulçîn veke kemberê, te dil da ber xencerê
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê

Haho haho!..«

Heso bang kir:

»Keçê Sarê zû ji dêvla min û xwe têkeve govendê!«

Sarê şahra xwe girêdida û xwe ji reqsê re hazir dikir. Wê dengê wî ne kir.

»Rê ji pîra xwe re vekin ez hatim! Ji bilî Hûto, ê ku bikaribe bi min re derxe serî, bila li xwe biqewimîne.«

Hemiyan dixwest ku pîrê têkeve destê wî. Pîrê govend xweş radikir.

Zibêr jêhatî bû, lê mele jî jêhatî bû. Kesî nikarîbû bida ber Hûto. Di eslê xwe de hemû jî reqisvanên di ser xwe re bûn. Sarê ket destê melê. Xortaniya Heso hat bîrê. Bêhemdî xwe hêsir barandin. Di dawiyê de xwe li ser kursiyê ne girt, bi çarlepikan çû ser cihê xwe. Lihêf kişand serê xwe, devê xwe xist balîfê û wek zarokan giriya...

Reşo ji Nisêbînê dihat. Çenteyê xwe ê dibistanê danî ber dergûşa Nêrgizê û bi lez ket destê dapîra xwe. Piştî ku Reşo ket destê wê, Sarê lîland û tam lê germ bû. Govend li hewşê geriya. Mîrzo gazî jina xwe kiribû. Jina wî hatibû û ketibû govendê. Wekî din jina Sadiq Xanê, jina Selîm Behiya, jina Hemo Zînê, jina Miho Rewşê û jina Zibêr Fatimê direqisîn. Qîz û xortên pizûriyan bi carekê ve hatibûn. Xort û qîzan li aliyekî û jin û mêran li aliyekî govend gerandin. Hûriyan jî ji ser xaniyên xwe li wan temaşe dikirin.

Mîrzo bangî wan kir:

»Bêhna xwe fireh bikin, bi êvarkî re jî em ê li ba we govendê li dar xînin...«

* * *

Saet li dor yekê şevê ye. Şev wek teniyê reş e. Deriyê odê girtiye lê ne xiliqandiye. Fitîla lempê hatiye daxistin, ji der ve de hindur reş xuya dike. Heso li ser cihê xwe serpiştkî paldayî ye û li hewşê guhdar dike.

Derî bi dizî vebû, derî bajarkî hatibû çêkirin, ji ber vê yekê deng ji derî ne hat. Reşekî xuya kir û bi lez û bez derbasî hindur bû, xwe da ber dîwêr, tiştek danî erdê û bêdeng li ser lingan sekinî. Deqîqeyek ne ket wê navê, reşekî din bi haweyê ê pêşî derbasî hindur bû û wî jî pala xwe da dîwêr.

Heso bi dizî got:

»Hertişt temam e!«

Herduyan bi hev re »erê« gotin.

»Ma malî bi hatina we ne hisiyan?«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Na, kesek bi me ne hisiya.«

»Binere nebî nebî, hûn hîç bi navê hev bangî hev nekin!«

»Em ê bangî hev nekin.«

»Binere hûn têxin bin dîwarên êxur ha!«

»Erê.«

»Ku we karê xwe qedand heryek bi aliyekî de herin û bi dizî xwe bigihînin malê!«

»Temam.«

»Binere eman eman, kes bi vê meseleyê nehise! Bi tenê em hersî pê dizanin. Bi devê xwe karibin û tiştekî ji kesî re nebêjin. De herin Xwedê bi we re be.«

Kenêr û Simo wek du guran dan ber hev û ji hindur derketin. Gihan hindama mizgeftê kûçik ji binya mala Circîs reyan. Wan xwe da ber dîwarê mizgeftê, xwe bi dîwêr re kirin yek û pê bi pê bi jêr de meşiyan. Navbera mizgeftê û mala Circîs li dor sih metroyî bû. Lê van hîn dîwar xelas ne kiribû du kûçikan bi hev re êrîşî ser wan kir. Kenêr bi lez xwe şilfîtazî kir, pişta xwe da kûçikan û xwe daqûl kir. Kûçik sekinîn û ew bi wî haweyî ber bi wan de çû. Ew çiqasî çûn, kûçik jî bere baş bûn. Di dawiyê de kûçikan kire nûze nûz û reviyan.

Heso bi dû wan de radeka derî kişand. Hat ser cihê xwe, destê xwe dirêjî lihêfê kir, lê bi ser xwe danekir. Mîza wî dihat. Bi qûnkişkê xwe gihand serşokê, mîzt, lê av bi dû mîza xwe de ne rijand.

Simo di qorziya dîwarê êxur de kîsikê xwe vala kir. Kadîn di navbera qesirê û êxur de bû. Simo rahişt xilç, serê xilç li kevir ket, çingînî jê hat.

»Hêdî kuro!« Kenêr got û bi herdu destan ew hişk zeft kir.

»Bisekine, dengek ji êxur tê!«

Hesûk pez êm dikir. Piştî bêhnekê deng nema hat, wan dîsa dest bi karê xwe kir.

Simo xilç li erdê xist, xilç tiliyekê ne çû xwar li tahtê sekinî. Wî pênc caran cih guhert û di herpênc caran de jî xilçê wî li tahtê sekinî. Dîwarên êxur bi kevirên kufarî û hişkeberê hatibûn lêkirin. Kevir mezin bûn. Baranê heriya di navbera qelşên keviran de hilandibû. Gelek qelş hebûn ku deremêt bi rehetî tê de bi cih dibûn. Simo du deremêt di bin qorziya dîwarê roave de çep û rast bi cih kirin. Destên wî diricifîn. Bêvila wî jî diherikî. Kêleka xwe a çepê pir dixurand. Herdu deremêt jî xweşik bi cih ne bûn. Rahişt xilçê xwe û sê deremêtên ku mabûn û di dîwêr de li qulan geriya. Qul ne dîtin. Dîsa çû û hat û xilçê xwe di erdê de bir. Hema bi asas

ve du deremêtên din jî bi cih kirin. Ji van herduyan yek jê cihê xwe tam girtibû. Fitîl jî hemû ne li sêrekê jê kiribûn. Fitîlên deremêtên ku di qorziya êxur de bûn, bi qasî du metroyan dirêj bûn. A bi dû van de kintir, a din ji vêna kintir û a dawî jî ji hemiyan kintir bû.

Simo:

»Hê hê!«

»Çi ye!«

»Ez ê vê deremêtê jî têxim bin qesirê.«

Kenêr bi ser de hilbû:

»Na na!..«

»Hişş dengê xwe neke, ez ê têxim bin ewqas!«

Wî bi a xwe kir. Qesir du tebaqe bû. Tebaqa jêrê bêşibake bûn. Ji dêvla şibakan di jora dîwaran de bi tenê çar qulên ku li ser bihustekê fireh û girover hebûn. Simo tibabê deh deqîqeyan ji aliyê rohilat de li ber dîwarê qesirê xebitî. Di vir de jî deremêt bi cih kir. Vê carê baş bi cih kir.

»Hertişt temam e.«

»Pêşî ji aliyê kadînê de biteqîne!«

Simo meşiya, Kenêr bêî ku ew pê bihise, deremêta di ber dîwarê qesirê de kişand, xist bin çengê xwe ê çepê û ji qesirê bi dûr ket. Simo li ber qorziya êxur çong berdan erdê û di bin çakêtê xwe de çixare pêxist. Êgir hîç xuya ne kir. Ev haweyê wî ew dida dest ku bê çiqasî diz bû. Çakêt kişand ser serê xwe, bi herdu fitîlan girt. Serikên fitîlan bi tiliya xwe kola. Barûda fitîlekê bi qasî movikekê rijiyabû. Ew bi herdu destan lê xebitî, lêbelê fitîl neçiriya. Pense hat bîrê. Wek dînan li dêrûdora xwe nerî û dest pelikandin. Pense li ser kîsik bû. Dît. Bi lez fitîl qut kir, pense danî erdê û serikê herdu fitîlan di ber hev re radan. Çixare danî ser wan û hilma xwe kişand. Agir pêket û bi ser ruyê wî de pijiqî. Simbêl û mijank kizirîn, rû û lêv şewitîn. Kenêr li ber dîwarê mizgeftê li ser lingan sekinîbû, pişta xwe dabû dîwêr û dimîzt. Cilên xwe li xwe kiribûn. Simo li ber deremêta sisêyan teniştkî pal da û çixare bi fitîlê ve zeliqand. Agir pêneket. Deremêt ji cihê wê kişand; bi haweyê ku berî niha kiribû fitîl di bin çakêt de pêxist. Fitîl mîna zîzokê zîvirî û hawêrdor agir pijiqand. Wî deremêt avêt wê navê û bi bazdan çû a çaran. Xwe qulûz kir. Hesûk hilkişiyabû ser xaniyê malê û li nav erdê mayinan temaşe dikir. Xaniyê malê bi ser kadînê vebû. Du deremêt teqiya bûn.

»Eeehew lawo, bê çawa mayin diteqin! Ji sedî sed ew antîtenq mayin in...«

Simo dengê wî kir, di ber xwe de keniya. Ji bêaqiliya wî cesaret girt, xwe gihand deremêta çaran û agir bi wê ve jî danî. Bi bazdan çû bi a bin dîwarê qesirê ve. Li gor wî deremêta çaran jî teqiya bû. Lê ne çar, sisê teqiya bûn.

»Eeeehew lawo ev çawa mayînin! Ji wir û heta bi vir erd diheje! Batil batil! Bi Xwedê niha kes sax ne filitî ye!«

Hesûk eger hema serê xwe bifitilanda, belkî tiştek fêm kiriba. Agirê ku ji fitîlan diçû, pişt xaniyan bi carekê ve ronî kiribûn; heta pêşiya wî bi xwe jî bûbû ronahî.

Simo kîsik û pensê xwe li wir ji bîra kirin û ber bi berqefan de bazda. Kenêr jî bi jora gund de bazda. Kesî ew ne dîtin. Deh deqîqe ne ketin wê navê, melê li tenekê xist û li navtarên gund çû û hat. Bi lêdana teneka wî, temamê gundiyan ji xewê şiyar bûn.

Heso serê xwe xistibû bin lihêfê. Ji aliyekî de ji tirsa ku wê sibehê ev bûyer çawa encam bida lêva xwe dicût û ji aliykî jî de dikire xire xir. Dizanîbû ku wê bêhneke din Sarê bihata odê. Sarê ew di xew de bidîta ji bo wî baştir dibû. Wilo difikirî.

Sarê li derî xist û bang kir:

»Pîro pîro, zû derî veke!..«

Wê çiqasî li derî xist û bang kir, Heso jî ewqasî kire xire xir.

»Lawo Temo derî bişikîne. Sê, çar şeve ku bavê te ranezaye xew lê giran bûye...«

Heso jî ji xwe ev gotin dixwest. Di bin simbêlan re dibeşişî û henekê xwe bi aqilê Sarê dikir. Temo xwe da derî û hilqerast. Piştekên radeka hesinî ji ber bûn, derî vebû. Sarê pêşî fitîla lempê hilda. Lihêf ji ser Heso avêt û milê wî hejand:

»Kuro hey agir bi malê keto, rabe ji temara mirinê!..«

Heso mîna ku bi rastî xew lê giran bûbû, »Çi ye lê! Te çima ez şiyar kirim Xwedê jê raziyê!« got û çavên xwe firkandin.

»Te porê min kur kiro, qaçaxçiyan dîsa li hidûd xistin!«

»Na lê!«

Heso di bin tesîra gotina wê de, bûyera ku wî bi xwe dabû erêkirin ji bîr kir û şaşomaşî axivî:

»Qaçaxçî, qaçaxçî ha! Tu bi rastî dibêjî? Kengî kengî?..«

»Hema berî niha bi çend kêlîkan. Ma dengê teneka melê nayê te?«

»Ma teqîn çêbû? Eskeran dan dû wan? Şintaq pêket? Terempêl xuya dikin? Ma gihan bestê an na? Lempê hûr bikin! Temo derkeve ser xênî û

li ser rêyan temaşe bike!«

Temo bêî ku lempê hûr bike hilkişiya ser xênî.

Sarê:

»Sê, çar mayin teqiyan. Ê ne te nedît bê çawa erd dihejiya!..«

Bi vê gotinê şiyar bû.

»Ma tenê dere, e erê lê erê erê, ma tenê mayin teqiyan? We pêjina tiştekî din jî ne kir?«

Kela girî kete qirika wê:

»Ma ji mayinê mezintir wê pêjina çi hebe Heso? Mayin bi rebenan de teqiya, ew perçe perçe kirin! Kî dizane bê niha çend kes ji wan hatine kuştin, howeh li min porkurê! Jinên wan ên ciwan, zarokên wan ên hûr û mûr hemû wê di nav lingan de telef bibin û herin! Nizanim bê çima vî guyî dixwin, erê niha we çi ji xwe fêm kir! Mal çû, can çû, jin ji xelkê re man, zarok man li ber dîwaran. Ji xwe re şivan û gavantiyê, hemaliyê bikin û vê quzelqurta ha nekin, hey bêmirad çûno! Wey li min rebenê, diyên wan wê çawa bikaribin vê êşê tahmûl bikin! Wê ew zarok çawa bêbav mezin bibin!..«

Sarê zû bi zû ne digiriya, vê kêlîkê giriya û wek baranê hêsir barandin. Sarê lempa dilê wî bû û ji qahremaniya wê cesaret digirt. Heso tu carî nikarîbû xwe li ber vî girî bigirta.

»Keçê ev çi girî ye! Tu çima li ser min nagirî diya minê; Circîsê te îro çend roj in ez behdilandim, mala min şewitand. Ez li ba te û mêrê te me, tu li ser min nagirî, Licê li terefê dinyayê ye, tu liciyan nas nakî û tu li ser liciyan digirî...«

Sarê giriyê xwe qut ne kir, lê bersiv jî neda. Heso li hev xircilî, dilê wî sivik lê xist û di cihê xwe de qeliqî. Mejiyê wî di bin tesîra giriyê Sarê de sawêr girt; niqrîsk hatênê û tevzînok bi laşê wî ve hilkişiyan. Deremêtên ku li ser gotina wî di bin xaniyê Circîs de teqiya bûn, mîna ku bi rastî bûbin mayin û bi liciyan de teqiyabin, lerizî. Di dawiyê de xwe ne girt, bang kir:

»Temo Temo, ma çawa bû? Pêjina qaçaxçî û eskeran tê an?..«

Temo hat odê.

»Yabo, min pêjina tu tiştî ne kir. Her der bêdeng e...«

Sarê hîn digiriya. Giriyê wê dilê wî dax dida. Tam di vê bêhnikê de Heso ji ser xwe çû û bi carekê ve belav bû.

»Na na, here ser xênî, here here!..«

Temo ji odê bêdeng derket. Ew hîn ne gihabû ser xênî, Heso bang kir:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

»Ma hatin? Erê kuro esker hatin! Esker esker!..«

Wî çiqasî bang kir, Sarê jî ewqasî zor da girî. Di eslê xwe de Sarê ne ku li ser qaçaxçiyan digiriya. Kuştina Cibran û Dawidê Osmên dihat ber çavên wê. Li ser kuştiyên xwe digiriya. Cindiyê Serhên wek Dawid xortekî sipehî û jîr bû. Cindî jî bi dû docê vekiribûn û di nav pirêzên gund de doc ajotibûn. Laşê wî hemû xerab bûbû. Qîr û hewar hewarên Cindî di guhên wê de zingînî dida.

»Li min porkurê, niha gelek ji wan birîndar ketine û nali nalên wan e. Sibehê wê wan jî bi dû terempêlan ve girêdin û bikişkişînin!..«

Heso ji bo ku bi xwe şiyar bibe, ji desthilanîn nekeve û li xwe mikur neyê, qurîncek ji xwe didan. Rîha xwe dikişand û dev lêva xwe dikir. Lê hîç jî fêde ne dikir. Xwîn lê vemirî bû, mîna quşûfê zer vedabû.

»Lo lo Temo, ma qaçaxçî gihan ku derê? Zû tiştekî bibêje!«

Tiştek tune bû ku heta Temo jî tiştek bigota. Temo dîsa hat odê.

»Yabo, wilehilezîm ji girgira ewran pê ve dengê tu tiştî nayê...«

Sarê neperûşk ji ruyê xwe dan û bi haweyê ku termên neh, deh kesan li ber bin kaliya:

»Di vê seqema dijwar de û hemû wilo birîndar, haho haho! Niha birînên wan wek çaviyên kaniyan vebûne û ha ha xwînê dibeliqînin!«

Qêrîn bi Heso ket:

»Eeehew eskeran em hilanîn!« got û dev lihêfê kir.

»Kuro lawê kerê, here binere bê gihan ku!«

Temo piştî ku ziq li herduyan nerî û hinekî hizirî, destê xwe di ber xwe re hejand, »Belkî jî eskeran dora gund zeft kiriye, ez nabînim« got û bi bazdan çû.

»Îcar gelo ew teresên eskeran sibehê wê çi bikin ji me? Wê çend kesan ji me bikujin? Û ku bi birîndarî têkevin destên wan, wê ew birîndar li ser me çi nebêjin! Wey li min pepûkê!..«

Heso dîsa qêriya:

»Keçê de re mêêê t!..«

Sarê gotina »deremêt« bi haweyê ku »de rabe biceheme ji vir!« fêm kir. Rabû ser xwe û hinekî sekinî. Bêvila xwe bi hûçikê kirês paqij kir. Hûçik berdayî bûn. Servekirî hatibû odê. Derpiyê wê sor bû, lê reş xuya dikir. Lastîka delingê wê ê rastê filitîbû, devê deling mîna şalê botiyan fireh vebûbû û lingê wê nixumandibû. Kirasê wê ê şîrikî rengê xwe ne dida. Xwas bû. Li ser çementoyê şopa lingên wê xuya dikirin. Dengê xwe ne kir û ji odê derket.

»Lawo Temo hey agir bi malê keto, ma tu çima dengê xwe nakî looo! Te çi fêm kirrr! Li aliyê mala Circîs binere, Circîs Circîsss!..«

Deng ji Temo ne hat.

»Lawê berêz, bersiva min bide!«

Temo bi lez daket.

»Yabo, wilehî û bilehî pêjina tiştekî nayê. Ji qereqolê ronahî xuya nake. Ne ji bestê û ne jî ji tu derên din dengê qaçaxçiyan tê. Deng ji mala Circîs jî nayê.«

Ji kûraya kezebê keserek veda û rîha xwe firkand.

»Ka here binere bê hîn jî diya te digirî, an na...«

Temo di destê wî de wek zarokekî bû. Çû û zû jî vegeriya:

»Yabo, bi Xwedê îske îska pîrê bû. Ev îşev çi bi pîrê hatiye, min di temamê emirê xwe de ne dîtiye ku wek îşev giriyaye. Xwedê xêr bike.«

»Na na, bila negirî. Ez ê ji te re bibêjim û tu jî here jê re bibêje.«

»Wileh ku tu bikaribî wê haş bikî, baş e. De ka bibêje bê tu ê çi bibêjî?«

Heso xwe cidî kir, lê bi heyecan jî got:

»Erê lo, yanî min got bila negirî tştek ne qewimiye. De ka dîsa pêşî here ser xênî li qereqolê û mala Circîs binere û dûv re jî here wê haş bike.«

Temo bi şerwal û tena qutik bû. Ber xwe ne xiliqandibû. Qutik dabû ser hev û xistibû bin şerwêl. Ji serma dirikrikî. Şimik di lingan de bû. Bêgore bû. Bi çûna wî re Heso ponijî:

»Ez divê bibêjim. Gotina min ji ne gotinê çêtir e. Eger ez Sarê bi xwe nehisînim, dibe ku ev mesele hîn ne baştir bigere. Dibe ku ez ji herkesî re bibêjim. Û wî çaxî jî wê herkes min neheq bike. Ma mirov deremêtê dixe bin xênî! Lewra dijminê mirov çiqasî bênamûs be jî, mirov vê yeka ha tê de nake. Erê mirov tê de dike; gava ku dijminê mirov yekî wek Circîs be mirov ne deremêtê, mayinê mayinê dixe bin xênî. Na, ez li xwe mikur nayêm...«

Temo bêhnçikyayî xwe avêt hindurê odê:

»Yabo, li tara jêr kûçik direyên; hin kûçik jî dizûrin!«

»Na lo! Zû xwe bigihîne ser xênî û li qesira Circîs binere! Ma diya te hîn jî digiriya?«

»Erê erê,« got û dîsa bi lez derket .

Heso tam ji ser xwe çû.

»Sarê bi derewan nagirî, rast e mayin teqiyan e. Na na deremêt bûn. Min çima ev tişt qebûl kir? Ev çawa ûjdan e, mirov çawa dikare wilo bifikire! Hemû sûcê Simo bû. Wî ez ji rê birim. Kenêr bi aqil bû, gerek wî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rê nedaba vê yeka ha. Min bi a wan kir. Of bêhna min dernakeve. Ez ê bibêjim. Wey ma ne min ji wan re gotibû ku deremêtan têxin bin dîwarên êxur!« Kêfa xwe anî û keniya. Lê di kenê wî de kêfê hîç xuya ne dikir; kenekî derwêşî û melûl bû. Zû jî qut kir.

»Ferqa êxur û xaniyê malê çi ye yanî? Çawa ne çi ye? Yek cihê insên yek jî cihê heywên e. Ez xênî dihedimînim, hin xaniyên wan ên din jî dikarin bi êxur re bihedimin. Di axur de şivanê wan radiket. Belkî hin zaroyên wî jî li wir raketî bin. Hema zaroyên wî ne hatibin kuştin, şivan be dîsa xem nake. Em ê çend qurûşan heqê xwîna wî bidin û wê mesele bê girtin. Erê çima min çewtiyeke wilo kotî kir? Dijminê heywên dijminê insên e jî. Insanê ku heywên bikuje dikare insên jî bikuje. Min ew hemû kuştin. Ax ku bi rastî hemû hatibana kuştin û tiştek bi kesekî ji me nehata, bê çiqasî baş bû! Hemû nayên kuştin, min mala xwe şewitand! Ev niha ez bi xwe dizanim bê ez çi dibêjim? Gelo ez li ser hişê xwe me? Ha ma ne wê deremêt ne xistibana bin qesirê. Tew tew, ku dibêje min ji wan re gotibû wilo û wilo bikin. Herdu jî kafir lawê kafiran e, bi telaq xistine bin qesirê û temamê xaniyên wî!..«

Temo serê xwe di derî re dirêjî hindur kir, bi ecele:

»Yabo kûçik êrîşî hinan dikin« got û bi mêrdewanê ve hilkişiya.

»Niha tu bi qedirê Xwedê kî tu rast dibêjî, lo! Ma qesira wî hedimî ye, qesir qesir!..«

Temo bi rastî jî mirovekî tam saf bû. Di nav pez û dewaran de mezin bûbû, ji şiklê reyandina kûçikan yekser fêm dikir. Gava kûçikan pêjina gur dikir, kûçikên qels dizûriyan û ên xurt jî bi him û gim xwe li erdê dixistin, bi dengekî qalind û tena tena direyan. Doguj bi neh, deh kûçikan ve li qelaçê aliyê Dêrê gur zeft kiribû. Qelaç bi gund ve bû. Hin kûçik jî li navtaran dûzûriyan û dikirin kûze kûz. Û Temo jî hîn mesele fêm ne kiribû.

»Temam, îcar ez ê li xwe mikur bêm. Min xanî bi ser temamê kuflet de herifand, hertiştê me derket meydanê. Navbera me û qereqolê du sed metro ya heye ya tune ye. Qomandar dengê deremêt û mayinê ji hev nas dikin. Ev karê wan e. Esker bi hewara Circîs ve hatine. Kûçik êrîşê dibin eskeran. Sarê Sarê, keçê de ka wer ku ez hemî ji te re bibêjim! Were binere bê me çi gû xwariye!..«

Temo dîsa ji devê derî bang kir:

»Yabo, li ser rêya Dêrê kûçik rikêbî ser insên dikin. Dengê Circîs ji binya gund tê, lê ez fêm nakim bê çi dibêje« got û dîsa hilkişiya ser xênî.

Heso qêriya û qêriya:

»Keçê Sarê, ka were! Me mal bi ser birayê te û kufletê wî de xirîxopan kir! Keçê de were !..«

Doguj û gur hevdu girtibûn û li hev dixistin. Dengekî cêhilî jî di nav dengê reyandina kûçikan de bilind dibû. Dipeyivî û bi kûçikan re li gur dixist. Gur ji jêra gund ve hatibûn û xwe dadabûn hewşa Etman. Circîs bi teqîna deremêtan rabûbû ser xwe, çavdêrî li ser rêyan dikir. Bi guran hisiya bû. Di şibaka qesirê de rûniştibû û navtêdan di wan de dida:

»Hema tu kî be, eferim ji te re! Ez di temamê heyata xwe de îşev dibînim ku insanek û gur li hev dixin. Ma ez bêm bi hewara te ve lo!..«

Bi teneka melê re gundî şiyar bûbûn. Di nav bêdengiyê de herkes tevdigeriya. Lê kesî jî xwe ji mal bernedida. Gelek ji wan mîna Sarê, ji tirsa ku wê sibehê çi afat bi serê wan de bihata, digiriyan.

»Temo Temo, lawo diya te nayê vir, îcar were ez ê ji te re bibêjim!..«

Deng ji kûçikan nema hat, ber bi gund de xwe berdan. Temo di nav kûçikan de reşê wî dengê ku wek dengê tabûreke esker bihîstibû, fesiland. Lê nas ne kir. Heso zor da Temo.

»Kuro bêşerefo, ez bangî te dikim, tu çima nayê!..«

Temo hat û li himber wî li ser pêyan sekinî. Derî vekirî hişt.

»Rûne ku ez ji te re bibêjim!« Rûnişt û guh da ser.

»Kenêr û Simo deremêt xistin bin xaniyê Circîs. Ma gelek ji wan hatine kuştin? Eskerên ku hatine gelek in?«

Temo behetî.

»Tu çi dibêjî yabo!«

Pêjin ji hewşê hat. Temo bêhemdî xwe hilqevizî û çik sekinî. Heso jî çeng bû, pişta wî li dîwêr ket. Reşo bû ev.

»Kalo ê ne tu nizanî bê min û Doguj me çi zir gur kuşt, gur!«

Devê Temo berî dilê wî bi xwe şiyar bû. Lêv ji ser hev çûn, beşişî. Lê hîn jî nikarîbû xwe bilebitanda. Ji qiram ketibû. Heso wek kewê ku di dahfkan keve, gewdê wî bi carekê ve melisî, serê wî jî hildayî bû û qîq li Reşo dinerî. Hersê jî bêhnekê ne peyivîn. Piştî ku Heso got »Çi çi çii!« pala xwe da dîwêr û li Temo nerî.

»Me gur kuşt gur. Termê wî li ba golê ye, hûn ê sibehê bibînin. Doguj devê xwe xistibû qirika wî û min jî bi pehînan lê dixist. Di wê bêhnikê de min çiqasî dixwest ku Hûto li wir ba. Ê ne kalo, te nedît bê pevçûna wan çiqasî xweş bû. Ew jî ne kêmî Doguj bû yanî. Eger ew û Doguj bi tenê bana, belkî Doguj nikarîba pê. Kûçikên din jî alî me kirin. Gur gelek


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bûn. Lê min heta bi çaran dîtin. Hevalê xwe di nav lepên me de hiştin û reviyan.

»Ev tu çi dibêjî, ez fêm nakim?«

»Kalo, qey tu ji min yeqîn nakî? Ji bavê min re bibêje bila bê, ez ê wî bibim ser bereta gur.«

»Yanî niha ev qolordiya ku dora gund zeft kiribû, hemû tu bû ha!«

Reşo keniya.

»Hiii, tu behsa mayinan dikî? Ew ne mayîn bûn, kalo. Li nav gund diteqiyan.«

Heso veciniqî.

»Tu çawa dizanî kuro?«

»Ez li mala mahelim bûm. Mahelim araq vedixwar. Ez û jina wî em direqisîn û wî jî ji me re li tembûrê dixist. Piştî ku xalê mele li tenekê xist, ew jî hat wir. Erol ji wî re jî got. Kalo kî bûn ew ên ku deremêt teqandin?«

»Xwedê ne hişt, ev çi gotine! Deremêtên çi! Kê ji te re got?«

»Erol got.«

Heso li Temo nerî, çavê xwe girt û devê xwe vekir:

»Bêşeref yaya gidî bêşeref, tu jî zilam î ha!« Tif nav şeqên xwe kir, »Wey tifî li vî kîrî be ku tu jê yî! Lawê wî zarokeke dide dû guran, ew jî zir nihîtekî zilama ye ji desthilanîn dikeve û vî gundî tije esker dike. Ji teyrên ku te li min û diya xwe çêkirin hindik mabû dilê me biqetiya. Sed sal e ku tu xwedî kûçik e. Tu li ber pez û di nav gur û kûçikan de mezin bû. Kûçik gava bêhna gur dikir, çawa direya te nizanîbû, hi! Tu çawa dengê Doguj nas nakî! Ma wê çawa nas bike yabo, mêrik li jina xwe hatiye. Îcar zilamê ku li jina xwe bê, tu ê hêviya çi jê bikî! Zû ji ber çavên min winda bibe, kûçik lawê berêz!«

Kipînî ne ket Temo; pir li ber xwe ket! Heso erza wî li himber lawê wî şikenandibû. Serê xwe berdabû ber xwe û diponijî. Ji odê derket.

»Lawê min Reşo, ma Erol wekî din çi digot?«

»Kalo bêhna xwe pir teng kiribû. ‘Gundî deremêtan di bin xaniyên hev de diteqînin. Ev tiştekî pir talûke ye!’ digot«

»Ê îcar melê çi digot?«

»Piştî ku Erol mele bi teqîna deremêtan hisand, melê xwe ji Erol bêhntengtir kir. ‘Eger wilo here ez ê jî araqê vexwim,’ digot.«

»Lawê min Reşo, mîna ku tu hîç ne çûyî mala Erol efendî, behsa tiştekî neke. Here ji xwe re razê û bavê xwe bişîne vir. Eferim lawê min, tu mêrekî di ser xwe re yî. Pîrika te Sarê bi derewan ji te hez ne kiriye. Bi

telaq tu ê ji pîrê re ne qereqola Sitilîlê û Qesra, Tûgaya Mêrdînê feteh bikî. Qolordî ne himberî te ne, qolordî!«

Reşo ji kêfan re dikir bifiriya. Bapîrê wî ew ji xwe û bavê wî mezintir kiribû. Pesindaniyeke bi vî haweyî ji bo naşiyekî hivdeh salî ne baş bû. Reşo xwe nepixand û meşiya.

»Min çi xwelî li serê xwe kir! Binere hemû deqîqeyek mabû, lawik li hewşê bû, ha. Min xwe hema çend saniyan ragirtiba, lawik diket hindur û Temo jî wê bi vê pîsitiya me ne hisiyaba. Ma hisiya wê bibe çi, yanî. A baş ku pîrê pê nehise...«

Temo li himber wî bi haweyê xulaman li ser kursiyê rûnişt. Yanî qeweta gewdê xwe ji ser kursî bêtir berda ser lingan; kelef bi kabokan ragirtin û xwe bi ser hev de pirnisand. Ew qelafetê wî ê girs û vê rewşa ha qet li hev ne dikir.

»Yabo, te gazî min kiribû.«

»Erê« got û sekinî.

Heso bêî ku bi xwe agahdar bibe bê çi dike, dixwest Temo bipeyive. Zanyariya wî di demên xofgirtin û bêhntengiyê de ji pêşzanyariya wî bêtir di bandora binzanyariyê de çerx dikir. Eger Temo hinekî bi kêrhatî ba, peyvek wî dikarîbû bûba mifta xilqa zindana mejiyê vî. Wê gavê jî problema ku rû dabû, wê ewqasî mezin neba. Ev rêdana Heso bi xwe tiştekî bedew bû. Ji ber ku dixwaze lê guhdar bike, lê ê li himber wî bi qasî zarokekî ku li koşk û serayan rûdinişt, nikarîbû bifikiriya. Di bîstikên xofgirtinê de peyvandina xwe bi xwe ji guhdarkirinê û di bîstikên bêhntengiyê de jî guhdarkirin ji peyvandina xwe bi xwe çêtir bû. Heso tam di van kêlîkan de dewreke bêhntengiyê digire û naxwaze bide, dixwaze bistîne. Heta Heso yekî wilo bû, di bîstikên xof girtinê de jî dixwest bistîne; yekî zana pê re rûne û ew jî lê guhdar bike.

»Yabo, ez li te guhdar dikim. Bibêje!«

Heso pêşî keserek veda. Bi haweyê ku alikariyekê jê bixwaze fikirî, piştî ku bêhnekê lê nerî û wî jî serê xwe berda ber xwe, dest bi axavtinê kir:

»Gelo ne baştir e ku mirov biçe derdora xaniyên Circîs saxtî bike bê ka çi bi xaniyan hatiye?«

»Tu dizanî yabo, tu çawa bixwazî ez ê wilo bikim.«

»Hema wilo ha.«

»Erê wilo.«

Tirs, bêhntengî û neçarî bi hev re di hezaza mejiyê Heso de zîvirîbûn; di hêwanê de pêrgî hev hatibûn û mîna sê lezbiyenan hev dialastin. Ev


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kêlîk pir tehlûke bû. Eger Heso mirovekî alim ba, di vê kêlîkê de dikarîbû xwe intîxar jî bikira. Di çavên wî ên ku li dûr dinerîn, dil dixuya. Dilê wî diniqirand; dil mîna motorê ku hewa dikir û piçpiçî benzîn distend, kurkubî lê dixist. Dihejhijî. Xwêziya wî ne diçû xwar. Temo jî hîç bîr ne dibir ku fireke av bidayê. Piştî ku ji Temo re got »De ka here« û Temo jî çû, ew dîsa bi xwe re kete mihasebê:

»Min çima ev yeka ha kir? Qaşo ez mirovekî bi hesab bûm. Ez yekî wilo bûm ku ji qewimandina meseleyê bêtir, min bala xwe dida ser dawiya meseleyê. Ez firavînê dixwim û li ser firavînê hesabê firavîna roja din dikim. Û min her tim jî bi qeweta vê fikirê qezenc kiriye. Îcar sibehê wê kî ji min re çi û çi nebêje! Hema kî çi dibêje bila bibêje, bi tahtilerd kirî! Te baş kiriye. Ma Circîs ê ku mirov dûnde jê bihêle. Insanên wilo gerek bi carekê ve mehû bibin. Tew, yanî niha ev jî gotin e tu bi qedirê xwedê kî. Lê ne bi hesabê kuştinê, bi hesabê ku wî bitirsînim û wî hinekî ji eskeran dûr bixînim, min ev tişt kir. Hîletê min ji bêbextiyê diçû. Ez li ba bêbextan rûnediniştim. Min bêbextî li Circîs kiriye. Bêbextî jî karê qelsa ye. Ez di çavê xelkê de him bûm bêbext û him jî bûm qelsok. Gelo ne baştir e ku ez hema niha temamê zilamên xwe li odê bicivînim û em êrîşî ser mala Circîs bikin? Bi êrîşê re em ê bi tivingan li xaniyan girêdin û wî çaxî jî wê ev meseleya deremêtan ji holê bikeve, winda bibe. Bila em deh kesan ji wan bikujin û bi deh salan di hepsan de bimînin û bila navê min bi bêbextî dernekeve. Cihê bêbextan di civata gunmezinan de tune ye. Mirovên ji xwefedîkir, ne bêbextiyê dikin û ne jî bi bêbextan re rûdinin. Na ne wilo ye. Wilo ye, lê tu derewan dikî bibêje. Ma ji Zibêr bêbextir kî heye gelo? Ev tiştekî din e. Tu wek Sadiq difikirî. Kîjan baş e gelo? Ez şer derxînim an ez xwe li bendî sibehê bihêlim bê ka mesele çawa dizîvire? Bi derxistina şer wê ev mesele dîsa neyê veşartin. Erol efendî, jina wî û mele pê hisiyan e. Reşo pê dizane. Ez çi bikim, ez çi xweliyê li serê xwe bikim! Deremêt kuro, tiştê ku heta niha kesî ne kiribû min kiriye! Ma yabo, çawa min ê ne kiriba, temamê şeytan û meytanan li dor min civiyane. Şeytanekî dinya xistiye qelaqê, îcar ê min tew pênc, şeş şeytan hene. Tobe ya rebî tobe estexfîrulah. Ez ê xwe li ber navê bêbextiyê negirim. Eger kes bi vê bêbextiyê ne hisiyaba, bila bêbextî ba. Dijminayî bû xem ne dikir. Çawa dijminayî bû xem ne dikir! Tu çi dibêjî kuro! Di hindurê mala wî de li dor panzdeh zarokên hûr û mûr razayî bûn. Te bêşerefiyeke mezin kiriye! Erê bi Xwedê rast e. Min xwe gindorkî girêdaye û hayê min ji min ne bûye. Gava ev mesele li me derket, em ê nikaribin bi mêrik re pevçûnê

jî derxînin. Çimkî ji hemû alî de em neheq in, wê xelk me neheq bikin. Baş e ez çi bikim?.. «

Kolanên gund çamûrî bûbûn. Temo ji tirsa ku şekala wî di çamûrê de neviciqîne, xwas çûbû. Lê ji bîr kiribû ku mirov li ber xaniyê Circîs jî çixarê nakişîne. Eger çixare ne kişandiba, dibû ku Circîs ew li dor xaniyê xwe ne dîtiba.

Heso bi hêdî got:

»Ma te çi fêm kir Temo?«

»Xaniyê wî ji ê me saxlemtir bû. Ji bilî du dîwarên qesira wî, min temamê dîwaran saxtî kirin. Dîwar ne herifîne. Tiştek ne bûye. Îcar tu dikarî bêmitale rakevî. Yabo, ez jî dixwazim herim rakevim.«

»Ma kesî tu dît?«

»Erê erê, Circîs ez dîtim.«

»Te got çiii!«

»Mêrik di şibaka qesirê de rûniştîbû û hayê min jê tune bû. Gava ez di ber dîwêr re dimeşim, tu nabê ew jî min dibîne...«

»Ê dûv re?«

»Bangî min kir, ‘ lo lo tu kî yî, tu li wan deran li çî xwe digerî?’ got. Min jî tiştek li xwe çênekir, ez rast meşiyam û min berê xwe da malê.«

Heso bi wahc xwe bi ser hev de diguvaşt û bêsebir lê guhdar dikir.

»Yanî bi tenê hew evqask bû! Ma hûn bi hev re ne ketin devjengê jî, hi?«

»Na, hemû wek ku min ji te re got, ewqas bû.«

Heso bi herdu destan li kabên xwe xistin, dûv re destê xwe ê rastê hejand û got:

»Lawo wilehilezîm, tu ne ê hewandinê ye, lê ez çi bikim. Niha ez te bikujim, wê dewlet jî min bi hesabê, ‘Heso bîr adem oldurdî’ tewqîf bike. Kuro bi telaq tu ne tu ‘adem’î, îcar lawo bila tu ‘adem’ bî û hew! De here ji xwe re razê û berî ku tu razê jî bazde ser Meyro, kûçik lawê berêz!..«

* * *

Banga sibehê lê xistibû. Ronahî ketibû dinyayê. Çûkên beytik xwe ji hêlînan berdabûn hewşan, dikirin wîze wîz û diçêriyan. Dengê teyr û tilûran ji nav rezê pişta gund dihat. Dîkan bang didan. Ji navtara jêr kerekî nêr diziriya. Dengê wî mîna borîzana şer qalind û bilind bû. Mîh ne dibariyan. Li ser gund ewr digeriyan, lê hemû jî ne ewrên baranê bûn. Bayekî hênik dixurbilî. Perîxanê ji ser birka gund dihat malê. Satileke tije av di destê wê de bû. Herdu tajiyên Mîrzo bi haweyê ku keroşk xistib-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

in hesara xwe, li ser bênderên jêra gund bazdidan. Eskerên ser hidûd tabiyên xwe berdidan û bi terempêlên eskerî diçûn qereqolên xwe. Ronahiya fanosekê ji çavên terempêlan dida der. Rêya Îpekê ji terempêlan xalî bû. Qelebalixek ji mala Kenêr dihat. Dengê Kejê li ê hemiyan ferq dikir, lê dîsa jî mirov jê fêm ne dikir, bê çi digot. Melê bang nedabû. Sarê limêj dikir. Meyro bi Fehmiyê şivan re pez rast kiribû û qutik diavêtin hindurê sobê. Sobe ne dadayî bû. Heso heta berdestî sibehê jî kabûs dîtibûn. Bi destê sibehê re xewê lê giran kiribû.

Sarê:

»Meyro deyl Temo bike bila rabe ser xwe; bêhnek din wê esker bigirin ser gund...«

Xewê li Temo jî giran kiribû. Meyro ew şiyar kir, lê hîç ne dixwest ku rabe ser xwe.

»Keçê dev ji min berde, ez şevê din ranezame, bihêlê ez hinekî ji xwe re razêm.«

Sarê bi bêhntengî got:

»Zû xwe bide ser hev wê bêhneke din esker bigirin devê derî!«

Temo veciniqî:

»Eskerên çi yadê!«

»Ma qey te mayinên şevê din ji bîr kirin. Niha di nav mayinan de bi kêmanî pênc, şeş kuştî hene. Xwedê dizane bê niha çiqas birîndar jî ketine!«

Temo lihêf kişand ser serê xwe û di bin lihêfê de peyivî:

»Yadê, a te xewn e, te dîsa xewn dîtiye. Ne mayîn teqiyane û ne jî tu kes hatiye kuştin. De îcar bihêle ku ez ji xwe re razêm.«

»Kuro ev tu çi dibêjî! Bi mayinên şevê din re erd hejiya, erd!..«

»Yadê, wilehî tu xanî ne ketine. Limêja xwe bike û dev ji min berde.«

Sarê piştî ku hinekî bêdeng sekinî,« qey bi rastî min xewn dîtiye!« bi dizî got û dengê xwe hilda:

»Lawê kerê, ku dibêje ‘te xewn dîtiye!’ Ne mayinek, çar, pênc mayin bi dû hev de teqiyan. Ez û tu em çûn odê, cem bavê te. Ez giriyam, bavê te giriyê min bi xwe ne xweş anî û ji odê berda min. Ma çawa ev hemû dibin xewn!..«

Meyro keniya:

»Yada Sarê, Temo henekan li te dike. Ma ne gava mayin teqiyan, ez jî bi we re rabûbûm. Melê li tenekê xist...«

Meyro bi gotina henekkirinê, rê ji Temo re vekir. Wî berî niha ne bi henekî, cidî gotibû.

»Meyro qey te jî xewn dtiye« got û nema peyivî.

Ro baş bilind bûbû, gihabû delavan. Gund tevdigeriya. Bedranê muxtar bi çend hevalbendên xwe ve li ber sênca hewşa Circîs sekinîbûn. Ji rewşa wan xuya dikir ku hûrî hemû wê li wir biciviyana. Xwendekaran yek bi yek xwe ji malê berdidan û diçûn dibistanê. Sarê, Heso ji xew şiyar kiribû. Hemo berî Zibêr û Sadiq hatibû oda Heso. Miho û Selîm bi hev re û Simo jî bi dû wan de hatibû odê. Melê li ber deriyê xwe bi haweyê ku hin gundî bangî wî bikin, piyase dikir. Ji hejandina herdu destên wî û nerînên wî mirov tê derdixist ku xwe bi xwe dipeyivî. Pêjina mamoste ne dihat. Pîrekên hûriyan her sibeh bi gavên re dewar didan ser hev, pîrekan dev ji garanê berdabûn; li ser dêlegura ku şevê din hatibû kuştin û xortan ew kişandibûn ber xaniyê Celîl, civiyabûn. Pîrekan dêla gurê, qûn û heta bi nîvê parxwanan jî jê kiribûn. Li gor wan dêla gurê sihûd dianî. Yanî pîreka ku gava piçek ji dêla gurê wek nivîştê bi xwe ve daliqanda, wê sihûda wê veba û mêrê wê jê re misixur bûba. Bi kuştina gurê, Reşo di çavê gundiyan de bûbû qahremanekî mezin. Jina mamoste, gundî serwext kiribûn.

Pizûriyan garana xwe rast kiribûn. Garan gihabû pişta rez. Teyrekî reş mîna ku li mirîşkan digeriya li hindama mala Xelef li hewa sekinîbû. Dengê zerzûlan ne dihat. Ji nav xiramê qesrika binya Sirêçkê, kewekî berê xwe dabû goristanê û bi haweyê ku yasînan li miriyan bixwîne hebhebî dixwend. Kera Kerîm dîsa ji garanê mabû. Jina wî Hemdo bi bez ker diajot û bang gavên dikir. Dora gavantiya îro a Zibêr bû. Sadiq Zibêr ji ber garanê vegerandibû û Hûto ji dêvila wî ve xistibû ber dewêr. Ji bilî Kerîm û Hûto temamê pizûriyan li odê gihabûn hev.

Zibêr:

»Pêjina eskeran nayê. Ev tiştekî ecêb e, seet bûye nehê rojê û esker xuya nakin!«

Temo bi haweyekî ji xwerazî:

»Qey bi me ne hisiyan e»got û di cih de gotina xwe birî.

Heso lê nerî û awir tê vedan.

»Hilkişe ser xênî û li ser rêyan binere kûçik lawê kûçik!«

Temo çû. Miho keniya:

»Zibêr, ez dibînim ku te gelek cil û mil li xwe kirine. Ma tu çiqasî li xwe bikî, hey wê te tazî bikin û li te xînin.«

»Yabo, ne min bi tenê, ji xeynî apê Heso we hemiyan xwe wek min girêdaye. Îcar çima tu henekê xwe bi min dikî. Ê min bêceme û şerwalek


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

e, tew îcar te du şerwal li xwe kirine. Ê min çakêt, ê te qapût û çakêt li te ye...«

Giriniya terempêlekê hat. Cefil li civatê ket. Bêî ku hin ji wan bangî Temo bikin, hemiyan xwe li devê derî qerase kirin û çeng bûn hewşê. Qemyona Feremezê Kwîtanê ji Sitilîlê dihat û diçû Nisêbînê. Di eslê xwe de a wî ne qemyon û ne jî bi navê tiştekî din bû. Serê wê ê qemyonê bû. Qeresêla wê ji a qemyonên ford kintir û li ser sê şivên hesinî wî bi xwe çêkiribû. Sindoqek bi textan li hev xistibû; hemû jî teneke kiribû û bi qeresêlê ve şidandibû. Piştî ku li hindama Şêxbat sindoqa wî tev li rêwiyan dipeke bestê, li ba Beşîrê qeynaxçî tankêreke hesinî çêdike û diavêje ser qeresêlê. Rêwî di vê tankêrê de dibirin û dianîn û bi hesabê siwarbûna qemyonê pere ji wan distendin. Dengê terempêla wî ji kîlometroyan ferq dikir. Dema ku terempêl ji Sitilê dihat û Atxê derbas dikir, mîna ku helîkopter di newalê de difiriya, deng derdixist. Hûrî û pizûriyan ji herkesî bêtir dengê terempêla wî nas dikirin. Lê civata Heso di vê bêhnikê de, ev deng hîç nas ne kiribûn.

Sadiq:

»Hey qeda xwedê pê keto, em ji desthilanîn xistin!« got û keniya.

Xelef beşişî. Peyv xist mista zimên, xwest ku bigindirîne, poşman bû û daqurtand. Destê xwe danî ser devê xwe, lê xwe ne girt.

»Sadiq tu jî tiştekî efû nakî. Tu dibê qey tu di nava mirov de yî. Ma em çawa bikin, bêbavan zalim in. Mirov ji zaliman bitirse, ne eyb e...«

Di ruyê wî de çar birîn hebûn. Şûna diriyê ku di kerînoka bêvila wî re çûbû xwar, bi qasî beyendûrekê mezin bû. Bêvila wî baş werimî bû. Xinxinokî dipeyivî.

Qaso:

»Ka qahremanê dêlegurê çima nayê civatê? Situyê jinên hûriyan tije qu... kir û wê here mektebê, ha! Ma jinên me jî ne wek ên wan bû! Çima dêlegur bi dest wan ve berda?..«

Xelef:

»Erê kuro, gava ez hatim odê, ê ne we ne dît bê van pîrekan çi dikirin ji serê hev! Heryekê kêrek xistibû destê xwe û rebena gurê ha ha diçilvirandin.«

Sadiq:

»Erê wey, qîre qîra wan bû. Xensê û Koçerê xwe rakişandibûn hev. Koçerê jê re digot ‘te qu...ê min biriye, ka qu...ê min derxîne!..’ Rebena Xensê jî, ‘yadê wilehî min tu qu...ê te ne biriye weh!..’ digot.«

Zibêr kenekî fahş kir û peyivî:

»Ma dêla wê ji bo zilaman jî sihûdê nayine gelo?«

Xelef awirek dijwar tê veda:

»Mêrik qûnek bûye ha...« Civat bi gotina wî bêtir keniya.

Heso diponijî. Hîç ne dixwest bipeyive. Civatê jî ji ber wê bêkêfiya wî ewqasî ne diajot ser. Kenêr bêmad bû, zor dida xwe ku vê bêmadiyê nede der. Bi xwe hisiya bû ku ne baş kiriye. Poşman bûbû. Yekliban gotinên vala dikirin û xwe di ber re dikenand. Kêfa Simo li cih xuya dikir. Wî û Sadiq bi qeşmeriyan dabûn ber hev û kenê xwe li hev dikirin. Hemo kêm dipeyivî. Zibêr ji herkesî bêtir ditirsiya. Wek dizan li devê derî dinerî û guhên xwe bi ser şibakan de ker kiribû. Qaso bi haweyê ku wextî esker bigirin ser gund, qerevîzkî rûniştibû. Serê xwe berdabû ber xwe û tiliya xwe a işaretê bi çementoyê difirkand. Miho ji herkesî bêtir dipeyivî. Kê çi digot, wî xwe di ber re radikir. Temo hîn jî li ser xênî bû çavdêrî li ser rêyan dikir. Sarê çûbû aliyê malê û haziriya çûna Reşo dikir.

Reşo ji midîrê dibistanê destûra rojekê sitendibû. Lê li xwe kiribû du roj. Li lîseyê sinifê yekê dixwend. Birayê wî Seydo jî li dibistana ortê sinifê dawî dixwend. Reşo bi mebesta pevçûna ku doh na pêr na pitirpêr derketibû, hatibû gund. Li kolanên qijla Nisêbînê ew û birayê xwe di xaniyekî bi kirê de bûn. Bi giştî di rojên înan de dihatin gund û yekşemê jî diçûn Nisêbînê.

Hûrî li mala Circîs vehewiya bûn. Mele, Mîrzo û Erol jî di nav wan de bûn. Hemû bi bûyera şevê din agahdar bûbûn. Lawê Circîs Bozan pêşî pense û kîsikê Simo ê ku şevê din li şûna xwe hiştibûn û dûv re jî fitîlên deremêtan dibîne. Fitîl li wê navê belav bûbûn. Lê li gor ku Bedran digot, »Bi xwe şiyar nabe heta ku çavên wî bi fitîla deremêta neteqyayî nakeve.« Ji herdu deremêtên ku di bin qorziya dîwêr de bi cih bûbûn, yek jê ne teqiyabû. Pîjek bê çi ye ji dîwaran ranebûbû. Tam li gor dilê Heso encam dabû. Piştî poşmaniya xwe, wek pîreka ku mêrê wê li hidûd dixist, berzûrî Xwedê bûbû ku tiştek bi dîwaran ne hatibe.

Melê digel ku dizanîbû kûçik bi pez re çûye, ji binya hewşê bang kir, »Malîno kûçik neyê min!«

Sadiq pêrgî wî çû. Mele bêî

ku bi Sadiq re bide û bistîne, bi lez xwe avêt odê. Gurinî bi civatê ket, dîsa herkes ji ber rabû û cih jê re xweş kirin. Mele li ber sobê li himberî hemiyan li ser kursî rûnişt. Bêhna wî teng bû. Eniya xwe difirkand û serikên simbêlên xwe dikirpitandin. Heso mesele fêm kir. Kenêr bi tirs li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

melê nerî. Simo bêxem rûniştibû. Guhên Zibêr û Hemo wek guhên roviyan bel bûn. Temo li ser xênî piyase dikir.

Heso:

»Xwedê xêr bike Seyda dîsa çi qewimiye?«

»Ne xêr e. Heso hişê xwe bîne serê xwe û li min guhdar bike. Hinekan şeva çûyî deremêt xistine bin xaniyê Circîs. Ew vê meseleyê dixin situyê we. Circîs bi dû ku deremêt diteqin bi nîv seetekê, Temo li dor xaniyê xwe dibîne« got û sekinî.

Heso pêşî ruyê xwe tirş kir, xwest ku konebaziyê bike û bibêje, »Ma mele tu bawer dikî ku Temo bikaribe tiştekî wilo bike?« bi xwe hisiya ku wê bi gotineke wilo tiştekî safî neke, dev jê berda.

»Ê dûv re?«

»Eger we ev xerabiya ha ne kiribe, yek bi yek werin mizgeftê û sûnd bixwin. Eger hûn sûnd nexwin, wê mesele pîs bigere. Îcar eger bi rastî ev yeka ha ne bi destê we bûbe, wek camêran sûndê bixwin. Sûnd ji bo we ne kêmanî ye.«

Civat ecêbmayî ma. Ew li bendî tiştekî din bûn, tiştekî din derket holê. Heryek ji hindama xwe de keliya, »Wî deremêt xistiye bin xaniyê xwe, ew çi kûçike ku em jê re sûnd bixwin!..«

Zibêr rabû û destê xwe bi ser melê de hejand:

»Hîn ji serî de dest bi derewan kiriye. Dilê wî li kê bişehetiya belkî me qebûl bikira, lê ma Temo ê dilşehitandinê ye, hi! Ew wek melayiketekî ye...«

Heso serokatiya xwe bi kar anî û bi haweyê ku ji berê de qerara xwe dabe, dest bi peyvê kir:

»Herkes bila devê xwe bigire û li min guhdar bike! Em ê yek bi yek ji wan re sûnd bixwin ku hayê me ji vê meseleyê çênebûye, ewqas. Seyda dirêj neke, rabe here mizgeftê!«

Di eslê xwe de kêfa sextekarên wek Zibêr pir hatibû ku bûyera şevê din ne mayin, deremêt bûye. Lê ji herkesî bêtir jî wî sûndxwarin bi xwe ne xweş dianî. Tirsonekê herî mezin ew bû û di vê bêhnikê de jî mêrxasiya herî mezin wî dikir. Bilind dipeyivî û sûnd di derbarê tirsonekiyê de rave dikir. Ji civatê jî destek distend.

Heso xwe aciz kir. Destê xwe ê rastê bilind kir û lê hejand:

»Zibêr min nekufirîne, li cihê xwe rûne û devê xwe bigire!«

Kenêr xwe avêt pişt:

»Apê Heso rast dibêje, em mecbûrê sûndê ne. Helbet hinekan deremêt

xistine bin xênî. Îcar dibe ku mirov karibe qesda kuştina xwe, lê mirov nikare qesda kuştina temamê kufletê xwe bike. Ez bawer nakim ku Circîs deremêt xistibe bin xaniyê xwe. Li vê mentîqê gelek dijminên me hene. Hin ji wan bi bafîka ku me bi hev bidin kuştin, deremêt xistine bin xaniyê mêrik. Çima hûn hişê xwe nayînin serê xwe, weh! Sûndxwarina me ji ne sûndxwarinê çêtir e. Gava ku me sûnd ne xwar û me şer derxist, wê xelk ji me re çi nebêjin!..«

Mele çû. Sarê dengê wan bihîstibû. Ji aliyekî de kêfa wê hatibû ku mayin bi qaçaxçiyan de ne teqiyane û ji aliyekî de jî aciz bûbû ku pizûrî bi karekî wilo xerab rabûbûn. Dilê wê li Simo dişehetî. Lê Simo jî bêşêwira Heso wê nikarîba ev bûyer bikira. Wilo difikirî. Civatê Temo peyivandibû. Eger Heso berî wî ne gotiba »Temo, heta destê sibehê li ba min bû«, Temo wê rasterast bipeyiviya. Zena pizûriyan hemiyan li ser Simo civiya bû û wî jî habela li xwe dida mandelê. Li çavê Kenêr û Heso temaşe dikir û sûndên herî mezin dixwarin.

Xelef da pêşiya pizûriyan û berê xwe dan mizgeftê. Necîmê hûrî, Mîrzo û mele li mizgeftê bûn. Ji bilî Reşo û Heso mêrên pizûriyan bi carekê ve li ser ku hayê wan ji bûyerê ne bûye, sûnd xwarin. Hûto li ber garanê bû. Li gund ba jî qîmet ne dikir ji xwe. Circîs ne dihişt ku ew sûnd bixwe. Melê piştî ku pizûrî sûnd dan, bi Qurana xwe ve hat odê. Di vê bêhnikê de dîsa civat digeriya. Pizûrî yek yek, dudu dudu dihatin odê. Mele li himber Heso çong berdan erdê:

»Bibêje, bi vê Quranê min deremêt ne xistine bin xaniyê Circîs; bi vê Quranê hayê min bi deremêtan ne ketiye; bi vê Quranê ez nizanim bê kê deremêt xistine bin xênî!«

Heso sekinî û keserek veda. Çavên xwe li ser zilaman gerandin û dûv re jî ziq li melê nerî. Destên xwe bi hev firkandin û ber bi Quranê de bir. Destê xwe ê rastê bilind kir, devê xwe dagirt û dîsa sekinî. Sarê bêhna xwe teng kir:

»Sûnd bixwe ku Quran li ser dilê te xîne, hey deh top li rih keto! Te ew kafirî kiriye, te te te!..»got û bi lez ji odê derket.

Heso bi haweyekî cidî ji civatê re got:

»Min û seyda bi tenê bihêlin.«

Hevalbendên wî ode terk kirin. Kenêr piştî ku li Heso nerî û hinekî tê de fikirî, giran giran meşiya û çû.

»Seyda, ez naxwazim sûnd bixwim. Min fêm bike.«

»Heso, ez te fêm dikim û dilê min jî ji te re dixwaze; lê ez ê nebim şirîkê



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

gunehê te. Ez mirovekî misilman û xwedaperest im. Di vê sûnddanê de Circîs ez kirime wekîlê xwe. Û min jî qebûl kiriye. Ez nikarim bextê xwe biavêjim. Tu çawa bikî, ez ê jî wê ji Circîs re bibêjim ewqas. Tu sûnd dixwî, yan na?«

Heso fikirî û melê jî dengê xwe ne kir.

»Ez sûnd nexwim, wê ev mesele li ser min bîmîne. Wî çaxî jî şerekî nuh li dar dikeve. Em ê gelek mêran ji hev bikujin. Ev ne bû. Ez sûnd bixwim, wî çaxî jî wê Xwedê li min bê xezebê. Ez yekî bi tenê me. Hema Xwedê çi dike ji min bila bike. Ev baş e« got û çavên xwe girtin.

Bi haweyê ku Quran pê nehise, pir bi dizî serê tilîkên destê xwe ê rastê gihand Quranê û ji nişkê ve li bin zikê xênî nerî. Pêşiyekî li hewa dilîst. Wî hinera mejiyê xwe bi carekê ve li ser vî pêşî civand. Pêşî di hindurê çavên wî de lîst û bi qasî gayekî mezin bû. Di hikmê neh, deh saniyan de ji mezinahiya vî pêşî, hindur yekser reş bû. Heso xwe çeng kir melê. Devê xwe xist sênga wî û wek zarokan giriya. Dilê mele pê şewitî, wî jî dest bi girî kir û bi xwedayê xwe re peyivî:

»Ya rebî tu xefûr û kerîm î. Ez dizanim ku te ecêbek mezin şanî vî ebdê xwe ê gunehkar kir. Lê ya rebî min bibexişîne, ez mecbûrê ku avekê li vî agirî bikim. Wê hevdu bikujin. Şeref û namûs û erz û eyalên wan, wê di nav lingên romiyên teres de bitelife. Bila rûreşî barê min, dojeh mala min be û namûsa vî miletî nekeve nav lepên eskerên tirko! Ez ê bextê xwe xerab bikim û ji Circîs re bibêjim ku Heso sûnd xwariye« û bi lez rabû.

Wek gule pekiya hewşê. Li Kenêr qelibî, şiqamek li bin guhê wî xist û bi zirt bangî Sarê kir:

»Circîs dixwaze ku Reşo jî sûnd bixwe!«

Sarê di cih de soro moro bû û yekser ew bersivand:

»Dinya jî xerab bibe ez nahêlim ku Reşoyê min sûnd bixwe. Hemû çûne ser kufirê, tîra Xwedê di wan de nare!« Destê xwe ber bi Reşo vekir: »Kafirno, hîn şitil e, şitil! Hûn ê çawa destê wî li Quranê xînin!«

Melê Quran bilind kir ku li erdê xîne. Di cih de poşman bû. Quran hejand û berizî Sarê.

»Nalet li te jî bê, nalet li we hemiyan bê, Xwedê xezebê li we bibarîne! Temam bila Reşoyê te jî sûnd nexwe!«

»Waweylê waweylê li min pepûkê, ev mele jî dîn kirin!«

»Hiş nepeyive!« melê got û ber bi mala Circîs de lezand.

## Sala 1977an

Mele Salar ji Circîs re bextê xwe avêtibû ku Heso û Reşo jî sûnd xwarine. Lê digel vî haweyî Circîs dîsa jî rehet rûnanê û li Reşo gilî dike. Polîs ji dibistanê Reşo digirin û wî teslîmî qereqola Sitilîlê dikin. Mele û Sarê bêhnçikyayî diçin Sitilîlê, xwe diavêjin tor û bextê başçawîş. Çil û sê hezar lîreyên Heso ên girêdayî hebûn. Sarê pereyan hemî bi xwe re hiltîne, kîsikê pereyan li ber başçawîş vala dike û dibêje, »Lawê min berde û ev pere hemû ji te re.«

Ji ber ku lawê wê di kontrola polîsan de hatibû qereqolê, başçawîş rasterast nikarîbû lawik berda. Mecbûr bû ku ew bişanda dadgehê. Soz dide Sarê ku wê Reşo li dadgehê bê berdan. Piştî ku başçawîş 43 hezar wereqeyan berdide bêrîka xwe, hema di cihê cih de bi Reşo re du cendirman kar dike û wan dişîne Nisêbînê. Di eynî rojê de wî derdixînin dadgehê. Lê mixabin dadger jî dinyayê bi ser serê Sarê de diherifîne û Reşoyê wê tewqîf dike. Polîs Reşo dibin girtîgehê, Sarê li Nisêbînê dimîne û mele jî teqeze texsiyekê kirê dike û berê xwe dide bajarê Batmanê. Mele, Xalitê ku endamê PDKTyê bû bi xwe re radike û bi şev digirin ser mala Circîs. Wî xewle dikin û jê re dibêjin:

»Du rê ji te re hene; ya tû ê îfada xwe ji ser Reşo biguherînî û ya jî kuştina te!«

Circîs ji desthilanîn dikeve. A din î rojê Salar û Circîs diçin Nisêbînê. Circîs îfada xwe diguherîne. Piştî panzdeh rojan Reşo tê berdan û Circîs jî ji şahidiya bi derewan, sê mehan ceze dixwe. Bi tewqîfkirina wî kêfa Sarê pir hatibû. Reşo sitûna dilê wê bû. Dê jê re bûba pîlot û bi balafiran agir li ser qereqolan bibaranda. Bi hezaran esker dikuştin û ji herêmê zilm radikir. Ji bo kuştina eskerekî ne çil û sê hezar, wê temamê malê xwe feda dikir. Ji ber vê yekê bû ku alîkarî bi ên wek Xalit re dikir. Dijminê eskeran kî diba bila bûba, dostên wê bûn. Eger bi qasî serê derziyê dijminahiyeke Circîs bi eskeran re bûba, Sarê ya Heso hedayet dikir û ya jî dikuşt. Di civatê de, wê bi xwe ev gotina ha dikir. Panzdeh rojan li Nisêbînê mabû. Bi roj li ber deriyê girtîgehê bûbû pepûk û bi şev jî mîna

guran bi seetan li derdora girtîgehê geriyabû. Reşo ji bo wê hertişt bû.

Di hikmê şeş salan de, li Zorava û temamê herêmê gelek tişt hatibûn guhertin. Zoraviyan bi dû girtina Circîs de tu carî bi hev re şer ne kirin. Bêî ku hin wan li hev bînin, li hev hatibûn. Lê têkiliyên wan jî pir bi sînor bûn. Ne diçûn malên hev, xerabiya hev jî ne dikirin. Bêşa ku başçawîş diavêt ser gund, bi hev re didan hev û bêş teslîmî Bedran dikirin. Gelek ji wan dewlemend bûbûn. Heso terektorek û texsiyek kirîbû. Circîs jî du texsî û terektoreke xwe hebû. Zoraviyan pênc texsî û sê terektor kirîbûn.

Reşo û lawê Îdrîs Serdar ku neviyê Circîs bû, herduyan jî di imtihanên unîversîteyê de zanîngeha hiqûqê a Enqerê qezenc kiribûn. Li vê zanîngehê Reşo du salan û Serdar jî du sal û nîvan dixwîne. Di salên xwendinê de bêî ku ji malbatê hin bi wan bihisin, Reşo beşdarî nav refê rêxistina »Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê PPKK« û Serdar jî beşdarî nav refê PKGKê dibe. Ji bavên xwe bi hesabê ku xwendinê dikin, pereyan distînin û di xebata rêxistinî de bi kar tînin. Sarê bi armanca ku Reşo ne bûbû pîlot xwe jê xeyidandibû. Xwe aciz dikir û digot:

»Kûçik lawê kûçik, ji Sarê re qereqol fetih kirin, hi! Şîrheramo, heq û hiqûq û edalet û medaletê dixwîne, tirrr! Wê di mehkeman de heqê mîhê li ba gur biparêze, bênamûs lawê bênamûsan!..«

Mafir, Reşo piştî ku jê re dibêje, »Ji kurdan re pîlotî qedexe ye... « û ew jî bawer dike, dîsa jî haş nabe. »Ma te nikarîbû mektêbên ku bombe û sîlehan çêdikin jî bixwenda, hi!« dibêje û pê re li hev nayê.

Lawê Kenêr Restem û ê Erol Sînan li Diyarbekirê zanîngeha tibê, lawê Zibêr Aydin li Stenbolê li zanîngehê beşê edebiyat û zimên, lawê Luqmên Bişar li Enqerê enstîtu beşê metamatîkê û lawê Bozan jî li Stenbolê mihendizî dixwend. Gelek xort jî bûbûn mamoste. Herêm ji xwendekaran tije bûbû. Ji sala 1970î û vir ve xwendekarên kurdan »Partiya Kominîstên Gundiyên Kurdistanê PKGK, Partiya Herî Kominîstên Kurdistanê PHKK, Partiya Sosyalîstên Memûrên Kurdistanê PSMK, Partiya Maoîstên Kurdistanê PMK û Partiya Reel Kominîstên Kurdistanê PRKK« damezirandibûn. Hemiyan jî doza dewleteke kurdî dikirin. Bi damezirandina van partiyan re, li gundan berberî rabûbû. Têkiliyên navbera xelkê, polîs û eskerên dewletê bi sînor bûbûn. Bêş rabûbû. Li polîsxana Nisêbîne êşkence her çiqasî bi temamî ranebûbû jî, bi êşkencê kesek ne dihat kuştin. Li qereqola Sitilîlê û temamê qereqolên gundan êşkence rabûbû. Başçawîşan ji gundiyan re »yoldaş« digotin. Başçawîşê Sitilîlê Mustafa li qahwê bi zilaman re bi kax-

etan û Fatîme xanim jî bi xortan re bi gokê dilîst. Vê jinikê berî xortên herêmê di xwe de şoreş kiribû. Gava bi xortan re bi gokê dilîst, te digot qey li ber behra Mêrsînê ye, tena derpî û bi sudyen dilîst.

Xwendekaran keça Zeroyê sitilîlî Hedo revandibûn çolê û kuştibûn. Bavê wê ji gund bar kiribû.

* * *

Kelkela germa havînê ye. Rivîn ji taht û latan diçin. Bêhna êgir ji erdê tê, erd dikele; mîna ku agirekî mezin di binê erdê de hatiye dadan, pêtî ji qelşan dide der. Hawêrdor rewrewk girtine, leylan leylanê hiltîne. Pûş û pelax qemirî ye û di bin lingên çûkan de dişike. Pişta zinaran bûne wek sêlek sor. Çûkan xwe berdane bin sîdaran. Zimanê kûçikan di tûlê de kişiyane; tu tivingan berdî wan ji cihê xwe dernakevin. Cil bûne pîşo. Ji rivînan bêvila mirov dişewite, bêhn dernakeve. Çirûskeke agir dikare deşt û çiyê bişewitîne.

Heso tena bêceme û fanêreyê sertazî li ser kulêv di nav koma pizûriyan de rûniştiye û çayê vedixwe. Sê xortên bi çek derbasî odê bûn. Dudu jê bi demaçe, yek bi keleşkof e. Demaça yekî map ya ê din astrake nehderbî ye. Yek jê simbêlbor, yek simbêlhej û ê din jî simbêlşor e. Şekalên hersêyan jî meqab in; bi çakêt û bi pantor in û li serê xwe jî çefiyên soringî pêçane. Yekî ji wan qazaxekî bi berstik li xwe kiriye. Yê simbêlşor bi qapût e jî. Qapût li qama wî a kin naxwe. Ne dikenin, ne digirîn. Madê wan ne tirş e, lê pir jî cidî ne. Ji xwêhdanê bûne av. Serê zendika çakêtê xortê ku li ber derî sekiniye, şil bûye. Çavên wan di xwêhdanê de bûne bizot. Hilm ji serê ê pêşî diçe. Çavên wî jî terifî xuya dikin. Çend tayên xernûfê bi pişta çakêtê xortê qamqutî ve ye. Qilçixên simbilên genimî bi qeytana şekalên hemiyan ve zeliqîne. Qurîncek jî bi wan ve hene.

Çekdaran bi hevdu re gotin:

»Merheba ji civata we re!«

Mele berî herkesî rabû ser xwe. Sadiq pêrgî wan çû. Heso dengê xwe bi ser ê civatê xist:

»Wey merheba û hezar carî merheba ji we re. Hûn di ser herdu çavên min re hatin. Kerem bikin rûnin. Temo, ji van xortên delal re pêşî xwarinê û dûv re jî çayeke giran bîne...«

Piştî ku şekalên xwe eskerkî rêz kirin, hersê jî li kêleka hev û li himber Heso rûniştin. Ne çakêt û ne jî çefî ji serê xwe kirin. Xortê simbêlşor bi haweyê ku qêpût ji xwe bike, li ê simbêlbor nerî û di cih de jî berê xwe jê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

guhert. Qapût ji xwe ne kir. Çarmêrkî rûniştin. Zibêr çixare li ber wan gerand, Kenêr çeqmaq pêxist û Miho jî satileke av anî. Yekî ji wan çixare ne dikişand. Heso ew nas ne dikirin. Lê Mele Salar yek ji wan nas dikir.

Heso:

»Xortino li qisûrê nenerin, lê ez telebên bi sîleh nuh dibînim. Ma ev hûn ji kîjan partiyê ne, eyb nebe?«

Xortê ku simbêlbor bû bi haweyekî kemlan peyivî:

»Apo, em ji Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê ne.«

»Wilehî navê we mîna ku hinekî bi min ecêb hat. Lawo li qisûra min nenerin, ez tiştekî di dilê xwe de nahêlim. Ez miroveki deqarû me.«

Piştî ku xortê simbêlşor got:

»Şoreşgerî ji xwe ev bi xwe ye, apo« û hema pê re li ê simbêlbor nerî.

»Wek we, gelek partiyên teleban tên vir û diçin. Herkes tiştekî dibêje... Îcar hûn ê bi çi rêyê Kurdistanê ji bin zilma tirko xelas bikin?«

Xortê ku Simbêlbor bû, pêşî çep û rast simbêlên xwe firkandin. Dûv re jî boqên simbêlan berjêr kirin, lêva qalind di bin wan de wek sefirneyekê xuya kir.

»Em ê bi devê tivingê kurd û Kurdistanê xelas bikin, apo...«

Wî xwest ku dirêj bike, Heso rê nedayê. Gelek caran li ên wek wan guhdar kiribû. Dizanîbû ku gotina wan nebire, ew ê bibêjin û hey bibêjin.

»Ev baş bû. Rast e, ku ne bi devê tivingê be, tiştek safî nabe. Ma lawo navê serokê we çi ye?«

Simbêlşor:

»Apê Heso, navê serokê me Circîs Bîtîren e, lê em jê re Reyis dibêjin.«

Heso wek hespê ku ji mêr bicefile, rimekê bilind bû. Çavên wî wek du tasan vebûn. Sênga xwe heta bi çongan tewand, serê xwe ber bi wan de bir û rakir:

»Te go çi yabo qurbano? Te go çiii?«